
KONÊ REŞ



# Ji Stêrên Welatê Qedexe

Institut Kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# Ji Stêrên Welatê Qedexe

Institut kurde de Paris

Hikûmeta Herêma Kurdistanê
Wezareta Rewşenbîrî û Lawan
Rêveberiya Giştî ya Ragehandin û Çap û Belavkirinê
Rêveberya Çap û Belavkirinê – Duhok

- Navê Pertûkê: Ji Stêrên Welatê Qedexe
- Babet: Vekolîn
- Amadekirin: Konê Reş
- Dîzayina Naverok: Reşad Bêcirmanî
- Dîzayina Berg: Guhdar Salahedîn
- Qeware : 15 × 22
- Jimara Laperan: 282
- Nirx: 3000
- Tîraj: 500
- Zincîre: 68
- Çapa yekê
- Hijmara Spardinê: 2104 ya sala 2013
- Çapxana: Çapxaneya Parêzgeha Duhokê/ Duhok - Kurdistan

Institut kurde de Paris

**Mafên Çapê parastîne ji bo Rêveberiya Me û Xudanê Pertûkê ©**

LIV, KL. 4990
24/11/2017

*Konê Reş*

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque
Reçu le 24/11/2017

# Ji Stêrên Welatê Qedexe

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque

Institut kurde de Paris

1.

# Naverok


Cegerxwînê Hesarî (1903 – 1984) .......................... 9
Osman Sebrî (1905 – 1993) .................................... 57
Casimê Celîl (1908 – 1998) .................................... 73
Celîlê Celîl ( 1936 - ) ............................................ 81
Hemze Begê Miksî ( - 1958) ................................ 95
Mihemedê Seîd Axa (1928 – 1960) ....................... 99
Mihemed Arif Cizrawî (1912 – 1986) ...................... 101
Mellayê Cizîrî (1407 – 1481) ................................. 108
Dr. Qasim Miqdad (1932 – 1992) ............................ 113
Aram Dîkran (1934 – 2009) .................................... 123
Şivan Perwer ........................................................ 133
Melle Ehmedê Namî (1906 – 1975) ....................... 136
Seydayê Tîrêj (1923 – 2002) ................................ 151
Musa Anter (1918 – 1992) ...................................... 159
Roger Lescot ( 1914 – 1975) ................................. 167
Nelson Mandela ....................................................... 171
Dr. Ehmed Nafiz (1899 – 1968) ............................... 177
Sebrî Botanî (1925 – 1998) .................................... 186
Mihemedê C. Seyda (1918 -2005) ........................... 197
Remezanê Berzencî (1930- 2004) ........................... 199
Seydayê Keleş1930 – 2007 ..................................... 201
Dr. M. Nûrî Dersimî (1892 – 1973) ......................... 205
Mihemed Şêxo (1948 – 1989) ................................. 211
Hizniyê selîm (1932 – 2008) .................................. 225
Elîkê Betê (? – 1919) ............................................ 229
Mele Nûriyê Hesarî (1934 – 2011) ......................... 241
Hecî Mûsa Begê Xwêtî(1855 – 1928) ..................... 251
Memdûh Selîm Begê (1897 - 1976) ......................... 259
Rezoyê Osê (1950 - 2010) ....................................... 267
Hunermend Seîd Yûsiv (1947 - ) ........................... 273


Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# Çend Gotinên Pêwîst

Mijarên vê berhevokê (Stêrên Welatê Qedexe), di çax û demên têvel de hatine nivîsandin. Her stêrek li gor ronahiya xwe xeber dide û li gor navê her stêrekê min derfet daye ronahiya wî..

Ez kêfxweş dibim ku xwendevanên zimanê kurdî li ber ronahiya van stêran ber xwe bibînin û rêçikên durist di pêvajoya xebata rewşenbîriya kurdî de ji xwe re bibijêrin û her wiha xwe ji xebatê bê par nehêlin. Her yek ji rex xwe ve kevirekî di avaniya rewşenbîriya kurdî de deyne..

Bela serboriya van stêran ji me re bibe navtêdan, dehifdan û sorkirin ber bi parastina ziman û rewşenbîriya kurdî ve...

**Konê Reş**
Qamişlo

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# Cegerxwînê Hesarî
## 1903 - 1984

Di sed saliya Cegerxwîn de ez li Amedê bûm

Li ser daxwaza Enistîtuya Kurdî a Stenbolê, di roja 20/09/2003an de, min berê xwe da Amedê (Diyarbekirê), û di roja 21-22 an de bi xelkên Ameda şewitî re min beşdarî di 100 saliya zayîna helbestvanê Kurdî gewre Cegerxwînê Hesarî de kir. Û min wiha got:

Amedê!

Te çi dîtiye û çi nedîtiye ?

Amedê! xwezî lat û berên beden û keleha te biaxifyana, ew tiştên ku dîtine ji me re bigotina; xwezî ava çemç Dicle, seyrangehên Feqehê Teyran şanî me daba; xwezî keleha xwînê mukir bihata, bê çendî mirov di bin lat û zinarên wê de derbas bûne.

Erê Amedê!

Ji berîya Mêrdînê, min qesda navê te kirîye , ji Qamişloka evînê, min xwe avêtiye hembêza te û min gelek serpêhatiyên li ser peravên çemê Ceqceq, di bêrîkên xwe de ji te re anîne..

Erê amedê !

Li ser daxwaza Melayê Cizîrî û (Selma), li ser daxwaza Ehmedê Xanî û (Mem û Zînê), li ser daxwaza Feqehê Teyran û ava (Dicle), li ser daxwaza Mîr Celadet Bedirxan û (Hawar) a wî, li ser daxwaza Edîb Karahan û kovar (Dicle - Ferat), li

Institut kurde de Paris

ser daxwaza Mûsa Enter û (Birîna Reş) li ser daxwaza Osman Sebrî û (Derdên me) û li ser daxwaza Cegerxwînê Hesarî û (Kîme ez):

Kîme ez !

Ez im rojhilat

Tev birc û kelat

Tev bajar û gund

Tev zinar û lat

....

Bejin bilindim

Wek dêw bilindim

Ez dest dirêjim

Serbest dibêjim

Dixwazim bi lez

Gavan bavêjim

Kîme ez.. kîme ez...

Erê Amedê!

Welatiyên Amedê! Guhdarên delal û birêz!

Min di tûrikê xwe de gelek silavên gerim ji we re anîne; ji Qamişloka (Bavê Felek), ji Tirbesipiya Hevêrkan, ji Dêrika Hemko û Amûda şewitî, ji Dirbêsiya Kîkan û serê Kanîya Ibrahîm Paşayê Milî

Erê Amedê!

Institut kurde de Paris

Silavên gerim ji te re hene ji Kobanîya Berazan, ji Efrîna çiyayê Kurmênc û darên zeytûnan..

Erê amedê !

Silavên gerim ji evîna çirayên li ser te (Amedê) vêketî, ji bajarê Şama şerîf, Taxa Kurdan, goristana gernas û mêran; ji Mîr Bedirxanê Botî, Mîr Celadet Bedir-Xanê Azîzî, Rewşen xanima Mîr Salih, Qedirî Beg û Ekrem Begê Cemêl Paşayê Diyarbekirî.. ji Qedrî Canê Dêrika çiyayê Mazî û Memdûh Selîm Begê Wanî..

Erê Amedê!

Tûrikê min dagirtiye ji silavên haval û hogirên Cegerxwîn di 100 salîya zayina wî de.

Sebaretî min ez mirovekî Kurd im:

Mirovekî Kurd im

Ji sala 1514 an ve

Ta roja îro;

Di kul, êş û janên

Gelê xwe de di ponjim

Xemxur û zikêşê

Zimanê dê û bavê xwe me;

Yekim, ji wan kesên ku,

Li dor malbata Bedirxaniyan

Di xepêrim...

Institut kurde de Paris

Ez Konê Reş im.
Konê ku stûnên wî,
Bi kuçên ji çiyayê
Sîpanê Xelatê, Barzan û Agrî
Bilind dibe,
Çît û berçîtên wî
Bi zil û qamîşa
Derdora çemê Dicle û Ferat
Dibe dîwar û
Bi hevirmêşa
Mûş û Bazîdê
Hatiye hûnandin..
Ben û şerîtên wî
Ji hiriya berxên
Şikak û Heyderan,
Keriyên koçerên Milan û Mîran
Hatiye ristin...
Konê ku ji mûyê
Bizinên zozanê Botan,
Zozanê şerfdînê û çiyayê Mazî
Hatiye çêkirin û
Bi rengê şevê

Institut kurde de Paris

Hatiye debixdan

Da ku di rojê de

Belû û diyar be û

Xweş bê xuyakirin;

Dinya û alem tev

Bibîne û bizanibe ku

Qet singên konê min

Ji nav xaka bav û kalan

Nayên hilkirin

Nayên hilkirin

Ez Konê Reş im

Mirovekî Kurd im.

Institut kurde de Paris

Di destpêkê de dixwazim bi helbesteke xwe derbasî jiyan, kar û xebatên Seydayê Cegerxwîn bibêjim, ev helbesta ku min di roja 22/04/1994 an de, li ser gora seydayê Cegerxwîn, di bîranîna wî a dehan de xwendiye:

Di axbeyareke Kurdistanî de

Sinbilek şînhat

Bi navê Cegerxwîn,

Bi ba re dixilîya

Lê qet ne tewiya;

Di zivistanî de,

Tevî bef û bahozên

Ku dihatin,

Pişkivî, zîl da û

Bû kat,

Di buharî de

Bû şîndar,

Lê bi tenê,

Bê dost û heval..

Ta ku bi ser de hat

Havîna gerim

Hingê ji nû

Hişk bûn libên;

Sinbilên zer..

Ne pûç ne kwîrik,

Xurû genimê zerik

Çaxa dem xîvirî û

Bû payiz,

Ba leyist fîze.. fîz

Hingê ji nû,

Ji wî sinbilê genim sor

Lib pekiyan;

Institut kurde de Paris

Yeko.. yeko

Dor bi dor û

Tev di wê axbeyarê de

Belavbûn,

Tovekî nû..

Di xakê de

Hat werbûn,

Ji wê libê, ji wî sinbilî

100 libî zîl dan, pişkivîn û

Bûn sinbilîn genim sor,

Dema ku bayê nû hat

Ew sinbilên nû

Bi wî bayî re

Xilîyan û gotin:

Cegerxwîn.. Cegerxwîn..

Institut kurde de Paris

# CEGERXWÎN SEMYANEKÎ SEMBOLÎYE JI FERHENG Û WEJEYA GELÊ KURD RE

Ji ber tarîbûn û bê ronahiyê, stêr di asmanan de diçirisîn in, ji hêza baran û şilahîyê, xak di buharî de dikene, mirovên çak, rind û leheng jî, ev kesin, ku ji nebûnê, hebûna xwe di nav gelê xwe de diyar dikin, di şert û mercên dijwar û teng de li ber xwe didin, di nebûna mêran de, mêranîya xwe berz û eşkere dikin, ji ber ku di firehîyan de her yek dibêje: ez lawê bavê xwe me.. Lê ez heyranê wî mirovê bim, ewê ku di asteng û dijwarîyan de, li ber xwe bide û ji mêranî nekeve, û dawî welatîyên wî pesnê wî bidin û li ber ronahîya kiryarên wî, pîş û hunera wî pêşkevin û reş û sipî ji hev derxînin...

Cegerxwîn jî yek ji vî terzê mirovan bû, her dem û gav bi kul, êş û janên gelê xwe ve girêdayî bû, bi refên pîşengên gelê xwe re bû, ew refên ku bingehê rewşenbîriya Kurdî li Binxetê danîne.

Erê, Cegerxwîn; semyanekî sembolîy ji rewşenbîriya Kurdî re, ji ramanên Kurdî yên pêşverû re.. Ta radeyekê ku hêj jî pêdevîya me bi kesên weke wî heye û wê bimîne wek semyanekî ji afirandina helbesta Kurdî re.

Li ser pêvajoya wî ya bi ronahî, wê xortên Kurdan hêvîyên bilind û berfireh ji xwe re ava bikin.

Institut kurde de Paris

Ew pêvajoya ku ji rewşenbîran re bûye jêdereke bingehîn; tevî ku ez ne di wê bawerîyê de me ku rojên derbasbûyî, rojên îroyîn û pêşerojê li trazûya xwe xînin, lê sûdeya ku di serboriya Cegerxwûn de, ji xortan re heye, gelekî giring û pêwîste.. û weha ez ne bawerim ku rewşenbîrên Kurd karibin pêşkevin, biserkevin û tiştekî nû ji xwe re pêk bînin bêyî serborîya Cegerxwîn ya zengîn û bi sûde.

Ma wê çi buhayê nirixandina zinarekî hebe ji çiyakî wek Cegerxwîn re ?! Cegerxwîn çiyak bû ji çiyayên Kurdistanê, çiyakî bi dar û ber bû, bi çem û cobar bû, bi gelî û newal bû, çiyakî poz bilind û bi heybet û saw bû.

Rojekê ji rojan, ev çiya ji cihê xwe nehat hejandin, ne pêşberî bahozên dijwar û ne babîsokên gur û tund.

Wek ku me got, Cegerxwîn çiya bû, û çiya namirin..

Ew ji nifşekî bû ku ji berî 22 salan ve çavê me bi gotineke wî ya nû neketiye.Wek ku her tişt bi koçkirina wî re hatiye guhertin. Ji ber ku nimûneyên weke wî pir kêmin.Vêça wek hûn dibînin, va em bîranaînên xwe derbarî wî, bi ser hev ve pîne dikin, da ku em wî û kesên weke wî bi bîr bînin, û jiyana ku em tê de dijîn, bi bakî nû û xunavî re, bi ser me de bibare, û em di navbera serboriya gotinên wî, awir û nerînên wî, ewên ku xweş dibistan bûn ji me re, di warê jiyan, rewşenbîrî û gotina resen de milevaniyê bikin, ewên ku ji dil û canê wî dihatin der, da ku em sûdekê ji xwe re jê wergirin.

Ew Cegerxwînê Hesarî bû, ewê ku pêmayekî zengîn ji helbestan ji me re hiştiye û em bi helbestên wî ta roja îro, xwe paye û serbilindin dibînin.

Hêjî ew bi rewşenbîriya xwe ya jiyanê, ewa taybetî pê di nav me de amadeye. Navê wî, bi saya helbestên wî ji nav gel nayê jibîrkirin. Ew helbestên ku rojên çetîn û dijwar derbas kirin, û hêj jî di nav me de amade ne, wek ku ew nemiriye. Ne xasim dema ku em li gotineke Kurdî ya resen digerin, hingê em wê gotinê di nav helbestên wî de dibînin û bi taybetî, di nav helbestên wî ewên ku dengbîjan kirine stiran û li ser zarê her mirovekî Kurd in.

Cegerxwîn ji malbateke xizan, nezan û belengaz bû. Bavê wî cotkarekî Hesarî bû, ev gundê ku di destpêka çerxê 20 an de, cîgehê kuştin, talan û berberîyê bû.

Di wî heyamî de, cehalet û nezanînê konê xwe di ser Hesarê re vegirtibû, ji 20 gundên wê herêmê mirovekî xwendevan peyda nedibû ku nameyekê bixwîne.

Cegerxwînê xort ji Hesarê destpêkir, û berê xwe da xwendina olî, di nav re xwe dît ku bê hemdî xwe ber bi hûnandina helbestê ve diçe û weha bi toreyî li pêşberî Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û feqehê Teyran sekinî, destê xwe ser hev danîn û ji pêmayê wan tûrikê xwe dagirit.

û bi dûv xwendina olî de li her 4 perçeyên welat geriya, êş û janên gelê xwe ji nêzîk ve naskirin...



Institut kurde de Paris

Dawî şaşik û cibe avêtin rih birî û şortê Firansîzî li xwe kiri û xwe berda sikakên Amûda şewitî, bangkir û got:

Kurdino, merdino, pir xweş e serxwbûn

Ew demên tar û teng ko me dîn vane çûn

Dest bidin hev hemî pêşkevin em hemî

Da biçin bo welat yan mirin yan felat

Hingê xelk di çarşîya Amûdê de lê kom bûn, dilê xwe pê şewitandin û ji hev re gotin: mêzekin Mele Şêxmûs dîn bûye ? Şaşka xwe avêtiye, riha xwe qusandiye, cibê xwe dirandiye û cilên gawiran li xwe kiriye û hinan digot: heyfa kurê bavan çi xortê bedew dînbûye ! Xwedê neyne serê kesî..?!

Institut kurde de Paris

Cegerxwûn yek ji wan mirovên ku hez jiyanê bi tev hûrikên wê ve dikir û gelek caran gotinên wî wek helbestan bûn bê ku bêne nivîsandin, wek:

1 – Carekê çûye oda Evdî Axa yê Xelo, derbasî odê bûye û gitiye: merheba Axayê Kera...Hingê gundiyên di odê de rûniştî behitî mane ,devê wan maye jihev û li Axê mêze kirine, çawa Cegerxwîn ji Axê re dibêje Axayê Kera ?! Hingê Cegerxwîn li wan vegerandiye û gotiye:Hûn kerin law, ez we re dibêjimûn...

2 – Careke din ew di gel çend û berpirsyarên Partî li çayxaneke Qamişlo rûniştîbûn,yekî ji wan ji Cegerxwîn re

gotiye: Seyda, tev berhemên te bi zimanê kurdî ne û birayên me yên Ereb tê nagihêjin bê tu çi dixwazî, de hela bi zimanê erebî jî binivîse da ku ew kêşeya me nasbikin û mafkê me bidine me...?! Hingê Cegerxwîn lê guhdarî dikir û di pencerê re li kolanê dinerî û didît ku yekî Ereb pêxwas derbas dibe, hema di derhal de lêvegerand û got: Mêzeke li evê Ereb, nikare mafê lingê xwe bidê, wê çawa mafê me bide me... ?!

Gelek lêkolînvan li dor helbestên Cegerxwîn rawestiyane, gelekan ji wan pesnê wî dane ku ew tekane helbestvan bû di heyamekî de hat yên weke wî pir kêm bûn, hem jî ku wî bi xurtî li tev deriyên toreyê daye û derbas bûye ta pileyekê ku tê gotin: Cegerxwîn polîtîk û tore bi hev ve girêdane, tevî ku maye mêldarê hûnandina helbestê û tev his û hestên xwe di vê rêkê de xerc kirine û vê yekê hiştiye ku piranîya helbestên wî ta roja îro li ser zimana bin...

Cegerxwîn xwe berdaye nav tev bûyerên welat û welatiyên xwe, ew xwedî gotin bû û gotina wî cihê xwe digirt. Ew yek bû ji wan kesên sereke ku bi berhemên xwe kovara (Hawar) ê ya Mîr Celadet Alî Bedir"Xan dixemiland, û ta rojên xwe yê dawîn ma li rex welatiyên xwe bi tev kul, êş û xemên wan, hem jî wî ji tev şoreşên Kurdan re helbest gitine û rojekê pênûsa xwe nekir bin xizmeta şêxekî olî an axayekî zordar de, bi tenê pênûsa wî wek şûrê azadiyê bû di dest de, bi wî şûrî şer dikir ku xwe bighîne azadiyê.

Institut kurde de Paris

Helbestek ji helbestên Cegerxwîn yên pêşîn ku di sala 1927an de, piştî kujtara Alaqemşe nivîsandiye bi navê Pîra Torê:

Hilkişîme çûme jorê, herdû rex min bend û rez
Min dî pîrek tê ji Torê, ker di berde tê bi lez
Hate nêzîk rojbixêrek da, û wek min dil bi xem
Pirebî bû, por spî bû, taqî reş bû rû gewez
Min ji pîrê xweş di pirsî; Ey metê tu ji kuve tê ?
Go ji Sêrtê diçme Bêrtê, xwîniya Romê me ez
Xan û eywan kirne weran, mêr û jin ser jê kirin
Min go pîrê qey tu kurdî ? Çûye tilyên xwe bi gez
Gotî dayê; em dixwînin wek Cegerxwîn gotiye:
Zû bi xwînin, hev bibînin, biçne Kurdistan bi lez.

Institut kurde de Paris

## Kurtiyek ji jînenîgeriya Cegerxwînê Hesarî

## 1903 – 1984

Cegerxwîn bi navê (Şêxmûs) ji dê û bavekî Kurd yê gundî, cotkar û belengaz di sala 1903 an de li gundê Hesarê çêbûye, ji 11 xuşk û bira, tenê 3 ê mane: Xelîl, Asya û Şêxmûs.Di zaroktiya xwe de wek karker di danîna herdû şivên hesin de kar kiriye, di navbera Nisêbînê û Amûdê de ewa ku Almanan di cenga cîhanî a yekemîn de bingehê wê danîn.

Di sala1918 an de bavê wî Hesen li bajarê Amûdê çûye ber dilovaniya xwedê, piştî mirina wî bi salekê, ango di sala 1919 an de diya wî Eyşanê ya ku temenê wê 70 salî bû li gundê (Bêdir Memo) çûye ber dilovanya xwedê. Û weha Cegerxwîn pêlekê li bal xuşka xwe Asya û birayê xwe (Mele Xelîl) jiyaye.

Jiyan û xebata Cegerxwîn di nav Kurdên Binxetê de:

Cegerxwîn di sala 1920 an de berê xwe daye xwendina olperstî, bi dûv xwendinê de li her çar perçeyên Kurdistanê geryaye û rewşa gelê xwe baş naskiriye.

Di sala 1927 an de, keçxala xwe (Kehla Selîm) ji gundê Hesarê ji xwe re anîye û li Amûdê bi cih û war bûye.

Institut kurde de Paris

Di sala 1928 an de, xwendina xwe qedandiye û îcaza xwe wergirtiye û bûye Melayê gundê (Hasda Jorî) li nav hoza Mêrsîniyan, nêzîkî Amûdê.

Di sala1932an de, helbestên wî di kovara (Hawar)ê de hatine weşandin, ewa ku Mîr Celadet Alî Bedirxan li Şamê çap û belav dikir.

Di sala 1936 an de, Cegerxwîn bi çend malan ve 2 gund ji xwe re li beriya Mêrdînê ava kirine, bi navê (Çêlekê û Cehnemê), bi alîkariya Haco Axa.

Di sala 1937 - 1938 an de, Cegerxwîn û çend hevalên xwe komelayek li bajarê Amûdê ji xortan re vekirine...

Di sala 1946 an de, Cegerxwîn mala xwe ji gund biriye Qamişlo, û ketiye nav siyasetê de û di wê salê de (civata Azadî û yekîtiya Kurd) hatiye damezirandin di bin serokatiya Dr. Ehmed Nafiz û sekretêriya Cegerxwîn de...

Di sala 1948 an de, Cegerxwîn bûye hevalê partiya (Komonîsta Sûriyê).

Di sala 1949 an de, cara yekemîn bû ku Cegerxwûn hatiye girtin.

Di sala 1950 î de, Cegerxwîn bûye endam di civata (Aştîxwazên Sûriyê de).

Di sala 1954 an de, ji hêla Komonîstan ve bûye namzadê perlemana Sûriyê di gel hevalê xwe Ibrahîm Bekrî...

Institut kurde de Paris

Di sala 1957 an de, ji Komonîstan dûr ketiye û di wê salê de di gel çend hevalên xwe rêxistina (Azadî) damezirandine û piştî pêlekê tevî paritiya (Demoqratî Kurdî) li Sûriyê bûne...

Di sala 1959 an de, Cegerxwîn ji neçarî revyaye Îraqê û 3 ê salan li wir bûye mamostayê zimanê Kurmancî di zanîngeha Bexdayê de .

Di sala 1962 an de, hikometa Îraqî bera Cegerxwîn dane, Cegerxwîn vegeryaye Sûriyê û li Sûriyê hatiye girtin lê piştî pêlekê hatiye berdan ...

Di sala 1963 an de, careke din Cegerxwîn tê girtin û dikeve zindana (Mezê) de li bajarê Şamê, piştî pêlekê ji berdana wî, wî sirgûnî bajarê Siwêda li nav Dirzîyan dikin.

Di sala 1969 an de, careke din Cegerxwîn diçe Kurdistana Îraqê û dor salekê bi Pêşmergan re dimîne.

Di sala 1973 an de, ji neçarî berê xwe dide Libnanê û li Beyrûtê dîwana xwe ya 3 yan (**Kîme E**z) û çîroka (**Salar û Mîdya**) çap dike.

Di sala 1976 an de, ji Libnanê vedigere Sûriyê bajarê Qamişlo û lê dimîne ta sala 1979 an ku diçe Swêdê.

Li Siwêdê:

Institut kurde de Paris

Di sala 1979 an de, Cegerxwîn berê xwe dide Siwêdê bajarê seqem û sermê, û her 5 salên xwe yên mayî li wir derbas dike .

Di roja 22 / 10 / 1984, li bajarê Stokholmê serê xwe datîne û diçe ber dilovaniya xwedê ...

Di roja 05 / 11 / 1984 an de, termê wî gihişt bajarê Qamişlo û bi beşdarbûna cemawerekî zor mezin termê wî di hewşa mala wî de veşartin.

Zarokên wî :

2 u kur û 4 keç in:

Keyo(Kesra), Azad, Gulperî, Rojîn, Beniye û Selam. Ta roja îro di ser 30 neviyên wî hene....

**Berhemên Cegerxwîn yên çapkirî:**

Dibêjin dîwanek Seydayê Cegerxwîn bi navê (Xweşxane) heye,di sala 1927 an de berhevkiriye, lê ne hatiye çapkirin.

1 – Pirîsk û Pêt, 1945 – Şam. Bi pêşgotina Mîr Celadet Bedirxan.

2 – Cîm û Gulperî (çîrok), 1948 – Şam.

3 – Sewra Azadî, 1954 – Şam. Bi pêşgotina Osman Sebrî, 212 R

4 – Reşo yê Darî (çîrok), 1956 – Şam.



Institut kurde de Paris

5 – Gotinên pêşîyan, 1957 – Şam.

6 – Awa û destûra zimanê Kurdî, 1961 – Bexda.

7 – Ferheng, perçê yekem û duwem, 1962 – Bexda.

8 – Kîme Ez ?, 1973 – Beyrût. Bi pêşgotina Hemîdê Derwêş, 318 R

9 – Salar û Mîdya, 1973 – Beyrût.

10 – Ronak, 1980 – Swêd. Bi pêşgotina Kemal Burkay, 208 R

11 – Zend – Avesta, 1981 –Swêd.Bi pêşgotina Qenatê Kurdo,178 R

12 – Şefeq, 1982 – Swêd. Bi pêşgotina Casimê Celîl, 180R

13 – Hêvî, 1983 – Swêd. Bi pêşgotina Ordîxanê Celîl, 186R

14 – Aşitî, 1985 – Swêd. Bi pêşgotina Tîmûrê Xelîl Mûradov, 173 R

15 – Tarîxa Kurdistan (1), 1985 – Swêd.

16 – Tarîxa Kurdistan (2), 1987 – Swêd.

17 – Folklora Kurdî, 1988 – Swêd.

18 – Jînenîgeriya min, 1995 – Swêd.

19 - Nivîsarek li ser dîbaca Ehmedê Xanî, 1995 Stokholm.

20 - Şerefnameya Mewzûn, Ev pirtûk di sala 1997 li Bêrûtê, hatiye çapkirin. Her weha çend pirtûkên wî yên din jî hene.

Institut kurde de Paris

Cegerxwînê dest zêrîn.. Cegerxwînê ku bi sedan şagirt bi saya afirandinên wî fêrî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bûn.. Cegerxwînê ku 60 salî, xebat û bizav bi berdewamî di ber zimanê Kurdî de kir.. 60 salî di pêvajoyeke pîroz de liviya û xwe jê ne da alî.. Bi saya gel ew çêbû û bi saya wî şagirt çêbûn, di navbera vê hûnandinê de zimanê Kurdî pêşket û afiriandinê cihê xwe di nav berhemê me de dît...

Erê, Cegerxwîn mîna semyanekî sembolîye ji ferheng û wejeya gelê Kurd re, ji mafê her zimanhez û kurdparêzekî ye ku, xwe bi navê wî paye û berz bike, di nav gelên cîha nê de.

Hem jî min ev helbest, di sed saliya seydayê Cegerxwîn de li bajarê Amedê (Diyarbekir) xwendiye, bi hekeftina sedsaliya wî:

Ji xwendina li ser kêla gora Seydayê Cegerxwîn li bajarê Qamişlo:

Meyger tu binê, ez li dinê her wekî fîl im

Şûva ko me ajotiye, tovê xwe biçênin

Xêzên me nivîsîne, bi xwe ayetê kurd in

Dê pişt me re, ew di civatan de bixwênin

Institut kurde de Paris

Doza ko me kir ew bi xwe, Mûsa ne gihiştî

Kurdên me dizanin, bi xwe rêça me bibênin

Ger ez bimrim, axa cebana me bixwî tev

Mizgîn ji welat, bo me di gorê de bişênin

Ma qey tu nizanî, ji kulan bûme Cegerxwîn

Dermanê me ye serxwebiwîn, bo me werênin.

Institut kurde de Paris

## Rojnamevaniya Cegerxwîn, Kovara Gulistan Û Gerek Di Nav Hejmara 15 An De

Wek ku em tev helbestvaniya seydayê Cegerxwîn dizanin; wî di ser heyşt dîwanan re nivîsandiye, her heyşt dîwanên wî di nav gel de hatine belavkirin. Di çerxê bîstan de, ew dîdevanê heyamê xwe bû. Wî, li gor imkanên xwe, gelek bûyer, rûdaw û serhildanên Kurdistanî di hunraw û helbestên xwe de şopandine, anîne ziman û ji gelê xwe re pêşkêş kirine.. Her wiha di helbestên xwe de kiriye, hawar, gazî û şerê kevneşopiyê, oldariya kor, beg û axayên zordar û kedxwar kiriye.. Helbestên van her heşt- neh dîwanan wî, bi formên têvel û cihê cihê hatine hunandin, ku hêj helbestvanekî kurdî bi wiha pirrbûn helbest nenivîsandine.

Eger em helbestên Seyda li bêjingê xin, li naveroka wan ji rex Mijar, form, felsefe, huner û nûbûnê ve mêze bikin, em ê bibînin ku naveroka helbestên wî li dor van zîlanan dizîvirin:

Li dor rizgariya welatê wî.

Li dor yekîtiya gelê kurd.

Li dor pesnê qehreman û têkoşerên gelê Kurd.

Dijî kiryarên çewt yên şêx, axa, beg û dewlimendên gelê Kurd.

Li dor aştî û demokrasiya cîhanê.

Institut kurde de Paris

Li dor têkoşîna belengaz û hejaran.

Şiyarkirin, pend û şîretin ji nezan re

Wek têkoşerekî ji bo azadiya welatê xwe, ji bo wekheviya civata xwe, ji bo avakirina cihanek aştîxwaz û ji bo serxwebûna welatê xwe nivîsandiye.

Helbestên wî hawar, gazin û gaziya gelê Kurd in.

Ji rexekî din ve seyda helbetên evîndariyê jî nivîsîne, evîndariya wî jî bi du mijara ye; Yek evîndariya welatê wî ye û yek evîndariya wî a kesayetî ye; wek insan, wek mirov. Mijara dilgirtiya wî a pêşî welatê wî ye. Ew welatê ku di şibhê keçekê an jinekê de aniye ber çavê xwe û helbest û sirûd li dor gotine. Mijara din evîna wî a kesayetî bixwe ye; hez kiriye, hez jina bedew û spehî kiriye..û wiha helbestên evîndariyê avêtine ser..

Ew yek bû ji wan kesên sereke ku bi berhemên xwe kovara (Hawar) ê ya Mîr Celadet Bedirxan dixemiland û ta rojên xwe yê dawî ma li rex welatiyên xwe bi tev kul, êş û xemên wan ve, hem jî, wî ji tev şoreşên Kurdan re helbest gitine û rojekê pênûsa xwe nekir bin xizmeta şêxekî olî an axayekî zordar, bi tenê pênûsa wî wek şûrê azadiyê bû di destê wî de, bi wî şûrî şer dikir ku xwe bighîne azadiyê dema dibêje:

Cegerxwîn im ji van derda

Li meydanê xwe zû berda

Institut kurde de Paris

Di nav bahoz û bager da

Bi bîr û bawer û doz im

Ne Şewqî û Zehawî me.

Belê em bêjin nebêjin, navê Qamişlo û Cegerxwîn bi hev ve hatine hunandin û gora Cegerxwîn bûye sembol ji bajarê Qamişlo re.

Ev yek ji rexê helbestvaniya wî ve.

Ji rexekî din ve, Cegerxwîn beşek ji folklorê me kom kiriye, hinek ji dîroka me nivîsandiye, di gel ku wî di warê ziman, ferheng, çîroknivîsandinê û danheva gotinên pêşiyan de jî karekî baş kiriye.. Belê di vê mijarê de, bi min xweş e ku ez rexê rojnamevaniyê li cem Cegerxwîn bînin ziman. Cegerxwîn wek rojnamevan ji xwendevanan re bidim naskirin.

* * *


Piştî rawestandina herdu kovarên **mîr Celadet Bedirxan** (**Hawar**:1932 - 1943 û **Ronahî**:1942-1945) û (**Roja Nû** û **Stêr**) yên birayê wî **Dr. Kamiran Bedirxan**, pênûsên ku ew kovar bi berhemên xwe dadigirtin, bi rola xwe wek ku pêdivîye ranebûn..?! Erê ranebûn.. Ew kesên ku, naveroka wan kovaran bi helbest û nivîsên xwe dixemilandin û wek şagirtên mîr Celadet Bedirxan û Dr. Kamîran Bedirxan dihatin naskirin, Li gor pêdiviya demê bi karên xwe yên zimanî û rewşenbîrî rabûn, ji wan: Cegerxwîn, Osman Sebrî,

Institut kurde de Paris

Qedrî Can, Dr. Nûrddîn Zaza, Mele Ehmed Namî, Mistefa Ehmed Botî, Mele Ebduhadî, Hesen Hişyar û Reşîdê Kurd û gelek kesên din jî hebûn..

Belê piştî ku ew kovar û rojname hatin rawestandin, gelekan li wan kesan, ji wan rewşenbîr û helbestvanên ku me navên wan gotin, dûrî karê wêjeyî ketin.. Hina ji wan dest bi karê siyasî kirin.. Hin, ji ber tirsê û qedexebûna zimanê kurdî bi dîzî xebitîn û hin ji ber feqîrtiyê û ji bo bidestxistina gepa nanê rojê, dûrî ziman, ferheng û wêjeyê kurdî ketin..

Lê Cegerxwîn, ji ber bîrbûn, zanîn û dûrdîtina giringiya zimanê Kurdî di hebûna miletê Kurd de, wî bi berdewamî, bi Kurdî nivîsand û bi wêrekbûn, bê tirs û bê saw helbestên xwe li dor kul, êş û derdên gelê Kurd hunandin û wiha di çerxê 20 an de xebat û bizaveke zor mezin ji ziman û rewşenbîriya Kurdî re pêşkêş kir..




Di sala 1968 an de, piştî 23 salan di ser rawestandina kovara Hawar û Ronahiyê re, 23 salên ji bêdengiyek wek mirinê di ser zimanê kurdî re, seydayî Cegerxwîn hewlda ku wê valahiya dagire û wiha dest bi weşandina kovareke xurû

Institut kurde de Paris




kurdî, bi tîpên latînî kir. Ew kovar navê wê (Gulistan) bû.

**Gulistan**: Kovareke toreyî û edebî ye. Hejmara pêşîn ji vê kovarê di meha cehzeran sala 1968 an de hatiye weşandin, serkêşiya wê seydayê Cegerxwîn dikir. Hejmarên pêşîn ji 12 rûpelan ta bi 24 rûpelan bûn, li ser pêlên A4, bi bi ronyo dihat kişandin.. Naverok bi piranî bi helbestên Cegerxwîn dihat xemilandin.

Wî kovara Gulistan diweşand.. Me wek Hizib (Partî), her tişt jêre amade kir, dektîlo, kaxet.. Me gelekî guhdida ziman.. Kekê, di wan salan de em di rewşeke zor dijwar de derbas dibûn.. Hevalên me dizindanan de bûn, em revyayî bûn, ew derfeta xweş nebû.. Me dixwest em gelek tiştan bikin..

<u>**Gulistan:**</u> Li ser bergê hejmara Dawî (38), zivistana 2009 an, pênasîna kovarê wiha hatiye diyarkirin: **Kovarek Wêjeyî û Civakî ye**, Lê li ser bergên hejmarên pêşîn manşêta pênasîna kovarê wiha hatiye nivîsandin; **Kovarek toreyî û edebî ye**. Hem jî **Kovarek Torevanî û Civakî ye**!. Hem jî ev gotina Cegerxwîn li ser tev hejmaran heye, kevin û nû:

Institut kurde de Paris

***Ev kovar kovara te ye***

***Ev bax û gulîzara te ye***

***Têde darek xweş biçîne***

***Ev dar nivîsara te ye.***

Piştî koçkirina seydayê Cegerxwîn, ev manşêt li ser tev hejmaran tê nivîsandin: (***Di sala 1968 an de Cegerxwîn kovara Gulistan damezirandiye û bûye berpirsyarê wê***).

Û wek ku me got, hejmara pêşîn ji vê kovarê di nisana sala 1968 an de hatiye weşandin, serkêşiya wê seydayê Cegerxwîn dikir.

Ta bi sala 1979 an, sala ku Cegerxwîn têde berê xwe da penaberiyê û çûye Swêdê, bi tenê 16 hejmar jê hatibûn weşandin, anku Cegerxwîn 16 hejmar ji vê kovarê weşandine û naveroka wê bi piranî, bi berhemên xwe dixemilandin. Mixabin ku hejmara 16 an bi dest min neket da ku ez geryanekê di naveroka wê de ji xwendevanan re raxînim ber çavan.. Vêca ez neçar dibim li naveroka hejmara 15/Nîsana 1978 an a berî dawî ku Cegerxwîn berpirsyariya wê kiriye vegerim. Ev hejmar di nîsana 1978 an de hatiye belav kirin, ji 14 rûpelan pêk tê, li ser pelên A4, bi bi ronyo hatiye kişandin, naveroka wê, bi van babetan hatiye xemilandin:

Institut kurde de Paris

Rûpelê 1: Pêşgotin e, ev pêşgotin bi pênûsa Cegerxwîn e, di bin vê manşêtê de ye: **Çi ji zana û torevanên me tê xwestin?**

(Miletê Kurd pir li paş maye. Di bin barê nezanî, perîşanî û bindestiyê de pişt xûz bûye. Û dijmin û kevneperist, keysê têde dibînin, fena lê dikin, xwîna wî dimijin û wî dûrî armanc û daxwazên wî, bi riya şaş de dajon..

GULİSTAN

kovareke torevanî û civakî ye

Jimar:( 15 ) Nîsan 1978

buha:/ 3 / L.S

Gotin jêr navê ko miletê Kurd, ji vî barê giran piştrast nabe û ji perîşanî, nexweşî, nezanî û bindestiyê, rezgar nabe, bê xebat, hişyarî, zanîn û gorîdan.. Û bêgûman jî ko di van meydanan hemûyan de zana û torevanên bi milet re dilsoz, dikarin karên hêja û xizmetên mezin, ji pirs û dozên welatê xwe re pêşkêş bikin..

Ristvanê bi milet re rast û dilsoz, dikare bi ristên ko ji kûraniya dilê wî derdikevin, komên fireh ji milet tev bide û daxîne meydana xebatê.. Nivîsevanê miletperist, riya xebatê bi nivîsanê xwe ronî dike û dihêle milet bi bawerî, li ser pêş de,. ber bicîkirina daxwaz û armancên xwe de, here. Û

Institut kurde de Paris

hinermend (Stranbêj, sazbend û ayîngir), derdê milet digirin, dibêjin û dibilînin û nav têde didin da ko li ber dijmin û kevneperistan rabe..

Û wiha ristvan, nivîsvan û hinermend lîzkek mezin di jîna miletan de digerînin. Çi di warê hişyarkirina milet û ji hevdanalîna dost û neyaran de û çi di warê şer û xebata dijê pêwendên malbatî, êlperistî û hemû rêçik û rêcîmên kevnarede..

Û heta ko nivîsvan, ristvan û hinermendên welatperwer, xweş bi vî karî ranebin, divê dakevin nav kom û rêzên milet û jîna karkir û cotkaran û bi kul û derdên wan agahdar bibin û li gel wan kar û xebatê bikin.. Da ko rist, nivîsar û stranên wan, bi rastî û dirustî derdê milet bêjin..

Û wek em tim dibêjin, **Gulistan** meydaneke vekiriye li pêşiya her kesên ko dixwazin ko kar û xebatê ji welat û miletê xwe re bikin. Û di vejandina pêmayê Kurdî de pişkdar bibin).

Rûpelê 2: Çîrokeke bi navê (Çûna Bajêr), bi pênûsa (**Pîran**) e.

Rûpelê 3:Gotareke bi navê (Hoşî Mîneh ê nemir) bi pênûsa (**Rêwî**) ye.

Rûpelê 4: Helbesteke bi navê (Banga Şoreşê), di bin manşêta (Ji ristên Afrîqa Reş; ristên serbest), yekî bi navê (**Navdar**), ji ingilîzî guhestiye Kurdî.

Institut kurde de Paris

Rûpelê 5: (Lêkolînek li ser seydayê Xanî), bi pênûsa **Cegerxwîn** e.

Rûpelê 6: Helbestek Cegerxwîn e bi navê (Li Rojhilat Ci dibî?). Di eynî rûpel de ev manşêt û şirove heye: (Nivîştên Ko Cegerxwîn Çêkirine). Xuya ye ko wî bi xwe nivîsandiye, dema Di dawiya wê de dibêje: Lê mixabin ko yek jî li cem min nîne û tev ji derve ne.

**Yên Neçapkirî:**

3 - Dîwan; 1-2–3

5 – Tarîx; 1-2-3-4-5

1 – Tarîxa Jindariya wî, 3 perçe.

4 – Tercume; Mînorûskî, Xalîfîn, Basîl, Dewleta mehabad.

1 – Tarîxa Şoreşa Kurdistana îraqê ji 1961- 1968 bi Kurmancî ye.

1 – Ristvanên Kurdistan.

1 – Nivîsarek li ser seydayê Xanî û çend nivîsarên dî jî û çend kurteçîrok jî çêkirine..

**Çapkirî:**

3 – Dîwan, 2 – Perçe Ferheng, Destûra Zimanê Kurdî, 2 – Çîrok, Cîm û Gulperî û Reşoyê Darî, Gotinên pêşiya.. Lê mixabin ko yek jî li cem min nîne û tev ji derve ne).

Rûpelê 7: Xelekek ji tercuma nivîsek **Mînorûskî** ye li dor Kurdan, **Cegerxwîn** wergerandiye Kurdî.

Institut kurde de Paris

Rûpelê 8: Xelekek ji tercuma nivîsek **Xalîfîn** e, bi navê (Kêferat Li Ser Kurdistanê), **Cegerxwîn** wergerandiye Kurdî.

Rûpelê 9: **Gotarekî Cegerxwîn** e, bi navê (Nûroja Îsal), **Cegerxwîn** di vî gotarî de pesnê Newroza sala 1978 an daye.

Rûpelê 10: Di vî rûpelî de manşêt weha hatiye; (Ristvanekî Kurd: Tîrêj/Nayifê Heso). Cegerxwîn bi kurtî hin ji jînenîgariya wî aniye ziman û di dawiya wê de wiha gotiye: (Tîrêj niha hin ristên xweş dibêjî û çîroka (Ciwan û Kejê) çêkiriye. Hêvîdarim ko berpêş gavên xwe bavêje. Ca ji ber ko dîwana wî li nik min peyda nabî, divêm çend ristan ji çîroka wî di vir de bidim nîşandan). Û wiha Cegerxwîn çend perçe ji helbestek Seydayê Tîrêj di vê hejmarê de belavkiriye. Di eynî vî rûpelî de hin ji gotinên pêşiyan jî weşandine.

Rûpelê 11/12/13: Ev her sê rûpel bi **çîrokek Mîxayîl Şoloxof** ya bi navê (HÎNBÛNA KÎNÊ Û GIR), hatine xemilandin, wergêrê çîrokê (A. D) hatiye nivîsandin, lê xuya ye ku (A. D) mamoste **Ezîzê Dawê** bixwe ye. Hem jî di eynî rûpel de, helbestek seydayê **Keleş** bi navê (Yara Bê Bext) hatiye belavkirin.

Rûpelê 14: Bi bermayê babetan hatiye dagirtin.

Piştî koçberiya Cegerxwîn û çûna wî welatê Swêdê di sala 1979 an de, hêjî Cegerxwîn berhemên xwe ji kovara Gulistan re dişandin û têde belav dibûn..

Institut kurde de Paris

Hêjaye gotinê ku ev kovar ketiye nav gelek destan de; di pey Cegerxwîn re mamoste **Ezîzê Dawê** ta bi sala 1991ê bi kar û barên weşana wê rabûye û du salan hatiye sekinadin. Di sala 1993 an de **Ferhadê Çelebî** û **Saihê Heydo** bi berpirsyariya wê rabûne û bi rengekî mederin, spehî û bi wêne weşandiye. Piştî çend hejmaran û di sala 1997 an de hatiye rewestandin, ew jî wek kovarên rêxistnan yên din tevlî **kovara Bihar**ê bûye.. Lê ew biryara tev rêxistinên kurdan ku kovarên xwe yên bi Kurdî bi sekinînin û bi tenê kovara Bihar bi weşînin, neçûye serî.. Vêca careke din Kovara Gulistan hatiye weşandin. Vê carê jî **Ferhadê Çelebî, Salihê Heydo, Derwêşê Xalib û Fewazê Kano** bi berpirsyariya kovara Gulistan rabûne.. Ji mirina Ferhadê Çelebî (2005) û virde û ta roja îro, wek ku ez dizanim, bêtir **Selmanê Heso** û Salihê Heydo bi berpirsyariya vê kovarê radibin...

Eger her sal hejmarek ji vê kovarê bihata weşandin, gerek niha 43 hejmar hatibana belavkirin.. Cegerxwîn dikarîbû di 12 salan de 16 hejmaran biweşîne lê yên di pey re, nikarîbûn her salekê hejmarekê biweşînin...! Ev yek jî cihê mixabinyek mezine ku ziman li cem rêxistinên me di pileya dawî de ye û di ser guhan re tê avêtin..!

Hejmara dawî (38) ji kovara Gulistan di zivistana 2009 an de hatiye weşandin.

**Not**: Hêjaye gotinê ku di pey Cegerxwîn re, **Mecîdê Haco û Mele Tahir** jî di vê meydanê de kar kirine, wan jî di sala 1979 an kovara **Gelawêj** di ber Partiya Demokrata

Kurdî li Sûriyê (Alpartî) de, weşandine. Ta niha bi tenê 34 hejmar jê hatine belav kirin.

Wek ku di kovara Gulistan de hatiye min wiha nivîsandiye.

Qamişlo, 01.03.2011

Institut kurde de Paris

# EZ Û EV PIRSÊN XWARÊ DI 20 SALIYA KOÇKIRINA CEGERXWÎN DE

Di 20 saliya koçkirina seydayê mezin Cegerxwîn de, kak Qado Şêrîn ev pirsên xwarê ji min kirin, min jî bi kêfxweşî bersiva pirsên wî dan: Fermo bixwînin:

1-Rola Cegerxwîn di helbesta kurdî de çiye?

Bê guman Cegerxwîn rolek mezin di helbesta kurdî de lîstiye. Em bêjin ne bêjin ew bûye wek stûnek zêrîn li ser zîlana helbesta kurdî û di her çar perçan de digere. Di wî heyamê xerab de, ew heyamê ku zimanê kurdî qedexe bû û kesî newêrîbû bi gota kurd û ereb an kurd û tirk birane.. Cegerxwîn helbest bi kurdî afirand û hûna û bi mêranî û dengekî bilind helbestên xwe di nav gel de gotin û belav kirin. Ta radeyekê ku gelekan ji nexwendiyan helbestên wî ezber kirin û di civatan de gotin û dibêjin. Hêjî wek wan kesan peyda dibin mîna Salihê Silo û Hesenê Gemo..

Mêzekin bê çendîn rola wî di wî heyamê xerab de mezin û diyar bû. Roja îro jî, rola wî mezin û belûye û ji encamên rola wî, di festîvala helbesta kurdî de eşkere xuyaye, ev festîvala ku her sal di 22ê oktoberê de li nav me kurdên Binxetê tê li darxistn, bi hekeftina koçkirina wî, û têde bêtirî 60 helbestvanî helbestên xwe dixwînin, ji bilî yên ku dor

Institut kurde de Paris

nagihêje wan û yên ku amadenabin. Ango roja îro di nav kurdên sûriyê de dor 200-300 kesî heye ku helbestê di hûne û dor 50 kesî dîwanên xwe çapkirine.. Di baweriya min de, ev yek vedigere ser rola Cegerxwîn di navtêdan û pêşxistina helbesta kurdî de.

Belê, em wiha helbestvan di nav kurdên tirkiyê de nabînin, hem ku sînorek di navbera me wan de hebû û heye û hem ku Cegerxwînek di nav wan de ne bû, Cegerxwînê wan Ehmed Arif bû, wan jî bi tirkî helbest hûnandin bêtir ji kurdî.

Ji rexekî din ve, Cegerxwîn şagirtekî zîrek bû ji şagirtên şêx Ehmedê Cizîrî, ev şagirt bû pirek di navbera helbesta kilasîk û nû de, ango Cegerxwîn kevin û nû yê me bi heve girêdaye û di wiha girêdan de, rola wî zor mezine di pêşketin û berdewamiya afirandina helbesta kurdî de.

2-Gelo merov dikare bibêje ku helbesta kilasîk li ba Cegerxwîn bi dawî hat ?

Na xêr, qet helbesta kilasîk bi dawî nayê, her û her wê helbesta kilasîk li rex helbesta nûjen û modern bijî.. Ma gelo helbesta kilasîk li bal ereban bi dawî hat, piştî koçkirina Cewahirî û Beyatî ?!

Roja îro bi dehan ji xort û keçên me helbesta kilasîk di hûnin, tevî ku va 22 sal di ser koçkirina dawîn ya



Institut kurde de Paris

Cegerxwînê Hesarî re derbas dibe... li hember wan jî, gelek hene helbesta nûjen di hûnin.. Ango helbesta kilasîk piştî Cegerxwîn bi dawî nehart û bi dawî nayê.

3-Çima û ji bo çi ewqas nav û deg bi Cegerxwîn ket? Di nav kurdan de, ku Cegerxwîn ne di wê demê de bihata jiyanê,ma dê ew nav û dengî pêketa ? Û çima Cegerxwîn nebû helbestvanekî cîhanî?

Navdêrî û dengvedana navê Cegerxwîn di kurdistanê bi tevayî de, vedigere berî her tiştî hûnandina wî ji helbestan re û girêdayîbûna wî bi nexweşî û kêşeya gelê wî ve, di wî heyamê ku nezanîn û cehaletê konê xwe di ser welatê me re vegirtibû, di pey wan re mêraniya wî.. Erê, Cegerxwîn mêr bû. li tiştekî ne pirsî ne li mal ne li zarokan, kul û xemên wî gelê wî bû, tevî ku çend salên dirêj ji temenê xwe bi dûv zanîna olî de, li her çar perçeyê kurdistanê geriya û bû melayekî 12 ilmî, bi rîh, cibe û şaşik... Paşê, wî rih qusand, cibe dirand û şaşik avêt di wî heyamê paşketî de ku kesî newêrîbû limêj nekiriba.. Ne tenê wiha, wî kuncên Fransîzan yên kurt li xwe kirin û xwe berda kolanên Amûdê û bang li xelkê kir û got: Kurdino, merdino pir xweşe serxwebûn.. Hingê xelkê ji hev re gotin: Mezekin, Melle Şêxmûs dîn bûye, Xwedê neyne serê kesî...

Di wî heyamî de gelek melayên hevalên wî hebûn wan jî pîş bi hûnandina helbestê dikir û dibe ku helbestên gelekan ji wan ji helbestên Cegerxwîn bedewtir û spehîtir bûn, lê hem mêraniya Cegerxwîn û hem berdewamiya

Institut kurde de Paris

Cegerxwîn li bal wan nebû, û mixabin gelekan ji wan şerê wî jî dikir û belav dikirin ku, Cegerxwîn kafire...

Ji rexekî din ve wek ku kurdan gotiye: Heçî berê gula zerê.. Cegerxwîn berî tevayî hogirên xwe ji nifşê Hawarê, bê rawestan di 60 salî de bi dûv gotina kurdî de geriya, piraniya heval û hogirên wî, ew rêk nebirin serî, hin ji wan bi siyasetê daketin û hin li malên xwe rûniştin û hina ji tirsan ve herhemên xwe şewitandin, bi tenê Cegerxwîn xwe ji rêbaza ku dabû ser ne hat xwarê, û bi mêranî li ser liviya..

Şek têde nîne ku Cegerxwîn ne di wî heyamî de ba wiha nav û deng pê nediket, derfetin zêrîn jêre hatin,ji gelek rexan ve, wî jî bizanîbûn ew derfet bi kar aînin û sûde ji wan girt, yek ji wan derketina kovara Hawarê û alîkariya Mîr Celadet Bedirxan bû, berhemên wî yên sereta di Hawarê de belav bûn û Mir Celadet dîwana wî ya yekem di nav weşanên Hawarê de çap û belav kir...

Necîhanîbûna Cegerxwîn, vedigere wergerandinê, kesî helbestên wî wernegerandin ser zimanên cîhanî wek ingilîzî û espanî û fransî ku xelkên dinyê û alemê bi xwînin û dawî ku karibin wî bi nav bikin wek helbestvanekî cîhanî, û ta roja iro jî em gelekî paşketîne di warê wergerê de.

# Cegerxwîn û Şêweyên Zimanê Kurdî

Bi helkefta ku berî çend rojan 25 sal di ser koçkirina seydayê Cegerxwîn re derbas bû û ji ber problemên ku di şêweyên zimanê kurdî de hene, bi min xweş e nerîna helbestvanê netewî Cegerxwîn di vê derbarê de bînim ziman.

Berî pêlekê min pirtûka wî (Folklora Kurdî) dixwend, a ku di gulana 1988 an de li Stokholmê hatiye çap kirin. Di pêşgotina wî de rastî van baweriyên wî, yên xwarê hatim. Bi rastî ev baweriyên wî, bi min xweş hatin û hiştin ku ez van gotinan bi ser hev vekim

Cegerxwîn ê ku çend salan di nav Soranîaxêvan de mabû, probmemên Soranîaxêvan û Kurmancîaxêvan ji nêzîk ve naskiribû, dema ku wî mamostetiya zimanê kurdî di zankoya Bexdayê de dikir.. Xuya ye piştî vegera wî ji Bexdayê bi çend salan, wî ev baweriyên xwe, derbarî herdû şêweyan, di pêşgotina Folklora Kurdî de aniye ziman, anko ji berî ٤٤ salan ve wiha gotiye:

(Bê gomane ko dewlemendî û mezinahiya zimana bi folklor û rewş û pergala tore, rist û nivîsarên wa ye... Çi zimanê ko folklor û tore têde fireh û mezin bûne, ew ziman, zar, şîwe ji zimanên mezin têne jimartin... Her wekû pêşveçûna dezgeh û jîna civakî jî, yek ji van tiştane, ko ziman pêşve dibin û fireh dikin... Di vê meydanê de zimanê

Institut kurde de Paris

kurdî -zarê kurmancî- gelek dewlemend û mezin û payedare. Ji her nifşî helbeste, lawik, heyran, istiran, serpêhatî, çîrok û liztik dagirtiye..

Lê pir cihê axîne, ko heta Sedê Bîstan jî, tiştekî hêja di vê meydanê de nehatiye çêkirin, ne hatiye nivîsandin û belavkirin.. Tenê di vê Sedê Bîstan de çend nivişt bi zarê kurmancî li Ermenistana Soviyetî hatine belavkirin. Çawa, ko li nav kurdê Îraqê zarê soranî jî destek niviştên hêja hatine çapkirin. Tenê kurd, pirê kurdan nikarin ji van niviştan kareke hêja bikin, herwekû nikarin bi tevayî rewş û pergala zimanê xwe û folklorên xwe nasbikin. Ji ber ko, Kurd, hemî ne bi şîwakî tevayî dixwînin û dinivîsin. Ji lewra di îro de, gereke bi herdû şîwan hemû nifşên xwendewarî bête çêkirin û gotin û nivîsandin û belavkirin heta, ko rojekê karibin herdû şîwan bikin yek û bighênin hev. Her çiqas şîweyê sorî bi pêş ve herî jî, lê nikarî daxwaza xwendewarên kurd bi pirîtî bicîbînî. Ji ber ko, ne weke şîwê kurmancî dewlimend û fireh e, çawa ko di hindamek pir biçûk de hatiye givaştin, ko ji sedî bîst kes nikarî jê hîn bibî û daxwazê nadî naskirin. Belem şîweyê kurmancî, tevlî ko zêde dewlemende û her nifşê tore, helbeste, lawik ,heyran, serpêhatî, istiran, çîrok û lîztikan di nav xwe de digrî û ewqas daxwaza jî didî ziman û naskirin û nazik û kêm tevger û kêm tîpe..)

Cîgerxwîn ,١٩٦٥/١١/٢٧ ,Folklora Kurdî, Stokholim 1988

Kurdistan! Ev gotina mezin; ev xewna şêrîn a ku bi mijandina şîrê dayikê re, zimanê wê bi me re mezin bûye.. Peyv û bêjeyên zimanê wê ketiye xwîna me de.. Kurdistana ku bavê min û we bi hisreta bihistek axa wê a azad bûn. Mirin û ev azadiya ku îro li başûrî wê heye ,nedîtin.. Pêwîste em li dara zimanê wê bixwedî derkevin, wê darê têr av

Institut Kurde de Paris

bikin... Avdana wê darê ji min û te, tê xwestin.. Hilgirtina wê barê me ye.. Mane Kurdan ji mêj ve gotine; Barê ketî li xwedî ye

Sebaretî me Kurdan, ne xeme ku roja îro, em du şêweyan û du celebên tîpan, di zimanê xwe de bi kar bînin û herdu celeban standard bibînin... Lê cihê daxê ye ku celebek li ser hesabê celebekî mezin û girs bibe... Em bi hêvî ne ku di paşerojek nêzîk de herdu şêwe bibin yek, herdu şêwe bi yek elfabeyê bêne nivîsandin, em sûdeyê ji herdu, hersê û herçar şêweyan bigrin û yek şêwe ji tev kurdan re berdest bibe

Di vê biwarê de ,ez nikarim di ser Mîr Celadet Bedirxan re biqevêzim, çiko navê wî, bi xurtî xwe tîne bîra min.. De ka em ê li nîrê zêrîn, lı mîr Celadet Bedirxan jî vegeri, bê wî bi dûrdîtina xwe, di derbarî yekbûn û standartbûna zimanê Kurdî de çi ji me re gotiye:

(Yekîtiya miletê kurd bi yekîtiya zimanê kurdî tête pê. Di yekîtiya zimên de gava pêşîn jî yekîtiya herfan e.Yanî ji bona nivîsandina zimanê miletekî, divêt zana û xwendewarên wî miletî bi tevayî ji bona zimanê xwe elfabêyekê bibijêrin û heke di wî zimanî de çend zar hene, zar hemî bi wê elfabayê bêne nivîsandin.)

Mîr Celadet Bedirxan, Hawar, hejmar 10, sala 1932 an

Ziman mîna alê ye, pêwîste yek ala me hebe, yek zimanê me yê netewî hebe, em tev li dor kom bibin, pê

Institut kurde de Paris

biaxivin, pê binivîsin û bi gotin û bêjeyên wî zimanî his û hestên xwe derînin û hez hev bikin.

٢٠٠٩/١١/٠١ / Qamişlo

Institut kurde de Paris

# Dostaniya Cegerxwîn û Hisênê Emînê Perîxanê

(Bi Çavên Du Kalemêrên Ermenî)

Sebaretî me Kurdên Sûriyê û bi taybetî kurdên bajarê Qamişlo, her dem Cegerxwîn di nav me de amade ye. Şop û şûna wî di gelek sikak, kolan û taxan de belû ye.. Hêjî gelek ji hevalên wî, yên ku pêre mezin bûne û danûstandin pêre kirine li bajarê Qamişlo ne û hina ji wan helbestên wî ezber kirine û her dem û gav qala wî dikin û wî bibîr tînin.

Sebaretî min, her dema ku ez li kovara Hawarê an Ronahiyê vedigerim, tiştekî nû di nav rûpelên wan de dibînim, vê cara dawî ku min ew xwendin, ez rastî Cegerxwîn û Hisênê Emînê Perîxanê hatim. Min dît ku her yekî ji wan helbestek bo yê din nivîsandiye û di kovara Ronahiyê de belav kirine. Piştî ku min ev yek naskir, min berê xwe da wan hevalên wan, da ku bêtir pêzanînan li dor dostaniya wan nasbikim û bizanibim û wiha ez restî van her du kalemêrên Ermenî yên bira; Antranîkê Bêdros /1925 û birayê wî Gerabêtê Bêdros /1935 hatim. Evên ku xwe ji eşîra Reman dihejmêrin û ji dostên Hisênê Emîn yên herî nêzîk bûn li bajarê Qamişlo.

Hisênê Emîn kî ye? Kurê axayê hoza Rema Emînê Ehmedê Hecî Evdella ye(Perîxanê). Ew di sala 1919 an de li herêma Bişêriyê çêbûye, xwendina xwe li Eskîfê û

Institut kurde de Paris

Diyarbekirê xwendiye. Bavê wî Emînê Perîxanê yek ji hîmdarên damezirandina komela Xoybûnê bû li Beyrûtê sala 1927 an.. Di sala 1933 an de piştî ku bavê wî Emînê Perîxanê bi destê Tirkan hat kuştin û birayê wî Şikrî bi gunehê kuştina bavê wî gunehkar kirin, ew jî ji neçarî, di sala 1939 an di pey birayê xwe yê mezin Şikrî Binxet bû.. Li Binxetê dostaniya wî û Cegerxwîn bi hev re çêbû û dirêj kir.. Di sala 1951ê de Hisênê Emîn vegeriya welatê xwe Bişêriyê, nav eşîra Rema û di sala 1983 an de li Anqera çûye ber dilovaniya Xwedê.

Pirsa min ji wan her du kalemêrên Ermenî ev bû: Dema ku Hisênê Emîn Binxet bû, gelo pêwemdiyên we pêre hebûn.. Cegerxwîn dihat cem wan.. Dostaniya wî û Cegerxwîn çilo û çawa bû..?

Antranîk û Gerabêtê Bêdros, her du birayên hev in, her dem û gav bi hev re ne, wek teyrikê du bira ne.. Her ku ez diçim qehwexaneya Elumeraa li bajarê Qamişlo, dibînim ku her du bi hev re lê rûniştîn e. Car- cara ez jî bi wan re rûdinêm û qehweyekê bi wan re vedixwim. Bi vexwarina wê qehweyê re, em dikevin dabaşa mala Perîxanê (Mala Hecî Evdella) û zarokên Emînê Ehmedê Perîxanê de. Ji ber ku Hisênê Emîn bêtir ji nifşê wan bû, wana ew bêtir dîtibû û pêwendiyên wan bêtir pêre hebûn; wek heval û hogir bi hev re danûstandin kiribûn, vêca wan bêtir ji min re, qala Hisênê Emînê Perîxanê kirin..

Bersiva pirsên min wiha vegerandin: Piştî kuştina Emîn axa, her du kurên wî Şikrî û Hisên binxet bûn. Destpêkê



Institut kurde de Paris

hatin gundê Girsor, rex mala Xello axayên eşîra Mêrsînan, ew jî bi koka xwe ji eşîra Rema ne. Li Girsor wan û Cegerxwîn hev naskirin. Hingî mala Cegerxwîn li Amûdê bû. Cegerxwîn jî wek Evdî axayê Xello û eşîra Mîrsinan ji hevalbendên Fransizan bû.. Ji rexekî din ve mele Eliyê Topiz ku dibe xwarziyê Cegerxwîn, şêwirdarê Evdî axa yê Xello bû, hem jî Cegerxwîn û mala Perîxanê ji yek welatî bûn; Hesar, Kercos, Qerqat û Remanên jêrî bi ser hev ve bûn. Erê Hesar ne di bin destê Rema de bû, lê sînordaşên hev bûn, Nexasim Remanên jêrî ku mala Perîxanê serokatiya Reman di her du rexên çemê Dicle de dikirin ta bi tixûbê Kercosê ku Hesar, gundê Cegerxwîn, pêve girêdayî ye. Bi wateyeke din Cegerxwîn ew wek axayên xwe didîtin.. Van sedeman dihişt ku Cegerxwîn xwe nêzîkê her du kurên Emînê Perîxanê; Şikrî û Hisên bike û kêfa wî gelekî ji wan re dihat.. Antranîk û Karabêtê herdiwan bi hev re, ev çîrok ji min re gotin, ku yek ji wan şaş dibû yê din şaşitiya birayê xwe rast dikir.. û wiha pêde diçûn û ji min re gotin: Piştî pêlekê ku di nav eşîra Mîrsinan de man, bi alîkariya Fransîzan û mala Xello çûn gundê Qetraniyê ava kirin û dibistanek bo fêrkirina zimanê kurdî lê vekirin.. Lê vê paşiyê wan û mala Haco li hev nekirin, nexasim piştî ku Hisênê Hesenê Haco mala xwe bir Qetraniyê.. Vêca ji neçarî mala xwe anîn Qamişlo û li Qamişlo bi cih û war bûn. Mala Şikrî axa li ser kenarê çemê Ceqceq bû.. Hingî me Ermeniyan û xelkên Bişêriyê û Xerzan qedrekî zor ji wan re digirt. Ermeniyên me xanî ji Şikrî axa re li ser kenarê çemê Ceqceq ava kirin û her êvar li civata wî û birayê wî Hisên bûn.. Û ji wê hingê ve ew tax bi navê Mihela Bişêriyê an taxa Bişêriyê hatiye bi nav kirin.. Ji ber ku xelkên ku di wan salan de ji Bişêriyê dihat xwe li wan



Institut kurde de Paris

digirtin û wiha navê wê bû taxa Bişêriyê û ta roja îro bi navê taxa Bişêriyê tê naskirin.. Em jî bi bavê xwe re diçûn mala wan, mala wan wek mala me bû, me gelekî li hev mûm dikir.. Cegerxwîn jî pirê caran ji Amûdê dihat mala wan.. Li mala Şikrî û Hisên Emîn, me Cegerxwîn naskir.. Naskir ku şairekî Kurda ye..

Cegerxwîn û Hisênê Emîn bi hev re Hawar û Ronahî û hin kitêbên din dixwendin û dinivîsandin.. Dektîlok li cem Hisênê Emîn hebû. Cegerxwîn ji Amûdê dihat, Hisênê Emîn jêre dinivîsand û ji Celadet beg re dişandin Şamê.. û wiha di rêka Hisên û Şikriyê Emînê Perîxanê re me Cegerxwîn naskir û dostaniya me ji hingî ve pêre çêbû.. Dema ku Cegerxwîn mala xwe ji Amûdê anî Qamişlo, ket xaniyê xalê me Xello de û dor heft salan têde ma, paşê ket xaniyê Strak de navê jina wî Terzo bû û wiha di nav me Ermeniyan de gelek salan maye.. Me qedrekî zor jêre digirt.. Ji wê hingê ve dostaniya me Ermenan û xelkên taxa Bişêriyê bi Cegerxwîn re çêbû û dirêjkir.. Lê piştî ku efûya Şikrî û Hisên derket û vegeriyan welatê xwe, nav Rema, em dûrî hev ketin, ew dostaniya me bi Cegerxwîn re qels bû û êdî nema wek berê me ew didît..

Xuya ye ku di wan salan de dema ku mala Şikriyê Emînê Perîxanê û birayê wî Hisên li gundê Qetraniyê û Qamişlo bû, Cegerxwîn gelek caran dihat cem wan û wiha di bin bandora xwendina kovara Hawar û Ronahiyê de, Hisênê Emînê Perîxanê jî helbest nivîsandine û hin helbestên wî di kovara Hawarê û bêtir di kovara Ronahiyê de hatine belav kirin.. Di vê derbarê de bi min xweş e ku vê helbesta wî a bi navê (Marşa Tîpan) a ku ji bo zarokan di kovara Ronahiyê,

Institut kurde de Paris

hejmara 25 an, sala 1944 de belav bûye, careke din bo xwendevanan belav bikim:

Em şagirt in, dixwînin, A. B. C
Nivîsandin, ew ji me re, armanc e

Tîpên me tev sî û yek in Ç. D. E
Xweşî ev e, bi zimanê kurdmanc e

Ê. F .G. H. him rehet e, him şêrîn
Î. I. J. K. xweş dixwînim bi qîrîn

L. M. N. O. hê mayîne hinên din
Gelî kurdan, werin tev de bixwînin

P. Q. R. S. Ş. T. Û. U. tu meyze
V. W. X. ne, şaş nakim yek levze

Heşt dengdêr in, heçî dengdar bîst û sê
Riya ronî dibistan e ma Y û Z..

Hisênê Emîn, Qetranî 20/12/943

Institut kurde de Paris

Û ji wan helbestan, yek ji seydayê Cegerxwîn re nivîsandiye û di kovara Ronahiyê, hejmara 24 an, sala 1944 an de belav kiriye.. Cegerxwîn jî wek bersiv, helbestek bo wî di Ronahiyê, hejmara 26 an, sala 1944 an de belav kiriye û mîr Celadet Bedirxan xwediyê kovara Ronahiyê wek note, di binê helbesta Cegerxwîn de wiha nivîsandiye: (Hisênê Emîn di hejmara Ronahiyê a 24 an de ji seyda gazin dikirin. Ev şîhir ji wê gazinê re bersivek şêrîn e). Bi rastî Cegerxwîn di helbesta xwe de pesnekî zor daye Hisênê Emîn, dema ku wî, ew bi navê (Emînê Welat), bi nav kiriye.. Ev e bersiva Cegerxwîn ji Hisênê Emînê Perîxanê re:

Hisênê Emîn, emînê welat

Şîhra te xweş e, mizgîn û berat

Ez westiya bûm, ji rê derketim

Lingê min têla, xewa min dihat

Ez raketî bûm, xew pir şêrîn e

Îro bihar e, ne maye sibat.

Te dey li min kir, ji xew qevistim

Serê xwe hilda, roja me hilat.

Tana xwe daye çiyayên bilind

Tev tê xemilîn, çi deşt û çi lat.

Rengê zêrînî xwe berda welat

Sor û zer mane bajar û kelat

Institut kurde de Paris

Pir bi min xweş tê, dengê te ê zîz
Qêrîna piling, qebqeba ribat
Ey xortê hêja mizgîn im li te
Xweş ber girtiye bexçeyê xebat.
Damarên tehlî, hêj tê de mane
Qet şêrîn nabî, bê ceng û civat.
Hisênê Emîn, emînê welat
Te nehişt razim, xewa min dihat.
Cegerxwîn dilkul, seydayê xortan
Riya me dûr e, warê me welat.

Cegerxwîn

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# Osman Sebrî

## 1905 – 1993

### Lehengekî ji lehengên gelê kurd bû

*"Parastin û geşkirina xwendin û nivîsandina kurdî li ser milê her Kurdekî dilsoz û welatparêz e, bi taybetî xwendayên me, çûnkî ziman roleke giring di jiyana her netewekî de dimîne. Zimanê me jî gelekî li paş de ye û gereke em bi zimanê xwe mijûl bibin, hingê em qenciyê li xwe dikin..."*

*Osman Sebrî (Kovara Pêşeng, hejmar 5/1984)*

Institut kurde de Paris

Mirov ji ber xwe ve nabin leheng û her roj leheng çê nabin. Dibe ku di nav miletekî de nifşek derbas bibe û Xwedê lehengekî di nav lingê dayikekê de ji wî nifşî derbas neke, ew nifiş stewir bimîne; û dibe ku di nifşê miletekî de gelek dayik lehengan bînin.

Gel jî mirovên ne leheng nake leheng. Heger teraziya dîrokê gel be, teraziya gel jî ji zêr e; gel bi wê teraziya xwe ya zêrîn lehengên xwe dibijêre û navê wan di bîr û baweriya xwe de tomar dike û bi demê re xebat û bizava wan lehengan jê re dibe dîrok.

Ne gereke ez navên lehengên gelê kurd bibêjim, ewên ku navên wan di hişê her Kurdekî dilsoz û xemxur de hatiye tomar kirin; ewên ku di zindanan de, di bin şert û mercên dijwar de li ber xwe dane..

Lê wek nimûne, bi helkeftina derbasbûna 10 salan di ser koçkirina Apo Osman Sebrî re, ez wî wek lehengekî gelê kurd dibînim û vê panoramayê wek wefadarî ji giyanê wî re pêşkêş dikim.

**********************************

Di roja 11.10.2003ê de, 10 sal di ser koçkirina Apo Osman Sebrî re derbas dibin, ev mirovê ku di tevayî Kurdistanê de wek siyasetvanekî, têkoşerekî, torevanekî û rewşenbîrekî kurd hatiye nas kirin.

Osman Sebrî di nav tevgera rizgarîxwaz a gelê kurd li Sûryayê û tevayî Kurdistanê de navekî sereke û belû ye. Vî lehengî bi tev şiyanên xwe beryedêrî di ber mafê gelê Kurdistanê de kiriye. Ji destpêka xortaniya xwe û ta bi rojên xwe yên dawî, ango di 88 bûharên xwe de, bi vîneke ku nayê tewandin, li ber xwe daye û ranewestiyaye. Ew jî li ser vê rêbazê gelek caran ji rex dagîrkerên Kurdistanê ve hatiye girtin û sirgûn kirin û tevaya jiyana xwe di mişextî û zîvariyan de derbas kiriye.

Institut kurde de Paris

Osman Sebrî di roja 05.01.1905ê de li Kurdistana Bakur, gundê Narincê, qeza Kextê ji wîlayeta Adîyeman (Semsûr) çê bûye; bavê wî wek axayê hoza Mirdêsan dihat nas kirin.

Di 11e-saliya wî de, bavê wî koça dawîn kiriye, di peyre jî dayika wî. Vêca mamê wî Şûkrî bi kar û barê hoza Mirdêsan ve rabûye, hem jî biraziyê xwe Osman bi delaliyeke mezin xwedî kiriye. Di wan salan de, Osman Sebrî xwendina seretayî li ber destê mamoste Îsmaîl Efendî bi dawî aniye,

pê re pê re jî hez pirtûkên dîrokî û helbestan kiriye; belê dûrî dibistanê çûye û li kêleka mamê xwe Şûkrî bi kar û barê hozê ve rabûye.

Osman Sebrî ji şoreşa Şêx Seîdê Pîran re wek dîdevanekî bû; di sala 1925ê de, di vê şoreşê de dû apên wî bi tewana beşdarbûnê li Amedê (Diyrbekirê) hatine bi dar vekirin. Ew jî bi gunehê şoreşê dû carî hatiye girtin û zindan kirin... Di sala 1930î de, piştî ku binxetî Sûriyayê bûye û bûye endamek ji endamên Komela Xoybûn, wî ji hêla Berazan ve (Kobanî) beşdarî di Şoreşa Agrî de kiriye, lê mixabin hevalên wî ew ji pişt dane alî û bi paş de vegeriyane.

Piştî herifandina Şoreşa Araratê, berê xwe daye Kurdistana Başûr, da ku navbera Barzaniyan û Berzenciyan xweş bike. Lê mixabin li wir jî tev hewildanên wî beravêtî derketine.

Osman Sebrî di navbera sala 1926ê ta sala 1971ê, ango di navbera 45 salan de, 18 caran hatiye girtin û zindan kirin. Ew girtin di navbera rojan ,mehan û salan de bû. Yekemîn car di sala 1926ê de li Amedê hatiye girtin û ceza xwe di zindana Denzlî de derbas kiriye, ta bihara 1928ê. Di payîza 1928ê de, careke din di gel 26 axayên Kurdan bi gunehê ku karê xwe û şoreşekê dikin hatiye girtin û piştî 7 heyvan ji zindana Meletya hatiye berdan. Li Iraqê jî du caran hatiye girtin, carekê ji zindana Mûsilê reviya ye, cara din karbidestên ingilîzî ew spartine hikûmeta firensî, ya ku Sûrya dagîr kiribû. Wan jî ew - wek tevayî endamên Komela Xoybûn - li Şamê xistine bin rûniştina zorê de..

Institut kurde de Paris

Di sala 1935ê de, du carî li Libnanê hatiye girtin û di eynî salê de ew sirgûnî girava Medegeşker li Efrîqiya kirine û salekê lê maye.

Li Sûryayê 12 caran hatiye girtin, cara paşîn salûnîvekê di zindana Kelehê de li Şamê razaye. Piştî ku vê carê ji zindanê hatiye der, di sala 1971ê de êdî ji nû ve li mala xwe li Şamê rûnştiye, xwe dûrî karê siyasetê kiriye û dest bi fêrbûna zimanê Kurdî kiriye.

Bi weşandina kovara Hawarê re di gulana 1932ê de, ew piştî Qedrî Can duyemîn kes bû, ku ew kovar bi berhemên xwe xemiland, û ji wê hingê ve berê xwe da warê nivîsandina bi zimanê kurdî û li kêleka Bedirxaniyan sekinî, beşdarî di tev kovar û rojnameyên wan de kir, wek Ronahî, Stêr û Roja Nû. Hêjayî gotinê ye, ku - li gor ku Mîr Celadet Bedirxan gotiye - Osman Sebrî yekemîn kes bû, ku ziman û nivîsandinên wî ji yên tev nivîskarên wê hingê tekûztir, rastir û xweştir bûn.

Di sala 1938ê de, yanek li Şamê bi navê 'Yana Selahedîn a Rewşenbîrî û Werzişî' damezirand. Di sala 1942ê de, li Şamê 'Yana Kurdistan' vekir. Di sala 1949ê de, 'Yana Henano', Di sala 1954ê de, 'Yana Cezîrê'

Osman Sebrî di van kulûp û yanan de, xort û keçên Kurdên Şamê fêrî xwendina zimanê kurdî dikirin. Di 14.06.1957ê de, wî di gel çend ronakbîrên kurd, mîna Dr. Nûreddîn Zaza, Reşîd Hemo, Hemîdê Derwêş û hinên din,

Institut kurde de Paris

yekemîn partiya kurdî li Sûryayê damezirand û serokatiya wê partiyê kir.

Di ١٦e-saliya wî de, apê wî Şûkrî ew zewicandiye; ji wê jinê kurek bi navê (Welato) jê re çê bûye (Welato di sala 1970î de li welat hatiye kuştin). Di sala 1944ê de, li Şamê careke din jineke çerkesî ji xwe re aniye; ji wê jinê sê kur (Hoşeng, Hoşîn û Heval) û du keç (Hingûr û Hêvî) çêbûne. Belê Kewê, ya ku her dem pê re bû, keça birayê wî ye.

Osman Sebrî bi navê APO di nav gelê kurd de hatiye nas kirin; Rewşen Xanim Bedirxan ev nasnav lê kiriye, ji ber ku wê bi çavekî mezin li Apo Osman Sebrî mêze dikir û rêzgirtineke zor jê re digirt.

Osman Sebrî di roja 11.10.1993ê de li Şamê, di mala xwe de, koça dawîn kir. Di roja bi du de, termê wî guhestin gundê Berkevirê, navça Derbasiyê, û ew di goristana şehîdan de veşartin.

Ji berhemên Apo Osman Sebrî:

Bahoz (1956)
Derdên me (1956)
Çar Leheng (1984)
Şerrên Sasûnê (2005)

Di gel ku wî du Alfabeyên kurdî jî behev kirine Di sala 1981ê de li Elmanyayê komek hebestên wî ji rex Hemereş Reşo ve hatine çap û belav kirin.

## Di 100 Zayîna têkoşer û torevan Osman Sebrî de

## ١٩٩٣ -1905

**(Ziman zimanê me gişika ne?! Ne yê yekî an yê didiwane,gava ku em ji bo zimanê xwe bi xebitin em qenciyê bi xwe dikin. Lê heyfa yê ku heya niha bi ziman mijûl dibin gelekî kêmin. Gelek ji xortên me çavê xwe berdane nivîsandina helbestan, ev ne tiştekî hêjaye, divê nivîsên rastesere bêne nivîsandin. Belê helbest tiştekî ji edebê ye, lê ne tevaya edebê ye.**

**Di vê ku mirov bizanibe bi zimanê xwe bi nivîsîne, lê nizanim hemû ji min re helbestan çêdikin...**

**Em miletekî bê ziman in. Anha pir xortên me hene xwendane, bi erebî jî xweş dizanin, dibêjin: (Em dê ji miletê xwe re xizmetê bikin..). Lê mixabin hînî zimanê xwe nabin û ezê dê çawa ji wan bawer bikim... ?!)**

**Osman Sebrî**

Kovara **Hêvî**, hejmara (**7**)an, sala1990 / Parîs

Institut kurde de Paris

Mirov ji ber xwe ve nabin leheng û her roj leheng çênabin, dibe ku di nav miletekî de nifşek derbas bibe û Xwedê lehengekî di nav lingê dayikekê ji wî nifşî derbas neke ,ew nifiş stewir bimîne. Û dibe ku di nifşê miletekî de gelek dayik lehengan bînin..

Gel jî mirovên ne leheng nake leheng. Heger teraziya dîrokê gele, teraziya gel jî, ji zêre, gel bi wê teraziya xwe ya

zêrîn, lehengên xwe dibijêre û navê wan di bîr û baweriya xwe de tomar dike û bi demê re xebat û bizava wan lehengan jêre dibe dîrok.

Ne gereke ez navên lehengên gelê kurd bibêjim, ewên ku navê wan di huşê her kurdekî dilsoz û xemxur de hatiye tomar kirin, ewên ku di zindanan de, di bin şert û mercên dijwar de li ber xwe dane..

Lê wek nimûne, bi helkeftina ku (**100**) sal di ser roja zayîna **Apê Osman Sebrî** re derbas dibe, ez wî wek lehengekî ji lehengên gelê Kurd dibînim.. Û vê panorameya kurt ji jiyana wî, wek wefadarî ji xwendevanên zimanê kurdî re pêşkêş dikim.

Wek ku me got di roja **05/01/2005** an de **100** sal di ser roja jidayikbûn **Apê: Osman Sebrî** re derbas dibe.

**Gelo!** Kî bû ta ku ez wî wek lehengekî ji lehengên gelê kurd dibînim?

Osman Sebrî navekî sereke û belûye di nav tevgera rizgarîxwazî gelê kurd de li suriyê û di tevayî Kurdistanê de. Mirovekî Kurd bû di tevayî kurdistanê de wek: têkoşerekî, torevanekî û rewşenbîrekî hatiye naskirin.

Ji mafê wî û zarokên me ye ku bi bîr were û nifşên nû wî ji nêzîk ve nas bikin, nexasim di sedsaliya jidayikbûna wî de, wek vê sala nû 2005, ku sal bi navê wî (**Sala Osman Sebrî**) di nav rewşenbîrên gelê **Kurdistanê** de hatiye nas kirin.

Vî lehengî bi tev şiyanên xwe bervedêrî di ber mafê gelê Kurdistanê de kiriye. Ji destpêka xortaniya xwe û ta bi rojên



Institut kurde de Paris

xwe yên dawîn, ango di **88** buharên xwe de, bi vîneke ku nayê tewandin li ber xwedaye û ranewestiya ye..

Ew jî li ser vê rêbazê, gelek caran ji rex dagirkerên kurdistanê ve hatiye girtin û sirgûnkirin û tev jiyana xwe di mişextî û zîvariyan de derbas kiriye.

Ew di roja (**05/01/1905**)an de li kurdistana bakur, gundê **Narincê**, qeza **Kextê** ji wîlayeta **Adîyeman** (Semsûr) çêbûye, bavê wî wek axayê hoza **Mirdêsan** dihat naskirin.

Di 11 saliya wî de bavê wî koça dawîn kiriye, di peyre dayka wî, vêca mamê wî **Şikrî** bi kar û barê hoza **Mirdêsan** ve rabûye, hem jî biraziyê xwe Osman bi delaliyeke mezin xwedî kiriye. Di wan salan de Osman Sebrî xwendina seretayî li ber destê mamoste **Îsmaîl Efendî** bi dawî aniye, pêre pêre jî hez pirtûkên dîrokî û helbestsn kiriye, belê dûrî dibistanê çûye û li kêleka mamê xwe Şikrî bi kar û barê hozê ve rabûye.

**Osman Sebrî**, wek dîdevanekî bû ji şoreşa **Şêx Seîdê Pîran** re, di sala 1925andi, di vê şoreşê de, dû apên wî bi tewana beşdarbûnê li Amedê (**Diyrbekirê**) hatine bidarvekirin, ew jî bi gunehê şoreşê dû carî hatiye girtin û zindankirin...

Di sala 1930 î de, piştî ku binxetî sûriyê bûye, xwe li mîrekên hoza **Berazan** girtiye û bûye endamek ji endamên komela **Xoybûn**, beşdarî di şoreşa **Agrî** de kiriye, di gel hoza **Berazan** li **Kobanî**, lê mixabin, desthilatên Fransî di suriyê de dest danîn ser hevalên wî û hewildana wan têkçû...

Piştî herifandina şoreşa Araratê berê xwe daye Kurdistana Başûr ku navbera **Barzaniyan** û **Bezenciyan** xweş bike, lê mixabin li wir jî tev hewildanên wî beravêtî derketine ..

**Osman Sebrî**, di navbera sala **1926**an ta bi sala **1971**ê de, ango di navbera (**45**) salan de (**18**)caran hatiye girtin û zindankirin, ew girtin di navbera rojan, mehan û salan de bû. Yekemîn car di sala 1926 an de li **Amedê** hatiye gitin û cezê xwe di zindana **Denzlî** de derbaskiriye ta bihara 1928an, di payêza 1928 an **careke** din hatiye girtin di gel 26 axayên kurdan bi gunehê ku karê xwe û şoreşekê dikin, piştî 7 heyvan ji zindana **Meletya** hatiye berdan. Li îraqê jî **dû** caran hatiye girtin, carekê ji zindana Mûsilê reviya ye, cara din karbidestên îngilîzî ew spartine hikûmeta Fransî ya ku sûriya dagirkiribû, wan jî ew xistine bin rûniştina zorê de li Şamê, wek tevayî endamên komela Xoybûn..

Di sala 1935an de **dû** carî li Libnanê hatiye girtin û di eynê salê de ew sirgûnî girava **Medegeşker**, li Afrîqiya kirine û salekê lê maye.

Li Sûriyê **12** caran hatiye girtin, cara paşîn sal û nîvekê di zindana Kelehê deli Şamê razaye, piştî ku vê carê ji zindanê hatiye der di sala 1971ê de, êdî ji nû li mala xwe li Şamê rûnştiye, xwe dûrî karê siyasetê kiriye û dest bi fêrbûna zimanê Kurdî kiriye..

Bi weşandina kovara **Hawar**ê re di **gulana 1932** an de, ew duwemîn kes bû, piştî **Qedrî Can** ku bi berhemên xwe ew kovar xemiland û ji wê hingê ve berê xwe da warê nivîsandina bi zimanê kurdî û li kêleka Bedirxaniyan sekinî,

Institut kurde de Paris

beşdarî di tev kovar û rojnameyên wan de kir wek Ronahî, Stêr û Roja Nû. Hêjayî gotinê ye ku Osman Sebrî yekemîn kes bû ku ziman û nivîsandinên wî ji yên tev nivîskarên wê hingê tekûztir, rastir û xweştir bû li gor ku **Mîr Celadet Bedirxan** gotiye.

Di sala 1938 an de yanek li Şamê bi navê (**Yana Selahedîn ya rewşenbîrî û werzişî**)damezirand

Di sala 1942 an de (**Yana kurdistan**) li Şamê vekir.

Di sala !949 an de (**Yana Henano**).

Di sala 1954 an de (**Yana Cezîrê**).

Osman Sebrî di van Kulûp û yanan de xort û keçên kurdên Şamê fêrî xwendina zimanê kurdî dikirin..

Di 14/06/1957 an de wî di gel çend ronakbîrên Kurd mîna **Dr. Nûreddîn Zaza**, Reşîd Hemo û Hemîdê Derwêş û hin din yekemîn partiya kurdî li sûriyê damezirandin û wî serokatiya wê partiyê kir.

Institut kurde de Paris

**Ji berhemên Apo Osman Seberî:**

**Bahoz**: Di sala 1956 an de

**Derdên me**: Di sala 1956 an de

**Çar leheng**: Di sala 1984 an de

**Şoreşên Sasûnê**: Di sala 2005 an de

Di gel ku wî du **Alfabeyên kurdî** jî behevkirine

Di sala 1981 ê de li almaniya komek hebestên wî ji rex buhiştî Hemereş Reşo ve hatiye çap û belav kirin.

Di 16 saliya wî de apê wî Şikrî ew zewicandiye ,ji wê jinê kurek bi navê (Welato) jêre çêbûye (Welato di sala 1970 î de li welat hatiye kuştin).

Di sala 1944 an de, li Şamê careke din jineke Çerkezî ji xwe re aniye, ji wê jinê sê kur :Hoşeng,Hoşîn û Heval çêbûne û du keç: Hingûr û Hêvî, belê Kewê ya herdem pêre bû keça birayê wî ye.

Osman Sebrî bi navê APO di nav gelê kurd de hatiye naskirin, ev naznav Rewşen Xanim Bedirxan lê kiriye, ji ber ku wê bi çavekî mezin li Apo Osman Sebrî mêze dikir û rêzgirtinek zor jêre digirt.

Osman Sebrî, di roja 11/10/1993 an de li şamê, di mala xwe de koça dawîn kir, yadinî rojê termê wî guhestin gundê Berkevirê, navça Derbasiyê, ew di goristana şehîdan de veşartin.

Institut kurde de Paris

## Ez û Kovan Xankî û Hevpeyvînek Li Dor Helbestvaniya Osman Sebrî

**weke diyar ku osman sebrî berhemên kilasîk û nûjen jî hene, tu bi çi nerrînê rey, helbestvanek kilasîke, yan nûjene? Yan jî weke Cegerxwîn em bikin pir dinavbera herdukan de?**

Belê wek ku ez û tu serwextin, di jiyana Osman Sebrî de, bi tenê du berhemên wî yên wêjeyî hatibûn çap kirin: Bahoz û Derdên me., vê paşiyê jî Bersiva Hoşeng. Di sala 1979 an de jî, rehmetî Hemreş Reşo, helbestên wî di dîwanekê de li Almaniya dane çap kirin. Li gor xwendina min ji helbestên wî re û li gor ku helbesta kurdî a nûjen bi weşana kovara Hawarê û helbestên Qedrî Can destpêkiriye, ez Osman Sebrî di pey Qedrî Can re dibînim ango berî Cegerxwîn, ji ber ku Bahoza Osman Sebrî berî Kîme Ez a Cegerxwîn çap û belav bûye. Eger Cegerxwîn bi dîwana xwe Kîme Ez/1973 hatibe nas kirin wek helbestvanekî nûjen, Osman Sebrî berî wî bi gelekî, ji heyamê Hawarê ve hatiye naskirin wek helbestvanekî ku li ser şopa Qedrî Can dikulkulî. Lê di baweriya min de herdu jî (Cegerxwîn û Osman Sebrî),ji kilasîkan e, û pirek qewînin di navbera Kevin û nû de, Ji ber ku piraniya helbestên wan kilasîkî ne, bi tenê hin caran nûjen hunandine.. Eger Osman Sebrî di hunandina helbesta nûjen de berdewam kiriba, bêguman wê, ew mîrê helbesta kurdî a nûjen ba berî Qedrî Can, lê mixabin siyasetê ew di nav pêlên xwe de revand û wiha dûrî wêje û toreyê ket... Dawî ez dikarim bibêjm ku hersê jî (Qedrî Can, Osman Sebrî û Cegerxwîn), di ware helbesta nûjen de şagirtên mîr

Institut kurde de Paris

Celadet û Dr. Kamîran Bedirxan bûn, ewên ku serwextî nûjeniya toreya europî bûn û wan şagirtên xwe bi wê nûjeniyê fêr kirin...

**Cudahiya (ferqa) apo bi helbestvanên din re di çi deye?**

Di baweriya min de di berdewamiya hunandina helbestê de ye, Osman Sebrî wek Cegerxwîn bi berdewamî ne nivîsand, siyasetê agir bi semyanê wê yê wejeyî xist... Belê Cegerxwîn jî siyasî bû û her wiha Qedrî Can jî û mamosteyên wan yên bingehîn mîr Celadet û Dr. Kamîran Bedirxan jî siyasî bûn, lê siyaseta ku Apo Osman dimeşand, ji ya gişan aktivtir bû, û vê yekê, ew di warê wejeyî de kêm hişt û ev yek cudahiyek Apo ye ji helbestvanên din.. Cudahiya din, mêraniya Osman Sebrî ye. Wê mêraniyê ew di Felestîn, Urdin û Medegeşqer re derxist.. Hevalên wî yên din man li Şamê.. Cudahiyek din; Osman Sebrî divîbû berî helbestê xwe bigihîne welat...! Ango welat ji Apo re her tişt bû.. Ta ku wî navê kurê xwe yê pêşîn kir Welato..

**Çima helbesta evîndarî (hezkirinê) li cem apo Osman pir kêm e?**

Osman Sebrî mirovekî cddî bû. Ew di xortaniya xwe de pêrgî gelek bobelatên seyr û bi xwîn bibû; şoreşa şêx Seid û bidarvekirina mirovan li Amedê, kuştn û talaniya şerqê ew his û hestê evîndariyê li nik kuştibû.. Vêca bi tenê welat ma bû evîna wî û welat di ser her tiştî re digirt.. di baweriya min de ji ber vê yekê evîndarî li cem kêm bû..

Institut kurde de Paris

**Eger apo ne di sêgoşeya (îraq, surya û turkiye) de ba, wê kasayetiya wî û helbestvaniya wî çawe ba?**

Di baweriya min de wê kesayetiya wî a Axa ba, wê wek axakî kurdan li xwe meze kirba, bi tev irf û adetên axatiyê ve.. Wê axakî berberçîba.. Lê helbestvaniya wî, li gor cudahiyên ku di keseyetiya wî de hene, wê piraniya helbestên wî evîndarî bana û hozpesinandinî bana.. Li gor ez serwextî jiyana wî me.. Apo Osman, li Şamê di nav endamên komela Xoybûnê de wek axayê eşîra Merdêsan li xwe meze dikir..

**Helbestên apo pir pir bi zimanek sadene (raste u rast)in, bi nerrîna te eve ji nirxê helbestvaniya wî kêm nake? Û bi taybet ji aliyê rewanbêjiyê (rehwaniyê) ve?**

Qet na. Ji ber wî heyamê wiha dihat xwestin.. Ew heyamê ku nezanî û cehaletê konê xwe di ser kurdistanê re vegirtibû, ji deh gundan yekî xwenda peyda nedibû, ewên ku hebûn jî mela û feqa bûn, jixwe kurdewariyê bi wan destpêkiriye, ango dibistana Hawarê, ku em bavê netewa kurdî şêx Ehmedê Xanî bidin alîkî... Hem jî bi saya wan zimanê me hat parestin.. careke din dibêjim na li gor wî heyamî qet kêm naket..

**Weke diyar ku helbestvaniya apo hinekî kilasîke, gelo ew û erûza erebî (عروض العربي) di çawe bûne? Peyrewa wê kiriye?**

Apo Osman di medreseya Rişdiyê de ta pileya pêncan bi zimanê tirkî xwendiye û di pey re serê wî ketiye şek û pekên kurdewariyê de û ji bo vê yekê binxetî suriyê bûye. Ango wî



Institut kurde de Paris

bi zimanê erebî hiç nizanî bû. Li Şamê, bi saya mîr Celadet Bedirxan û kovara wî Hawarê dest bi nivîsîna kurdî kiriye.. Di bere jî fêrî erebî û xwendina zimanê erebî bûye, lê fêrî erûzên erebî ne bûye.. Belê her ew di ziman û folklorê kurdî de milevan bû. Nivîsandinên wî yên pexşaneyî ji yên tev nivîskarên Hawarê rastir, tekûztir û bedewtir bûn û wiha jî di helbestên xwe de. Di baweriya min de wî erûzên helbestên xwe ji stranên kurdî girtiye.. Ev yek jî, ji zîrekiya Osman Sebrî bû.

**Pîreka apo karî çend piştevaniya wî bike, di tev aliyên jiyanê de, û bitaybet jî dema di zindanê (hebsê) de? Pir peyiv dinavbera wan de hebûn ku pîreka wî alîkariya wî weke zilaman dikir, tu hineka dizanî?**

Bêguman rola pîreka wî hebû, lê ne ew rola ku tu dibêjî.. Diya Hoşeng jina Apo Osman a dudwan bû. Apo di jiyana xwe de du jin anîne, diya Welato û diya Hoşeng. Diya Hoşeng Çerkezî bû. Jinek bê deng, bêhin fireh, ser nerim û bê gazin û lome bû. Kar û bare zarokan, male û mêvanan hildigirt.. lê Osman Sebrî ji koka xwe ve fêrî têkoşînê bibû jina wî jî qîma xwe bi têkoşîna wî anîbû, qîma xwe bi feqîrtiya wî anîbû, ev yekane xweş piştgirtin bû ji Osman Sebrî re û xweş navtêdan bû.. Di baweriya min de ku kî jina Osman Sebrî ba, her wê Osman Sebrî ew Osman Sebrî ba ..

**Weke em dizanin te pêre jiyan jî kiriye, gelo kesatiyeke çawe bû? Tu dikarî çawe pesnê wî bidî?**

Osman Sebrî mirovekê xwedî gotin bû, ji gotina xwe danediket, gotina wî jî cihê xwe digirt.. Evîndarê ziman û

welatê Kurdistanê bû... Di sincê xwe de mirovekî bêhin teng û zirz bû, zû bêhna wî teng dibû, her divîbû gotin a wî be û ew gotin cihê xwe bigire... Ku bi dest wê keta, wê dîktatorekî kurd ba wek ku hevalên wî, yên pêre di tevgerê de bûn dibêjin.. Gelekî hez lehengên dîrokî dikir wek Napalyon, Selaheddînê Eyûbî... û di xwest ku ew jî wek wan be.. Di sala 1977 an de ez çûm bal Cegerxwîn, min pirsa Apo Osman Sebrî jê kir, li min vegerand û got: Ka Osmanê berê, min bihîstiye ku bûye sofî, diçe mizgeftê û nimêj dike... Mixabin ku di dawiya temenê xwe de, êdî nema huşê wî, wek berê dikişand û hin caran êrîşî heval û hogirên xwe dikir.. Belê ez wî wek lehengekî ji lehengên gelê kurd dibînim. Ta vir û bese kak Kovan.

Institut kurde de Paris

# Casimê Celîl

**1908-1998**

Yek ji danerê bingeha
Rewşenbîriya Kurdî li pişt Qefqasê

Buhiştiyê hêja Casimê Celîl yek ji rewşenbîrên sereke bû di nav kurdên Sovyêta berê de. Dihat hejmartin yek ji ronakbîrên pêşîn yên ku bingeha rewşenbîrî û toreya kurdî di Sovyêta berê de danîne wek: Erebê Şemo, Haciyê Cindî, Emînê Evdal, Wezîrê Nadirî, Qaçaxê Mirad. Eliyê Evdilrehman, Seîdê Îbo, Qenatê Kurdo û Pişkoyê Hesen...hwd.

Dibe ku apê me Casimê Celîl li wan zêde jî kiribe, hem bi afirandinên helbestên xwe û hem bi çalakiyên xwe yên bê rawestan di ber kultura gelê kurd de, ku dor 70 salî pêre dûmkir. Hem jî, bi vî nifşê ku li paş xwe hişt; Kurê wî yê mezin Prof. Dr. Ordîxanê Celîl pisporekî mezin e di warê folklorê kurdî de, yê jê biçûkitir Prof. Dr. Celîlê Celîl dîroknivîsekî bi nav û deng e, di nav 40 melyom kurd de, û keça wî Cemîla Celîl mûzîkvan û folklorîsteke jêhatî ye.

Casimê Celîl digel gelek kar û barên giran ev çend leheng li paş hiştin. Ev lehengên ku jiyana xwe ji dîrok, folklor û mûzîka kurdî re mizaxtine.

Di 24, 10, 1998 apê me Casimê Celîl gewrika dinyê winda kir, di nexweşxaneyekê de li bajarê Yerîvanê, paytexta komara Ermenistanê. Pişt ku tam 90 sal ji gewrika dinyê, bi tal û tirş ve dît,û her dem bi hisreta dîtna warê bav

Institut kurde de Paris

û kalan bû. Û dawî bi tenê termê wî li ser serê girekî – 15 KM ji Yêrivanê dûrî, hat veşartin. Ji bakurê gora wî ve çiyayê ku Elegezê xweş tê dîtin, ev çiyayê ku ew ji kiştina tirkan parast û ji başûrî gora wî ve çiyayê Araratê bi kûpên xwe yên spî ve, ber bi asmanê şîn ve bilind dibe, ev çiyayê bûye goristana şehîdên şoreşa Araratê di nav bera salên 1927-1930 ê de.

Pirtûkek têra çalakî, kar û pesindana buhiştî Casimê Celîl nake, di vê nivîsandinê de emê bi kurtî li ser çend qunaxên giring di jînenîgariya wî de rawstin.

Ji sedê salan ve hozên Êzîdiyan û Ermeniyan di herêma Qersê de bi hev re dijiyan, jiyaneke normal bi hev re derbas dikirin. Di sala1918 an de. Piştî şerê cîhanê yê pêşîn û vekişandina leşkerên Rusan ji Qersê, leşkerên ciwanên tirk bi serokatiya Kazim Qerabekir paşa êrîş birin ser herêma Qersê û bi hovîtî dest bi kuştina Kurd û Ermenan kirin. Hingê temenê Casimê Celîl dor 10 salan bû, ew di heyva çêriya pêşîn 1908 an de li gundê Qizilqulê navça Dîgorê ji herêma Qersê hetibû dinyê.

Di wê salê de 1918, di wê kuştina hovane de, ji malbata bavê Casimê Celîl ya ku di ser 50 neferî re hebûn, bi tenê Casimê Celîl, temen 10 salî, û xuşîkeke xwe bi navê Xecê filitîn. Mixabin ku xuşîka xwe di nav kerwanê revyayan de winda kir, dema ku ber bi çiyayê Elezegê ve direviyan.

Casimê 10 salî, bi perîşanî, xwas, tazî, û birçî bi dûv xelkên mişextî de xwe gihand Yêrîvanê.

Li Yêrîvanê tevî hezaran zarokên wek xwe sêwî bû, ji kurd û Ermenan, û bi wan re di sêwîxaneya Alêksanderaplolê û Celaloxliyê de hat xwedîkirin û bi xwendin dan.

Institut kurde de Paris

Di sala 1927 an de, navê wî hat pejirandin ku here bajarê Bakoyê. Dibistana leşkeriyê bixwîne, piştî pêlekê ji xwendinê li Bakoyê, Ji ber jîrekiya wî, ew rêkirin bajarê Teblîsê ji bo xwendina leşkeriyê ya hêj bilintir...

Di destpêka sala 1930î de, rewşa kurdin piştqefqasê (Azirbîcan, Ermenistan û Gurcistanê), hin bi hin xweş bû. Nemaze piştî ku di sala 1929 an de Erebê Şemo bi alîkariya Moragolov alfabêtek ji zimanê Kurdî re berhev kir. Hingê dewletê rê li ber kurdan vekir ku, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin. Belê kadiroyên kurd kêm bûn, ew kadiroyên ku karibin bi kar û barên dibistan û fêrgehên kurdê rabin gelekî kêm bûn, vêca çendek ji wan sêwiyên Kurd û Ermen bijartin, nexasim ewên zîrek, di nav wan de navê Casmê Celîl hebû. Hingê temenê wî dor 23 salan bû, weha Casimê Celîl ji Teblîsê vegeriya Yêrîvanê ji bo xizmeta rewşenbiriya kurdî...

Di sala 1930î de, Casimê Celîl bû endamek di partiya komenîstê sovêtê de. Di sala 1931ê de, bû rêvebirê Texnîkomê (wek Enstîtuyekê ye ji bo amadekirina kadiroyên kurd ji bo dibistan û navednên kurdî li piştqefqasê), û weha bi sedên xort û keçan li ber destê wî fêrbûn û bûm mamoste di dibitanên kurdî de...

Di sala 1932 an de, ji ber serketina Casimê Celîl di rêveberiya Enstîtuya kadiroyan de, karbidestên Ermenî ew bijartin ji dêrektoriya çapemenî û pêşxistina ziman û toriya kurdî re, û weha Casimê Celîl hat guhestin ser vî karê nû, û bû berpirsyarê sereke ji çapkirina pirtûkên bi zimanê kurdî re. Ji wê hingê ve, pirtûkên bi zimanê kurdî rêka xwe di çapxanê de dîtin, wek tev netewên Sovyêta ber.



Institut kurde de Paris

Di navbera salên 1932-1938 an de, ev sala dawîn 1938 Stalîn çapemaniya gelên biçûk birawestandin da, hingê Casimê Celîl bi sedan pirtûkên bi zimanê kurdî çapkiribûn, ji pirtûkên dibistanê ta bi dîwanên helbestan û wergerandinên kilasîkkên netewê Rûsî û Ewropî bo zimanê kurdî, û wî bi xwe dor 10 pirtûkên dibistanê amade kiribûn ji dibistanên kurdî re hem jî, çend nivîsandinên Marks û Lînîn wergerandibûn bo zimanê kurdî ...

Ta roja îro hin pirtûkên Casimê Celîl di dibistanên kurdî de têne xwendin û dersdan.

Di navbera salên 1938-1941 an de, Casimê Celîl li Yêrîvanê, di enstîtuya ziman û edebyatê de xwend, û bi şev rêveberiya dibistaneke ermenî dikir, bi navê Nar-Dos.

Di pey re sê salan di universîtê, fakulta Hiqûq de xwend û dîploma xwendina bilind stand.

Di salên şerê cîhanê yê dudwan de, di dibistanên leşkerî yên teybet de, bû mamosteyê zimanê kurdî..

Di sala 1943 an de, li ser xwestina partiya Komenist li Yêrîvanê, dor 500 semînerî, li ser niştiman û hezkirina netewan ji hev re, di herêmên kurdan de li darxistin. Di salên pey şerê cîhanê de, Casimê Celîl, di pêşxistina ziman û toreya kurdî de roleke mazin lîst. Di bîranîna 150 salîya ji daykbûna kilasîkê Rûsî yê navdar (A.S.Pûşkîn)de, Casimê Celîl komek helbestên wî wergerandin ser zimanê kurdî û belavkirin.

Piştî mirna Stalîn, carake din rê li ber xwendina bi zimanê kurdî di gundên kurdan de hat vekirin û careke din rûpelên rojnameya( Riya Taze), bi dêmê kurdan re keniya, lê ji bûyerên herî giring di jiyana kurdan bi tevayî de û kurdên piştqefqasê bi taybetî, ku di sala 1955 an de, beşekî

kurdî di êzgeya Yêrîvanê de ji kurdan vebû, di bin rêveberiya Casimê Celîl de,ûwiha dengê gelê kurd li dinyayê belav bû. Kurdên her çar kenarê dinyayê li mûzîk, dîrok û folklorê xwe guhdar kirin û bi saya serê wî dor 1000 stranên kurdî û perçeyên mûzîkî ji windabûnê hatin parastin.

Casimê Celîl ne tenê evîndarê guhdariya mûzîk û strana kurdî bû, belê bi xwe jî mûzîkvana bû. Wî li bilûr û fîqê dixist, hem jî, wî ew stranên zarokatiya xwe, zarotiya gundê bav u kalên xwe Qizilqulê ji bîr nekiribûn, her dem wî ew stran dinehirandin û digotin û bêhna xwe bi wan derdixist.

Rola radyoya Yêrîvanê, beşê kurdî, di hişyarkirina kurdên her çar perçan de, gelekî mezin bû.

Di sala 1970î de, carekê din Casimê Celîl bû berpirsyarê çapkirina pirtûkên kurdî, di weşanxaneya dewletê de û dor 10 salan têde dûmkir, bi sedên pirtûkan çapkirin.

Casimê Calîl dor 70 salî ji temenê xwe diyarî gelê kurd kir, bê ku rojekê raweste an rojekê evîna welatê kurdan ji dil û bîra wî derkeve. Hem jî evîdarê zargotina gelê kurd bû, û wî gelek caran navrokeke zargotinî dikir bingeh ji nivîsandina helbesteke xwe re, ango helbestên xwe bi zargotinê dixemilandin, û divî bû ku dewlemendiya zargotina kurdî bi gelên cîrar re bide naskirin wek Ermen, Gurc, Rûs, û yên mayî...

Digel ku Casimê Celîl bi gelek kar û baran rabû, ew helbestvanekî zîrek û jêhatî bû û xwedî nav û deng bû. Di nav helbestên wî de cihê welathezî û Înternasyonalîzmê gelekî·fireh bû, wek nimûne ev çend malikin ji helbestek wi:

Institut kurde de Paris

1- Ez gele caran li te bûm mêvan
Geriyam li her gund û bajara
Tu xemlî bi çem û ava
Gurcistana nû, aza bextewar

2- Çiyê Kazbêkê ku min dinhêrî
Ew dibriqî bi şewqa roê
Ava belekia mîna kemberê
Xemlandibûn bejin û bala wê

3- Wexta ez bûme gundada mêvan
Gele razî mam ji hukmeta wan
Tev merivhizin û dilê fire
Ez hesab kirim ji kinêzê xwe

***Casimê Celîl***

Û gelek ji helbastên wî hatin wergerandin ser zimanê Rûsî û di rojnameyên Sovyêtî de hatin weşandin; wek: Pravda, Izvestya, û yên mayînde.

Di sala 1963an de, dema zilm û zora hikûmeta Îraqê li ser şoreşa Barzanî dihat meşandin, hing Casim Celîl gelek helbest nivîsandin û weşandin.

Bi saya wî helbestên gelek nivîskarên kurd hatin wergerandin ser zimanê Fransî, Înglîzî, Azerbêcanî û Tirkî, û di rojname û kovarên têlev de li Ermenistanê, belav bûn.

Kovar û rojnameyek li Ermenistanê nema ku helbestên Casimê Celîl têde belav nebûn, çi bi zimanê Ermenî û çi bi zimanê Rûsî, û yek jî nema ku bi çak û rindî, li ser xeber neda.. Casimê Celîl bibû nimûneyek ji kurdên serketî di sovyêtê de, û bûyerekî kurdî nema ku navê Casimê Celîl ne

Institut kurde de Paris

di nav de bû. Ew dihat hejmartin yek ji çar kesên sereke ku bingehê edebyata kurdî danîne.

Ew di sala 1936an de, bibû endam di yekîtiya nivîskarên Sovyêt de û gelek caran bibû nûnerê konferansên li Moskoyê û Yêrîvanê. Ji ber çalakiyên wî, yên bê rawestan û berketi di ber gelê kurd de, navê wî di Ensîklopêdyay Sovyêt, Ermenistan û Ukranyayê de hatiye nivisandin, û gelek xelat ji standine.

**Ji berhemên wî:**

1- Elegez 1954.
2- Stranên kurdî yên evîndariyê 1955.
3- Kaniya Dê 1957.
4- Rojên min 1960.
5- Ocaxa min 1966.
6- Birêyên Zemana 1968.
7- Kilamê Çiya 1970.
8- Oda Kurda 1975.
9- Kurdê bengî 1980.
10- Zozan 1982.
11- Emerê Celalî1982.
12- Emerê Rosî 1983.
13- Kofiya diya min 1984.
14- Bijare 1988.
15- Mêxasê kurda 1988
16- Kela Dimdim 1991.

Dawî sed rehmet li giyanê wî bibare Buhişt jî cî û warê wî be.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# Jiyan û Xebatên Dr. Celîlê Celîl Di 70 Saliya Temenê wî de

**Pêşgotinek pêdivî:**

Di havîna 1982 an de, li Qamişlo, ez çav bi Dr. Celîlê Celîl ketim. Ew yekemîn car bû ku dihat nav kurdên sûriyê. Ji Heleb û Efrîne dihat û kalemêrekî Ezîdî ji Efînê di gel wî bû. Di vê carê de, min ew nas kir û bûm wek rêberekî pêre, di gel çend navdarên Qamişlo.. Wiha me tevan dengbêj û çîrokvan jê re komdikirin, ji Silo Koro bigire ta bi Demir Elî, ji pîrejinan ta bi kalemêran ...Wî jî bê westan, şev û roj dikin yek, û wek zarokê ku çav bi yariya xwe keve, bi şahiyek bê pîvan gotinên wan di nivîsandin û tomar dikirin...

Di sala 1985 an de, careke din di gel kebaniya xwe Gulîzarê hat Qamişlo. Di vê carê de jî, gelek pêmayê bav û kalan, ji windabûnê dahev û bi xwe re bir.. Di vê hatinê de, min jê pirsî, gelo te zargotina kurdên **Binxetê** çawa dît ?

Li min vegerand û got: **Behreke, min qurtek av jê vexwar û va ez tî vedigerim...**

Di sala 1988 an de, careke din ew û xwîşka xwe Cemîla Celîl hatin nav kurdên Binxetê/ Cizîrê. Di vê gerê de jî, gelek stran, metelok, nifir, û destnivîs bi xwe re birin...Di pey van hatinan re, me gelek carên din jî hev dît... Di van hersê caran de, ez pêre bûm, hem jî, ez jê fêrî danheva zargotina kurdî bûm.. Wiha bi saya wî, hezkirina zimanê kurdî bi min re mezin bû.. Roja îro, ez wî wek mamostayekî ji xwe re dibînim di warê eşq û danheva folklorê kurdî de û her dem ez vê yekê tînim zaman.

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque

Bi helkeftina ku di roja 26/11/2006 an de Dr. Celîlê Celîl derbasî temenê xwe yê 70 salî dibe, kefxweş dibim ku van gotinan derbarî jiyan û xebata wî, ji xwendevanên gelê xwe re raxînim ber çavan. Ji ber ku ev nivîsandin ji min tê xwestin, berî gelek kesên din. Ez ji gelekan bêtir serwextî jiyan, kar û xebata wî me û ji hingê ve pêwendiyên min di gel wî hene ...

Fermo hin ji nameya wî a dawîn ku di roja 20/11/2006 ji min re hatiye:

(( Konê Reş, birazî ! Agirê dilê min ji bona karkirinê hîn gure, apê te xwe kêm nekirye. Maşalla rewşenbîrên me li Sûryayê jî, îro bûne bi hezara û hemû jî xizmeta xwe ji bona çand û civaka me bi xurtî kar dikin.

Xûşk û birayên hêja ji Kurdistana rojava "Biçûk" !

Dewra xizmeta we mezine, we bi hêz û camêrîya xwe, kurdperwerîya helal li ber xwe vekirye. Ez meşa we li ser wê rîya ronak pîroz dikim.

Celîlê Celîl / Wîena 20/11/2006 ))

Institut kurde de Paris

Wek ku diyare, Kurdistan bi çiyayên xwe, hem jî bi şoreş û serhildanên xelkên xwe navdar e...Û tevî qedexebûna zimanê kurdî, perçebûn û bindestiya gelê kurd, gelek lehengên bi nav û deng, di warê nivîsîna bi zimanê kurdî, hunandina helbestê, folklor û weşandina kovar û rojnameyan de, di nav gelê kurd de hatine xuya kirin...

Eger Bedirxanî di vî warî de ji pêşengan têne jimartin, belê gelek malbatên din jî hene, wan jî di bin şert û mercên çetîn û dijwar de li ber xwe dane û navê xwe bi mêranî di dîroka kurdan de nivîsandine. Mirov dikare ji wan malbatan malbata Casimê Celîl jî bi nav bike; Ev malbata Kurd, bi ola

xwe Êzîdî, di sirgûnê de, 70 salî bi berdewamî xizmet di ber ziman, dîrok, zargotin, çand û medya kurdî de kiriye..û hejî neferên wê, bi berdewamî di vê kêferatê de li ber xwe didin..

Mebesta min ji van gotinan; Eve ku di 26/11/2006 an de Dr. Celîlê Celîl yê ku yeke ji vê malbatê, derbasî temenê xwe yê 70 salî dibe.

Evê ku bi dehan pirtûk li dor kêşeya gelê xwe nivîsandine, bi sedan gotar belav kirine û bi hezaran çîrok, çîvanok, metelok, yarî û lîstikên folklorî ji windabûnê parastine, dane hev û çapkirine ...

Ji mafê wi ye ku em di saxiya wî de, vê 70 saliya wî lê pîroz bikin, û pêre beşdariya vêxistina 70 mûmî bibin, hem jî pêre wan mûman bi temirînin..Di gel ku em jiyaneke xweş, geş û dirêj di bextiyariyê de jêre bixwazin.

## Dr.Celîlê Casimê Celîl Kî Ye ?

Prof. Dr. **Celîlê Celîl** kurê **Casimê Celil e**:1908-1998, (Yekî sereke bû di nav rewşenbîrên kurdên Sovyêta berê de û tê hejmartin ji ronakbîrên pêşîn, yên ku bingehê rewşenbîriya kurdî di Sovyêta berê de danîne. Ew di roja 24/10/1998 an de, li Yerîvanê, komara Ermenistanê çûye ber dilovaniya Xwedê).

**Celîlê Celîl**, di roja 26 ê meha yanzdan, sala 1936 an de, li bajarê **Yêrêvanê** Ji dayika xwe çêbûye. Ji ber ku dê û bavê wî, sêvî bûn û li sêwîxanê mezin bibûn, wan xwandina xwe a pêşin li wir girtibûn, ji ber wê jî jîyan û karê wan bi bajarê Yêrêvanê ve hatibû girêdan, ango bibûn bajari û zarokên wan bajarî xwedî bûn.

Institut kurde de Paris

Mala **Casimê Celil** ji şeş kesan pêk dihat: **Casimê Celîl** û kebaniya xwe **Xanima Celîl** û her çar zarokên xwe: **Ordîxanê Celîl**, **Celîlê Celîl**, **Cemîla Celîl** û **Zîna Celîl**. Ji ber ku kurdîtî li bal wan gelekî xurt bû, mala Casimê Celil li Yêrêvanê, di nava behra ermenîyan de wek dibistanek kurdî bû.. Û wiha jî xwe parastîye. Ji destpêkê ve karê Casimê Celil bi jîyana rewşenbîriya kurdî ve girêdayî bû, dergehe mala wî her dem li ber çûn û hatina kurdan, vekirî bû.

Vê malbatê ji roja roj de, Kurdîbûna xwe eşkere kiriye, veneşartiye û kêm jî nekirye. Ew pirtûkên kurdî yên pêşîn, ewên ku di salên 30-î de li Yêrêvanê çap dibûn, li ber destê Casimê Celil amadeyî çapê dibûn û di pirtûkxaneya mala wî de cî digirtin.

Casimê Celil, evîndarê pirtûkan bû. Bi taybetî pirtûkên ku qala kurdan dikirin, yan jî ku bi zimanê kurdî bana...

Û wiha Celîlê Celîl di gel birayê xwe yê mezin Ordîxanê Celîl û hedû xwîşkên xwe Cemîla û Zînê, di vê mala kurdperwer de hatin xwedî kirin, mezin bûn û di jîyana xwe de li ser rîya xizmeta çand û zanistiya kurdîtiyê fêrbûn û xwe ji vê rêkê dûr nexistin...

Celîlê Celîl di dibistana seretayî de, deh salan li Yêrêvanê (1944-1954) bi zimanê ermenî, xwendiye, di pey re, di navbera (1954-1959). Li ûnîvêrsîtêta dewletê, a Yêrêvanê di fakûlta dîrokê de berdewamî kiriye.. Li ûnîvêrsîtê, di konfêransên komala zanistiyê a xwendekaran de li ser dîrok û çanda kurdan wek lêkolîner gelek axaftin kirine...

Di sala 1959 de, piştî xwandina bilind, berê xwe daye bajarê Lênîngradê, înstîtûta Rohilatnasîyê, ji bona xwendina



Institut kurde de Paris

li aspîrantûrayê û wiha têza xwe a doktorayê bi navê (**Serhildanên kurdan yên azadarîyê di salên 1850-1880 an de**), di sala 1963 an de wergirtiye. Di sala 1964an de, vegeryaye Yêrêvanê û li înstîtûta rohilatnasîyê heta sala 1992 an, wek kurdzan kar kirye. Di Sala 1991 de li Moskvayê têza profêsoriyê (hebîlitation) parastiye. Çend salan li ûnîvêrsîtêta Yêrêvanêye ser navê Davît Anhaxt dersên kurdologîyê daye wek: Dîroka kurdan, Dîroka rojnamagîrya kurdî, êtnologîya kurdî û yên mayîn. Ji sala 1992 heta niha, li Awstryayê cîware. Ji sala 1994-a heta niha li Ûnîvêrsîtêta bajarê Wîenayê wek kurdzan, ser ziman, dîrok, çand û edebyeta kurdî kar dike û dersan dide. Di Akadêmîya zanistiyê de, çend salan lêkolînên xwe li ser kurdzanîyê bi berdewamî kar kirye. Di înstîtûta Pêdagogîyê de, ji bona amadekirina mamostayên zimanê kurdî, wek kurdolog û dîroknas du sêmêstran dersan daye...

Lê belê ji ber ku di mala wan de evîndarîya mezin ser çanda, ziman, folklora kurdî, dîyanet û êtnologîya kurdî bi firehî hebû, wî karê xwe ya lêkolînê li ser van mijaran jî berfire kirye.

Li akadêmîya zanistîya Ermenistanê dema ku karê xwe li ser dîroka kurdî ya sedsalîya 19 û destpêka sedsala 20 dikir, rastî gelek astengan hatiye. Hebûna zanîyarên ermenîya, yên ku lêkolînên xwe li ser bûyarên wan sedsalîya dinivîsandin, bi çavê dostanîyê li ser dîrokan kurdan nedinerîn. Ji ber wê jî, rê li ber dihat digirtin û tim rexne lê dihatin kirin... Nedihîştin lêkolînên xwe li Ermenistanê bi weşîne. Li pişt wan kesan çend kurdên hesûd û zikreş hebûn, ji nivîskarên ermenan re bibûn pal û pişt. Ji ber vê jî nivîsarên wî yên dîrokî li dervî

Institut kurde de Paris

Ermenistanê dihatin çapkirin, û bi taybetî li Moskvayê û Lênîngradê, ango Sankt-Pêtêrsbûrg. Û vê yekê ew aciz dikir, û gelek bele jêre çêdikirin, ta ku hina êrîşî wî dikir... Wî jî ji bona ku nêrvên xwe biparêze, heftê du rojan; Şemîyê û yekşemê diçû gundên kurdan; Çîrok, stran û destan didanhev û dinivîsandin... Paşê, di salên heyştêyî de, dema rê li ber vebû, sê caran (1982, 1985, 1988) bi demên dirêj, berê xwe daye nav kurdên Sûryayê û lêkolînên xwe li ser çand û folklorê wan berdewam kiriye...û wiha wî li ser matêryalên civandî li Sûryê, sê cild amade kirine. Akadêmîya Ermenistanê, bi tenê cildek ji wan berevokan bi navê (Zargotina kurdên Sûrîyê) çap kiriye û hew..

Prof. Celîlê Celîl gelek lêkolînên li ser dîroka kurdan wek pirtûk weşandine ji wan: Serhildana kurdan li sala 1880, Kurd li împeratoriya Osmanyê di nava sedsalîya XIX ya pêşinda", Ji dîroka jîyana kurdan a gelêrî û sîyasî di dawîya sedsalîya XIX-despêka sedsalîya XX", Dîroka têkoşînên kurdan li sedsalîya XIX –XX (tevî çend dîroknasên sovêta berê), „Rewşa têkoşîna kurdan li dewra nûda" (tevî çend dîroknasan).Ev pirtûk vekirî nehate firotin, her tenê dayîre û îdarên zanistî û sîyasî li hemû komarên Sovyêtê û wezarata wergirtin). Ji sedî zêdetir gotarên zanistî li ser cure-cûrên pirsên dîroka kurdan di kovarên zanîyarîyê de li Sovêtê çap û belav kirine.

Ji salên 70-î de, dest bi civandin û lêkolînan kiriye, li ser qewl û beytên êzîdîyan. Di vî warî de jî, bi ser ketiye. Wî dor 200 nimûneyên qewl, beyt û duayên êzîdîyan civandine û cildekî kamil ji 700 rûperî amadekirye. Dor 50 qewl û beyt di du berevokan de weşandiye. Li ser vê jî hinek

Institut kurde de Paris

"Rewşenbîrên" kurd eciz bûne...?! Wekî „Celîlê Celîl bi propaganda dîyanetê mijûle"...

Li ser ola êzîdîyan çend gotarên zanistî, çap kirine û di kovarên zanistî de belav bûne. Baldarya wî li ser sûfîzmê jî heye wek: Hûsêînî Helac, Îbrahîm Edhem, Huceta di navbera erd û esman de û yên mayîn. Du sê nivîsarên wî yên din jî hene hêj çap nebûne. Dema wî li Sûryayê lêkolînên xwe dikirin, destnivîsên kurdî bala wî dikişandin ser xwe, û wiha wî çend destnivîs dane hev wek: (Şêxê Senan) a Feqîyê Teyra, ku bi hunera nezîrîyê (Munazere) hatibû nivîsandin, wî ew destnivîs bi şertên zanistî û berhevdana sê destxetên nû çap kiriye. Ya dinê (Seyfelmulukê) bû a Sîyahpûş, ku nivîsara wî heta hingê nehatibû çapkirin. Wî ew destnivîs ji ser asasê çar nimûneyên cuda-cuda kamil kir û çap kir.

Di gera xwe de, ew pêrgî destnivîsên gelek hilbestên hilbestvanên kurdên ku hîn nehatine naskirin bûye, wî helbestên wan civandine û di berevokekê de, bi navê (Keshkûla kurmancî) weşandine. Têde 70-80 hilbestên nû hene yên 30î zêdetir hilbestvanên kurdan. Pêre jî sê poêm: (Hespê reş ), (şerê Sîsêbanê)û (Dimdim), ku şaxine nû bûn, wî ew ji arşîva destnivîsên lênîngradê peyda kiribûn, û di vê berevokêda belav kirine.

Berevokek (Sêzde rûpelên balkêş ji dîroka kurdan) weşandiye, ku ji her 13 nivîsar-lêkolînên wî ava bibû. Bingehê van nivîsara dokumêntên nû yên balkêş in, ji dîrok û çanda gelê kurdin.

Di karkirina Dr. Celîlê Celîl a zanyarîyî de, zargotina kurdan cîhekî berfire girtye û karê wî bi pêşde biriye, wî tevî birayê xwe profêsorê ûnîvêrsîtêta Sankt Pêtêrbûrgê

Ordîxanê Celîl û xûşka xwe a mûzîkar Cemîla Celîl li ser vê bergehê dora bîst pirtûk-berevokên zargotina kurdan çapkirine, yên ku li ser bingeha zanistyê hatibûn civandin û derskirin û çend pirtûk bi wergera xûşka wî Zîna Celîl hatine wergerandin ser zimanê rûsî û lîtvanî û çap bûne.

Hêjayî gotinêye ku Dr. Celîlê Celîl li ser bingeha bîblîotêka mala xwe, li ser navê bavê xwe, Casimê Celîl Bîblîografîyekî stûr (ji 535 rûpera) ji weşanên kurdên Ermenistanê amade kiriye.

Pirtûkên Dr. Celîlê Celîl bi gelek zimana hatine wergerandin wek: soranî, kurmancî, erebî, turkî, farisî, ermenî, rûsî, lîtwanî, almanî û hin ji wan du car û sê car hatine çapkirin.

Ji pirtûkên herî şîrin ber dilê wî, pirtûka ku li ser serhildana Sêx Ubêydûllayê Şemdînanî ye... Ev pirtûka ku pêşmergên Kurdistanê di salên serhildanê de, di şikeftên çîyayên Kurdistanê weşandibûn û di nav xwe bela di kirin û di xwendin.

Pirtûk-lêkolînên wî yên nû, ku amadene ji çap kirine re gelekin.

Di van salan dawîn de, çalakiyên wî yên zanyarî bi berdewamî, bi zimanê kurdî, rûsî û almanî têne weşandin.

Dr. Celîlê Celîl dibêje: (Karê min yê kurdologîyê belkî zêde bi berhem nebûya, heger atmosfêra mala me ser evîndarî û parastina dîrok, ziman û çanda kurdî nebûye. Di karê me yê zanîyarîyê da dewra mezin a dê û bavê min Casimê Celîl û Xanima Celîl, piştovanîya birayê min Ordîxanê Celîl û xûşkên min Cemîla Celîl û Zîna Celîl gekekî hebû..)

Institut kurde de Paris

Dr. Celîlê Celîl, salên dirêj li Ermenistanê, li hevalbendîya zanistiyê ya, rex sêntral komîtê a partîya Ermenistanê berpirsyarê para kurdzanîyê bû. Hem jî salên dirêj li (Hevalbendîya evîndarên pirtûkê), bûye serokê beşê kurdî. Bi alîkarîya vê hevalbendîyê wî pirtûkeke bîblîografîyayê ya biçûk, bi sernivîsara (Pirtûkên kurdî li Ermenistanê) çap kirye.

Di sala 1979 de, bi pêşnîyara beşa kurdî a akadêmîya zanîyarîyêyê li Bexdayê, ji bona karên wî yên bi nirx û giranbaha di pileya kurdzanîyê de, navê endametiya şerefê (Andam miqaledarê akadêmîya Zanistîya Îraqê) dane wî û birayê wî Ordîxanê Celîl. Hem lî ew andemê PEN klûbê ye û çend salan li serkirdatyia wê de cî girtiye...Her wiha ew andamê înstîtûta kurdî ya Parîsê ye, û andamê hevalbendiya nivîskarên Ermenistanê ye.

Di sala 1994an de, li Vîenayê, tevî çend hevalên xwe înstîtûta kurdzanîyê ava kirine û ji roja damezirandina wê ve û ta roja îro ew serokê wê institutê ye...înstîtûtê heta niha dor 10-12 pirtûkan li ser dîrok, edebyet û çanda kurdî weşandiye.

Institut kurde de Paris

## Bıblıografıya Pırtûkên Dr. Celîlê Celîl:


1. Serhildana kurdan li sala 1880: Moskva 1966. (Bi zimanê rûsî). Her wiha di sala 1979 de bi zimanê erebî û sala 1987. (Bi kurdîya soranî li Bexdad, di sala 1992 an de li Stokholim û di sala 1998 an de li bi Tirkî

2. Çîr û çîvanokên kurdî: Yêrêvan 1971. (Bi zimanê ermenî).

3. Mesele û metelokên kurda: Tevî Ordîxanê Celîl. Moskva 1972. Bi zimanê kurdî û rûsî. Û li Zürixê 1976. (Bi zimanê kurdî).

4. Gulçin. Tevî Ordîxanê Celîl: Yêrêvan 1972. (Bi zimanê kurdî). Her ew. Dihok 1985. Bi tîpên erebî.

5. (Kurdên împêratorya Osmanîyê li nîveka pêşîn ya sedsalya XIX.). Moskva 1973. (Bi zimanê rûsî). Her ew. Kurdekanî împêryatoryatî Osmanî. Bexda 1987. (Bi kurdîya soranî). Her ew. Min tarix el-emarat fi el-embiryetoryet al-Osmanîyet. Dumişiq 1987. (Bi zimanê erebî) Her ew. Anqara 1992. (Bi zimanê turkî. Her ew. Kurdekanî împêryatoryatî Osmanî. Swêdên1996. (Bi kurdîya soranî). Her ew. Kurdehayî Empêryatorî Osmanî. Têhran 1381. (Bi zimanê).

6. Çîrokê cimeta kurda.Tevî Ordîxanê Celîl. Yêrêvan 1974. (Bi zimanê kurdî).

7. (Sîyarê bahozê). Amadeker û werger Zîna Celîl û Algîrdas Alyonîs. Vîlnîûs 1977. (Bi zimanê Lîtvanî).

8. Zargotina kurda. Tevî Ordîxanê Celîl. Cilda I, II. Moskva 1978.

9. Zargotina kurda. Tevî Ordîxanê Celîl. Cilda 1. Yêrêvan 1978.


Institut kurde de Paris

10. Kirdakan gîrki Hayastanûm, 1930-1980. (Pirtûkên kurdî li li salên 1930-1980). Yêrêvan 1981. (Bi zimanê kurdî, ermenî).

11. Qisaed min el-folklor el-kurdî. Tevî Ordîxanê Celîl Beyrût 1982. (Bi zimanê erebî).

12. Zargotina kurda. Tevî Ordîxanê Celîl. Cilda 2. Yêrêvan 1982.

13. Nehzet el-ekrad el-siqafîyet we el-qewmîyet (Nihayet el-qurn el- eşir bidayet el-qurn el-eşrîn. (Dumşiq) 1984. (Bi zimanê erebî). Her ew. Jîyana rewşenbîrî û sîyasî ya kurdan (Di dawîya sedsala 19-a û 20-ada). Swêdên Ûppsala 1985. (Bi kurmancî). Her ew. Nehzet el-ekrad el-siqafîyet we el-. (Fî el-qurn el-tase eşir bidayet el-qurn el-eşrîn). Beyrût 1986. (Bi zimanê erebî). Her ew. Hendê sîmayî jîyanî û sîyasî û kultûrî kurd le kotayê sedeyî nozdeyem û seretayî sedeyî bîstemda. Stokholm 1993. (Bi kurdîya soranî). Her ew. Îz îstoriî 351;çestvênno-polîtîçêskoy jîznî kurdov v kontsê XIX- naçalê XX vv. Sankt-Pêtêrbûrg 1997. (Bi zimanê rûsî). Her ew. Bujaneweyî roşenbîrî û neteweyî kurd. Kotayîyê sedeyî nozdeyem-seretayî sedeyî bîstem. Suleymanî 2000. (Bi kurdîya soranî). Her ew. Kurd aydinlanmasi. Stenbol 2001. (Bi zimanê turkî).

14. Gulançkzêrîn. Zargotina kurda. Tevî Ordîxanê Celîl. Yêrêvan 1984.

15. Zargotina kurdê Sûryaê. Poêzîya. Yêrêva 1985. Her ew. Bi tîpên latînî. Swêdên, Uppsala 1989.

16. Têkoşîna kurda li dema nû û nûjenda. Tevî hevkara). Moskva 1987. (Bi zimanê rûsî). Her ew. Yênî ve yakin çaxda kürt hereketî. Swêdên 1991. (Bi zimanê turkî). Her ew. El-hereket el-kurdîye fî el-etr el-hedîs. Beyrût 1992. (Bi

Institut kurde de Paris

zimanê erebî). Her ew. Yênî ve yakin çaxda kürt sîyaset tarîhî. Stenbol 1998. (Bi zimanê turkî).

17. Avsûnên kurdî. Tevî Ordîxanê Celîl û Zîna Celîl. Vîlnyûs 1987. (Bi zimanê lîtvanî).

18. Kurdên Ermenistana Sovêtîyê. Bîblîografîya 1920-1980). Yêrêvan 1987. (Bi zimanê kurdî, ermenî û rûsî).

19. Çîrok lêgênd û efsûnên kurdî. Tevî Ordîxanê Celîl û Zîna

Celîl. Moskva 1989. (Bi zimanê rûsî). Her ew, (parçek). Mixtarat min asatîr û hikayat şerqîye. Heleb 1996. (Bi zimanê erebî)

20. Mesele û metelokê gelê kurda. Tevî Ordîxanê Celîl. Yêrêvan 1991.

Her ew. Wîen 2005. (Bi tîpê latînî).

21. Çîrokên kurdî. Tevî Ordîxanê Celîl. Frankfûrt 1993. (Bi zimanê almanî).

22. Destanên kurdî. Tevî Ordîxanê Celîl. Stenbol 1994.

23. Zargotina kurdan. Tevî Ordîxanê Celîl. Cilda I. Swêden, Bromma 1995.

24. Dîwaro terame – bûkê, tu guhdar be. Hewlêr 1999. Her ew 2000. (Bi zimanê turkî û kurdî).li Stenbolê.

25. Avtobîografîya Ebdulrizaq Bedirxan. Berlîn 1999. Her ew. Dihok 1999. Her ew. Biqet zu'e min mezkerat Ebdulrizaq Bedirxan. Bêrlîn 2000. (Bi zimanê erebî). Her ew. Abdulrizaq Bedirxan Otobîyografya.

Îstanbûl 2000. (Bi zimanê turkî û kurdî) ,Her ew Bîreweriyê Bedirxan. Hewlêr (2001). (Bi kurdîya soranî).

26. Sîyapûş, Seyfulmuluk. (Dastan). Wîen 2000. (Bi tîpên latînî).

Institut kurde de Paris

27. Sîyapûş, Seyfulmuluk. (Dastan). Wîen 2000. (Bi tîpên erebî).

28. Sêzde rûpelên balkêş ji dîroka gelê kurd. Wîen 2002.

29. Feqîyê Teyran şêxê Sen'anîya. (nezîrîye). Wîen 2003.

30. Keşkûla kurmancî. Sedsalîya X-XX. 2004.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# Hemza Begê Miksî
## ( - 1958)

*(Qehremanek ji pêşengê rewşenbîrên gelê min)*

Hemza begê Miksî (Hemza Beg kurê Hacî Bekir)qehermanekî pêşeng bû di nav gelê kurd de. Eger navê vî lehengî hinekî di nav tariya salan de mabe jî, lê her ew wek zêrê zer e, çendîn sal di ser navê wî re derbas bin, navê wî nayê zingar kirin, her û her wê navê wî bi nirx û biha di nav dilsoz û wefadarên gelê kurd de bimîne.

Di destpêka çerxa 20 an de Hemza Beg yek ji pêşengên rewşenîrê gelê kurdan bû li Stenbolê. Wî jî wek hevalên xwe gelek kar û xebat di avakirina komeleyên pêşîn de li Stenbolê kir û wiha tev jiyana xwe bi wefadar û dilsozî di rêka Kurd û Kurdistanê de xerc kir.. Ciwaniya xwe di mişextî û zîvariyan de derbas kir.. Dûrî xizm, dost, heval û hogirên xwe buhirand, ji bil ku çend salên giring ji ciwaniya xwe di zindanên Kemalîstan de derbas kir..

Hemza Beg yek bû ji rojnamevanên kurd yên sereke, wî gelek kar û barên giran ji gelê xwe re pêşkêş kirine. Di destpêka sala 1918 an de yekemîn rojnameya kurd/tirkî bi navê **JÎN** li Stenbolê weşandiye, hem jî dîbacak bi nirx û biha di gel Mem û Zîna Ehmedê Xanî çap û belav kiriye.. Hin dibêjin ji bo çapkirina vê pirtûkê hatiye girtin û hin dibêjin ji bo rojnameya Jîn e û hin dibêjin ji bo bizav û çalakiyên wî, yên bêrawestan bi dûv pêkanîna prensîbên serokê Amerîkî Welson de hatiye girtin..

Di baweriya min de Hemza begê Miksî di sala 1928 an de ji zindanê hatiye der û yekser berê xwe daye nav kurdên

Institut kurde de Paris

Binxetê, mîna Dr. Ehmed Nafiz beg Zaza û birayê wî Nûreddîn Zaza, mîna Arif beg Abas, Osman Sebrî, Qedrî beg û Ekrem beg Cemîl paşa...û li suriyê bûye endam di civata Xoybûnê de, ewa ku di sala 1927 an de li Beyrûtê hatibû damezirandin û ji encamên wê, şoreşa Agirî bi serkatiya Ihsan Nûrî paşa ala kurdistanê li ser çiyayên Araratê bilind kiribû..

Di sala 1930/1031ê de, piştî têkçûna şoreşê, li ser daxwaza hikumeta tirkiyê, hikumeta Fransî ya ku li suriyê desthilat bû dest datîne ser Hemza beg jî di gel Mîr Celadet Bedirxan, Dr. Ehmed Nafiz, Memdûh Selîm, Nûreddîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrî Can, Qedrî û Ekerm beg Cemîl paşa, Haco axa, Mustefa û Bozan Şahîn...û tev li Şamê xistine bin rûniştina zorê de..

Di sala 1932 an de, Hemza beg ji rex desthilatdarên fransizan ve dibistanekê li Eyndîwerê, di binya bajarê Cizîra Botan de vedike û zarokên kurdan fêrî ilm û zanînê dike, ew yekemîn dibistan bû ku di wê herêmê de tê vekirin, hem jî di wê hingê de Dr. Ehmed Nafiz pêre kilînîkekê li wir vedike.. û di nav kurdên Cizîrê de dibe wek gerînendayekî ji kovara Hawarê re û propagende ji zimanê Kurdî re dike..

Di sala 1940 an de dibe edîtorê yekemîn dibistana fermî ya herî bilind di bajarê Hesekê de li parêzgeha Cizîrê.. Di sala 1943 an de dibe berpisyarê dibistanan û zanînê di tevî parêzgeha Cizîrê de û di wê salê de gelek mamostayên kurd ji Şamê têne Cizîrê dibin mamostayên zarokên kurdan, (hêjî hin ji wan saxin)..

Li dor jinenîgariya wî; min gelekî da ser şopa vî lehengê kurd, min ji gelek kesan pirsî, belê mixabin, kesî tu

nûçeyên wiha hêja nizanî bû. Bi tenê ji min re hat gotin ku jina wî tirk bû, zarok jêre çênedibûn, bi gelek zimanan dizanîbû. Bêtir bi van kesan re dida û distand: Mîr Celadet Bedirxan, Dr. Kamîran Bedirxan, Memdûh Selîm beg Wanli, Dr. Ehmed Nafiz, Dr. Nûredîn Zaza, Qedrî û Ekrem beg Cemîl paşa bûn..û hin xiristyan û ermen hebûn..

Ew di roja 15 Remezana 1377 an koçî de, li bajarê Hesekê, di mala xwe de çû ber dilovaniya Xwedê, anko roja (05/04/1958) û li ser dazwaxa wî, ew li gundê Dugirê, di nav goristana welatparêzên kurdan de hatiye veşartin.

Gundê Dugirê li bareşî Qamişlo ye bi dor 27 K.M an, ji welarparêzên kurdan yên ku di vê goristnanê de hatine veşartin: Hacî Mûsa begê Xuwêtlî, Dr. Ehmed Nafiz beg Zaza, Arif beg Abbas, Haco axa, Silêmanê Abbas Axa, Dr. Qasim Miqdad Cemîl başa, Ebdulrehman axa Eliyê Ûnis, Hesen axa Haco...

Wek ku diyare, Hejarê Mukiryanî yek ji helbestvanên komara Mehabadê bû, piştî herifandina komarê reviyabû, xwe li nav Kurdên suriyê, li bajarê Tirbespiyê girtibû û lê dijîya.. Di sala 1958 an de dema ku Hemza begê Miksî çû ber dilovaniya Xwedê, rehmetî **Hejarê Mukiryanî** ev nivîsandin li ser kêla ber serê wî nivîsand:

**Mamose Hemza beg**
**Rehberê fidakar !**
**Pir kes ji xew te kirine hişyar**
**Raze bi xoşî bes menale**
**Peyman elê me ew hewale**
**Rojî ku welat bijî bibînim**

Institut kurde de Paris

## Ez mijde bi xo bo te bînim

15 ê Remezana 1377 Koçî
05/04/1958 Zayînî

Hêjaye gotinê ku gora Hemza Begê Miksî di goristana gundê Dugirê de di rewşeke xerab de bû; kêlên wê hatibûn şikenandin, kevirên li dor tirba wî hatibûn belawela kirin û bi zor dihat nas kirin.. Ew jî mîna pirraniya gorên welatparêzên kurdan di wê goristanê de, ku hina bi mebest ew gor xera dikirin..!! Jixwe gora Hacî Musa Begê Xuwêtlî êdî kes nema cihê wê nas dike..! Ji berî çend salan ve partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê(Yekîtî), gora Hemza Beg restore kirin.. Em jî ji dil spasiya wan dikim.. Xwezî hina ji dewlimendên Kurdan gora Hacî Mûsa Begê Xuwêtlî jî nûjen kiribana.

Institut kurde de Paris

# Mihemedê Seîd Axa Deqorî
## (1928 - 1960)

### Lehengê Sînema Amûdê

Wek ku diyare di roja 13/11/2010 an de, **50** sal **di ser** şewata sînema Amûdê re derbas dibe. Ew sînemeya ku di roja 13/11/1960 î de, **280** zarokên kurd têde hatin şewitandin û ku îsal 82 sal di ser roja jidaykbûna lehengê wê, **Mihemedê Seîd Axayê Deqorî** re dibuhire. Bi min xweş e ku ez jî bi van çend gotinan beşdariyê di 50 saliya şewata sînema Amûdê de bikim.

Belê, bi vê helkeftinê, pêwîste ku em lehengê wê Mihemedê Seîd Axa jî bibîr bînin, çiko mirov nikare li dor bûyera sînemê raweste, bê ku navê wî jibîr bike .

Ew di sala 1928 an de li Amûdê ji dayka xwe re çêbûye. Di eynê salê de, sînor bi rengekî fermî di navbera **Serxetê û Binxetê** de hatiye danîn û fransîzan Cizîr bi tevayî dagirkirine. Di sala 1937 an de Amûdê bi firokên Fransîzan hatiye şewitandin û bavê wî Seîd Axa ji Amûdê revyaye, xwe li çiyayê Şingalê girtiye û xelkên Amûdê derbiderî mane... Ji wê hingê ve ji Amûdê re tê gotin **(Amûda Şewitî) an Amûda Bavê Mihemed** ..

Institut kurde de Paris

Mihemedê Seîd Axa, biçûkaniya xwe li Amûdê wek ya tev xelkên wê derbaskiriye û çîroka evîndariya wî bi ciwneke Kurd re, bûye perçak ji folklorê kurdî ..

Di êvara roja 13/11/1960 î de, ango ji berî 50 salî, **Mihemedê Seîd axa** li çayxaneyeke Amûdê rûniştî bû, jêre gotin: Agir bi sînemê ketiye (Ya ku tekane sîneme li Amûdê bû).. Hingî ji cihê xwe çem bû û berê xwe da sînema malwêran.. Êrîşî nav rivîna agirê sînemê kir û bi dehan zarok derxistin... Hina jêre got: Va kurê te Fehed ji sînemê derketiye, tiştek pê nehatiye... Wî li wan vegerand û got: **Tev zarokên min in**.. û bê hedan û rawestan, zarok ji nav rivîna agirê dojeha sînemê rizgar kirin... Ta ku stûnek agirî ji banê sînemê bi serde hat xwarê û canê wî jî, tevî canê wan 280 zarokên kurdan çû bihişta rengin.. Hêjayî gotinê ye ku Fehed kurê wî yê tekane ye.

Rehmeta Xwedê li canê wî û canê tev şehîdên Kurdistanê bibare.

Institut kurde de Paris

# Mihemed Arif Cizîrî
## (1912-1986)

Bêguman her miletek bi navdarên xwe tê naskirin û dîroka gelan li ser pişta navdaran tê nivîsandin, çi di warê şer û cengê de be û çi di warê zanîn û pênûs û xamê de be. Mihemed Arif Cizîrî jî yek ji wan navdarên me ye. Di heyamê ku zimanê kurdî qedexe bû, kesî newêrîbû bigota ez kurd im, wî, li seranserî 50 salî, jiyana xwe ji bo gotin û awazên strana kurdî a orjînal terxankir û di wê navê re gelek ji folklorê me ji talanê parast.. Erê ew bû yê ku di mercên dijwar de, bi dûv gotina kurdî ya resen de dibeziya, ew gotin di tûrêkê xwe de diparast û tovê wê di nav gel de belav dikir.

Sebaretî min û Mihemed Arif Cizrawî dikarim bibêjim; her ku bîna min teng dibe û xwe di nav tenêtiyê de dibînim, li kovara **Hawarê** a mîr **Celadet Bedirxan** an li dîwana **Melayê Cizîrî** vedigerim û pêre jî li dengê **Mihemed Arif Cizîrî** guhdarî dikim.. Bi wiha xwendin û guhdarîkirin re bêhna min derdikeve û ew tenêtî û valahiya ku ez têde, ji hev belwela dibe.

Erê, eger bi xwendina Hawarê re ez sexletên nû di nivîsandinên pêşengên toreya kurdî ya nûjen de dibînim û bi xwendina Melayê Cizîrî re kûr û dûr diçim û pêre ala hezkirina **Selma**yê bilind dikim. Lê bêguman ez bi guhdariya deng, awaz û gotinên stranên Mihemed Arif Cizîrî

Institut kurde de Paris

re li gelî, zozan û çiyayên Kurdistanê digerim û wiha bîna min fireh dibe, canê min rehet dibe û careke din li normaliya xwe vedigerim.

Dilşad û kêfxweş dibim ku di bîranîna 25 saliya koçkirina hunermendê kurd yê gewre Mihemed Arif Cizîrî de, wî bi van çend gotinan bibîr bînim û dilê xwendevanên zimanê kurdî û evîndarên stranên wî xweş û geş bikim.

Wek ku diyar e Mihemed Arif Cizîrî di roja (17/12/1986)an de li Kurdistana başûr, bajarê Duhokê çûye ber dilovaniya Xwedê û di roja 17.12.2011 an de 25 sal di ser koçkirina wî re derbas dibin.

**Mihemed Arif Cizîrî** an **Cizrawî** evê ku ji berî 99 salan ve (**Havîna1912**), li bajarê **Cizîra Botan,** taxa **Mîr Elî,** çav bi gewrika dinyê ketiye, wî jî wek tevayî zarokên Cizîra Botan, ji bav û kalên xwe, çîroka **Memê Alan** û serboriya mîr **Bedirxanê Azîzî** û kurên wî sehkiriye û li gor biryara mîrê Cizîra Botan livyaye.. Ew biryara ku Mîr pêwîst didit ku, her kurdek ji danîştiyên Cizîra Botan qesîdeyekê an stranekê zanibe..

M. A Cizîrî di cenga cîhanî ya yekemîn de (1914-1918), wek zarokekî ji bajarê Cizîra Botan, ji dê û xizmên xwe serwextî mişextiya Mehcirên **Hesenan û Heyderan** bûye, dema ku di Cizîrê re, ber bi deşta Hesinan û deşta Mêrdînê de derbas dibûn.. Hem jî gelek çîrokên kuştin, ferman û bidûrxistina kurd û ermeniyan bihîstiye û bavê wî yek bû ji wan kesên ku, di **Seferberlika** cenga cîhanî a yekemîm de

Institut kurde de Paris

çûn şer û nezîvirîn.. Di gel ku Mihemed Arif di wî heyamî de, di wê zaroktiyê de feqîrtî û hejariyek zor mezin dîtiye, ku xelkê têr nanê garis nedixwar..

Wiha Mihemed Arif di Cizîra Botan de, di wî hejariyê de, li gor irf û adetên Botan, zaroktî û naşîtiya xwe derbaskir û serwxtî pêmayê bav û kalan bû û pêre mezin bûn.

M. A Cizîrî di jiyana xwe de, di gelek qunaxên çetîn û dijwa re derbas bûye, piştî têkçûna şoreşa Şêx Seîd Efendî bi tewana şoreşê, çar sal ji temenê xwe di zindana Amedê de derbas kirine, ta ku di sala 1928 an de, di nav lêborîna giştî de hatiye azad kirin û zîviriye Cizîrê.. Dibe ku di zindanê de û peyre li Cizîrê dest bi dengbêjiyê kiribe, nexasim akam û bandora dayika wî ya stranvan gelekî lê hebû û gelek sûd ji stranên dayika xwe wergirtine..

Piştî ku li Cizîrê, rê lê teng bûye, berê xwe daye herêma Badînan, bajarê Zaxo, belê lê dirêj nekiriye, pêlekê lê maye û çûye Duhokê, bûye ji akinciyên wê û wek sinetçî lê kar kiriye, pêre jî stran di koçk û dîwanên axaler û begleran de gotiye ta ku rewşa wî hinekî pak bûye, hingê ji nû, ji xwe re li Duhokê dikanek wek restorantekê vekiriye.

Di sala 1949 an de berê xwe daye Bexdayê, di Radyoya Bexdayê, beşê kurdî de, dor 100 stranî tomar kiriye, hem jî çav bi Almasxan, Hesen Zîrek, Resûl Gerdî, Tahir Tewfîq, Meryemxan û Elî Merdan û yên mayî ketiye û dostaniya wî bi wan re çêbûye.

Institut kurde de Paris

Di baweriya min de bi çûna Bexdayê re qunaxek nû û berfireh li pêş M. A hatiye vekirin û nav û dengê wî di Kurdistanê de belav bûye, nexasim bi van stranan: Çûme Ûrfayê, Bavê Seyro, Xezal-Xezal, Xerabo, Derwêşê Evdî, Eyndîwerê Paytexte, Yar Dilo, Pismamo, Ez Xezal im, Bêrîvanê, Koçerê, Çiyayê Şingalê, Eyşana Elî.. hwd.

Xweş tê bîra min, di sala 1968 an de ez di qunaxa amadeyî de bûm, dema ku M. A Cizîrî hat Qamişlo nav kurdên **Binxetê** û li seyrangeha **Gerbîs** ahengek gerand.. Di wê ahengê de dilmanî ket navbera kurd û ermenan de, li ser mêvandariya wî û dawî bû mêvanê ermenan, kurdan jî li xwe nexweş anî û dilê xwe jê girtin.. Di wê ahengê de gelek stranên xweş gotin.. Ew hatina wî ketiye bîranînên xelkên Qamişlo de.

Sebaretî sehkirina min ji navê M. A Cizrawî re, li berî vê dîrokê vedigere. Min, ji bavê xwe navê wî dibihîst, bavê min yek ji evîndarên guhdariya stranên wî bû û bi taybetî strana (**Bavê Seyro**), car caran, ev stran di ber xwe de dinihirand û di ber xwe de distira.. Ez jî, jê fêrî awaz û gotinên wê bûme û hin caran ez ji xwe dinihirînim.

Di dawiya gotarê ez ê gotinên stranê ji xwendevanên birêz re binivîsim. Di sala 1973 an M. A Cizrawî, di gel şagirtê xwe Îssa Berwarî di Qamişlo re derbasî Beyrûtê, nav kurdên **Libnanê** bûn. Li Beyrûtê bi Seîd Yûsiv, Îssa Berwarî û Gulbihar re ahengekê di sînemeya **Rîvolî** de ji kurdan re lidarxistin..

Institut kurde de Paris

Di baweriya min de Mihemed Arif Cizîrî dibistanek bi serê xwe ye, mirov dikare bibêje; **Dibistana Mihemed Arifê Cizîrî** û ji şagirtên wî jî, mirov dikare van herdû navan berî gelek navên din bîne ziman: **Îssa Berwarî:** (1933 Mûsil - 2002 Mûsil) û **Tehsîn Taha:** (1941 Duhok –28/05/1995 Holenda û di roja 04/06/1995an de termî giha Kurdistanê, ew li Amêdiyê hatiye veşartin). Jixwe **Meryemxan** (1904 – 1949), eva ku ji pêşengên jinên kurd yên hunermend e, ew dibistanek bi serê xwe ye.

Dengê **Mihemed Arif Cizîrî** dengekî nêr e, dengê mêraniyê ye tevî ku stranên evîndariyê jî dibêje lê mêranî ji dengê wî difûre. Mihemed Arif Cizîrî bilbilê çiyayê Botan û Badînan bû.. Di dijwartirîn rojên çetîn û dijwar de ku di ser Kurdistanê re derbas bûn, mayîn û têldirî dinav de hatin danîn û ji hev perçe bû, wî bi dengê xwe sînor derbas kirin û Kurdistan yek perçe hişt. Hem jî bi saya wî gelek stranên me ji windabûnê hatin parastin û gelekan ji dengbêjên me dane ser şopa wî.. Sed rehmet li giyanê wî di goristana Duhokê de bibar.

Evin çend firdik ji gotinên strana **Bavê Seyro** ya ku bavê min ji Mihemed Arif fêr bibû û car caran ji xwe re dinihirand û di ber xwe de digot, ez jî, jê fêr bûme û carna ji xwe re dinihirînim:

Li min lo lo li min lo lo li min lo lo

Li min lo lo Bavê Seyro..

Min Bavê Seyrana xwe dî li ser bênderê

Institut kurde de Paris

Kum û kolozê xwe xuar kiriye

Pala xwe daye cencerê

Ez terka Bavê Seyrana xwe nakim

Heta li ser sînga min karê, karxezalê

Bibe zîqîna vê xincerê

Li min lo lo Li min lo lo..

Li min lo lo.. Bavê Seyro..

Neqeba min û bavê Seyro tak dîware

Pînkê lêxe bîne xware

Sîng û berê min karê, karxezalê

Tiberka mala bavê Kale..

Li min lo lo li min lo lo..

Li min lo lo Bavê Seyro..

Erê ezbenî dem bi dûv me de dibeze.. Em jî ji ber baz didin, ta ku em li hev rast bên, li hev biterpilin û bibêjin em hev nas nakin.. Em li stranên Mihemed Arif Cizîrî guhdarî dikin, ew dengê nêr, ku çiya, zozan û geliyên kurdistanê tîne ber çavên mirov, dema ku strana Eyşana Elî, Xerabo, Bavê Fexro û Gula Etrûşî dibêje:

Gulê mehrûmê, çiya bilind in.. Gulê.. Berfê spî kir..


Welle malxerabê, çawa qaz û qumriyan lê hêlîn çêkir..

Gelî gundiyan û cîranan, Gula Etrûşî ya min bû..

Institut kurde de Paris

De çawa bi xelkê şû kir..

Erê ezbenî! Bi guhdarîkirina stranên Mihemed Arif re, dem xwe dide alî û winda dibe.. Sînor xwe ji nav nifşan vedidize û nebedî dibe.. Û wiha her tişt disekine; rojên îro, sibe û doh tev disekin in.. Erê, dem disekine bi tenê gotin dimîne.. Gotina dîroka kul û derdan û kêf û şahiyan dimîne.. Xwe eşkere dike ku ew, siltanê demê ye.. Erê ezbenî, gotin siltanê demê ye..



Institut kurde de Paris

**Wêne:** Ji milê çepê ber bi rastê ve: Welatparêzê Kurd Abdullah Misto ji Qamişlo, Mihemed Arif Cizîrî, Seîd Yûsiv û Îssa Berwarî. Wêne di sala 1973 an de li Libnanê (Beyrûtê) hatiye kişandin.

Qamişlo, 01.12.2011

# Melayê Cizîrî
## (1407 - 1481)

*Şêx Ehmedê Şêx Mihemedê Cizîrî*

Şêx Ehmed bi navê (**Melayê Cizîrî**) di nav gelê kurd de hatiye naskirin,ew helbestvanekî zor bi nav û denge. Helbestên wî mîna ayetên Quranê ne di kûrbûn û firehbûna wateya xwe de.Hezkirin û evîndariyek bilind ji nav gotinên helbestên wî difûre,hevgirêdana gotinan di helbestên wî de mîna libên tizbiyê, bi dûv hev de rêz dibin,û wek ava çemê Dicle diherikin.

Sebaretî me kurdan û zimanê kurdî, dîwana helbestên Melayê Cizîrî ji me re mîna dîwana helbestên (**Hafizê Şîrazî** )û dîwana (**Fazilê Camî**) ye di zimanê farisî de,û dîwana (**Kurê Farid**) di zimanê erebî de û dîwana (**Fidalî** )di zimanê tirkî de,ji ber huner,pîş û saziya herî bilind ku têde bi kar aniye û bêjeyên ji çend zimanan di nav zimanê kurdî de bi bi rengekî profîsyonale hunandiye,û bi rengekî qubebilind hestê xwe yê giyanî ji evîna **Selma**yê ,ji evîna Xwedayî û sofîtiyê deraniye...

Belê mixabin ji ber ku dîwana wî zû nehatiye çapkirin,gelek destan pê lîztiye,û her yekî li gor kêfa xwe gotin û hevokên wê guhertine,û wiha di ser 350 salî re dîwana helbestên Cizîrî, toşî pêlîstin,guhertin û talanê bûye,

Institut kurde de Paris

ta ku di sala 1958 an de Mele **Ehmedê Zivingî** (Miftiyê Qamişlo yê berê) û bi alîkariya **mele Abdulselam Nacî** yê Botî, ji nû dîwana wî bi şirovekirineke bedew berhevkiriye û daye çap û belav kirinê bi navê(**Ristika Cewheran di Şirovekirina Dîwana Melayê Cizîrî de**).

Navê wî Şêx Ehmed e,hem jî bi naznavê (**Nîşanî**) di hin helbestên xwe de diyar kiriye,Bi wateya (Nîşan) ango ew wek mertal bû ji tîrên evîn û hezkirinê re.Navê bavê wî **şex Mihemed** e bi koka xwe ji hoza **Bextiyan** in di herêma **Botan** de.

Gelek dîrokzanan jiyana wî û heyamê ku têde jiya ye ne wek hev nivîsandine,belê mele Ehmedê Zivingî yê ku dîwana wî di sala 1958 an de çap kiriye,vê yekê zelal dike ku ew di sala 1407 an de li bajarê Cizîra Botan ji dayik bûye,di destpêkê de li ber destê bavê xwe şêx Mihemed xwendina seretayî di Qurana pîroz de xwendiye ,û di pey re xwendina bilind li Amedê,Hekarê û Amadiyê xwendiye û wiha ta ku teza xwe di warê zanîna olî de li gundê (**Strabas**) nêzîkî Diyarbekirê, li ser destê **mele Taha** wergirtiye.Di pey re bûye melyê gundê (**Serba**)di eynê herêmê de,û paşê li bajarê Eskîfê (Hesenkêfê) akincî bûye û gelek mele ji ber destê wî derketine..Hin dibêjin li Eskîfê evînek Xwedawendî pêre çêbûye û dûrî mijûbûna zanîna beyan(**Zahirî**) bûye,tev mêla wî ketiye ser zanîna nebeyan de(**Batinî**),û di rengê dînekî de vegeriya ye bajarê Cizîra Botan û lê bi cih û war bûye,ta ku çûye ber dilovaniya Xwedê bi texmîn di sala 1481ê de,û ew di qebokê de,di rex medeseya Sor de hatiye

Institut kurde de Paris

veşartin.Roja îro gora wî cihê serdana keç û xortên bajarê Cizîrê ye û bi navê ziyareta şêx Ehmed tê naskirin.

Hin dibêjin ku, ew hevçerxê **mîr Şeref Xan e kurê mîr Evdalê Azîzî** bû ewê ku mîrê Cizîra Botan bû ,li gor ku **Şeref Xan Bedîsî** di **Şerefname**ya xwe de behis dike di sala 1596 an de ,û mîr Şeref Xan e yê ku **Medreseya Sor** di rex sûra Cizîrê de, ji baxerb ve avakiriye ,û gelek gund û zevî ji vê medreseyê re terxan kirine ji bo xerciya mamostayên Medresê û şagirtên wê.Çiko xwendin, razan,xwarin,û vexwarina wan ji kîsê medresê bû.Bê guman ,piştî ku Melayê Cizîrî ji Eskîfê zîvirîye Cizîrê, bûye mamoste di wê Medresa Sor de,û gelek melayê pehlewan ji ber destê wî derketine.

Tê gotin ku, li wir hez keçekê kiriye bi navê (**Selma**)an(**Sitiya bisk kesk**)ji malbata Azîzan û gelek helbest di evîndariya wê de nivîsandine,û dibêjin ku her roj diçû nav goristanê, reserî koçka Selmayê ,pişta xwe dida kêlekê û helbest di pesnê Selmayê de di hûnandin. Dibêjin, ew kêl ji heyecana evîna di hinavê Melayê Cizîrî de disincirî, pîrek jî ferî wê kêlê bibû her ku mela dizîvirî wê hevîrê xwe bi wê kêlê ve vedida...Hêjî ew kêl diyare li ber çavan di hewşa medreseya Sor de,di serdanekê de şanî min dan..

Di van çend malikên xwarê de, ji nizma malayê M. Cizîrî di pesinê mîrê Cizîra Botan **Mîr Şeref Xan** de, xweş diyar dibe ku Cizîrî di mederseya Sor de mamosteyî

Institut kurde de Paris

kiriye hem jî ku navê Kurdistanê bi kar aniye:

**Xef wan reşandin dilxweding**

**Teşbîhên tîrên mîr Şeref..**

Di cihekî din de wiha dibêje:

**Ne tenê Tebrîz û kurdistan li ber hukmê te bin**

**Sed wekî şahê Xurasan defrewarê te bin..**

Hem jî wiha gotiye:

**Tenha ne kurdistan didin**

**Şîraz û Yeng û Wan didin**

**Her yek li ser çehvan didin**

**Ji Espehan têtin xerac..**

**Min ev helbest ji dîwana wî bijartiye wek diyarî ji Xwendevanên zimanê Kurdî re,bi hêvîme ku cihê razûbûna wan be.**

*Xelkno li min kin şîretê* *Ew dilbera zerîn kemer*

*Min dî di halê xifletê* *Hat der ji burcê wek qemer*

*Hat der ji burc û penceran* *Dil girt û da ber xinceran*

Institut kurde de Paris

*Ev renge halê dilberan lew aşiqan xûn bû ceger*

*Qelb û ceger min bûne xwîn Lora ku nû derbûn birîn*

*Ay can were halêm bibîn Wer rûh ji qalib bîne der*

*Canê min erba ser cesed Mizgîn bi afaqan resed*

*Alem hemî pê bin hesed Însan û cin û canewer*

*Alem hemî têk bûne sef Seyrên li şahê min bi xef*

*Hatin temaşa car teref Şatir xumar tayên diber*

*Hat patîşahê pir sipah Qamet elîf dêm şibih mah*

*Dad û meded sed ah û ah Zilf û eqarib têne ser*

*Gez tême xelkno eqrebê Mestim ji şewqa xebxebê*

*Îro eqarib hate xwar Çû nêv baxê guledar*

*Ew bexçeya her lê buhar Lo bilbilan lê qal û şer*

.... ...... ...... ......

Institut kurde de Paris

# Malbata Cemîl Paşa Diyarbekirî û Dr. Qasim Miqdad Cemîl Paşa
## (1932 – 1992)

Çendî min dixwest ez jî beşdariyê di **Festîvala Rêzgirtina Neteweyî bo binemala Cemîl Paşa yê Diyarbekirî li Hewlêra paytext** bikim, lê mixabin ji ber gelek sedeman, ew derfeta zêrîn bi dest min neket.. Erê derfetek zêrîn bû sebaretî min.. Min di dixwst neferên vê binemala dêrîn ji nêzîk ve nas bikim û nexasim li Kurdistana azad.. Tevî ku ez gelek neferan ji wan nas dikim, ji yên ku li Binxetê dimînin.. Di vê dema dawî de, min du hevpeyvînên xweş bo KurdistanTV amade kirine. Yek bi **Jala xanim**, keça Ekerm beg Cemîl paşa re ye û ya din bi **Mistefa beg**, kurê Mihemed begê Cemîl paşa re ye. Belê navê min di progiramê festîvalê de hebû û kêfxweş dibûm ku bi mamoste **Malmîsanij**, **Dr. Kendal Nezan**, **Perwîn xanim**, **Verda xanim** û yên mayî re, têkevim dabaşa malbata Cemîl Paşa Diyarbekrî û em bi hev re kar, xebat û bizava wan di ber kurdewariyê de giftûgo bikin.. Lê mixabin **sînor** bû kelem û ew derfeta zêrîn ji dest min firiya.

Xwendevanên bi rûmet! Ev nivîsîna li xwarê, mijara min bû bo festîvala rêzgirtina neteweyî bo binemala Cemîl Paşa yê Diyarbekirî li Hewlêra paytext. Min Dr. Qasim Miqdad Cemîl Paşa wek nimûne ji vê malbatê ji xwe re bijarti bû, fermo nivîsa min bixwînin.

* * *



Institut kurde de Paris

Ji nav van çend malbatên dêrîn, ku di bajarê Amedê de, ji sedê salan ve dijiyan, wek malbata: Zulfî Zade, Birincî Zade, Hacî Îbrahîm efendî(1 û Cemîl Paşa, ji tevan bêtir malbata Cemîl Paşa nav û deng di nav kurdan de daye û navê bajarê Diyarbekirê, bedena diyarbekirê bi navê wan ve hatiye girêdan û naskirin. Hem jî, ev malbat, di warê xebata kurdparêziyê de hatiye naskirin, nemaze bi van mirovên xwe yên xebatkar û kurdperwer wek: Omer Cemîl Paşa, Qedrî Cemîl Paşa, Ekrem Cemîl Paşa, Wecdî Cemîl Paşa û hin din.

Cemîl Paşa, nevîyê Mehmûd Paşa bû. ji bav û kalên xwe ve li bajarê Diyarbekirê dijiya, lê bi koka xwe ji xelkên (Silopî) bû. Ji ber vê yekê Qedrî Cemîl Paşa, di bîranînên xwe de xwe bi naznavê (Zinar Silopî) daye naskirin. Ji berî 300 salî ve Beden û Birca Diyarbekirê dibin hêza destê vê malbatê de bû, yekî dispart yê din û wiha ta ku dawiya wan Cemîl Paşa û kurên xwe bûn.

Di sala 1847 de, piştî ku sultanê Osmanî, mîrê Cizîra Botan, mîr Bedirxanê Azîzî, dîl û sirgûnî Stenbolê û girava Kirîtê kir, hingê berê xwe da kurdan û bi sed hezaran ji kurdan sirgûnî derdora Anedolê kirin. Û Cemîl Paşa jî li Yemenê kir walî. Da ku ji şer û bela wê xelas bibin û kesên wek Cemîl Paşa nedin ser şopa mîr Bedirxan, ji ber ku têkilîyên Cemîl Paşa û mîr Berdirxan bihev re hebûn û xweşbûn û herêma Diyarbekirê bêtir dibin destê Cemîl Paşa de bû û wiha Cemîl Paşa 30 sal li Yemenê qedandin. Li Yemenê Cemîl Paşa 8 jinên din bi ser dotmama xwe de anîn, ji wan jinan 11 kur û 3 keç jêre çêbûn, 4 kur û keçek ji dotmama wî û 7 kur û 2 keç ji wan jinên din.

Institut kurde de Paris

Piştî ku Cemîl Paşa 30 salên xwe li Yemenê bûrandin, vegerya welatê xwe Diyarbekir û gelek zêr û mal bi xwe re anîn û kurên xwe bi xwendin û zanîn dan, nemaze li Stenbolê û Ewropa, ta ku di sala 1900 de, li bajarê diyarbekirê çûye ber dilovaniya Xwedê.

Di dawiya sed salên 19 an û despêka 20 na de, kurên Cemîl Paşa di nav rewşenbîrên imperatoriya Osmanî de, ji yên sereke dihatin hejimartin, hem jî pir têkilîyên wan bi malbatên kurdperwer re li Diyarbekir û Stenbolê hebû..

Li piştî ku destûrê 1908 an hate deranîn, kurên Cemîl Paşa jî bi welatparêzên kurdan re wek: Bedirxaniyan, Baban û Şemdînan, xebat û bizav kirin, da ku navê gelê kurd wek gelên Yûnan, tirk û Ereb bilind bikin û wiha doza mafê gelê kurd li Sultan kirin.

Di sala 1912 an de " Omerê Cemîl Paşa(2 bi xwendekarên kurd re li Stenbolê, yekemîn komele ji xwendekarên kurdan re bi navê " Hêvî " damezirandin, hingê ew serokê komelê bû, hem jî dostanî bi hin kesên gelên bin dest re danîn wek Ereb, Yunan û Ermenan..

Lê ku em vegirin ser kurê Cemîl Paşa yê din" Qasim " ku dibe kalikê " Dr. Qasim Miqdad " emê binerin ku " Qasim beg " ji kurên Cemîl Paşa yên mezin bû, camêr ne kêmî birayên xwe bû, belê ji gişa bêtir barê mabata Cemîl Paşa bi xwe ve hiltanî û di berde dixebitî. Dîwanxaneya wî di bajarê Diyarbekir de, ji her çar dîwanxanetên din bêtir bi mêvan û dan bû, hem jî welatparêzekî dilêş û xemgîn bû..

Dema serok " Wilson " her 14 bendên xwe di sala 1917 an de li cîhanê belavkirin " Qasim beg " komelek kurdî bi navê " Komela tealî kurdî " di bajarê Diyarbekir de

damezirand, bi alîkariya kurdên welatparêz wek: Dr. Evdella Cewdet, Dr. Fûad Hac Ibrahîm Efendî û Memdûh Selîm Beg .. û gelek şaxik jêre li bajarên rojhilatê vekirin. Hem jî dan û standinek bi komelên Kurdî yên Stenbolê re çêkirin, hingê Qasim Beg hate bijartin ku ew li Stenbolê serokê komelê be.

Lê ku em vegirin ser kurên " Qasim Beg * emê bi nerin ku sê Kurên wî hebûn, Şemseddîn, Ekrem û Miqdad:

**Şemseddîn**: li Siwîsra, bajarê Lozanê, bi bira û pismsmên xwe re xwendina xwe dikir. Dema ku şerê cîhanî yê yekemîn dest pêkir vegerya tirkyê û beşdarî di şer de kir, ta ku di sala 1916 an de giha Dêrazorê û di eynê salê de çûye ber dilovanya xwedê.

**Ekrem**: wî bi birayê xwe re li Lozan dixwend. Di destpêka şerê cîhanî de vegerya Stenbolê û tevî tevgerên kurdan bû. Û pir kar di komeleyên kurdan de kiriye.

Di sala 1919an de, bi mîr Celadet Bedirxan û birayê wî Dr. Kamîran Bedirxan re, di gel mêcer Newêl yê Ingilîzî re li kurdistana bakur geryane, da ku daxwazên gelê kurd nasbikin, berî ku peymana Sîverê bê mohrkirin di na bera hevalbenda û dewleta Osmanî de ..

Di sala 1925 an de, pir têkiliyên Ekrem beg bi Şoreşa Şêx Seîdê Pîran re hebû, bi hilweşandina şoreşê re, Ekrem beg li Stenbolê hate girtin û navî wî hate xwendin bi darvekirinê .. lê bi hêza zêran hate berdan..

**Miqdad**: bavê Dr.Qasim, ji kurên Qasimê Cemîl Paşa yên biçûk bû. Dema ku şerê cîhanî yê pêşîn, herdû birayên wî û pismamên wî ji Ewropa vegryan tirkyê, hingê rê ji ber xwendina wî li Ewropa hate birîn, vêca bavê wî, ew li Diyarbekir û Stenbolê bi xwendi da . lê mixabin, vê dawiyê



Institut kurde de Paris

û bi taybetî piştî şoreşa şêx seîd efendî, cî û war li tirkyê ji ber wan hat girtin, wan jî xweş naskir ku nema bi hêza zêran karin hikûmeta Mistefa Kemal Paşa bixapînin. Hingê jî, Mistefa Kemal paşa navê wan ji Cemîl Paşa guhertibû bi (Cemîl Oglo), vêca ji neçarî Miqdad Beg bi birayê xwe Ekrem Beg û bi pismamên xwe re wek: Qedrî Beg (3, Mihemed Beg (4, Bedrî Beg (5, Wecdî Beg ... hwd, binxetî Sûriyê bûn di Adara 1929 de.

Wiha tev bi zarokê xwe ve, li bajarê Dirbêsiyê û Hesekê kom bûn. Di wê navê re komela Xoybûn li Bêrûtê di sala 1927 ande hatibû dameziran din, vêca tev bûn endamê wê komelê û xwe ji şoreşa Agrî re amedekirin ku ji sînorê Sûriyê ve êrîşî tirkan bikin, lê mixabin ew pilanên wan jî ber avêtî derketin... Di wan salan de eynê sala 1932 an xwedê kurek da Miqdad beg li bajarê Hesekê, navî wî kir Qasim, li ser navê bavê xwe.

Institut kurde de Paris

# Dr. Qasim Miqdad Cemîl Paşa
# 1932 - 1992

Dr. Qasim, biçkanîya xwe li bajarê Hesekê û gundê Tehlikê bûrandiye ta ku temenê wî bûye 8 salî. Hingê bavê wî mala xwe barkirye Şamê, wiha wî xwendina xwe ya seretayî, orte û bilind li Şamê bi dawî aniye. Di ber re jî, fêrî gelek zimanan bûye wek: Erebî, tirkî, Ferensî, Ingilîzî, ji bil ku zimanê kurdî, zimanê axaftina mala wan bû.

Piştî ku xwendina xwe ya bilind di bijîşkiyê de, di zankoya Şamê de kuta kir, vegerya bajarê " Derbêsyê " û lê kilînîkek vekir. Lê pir lê dom nekir û berê xwe da bajarê " Qamişlo " di roja 7ê Adarê de di sala 1963 an, û têde kilînkek vekir û bi şev û roj, êş û nexweşyên gelê Qamişlo û Cizîrê bi derman dida. Wiha " 28 " salan berdewam kir di bajarê Qamişlo de, ta ku çû ber dilovanya xwedê di roja ( 13-10-1992 ) an de.

Di roja ( 14-10-1992 ) an de, bi guhestina termê wî re ji bajarê Qamişlo, ta bi goristana gundê " Dugirê " piranîya netewên Cizîrê, bi Kurd, Ereb, Ermen, Siryan beşdar bûn. Ew li kêleka Dr. Ehmed Nafiz Zaza bi çî û war kirin. Li ser gora wî çend gotin hatin xwendin, di pesin û şarezayiya wî de. Ji gotina dawîn a metran Antiranîk wiha got: ((Dr. Qasim, sembol bû ji hevgirtina netewên Cizîrê re.. Pîroz be ji wî gelê ku ew jê ye..))

Di çil rojiya wî de, tev netwên Cizîrê û girngtirîn kesayetiyên hukûmetê beşdar bûn, di gel dost, heval û

Institut kurde de Paris

mirovên wî yên ku ji Şam û Helebê hatibûn, hem jî gelek gotin û helbest hatin xwendin.

Çima Dr. Qasim Miqdad bi vê rêxistina dûr û dirêj ? gelo ji ber ku bijîşkekî jîr û zana bû..?! An ku ji mala Cemîl Paşa Diyarbekirî bû ?!

Ev tev netêne, bi tenê tiştekî giring li bal peyda dibû, wî tiştî dihişt ku tev dost û hevalên wî jêre temene bibin, ew tişt; mirovantiya bû, wekheviya wî bû, cangoriya wî bû.

Dr. Qasim, xwe di ser kesekî re nedigirt, û kes jî di ser xwe re ne digirtin û qet rojekê ji rojan xwe bi esil û feslê xwe paye nekir, hem jî ne got, ez kurê Cemîl Paşa me, û qet wî pîş bi paşnavê xwe ( Cemîl Paşa ) nekir. Tenê bi navê Dr. " Qasim Miqdad " di hat naskirin.

Dr. Qasim, kes di ser kesî re negirt, ne got ev kurd e, ev Ereb e, ev Ermenîye, ev Siryane, û ne jî ev misilmane an filehe an Yezîdiye .. tev li bal wek hevbûn..

Di şevên zivistanî de, cizme dixist lingê xwe û bi dûv nexweşên xwe de diçû gundan û taxên dûr ji bajêr..

Pere ji xizan û belengazan ne distand, belê pirê caran bihayê derman jî, ji bal xwe ve dida wan..

Mêr bû, ji kesî ne ditirsiya, ne ji Şêx û Keşan û ne ji hêzên dewletê û piraniya wan pêre dost û hevabûn..

Dr. Qasim, merd bû, li malê dinyê negerya, ku geryaba wê niha çend qûnaxên wî hebûna .. ji ber vê merdiyê " 28 " salên xwe yên dawîn, di hotêla " Semîr Emîs " de libajarê Qamişlo bûrandin, bi kurên " Baho " re li bajarê Qamişlo..

Raste jin ne anî, û bê ku bedena wî şîn bibe çû ber dilovaniya Xwedê, wî jî ev yek dizanî ne ku ne dizanî, lê wî tev nexweşên ku diçûn bal wek zarokên xwe di dîtin, û di piraniya wan de di dît ku tiştek ji wan nayê ji bilî çêkirina

Institut kurde de Paris

zarokan pêve, vêca pêwîst di dît ku riya tundiristiyê şanî wan bide, da ku di pêşerojan de saxlem bin, û karibin tiştekî hêjayî ji xwe û yên dora xwe re pêk bînin. Ji ber ku wî raman û xebata rast û durist di beden û laşê saxlem de didît. Ne di yê nexweş de. Vêca dixebitî Ku laşan saxlem bike, ne ku peran bi dehev wek doktorên îro..

Wiha di wê navê de, jin jibîr kir û xwe winda kir di nav bera mirovhezkirinê de û mirov parêziyê de..

Dr. Qasim, pir jîr û zîrek bû, wek me got, hem jî di warê ilm û zanînê de, kêm kes di sûrî de wek wî hebûn, mirov ne dizanî, Dr. Qasim, bijîşke, an dîrokzane an.. Kêm zêde di her warî de xwedî zanîn bû, bi gotina dostên wî yên nêzîk ku ji min re gotin: " **Dr. Qasim Miqdad ansîklopîdyake li ser dû lingan bû..** "

Dr. Qasim di warê kurdayetiyê de ne çav girtî bû, belê bi dû saloxdanên tevgera kurdî de bû, û di salên dawîn de hêviyên wî pir mezin bûn bi welatekî rizgarkirî. Tiştê jê dihat xwestin dikir û Dida.. Mirov dikare wî bixe rêza wan doktorên ku canê xwe gorî xaka kurdistanê kirine wek: Dr. Evdulla Cewdet, Dr. Fûad, Dr. Ehmed Nafiz Zaza û hin din..

Di bawerya min de çi mirovê ku di jiyana xwe de bibûre da ku jiyana kesên li dor xwe xweş û geş bike, ew mirov mêre û çi mirovê ku êş û nexweşiyên xwe jibîr bike, bi êş û nexweşiyên xelkên li dor xwe ve dakeve, ew mirov giranmêre, hêjaye pesn û şabaşan..

Dr. Qasim, yek ji van giranmêran bû, camêr jiyana xwe tevde diyarî gelê " Cizîrê " kir bi tev netewên ku têde dijîn, çi Kurd, çi Ereb, çi Ermen, û çi Aşûrî, û qet rojekê ji rojan li ola mirov ne pirsî, Mislmane an Filehe, an Ezidiye, bi tenê berguhka wî di guhên wî debû, û destên wî jenên nexweşan



Institut kurde de Paris

di hejmartin, wiha bi jîr û zîrekiya xwe raport û lîstên dermanan ji nexweşên xwe re dinivîsandin. Pirê caran nexweşên wî bi dermanên wan lîstan rehet dibûn, bêtir ji dermanên lîsteyên doktorên " Şam " û " Helebê " yên bi teybetî. Sed rehmet li giyanê wî biba re, bihişt cî û warê wî be..

---

**Perawîz û jêder :**

1- Dr. Fûad yê ku li Diyabekirê bi şêx Seîd re hatiye bidarvekirin, kurê Hacî Ibrahîm Efendî ye...

2- ta roja îro zarokên Omerê Cemîl Paşa li dervî kurdistanê dijîn, nemaze li Edirne û Stenbolê wek: Dr. Farûq û Dr. Cemîl û Kemal Sahib..

3 – Qedrî Beg ( Zinar Silopî ): Di sala 1946 an de wek nûnerê Kurdên Binxetê çû Mahabadê bo pîrozkirina Komara Demoqrat, zarok jêre nebûn ew xalê Dr. Qasim bû.

4 – Mihemed Beg di dawiya sala 1992 de li gundê xwe (dade Ebdal ) çû ber dilovanya Xwedê, nuha kurê wî Mistefa Beg li eynê gund dimîne, nêzîkî Serê Kanyê

5 –Du kurên Bedrî Beg li Sûryê dimînin yek Dilawer e, derman xaneyek wî li Helebê ye, yê din Welîde li Şamê akencîye.

6 - Qedriyê Cemîl Paşa ( Zinar Silpoî ) – Doza kurdistan (bîranîn ) Erebî

7 - Dr. Celîlê Celîl: Nehdet elekrad elseqafiye we elqewmiye 1984- bi Erebî

Institut kurde de Paris

8 - Kamîran Haco, dîrok û şax û paxên dara malbata Cemîl Paşa ji devê Dr. Qasim girtibû û nivîsibû, tev dane min ..

9 - Di herdû salên dawîn de têkilyên min bi Dr. Qasim re hebûn, pirê caran min jê dipirsî li dor malbata Cemîl Paşa, wiha ez serwextî gelek nûçeyan bûm.

Institut kurde de Paris

# Aramê Dîkran

## 1934 - 2009

Berî pêlekê li ser daxwaza nivîskarê kurd **Kakşar Oremar** min ev gotarê xwe, di bin navê (**Gurzek Nêrgiz Bo Aramê Dîkran**), nivîsandibû û jêre şandibû.. Belê piştî ku sibeha vê rojê 08/08/2009 min sehkir ku Aramê Dîkran, li Atinayê, paytexta yûnanistanê canê xwe ji dest daye, min hin guhertin di gotarê xwe de kir û navnîşan guhert.. Nemaze piştî ku min xemgîniya li ser dêmê xelkên Qamişlo dît... jixwe wek ku diyar e, navê Cegerxwîn û Aramê Dîkran bi hev re hatine hunandin û bajarê Qamişlo herdu lehengên peyva kurdî a resen di pêsîra xwe re derbas kirine... Vêca pêwîst dibînim ku navê Bajarê Qamişlo jî bê ziman.. A din berî 25 salan dema ku Cegerxwîn di 22/10/1984 an de li paytexta Swêdê mir, xwesteka wî ku li Qamişlo, di hewşa mala wî de, bê veşartin.. Gelo hun zanin ku xwesteka Aramê Dîkran jî ev bû; ku li Amedê(Diyarbekirê) bê veşartin.. Tu dibê qey Cegerxwîn Û Aram Dîkran Qamişlo Û Amed Li hev Parkiribûn..!

Buhiştî Aramê Dîkran di 15/01/ 1934 an de li Qamişlo çêbûye. Ew bi xwe kurê Dîkranê Sakoyê Mêlo ye(Navê wî di nasnameya wî a sûriye de wiha ye; Aram Dîkran Mîlîk), bi eslê xwe ji Ermeniyên herema Farqînê ye. Bapîrê wî Sakoyê Mêlo, berî fermanê mixtarê gundê xwe bû. Ew gundê bi

Institut kurde de Paris

navê Biebda, li navça Pasûrê, ji herêma Farqînê. Di fermanê de bapîrê Aram, Sakoyê Mêlo tê kuştin, bavê wî Dîkranê Sakoyê Mêlo, xwe di nav kurdan de vedişêre, kurd wî diparêzin û wiha jiyana xwe li Farqînê û Diyarbekirê derbas dike ta ku di destpêka salên sîhî de li Qamişlo cîwar dibe.. Û di sala 1966 an de ji Qamişlo diçe Ermenistanê, li gundê Apovyan cîwar dibin.. Li Ermenisanê, Aram çend salan di radyoya beşê Kurdî de wek karmend kar dike..

Dîkranê Sakoyê Mêlo, li Diyarbekirê dizewice û keça wî a meszin Baytzar li wir çêdibe( Temenê wê di ser 80 salî re ye, hêj saxe, mala wê li Brukselê ye, kurê wê Ewadîs hunermendekê zîrek e..). Zarokên wî yên din tev li Qamişlo çêdibin; Aram di sala 1934 an de, Kîvork di sala 1937 an de(Berî çend salan li Belcîka koça dawî kiriye), Serkîs di sala 1940 î de(Hêj saxe, li bajarê Qamişlo dimîne, dema ku malbata Dîkranê Sakoyê Mêlo di sala 1966 an de çû Ermenistanê, bi tenê kurê wî Serkîs li Qamişlo ma..Hingî bavê wî bêriya wî dikir, ev gotin ji aram re nivîsîn û Aram kir stran:

**Çima nayê ez wî bibînim...**

**Rêka min dûre**

**çavê min wî nabîne..**

Hayîk di sala 1943 an de(Niha li Holenda dimîne), Zavînar keça wî a herî biçûke, ew jî li Qamişlo çêbûye û niha li Belcîka ye.

Institut kurde de Paris

Dîkranê Sakoyê Mêlo (Bavê Aram) û seydayê Cegerxwîn dostên hev yên nêzik bûn. Gelek caran Cegerxwîn xwe di mala wan de vedişart... Aram ji biçûkaniya xwe ve hez lêdana amûrên muzîkê wek tembûr û cimbişê kiriye, ango di 15 saliya xwe de wek tembûrvanekî ermenî ku bi kurdî, ermenî û siryanî distrê û di nav xelkên Qamişlo de dihat naskirin.. Di rêka bavê wî re, dostaniya wî bi seydayê Cegerxwîn re çêbû û helbestên wî kirin stran... Hêjaye gotinê ku gelek gotinên stranên Aram yên bavê wî bixwe ne. Wî di hunermendiya xwe a dor 50 salî de, bi kurdî, ermenî, erebî, siryanî, yûnanî û tirkî stran gotine. Belê zêdetir bi kurdî stra ye û wek hunermendekî kurd hatiye nas kirin. Aramê Dîkran; di salên xwe yên dawî de, jiyana xwe li Atînayê, paytextê Yûnanistanê derbas dikir.. Ta ku di roja 06/08/2009 an de, ji ber xwîn dawerivîbûna ser mejiyê wî ket nexweşiyekê ji nexweşxaneyên Atînayê de û di sibeha 08/08/2009 de, jiyana xwe ji dest da.. Belê sed mixabin rayedarên Tirkiyeyê destûr nedan ku li Amedê bê veşartin wek ku wî dixwest... Li ser vê yekê malbata wî biryar dan ku termê wî li Brukselê veşêrin. Û wiha di roja 13-14/08/2009, termê wî birin Brukselê û roja duşemê 17/08/2009 an de, piştî merasimeke layiq pê, ew di goristana Jette de a li taxa "Boulevard de Smet de Naeyer" veşartin. Hêjaye gotinê ku Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr şandek, di gel hin axa ji Amedê bo beşdarbûna termê Aramê Dîkran şand Brukselê û axa Amedê bi ser gora wî de reşandin...

Sê zarokên wî hene, du keç bi navê; Eyçîmîk û Sîvan û kurek bi navê Agob. Ta roja îro birayê wî Serkîs Dîkran

Institut kurde de Paris

Sakoyê Mêlo (Bi navê Bavê Dîko tê nas kirin) û zarokên xwe li Qamişlo dimînin. Bav û diya wî di salên heftêyan de li Ermenistanê koça dawî kirine. Yezdanê gewre tevan bi dilovaniya xwe şad bike. Ev strana xwarê ji gotinên bavê wî ne.

**Hey lê lê wayê gidî bilbilo!**

**Wî bayê lêxist hêlîn tev xirakiro**

**Perîşano, de sêwiyê muhaciro!**

**Tu bi hesreta hêlîna keviro...**

Destekî bilnid, bi gurzek nêrgizên ku li derdola Cizîra Botan dipişkivin ji bo hunermend Aram Dîkran pêşkêş dikim. Ev ermeniyê ku wek hunermendekî navbilind di nav gelê kurd de hatiye nas kirin.. Ma şeyr e ku kurdek jî stranan bi zimanê ermenî bibeje û di nav xelkên ermenî de bi nav û deng bibe...? Wek ku hûn tev dizanin, Aram ermeniye bi zimanê kurdî stran gotine û dibêje û wiha di nav kurdan de dengvedaye... Ne tenê wilo û bes..? Wî strana kurdî bi gotin û awazên nû gotiye û bi pêşve biriye, ango ji pêşengên strana kurdî a nûjene.. Wî strana kurdî ji kilasîkiya wê rizgar kiriye û bi pêşve birye (Tevî dilmaniya ermenan ji kurdan piştî komkujiya ermenan di roja 24ê nisana 1915 an de ku hin ji wan kurdan jî gunehkar dikin.. ).

Aram Dîkran e yê ku Cegerxwîn bi me daye naskirin, bêtir ku em Cegerxwîn nasbikin di rêka xwendina dîwanên wî re. Ji ber ku zimanê kurdî qedexe bû û her kesî newêrîbû dîwanên Seydayê Cegerxwîn peyda bikin da ku bixwînin...

Ew kesên ku li bal wan peyda dibûn jî, newêrîbûn şanî kesî bidin.. Û wiha ji destpêka salîn şêstî û virede, hin bi hin navê Cegerxwîn bi saya dengê Aram Dîkran bilind bû, nexasim bi wek van gotinên Cegerxwîn:

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque

**Şev çû ma tu êdî hew tê lo?**

**Ez ranazêm kengê bê te xew tê lo?**

**Xanî bûye zindan têde ranazêm!**

**Ta sibê, qêrîn û nalîn tew tê lo...**

Institut kurde de Paris

Ev strana ku di wê hingê de li ser zardevê her mirovekî kurd bû.

Bi saya Aramê Dîkran hunermendên mîna Seîd Yûsif, Mihemed Şêxo û Mehmûd Ezîz di pêvajoyeke nû re hatin hole û bi saya wê pêvajoyê strana kurdî bipêşve birin, ji kilasîkiyê rizgar kirin...

Di sala 1966 an de ji bo xwendinê, ez ji gund hatim Qamişlo. Hingî min navê Aram sehkir ku, ew di gel grûpa xwe şahî û ahengên kurd û ermenan li Qamişlo, Dêrikê û Amûdê li dardixîne û tenê bi zimanê kurdî distirîne... Berî sehkirina navê wî, me navê çend neferên ermenî seh kiribû ku stranên kurdî yên kevin dibêjin wek: Karabêtê Xaço di rêka strana Lawikê Metînî de, Milkonê Nadir di rêka strana Felîtê Qutto de... û çend dengbêjên ermen yên din jî hebûn ku stran bi kurdî digotin wek: Bêdrosê Dengbêj... Lê Aram û grûpa xwe a muzîkê gaveke nû bû di vejandina stran û muzîka kurdî de.. Girûpa wî ji çend kesan pêk dihat wek:

Sako, Sîrop.. û gelek amûrên muzîkê bikar tanîn wek Dahola biçûk, Cimbiş... û her wiha gelek cûreyên govend û dîlana kurdî li ber dengê wî û grûpa mûzîka wî di hatin gerandin wek: Halayê, Şêxanî, Çeçanê... Wek nimûne ev strana reqsê:

**Wille govend ranabe**

**bille govend ranabe**

**Xwelî li mêrê xerabe**

**radizê şiyar nabe lo lo, lo lo lo lo...**

Di eynî salê de, 1966 an, Aram jî bi ermeniyên Qamişlo re çû ermenistanê... Dema ku çûn ez wek dîdevanekî çûna wan bûm, bi hevalên xwe re me ji dibistanê bazda û em çûn temaşekirina oxirkirin û xatirxwestina wan.. Min bi herdû çavên xwe xatirxwestina jin, mêr, kal, pîr û zarokên ermeniyan dît, dema li otobîsê siwar dibûn û di pencereyên wê re xartir ji hev dixwestin û digiriyan... Û wiha Aram di wê salê de çû Haystanê(ermenistanê). Berî ku here ev strana wî di nav gelê Qamişlo de belav bibû:

**Diçim diçim nema têm**

**Ez heyirîm çilo bêm**

**Êdî tiştek nema kêm**

**Diçim li vir namînim**

**Bes e derda hilînim**

**Pel ji te ra bişînim..**

Institut kurde de Paris

Lê piştî ku giha Yerîvanê ev stran ji xelkên Qamişlo re şand :

**Hatim hatim Haystan,**

**Gelek xweşe Yerîvan..**

Di baweriya min de ev strana wî bêtir ji bo gerimkirin û sorkirina xelkên ermenî bû, bo çûna ermenistanê. Mêzekin ev herdu stranên Aram bi kurdî ne/ne bi ermenî ne/ û propagenda ne ji bo ermenan û çûna ermenistanê.. Ev yek xweş nîşane ku piraniya ermenên Cizîrê bi zimanê kurdî xeber didan bêtir ji zimanê ermenî...

Sebaretî min wek nivîskar û helbestvanekî kurd, ez Aram Dîkran hunermendekî kurd yê payebilind dibînim.. Wî stran û mûzîka kurdî bi pêşve birye û xwe di berde westandiye, bêtir ku hunermendekî ermenî be.. Lê her bi nijada xwe, ew dimîne ermenî... û wê her navê wî di ferhenga gelê kurd e bimîne zindî.

Bi vê helkeftinê, ez ji dil spasiya nivîskarê kurd Kakşar Oremar dikim, ku wiha xwe di ber navdarên kurdan de diwestîne. Bêguman wî Aram Dikran yek ji wan navdaran dîtiye ta ku wiha bi kelgiranî pirtûkekê li dor jînenîgariya wî amade dike, ev yek jî ji resenî û kurdewariya wî a paqij û durist dertê, ji bo wî qevdek kulîlkên biharî ji nergiziyên Seqlanê Mema, Eyndîwerê û Dêrika Hemko pêşkêş dikim... Ji Aramê Dîkran re, buhişta rengîn hêvî dikim û destekî bilind, bi gurzek nêrgizên Cizîra Botan, di gel dengê wî û ev gotinên xwarê yên helbestvanê Ermenistê **Şikoyê Hesen**, ji

Institut kurde de Paris

xwenevanên zimanê Kurdî re pêşkêş dikim. Cihê Aramê Dîkran bilbilê Rojhilata Navîn bihişta rengîn be.. Serê gelê Kurd û Ermen sax be.

Bi xeml û rewş e, şêrîn û xweş e

Zimanê Kurdî

Bi xweş awaz e, letîf û naz e

Zimanê Kurdî

Beyta Feqî ye, kubra Xanî ye

Zimanê Kurdî

Bi xeml û rewş e, şêrîn û xweş e

Zimanê Kurdî

Kewkeb çiya ne, kubra teyra ne

Zimanê Kurdî..

Institut kurde de Paris

## Li Qamişlo Yeksaliya Aramê Dîkran

(Di Mala Birayê Wî Serkîsê Dîkran De)

Wefadarî, dilsozî û rêzgirtin ji giyanê Aramê Dîkran re.. Ji ked û dana wî re.. Ji dengê wî û van gotinên Şikoyê Hesem û Zimanê Kurdî re:

*Bi xeml û rewş e, şêrîn û xweş e*

*Zimanê Kurdî*

*Bi xweş awaz e, letîf û naz e*

*Zimanê Kurdî*

*Beyta Feqî ye, kubra Xanî ye*

*Zimanê Kurdî*

*Bi xeml û rewş e, şêrîn û xweş e*

*Zimanê Kurdî*

*Kewkeb çiya ne, kubra teyra ne*

*Zimanê Kurdî..*

*Li Qamişlo, di sibeha roja 08/08/2010 an de, bi kelkeftina ku salek di ser koçkirina hunermendê Ermenî/Kurd Aramê Dîkran re derbas bû, Derwêşê Xalib, Kesrayê Cegerxwîn (Kurê Cegerxwîn) û ez (Konê Reş), bi serdanekê çûn mala Serkîsê Dîkran (Bavê Dîko), birayê Aramê Dîkran û me gurzek gulên spî wek wefadarî ji giyanê Aramê Dîkran re, jêre pêşkêş kir..*

Institut kurde de Paris

*Di wê serdanê de, wek dilxweşiyê ji birayê Aram re, her yekî ji me bîranîn û baweriyên xwe derbarî Aramê Dîkran û rola wî di parastina ziman û pêşxistina stran û muzîka kurdî de anî ziman..*

*Hêjayî gotinê ye ku, Aramê Dîkran di sala 1934 an de li Qamişlo çêbûye. Destpêka hunermendiya wê, ji Qamişlo bi helbestên seydayê Cegerxwîn destpêkiriye û nav û deng daye. Di pey re stran bi zimanê Ermenî, Siryanî, Erebî, aşûrî û Tirkî jî gotine.*

*Wek ku diyar e Aramê Dîkran di sala 1966an de ji Qamişlo çûye Haystanê (Ermenistanê) û jiyana xwe li wir derbas dikir.. Di 20 salên dawî de di navera Belcîka û Yûnanistanê de wek penaberekî jiyana xwe dibuhirand..*

*Di roja 08/08/2009 an de li Etînayê paytexta Yûnanistanê koça dawî kiriye û di roja 17/08/2009 an de li Brukselê paytexta Belcîkayê hatiye veşartin.*

*Sed mixabin ku xwesteka wî bi cih nehat; çendî dixwest ku li Amedê bê veşartin, lê sîstema tirkiyê ew rê nedan ku li Diyarbekirê, paytexta Kurdistanê bê veşartin.*

*Bêguman bîranîna yeksaliya koçkirina Aramê Dîkran ji wiha gotin û çalakiyên şermok mezintir e.. Û gazin bê fêde ne.. Sed mixabin.. Em çi bikin..?! Wek ku kurdan gotiye: Itar ji tûrikê xwe xeber dide.. Em dûr dibînin lê destê me kine.. Sed silav ji giyanê Aramê Dîkran re, ji peyva Kurdî a resen re.*

*Qamişlo, 08.08.2010*

Institut kurde de Paris

# Dengê Şivan Perwer

**Şivan Perwer**, evê ku îro em di dabaşa nirixiandina wî ya hunerî de ne, bê guman ew lehengeke ji lehengên Kurdistanê ye.

Vî lehengî salên dûr û dirêj ji temenê xwe mizaxtine ji bo gotina peyva Kurdî ya resen. Wî ew peyv bi awzên Kurdewarîyê xemilandin... û bi berdewamî bê ku xwe ji vê rêbaza, ku ji xwe re bijartiye bide alî... Tevî asteng, dijwarî û kelemên ku di pêş de, ji rex yar û neyaran de, hebûn û hatin danîn ...

Ew hunermendekî pêşenge, di dawiya çerxê bîstan û destpêka çerxê bîst û yekan de. Wî jî, navê xwe bi bilindî di hizir û bîra gelê kurd de çand û çesipand; mîna navê Mihemed Arif Cezîrî, Mihemedê Mamilê, Resûl Gerdî, Hesen Cezîrî, Îsa Berwarî...Dibe jî ku di gelek waran de li wan jî zêde kiribe..

Wî ji kanîya resenîya Kurdî cerê ava xwe dagirtiye, bi ava wî cerî kulîlka mûzîka Kurdî av dide û bi pêş dixîne.. Hem jî bi dengê xwe yê çiyayî û awazên xwe yên xemilandî bi resenîya peyva Kurdî ya orjînal, dilê cemawerê Kurd pê xweş û geş dike.

Institut kurde de Paris

Kes nikare xwe bilind bike, gel mirovan bilind dike. Bilindbûna navê mirov, di destê gel de ye.. Gel jî zû bi zû, navê kesekî bilind nake, ku ew kes ne li gor dil, daxwaz û berjewendiyên gel be... Giringî di virdeye ku neferek, milyon neferî bihejîne û bilivîne ...Bi melyonan ji gelê Kurd, li yek neferî guhdarî bikin, hez deng û awazên yek neferî bikin, ew yek nefer kela dilê melyon neferî hênik bike, ew newfer Şivan Perwer be .

Ta ku bawerîya mirov bi afirênerekî an bi hunermendekî bê roj, meh û sal jê re divên û gerekin.. Û dema ku mirovê afirêner an hunermend cihê xwe di dilê cemawer de çêke û kesmê xwe bi gelê xwe bide naskirin, hingê bawerîya gel êdî nema bi wî kesê afirêner an hunermend tê guhertin û jibîrkirin... Ew bawerî li ser astekî bilind dimîne, nema ew bawerî toşî nizimbûn û bilindbûnê dibe, wek bilindbûn û nizimbûna zêr, dolar û cil û cawê li xwekirinê... Wê hingê bawerîya gel derbarî wî hunermendî an afrênerî tekûz û rast dimîne û qet nema tê guhertin.

Kirasê vê bîr û bawerîya gelî li hunermendê me Şivan Perwer tê li xwekirin, wek ku çawa bawerîya gel bi dengê şalûl û bilbilan tê, wisa jî bawerîya gel bi dengê Şivan Perwer tê û ew bawerî êdî nema tê guhertin.. Heger bawerî bi dengê şalûl û bilbilan bê guhertin !! weha wê bi deng û awazên Şivan Perwer jî bê guhertin...

Bawerîya di huner û toreyê de rastîye, û da ku ew rastî bijî û biserkeve, divê tekuz be, û rastîya tekêz bi hêsanî nayê, roj, meh û sal jê re divên.. Me jî, ew rastîya

Institut kurde de Paris

tekûz di deng, awaz û gotinên Şivan Perwer de xweş belû û diyar dîtiye...

Jiyan bi dirêjahîya xwe, xweş dîdevane ku resen û sexteyan ji hev derxîne, pîş û sazên resen û qelpan ji hev cuda bike, çendî berjewndîyên kesane di holê de hebin fêde nake...Dîrok dilovanîyê nake, genim û zîwanê ji hev cuda dike...

Hunermendîya Şivan Perwer li ser asteke sûdeyî dijî, û ew aste ji asoyê gelek kesan mezintire. Hunermendiya wî, bervedêriye di ber 40 melyon kes de ye.. Ne wilo tenê, nirxekî wî yê mirovantiyê heye...û di gelek waran de wek; derûnî û giyanî, berî gelek warên din...

Di vê mijarê de, ez nikarim di ser navê nivîskarê hêja Kakşar Oramar re bi qevêzim, evê ku bi mêranî xwe di ber jînenîgarî, xebat û çalakiyên navdarên me Kurdan de di westîne...Bê guman Şivan Perwer jî navdareke ji wan navdaran..

Ez jî ji dil û can serketinê ji destbirakê xwe Kakşar Oramar re dixwazim û her bijî li ser vê rêka kurdewariya resen.

Institut kurde de Paris

# Melle Ehmedê Namî
## (1906 – 1975)

*Mamoste Hadî Behlewî di şîna Namî de wiha dibêje:*

Xameyê binvîs bi reş, Şîna şehîdê Şiir û Kurd
Ger mîdada te nebit, Xwîna ceger bo te diyar

Ka zimanê halê qîza(Xort neyên van keç meşîn)
De keça kurd, tê bi dengê kûr bike nal û hewar

Kanî Ehmed, kanî Seyda, ka evîndarê welat ?
Kanî xwedyê( Ez ne kurdim ger ji bê rê bême der)

Wêje û helbest û ristên te li şûn hiştin ji mer
Wek pizota pê di sojî, cerg û mêlagên neyar

Lê çikim bê hûde iro, ne bi şîn û ne girî
Eve çend ristik di şînim, bo rewanê te diyar

Ez ji Yezdanê dilovan lavekar û dîlekim
Sed hezar rehmet li gora te bibarî çar kenar...

Dema ku mirov Melle Ehmedê Namî bi bîr tine, an li ser serbûriya wî di axife, di der hal de pirtûka wî (Agirê Sînema Amûdê) û sirûda wî:

Institut kurde de Paris

Pêşkevin em serfirazin miletê Kurdî
Yan mirin em dê bibînin yan jîna kurdî

Têne hiş û bîra mirov û pêre pêre jî, rêhevalên wî wek: Cegerxwîn, Qedrî Can, Melle Ehmedê Zivingî, Mele Palo, Mele Ebduselam Nacî, Dr. Nafiz û gelekên din têne bîra mirov.

Hem jî gundê (Tilşiîra Aşîtan), hêlîna afirandinên wî, warê dost û hevalên wî, yên herî nêzîk wek: Hecî Eliyê Evdê, Ûsivê Evdê axayên gund, tên bîra mirov.

Ji ber tarîtî û bê ronahiyê, stêr di asmanan de di çirisînin, ji hêza baran û şilahiyê, xak di buharan de di kene...

Mirovên çak û merd jî, ji wan kesanin, ewên ku ji nebûnê, hebûna xwe di nav gelê xwe de diyar dikin û navên xwe di sînga gelê xwe de tomar dikin.

Ewên ku di asteng û dijwariyan de li ber xwe didin, di nebûna mêran de mêraniya xwe eşkere û berz dikin. Di baweriya min de Melle Ehmedê Namî yekî ji vî terzê mirovan bû..

Di firehiyan de, her yek dibêje ez lawê bavê xwe me, lê ez heyranê wî mirovî bim, ewê ku di asteg û dijwariyan de, ji mêranî ne keve û li ber xwe bide û welatiyên wî pesnê wî bi din, û li ser ronahiya kiryarên wî pêşbikevin, ber xwe bidin û reş û sipî ji hev derxin..

Melle Ehmedê Namî her dem û gav bi kul, êş û janên gelê xwe ve girêdayî bû, bi refê pêşengên gelê xwe re di firîya, ew refê ku bingihê rewşenbîrîya Kurdî di Sûriyê de danîne.

Institut kurde de Paris

Piştî ku seydayê Namî nema karî bû li ser textê jiyana xwe bi domîne, nemaze piştî beravêtina şoreşa Şêx Se'îd di sala 1925 an de û herifandina şoreşa Araratê di sala 1930 î de, binxet bû û xwe gihand refê rewşenbîrên Kurd, di sere wan de, Mîr Celadet Bedir-Xan û birayê wî Kamîran û hevalên wan û kovarên wan(Hawar, Ronahî, Roja nû), ewên ku li Şam û Beyrûdê çap dibûn, bi nivîsandinên xwe dixemilamdin.

Di sala 1943 an de li ser daxwaza Mîr Celadet û bi arîkariya Hecî Eliyê Evdê, dibistanek Kurdî li gundê( Tilşiîrê) vekir, bi dehan xort û keç, jin û mêr, bi tena xwe fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî kirin.

Gelek caran di civatên rewşenbîran de tê gotin ku, seydayê Namî tirsonek bû, bizdayî bû.. Qet ez ne bi vê nerînê re, belê ez di bêjim; Seydayê Namî ne tisonek bû û netirsiya wî di pirtûka (Agirê Sînema Amûdê) de xweş diyare, bi xêra wê pirtûkê agirê Sînema Amûdê ma vêketî ta roja îro...

Hem jî mêraniya wî di hêza helbestên wî de diyare, ta pileyekê ku hin di bêjin û ez jî bi wan re:

Helbestên seydayê Namî ne kêmî helbestên seydayê Cegerxwîn in, di warê hûnandin, ramyarî û Kurdperweriyê de, nimûne ev sirûda wî bi nave (Gaziya keçan):

Birayên delal hûn werin xortino
Heger hûn neyên vane keç em meşîn

An eva din bi nave (Dilê jar û xemgîn):
Diljaro ji xew rabe, ji derdê miletê xemgîn
Xebatê pir bikin îro, bi serbestî bibin zengîn



Institut kurde de Paris

Me (Tacdîn û Çeko) nînin, xeberdarê me bê (Gurgîn)
Bi top û balefir rabin, li zozanê dilê xemgîn

Di roja 11-12-2000 î de 25 sal di ser koçkirina wî re derbasbûn, ango yobîla zîvîne, em jî bi vê helkevtinê, wî bi bîr tînin û di bêjin rehma xwedê lê be, buhiuşt warê wî be.

Institut kurde de Paris

# KURTE JIYANA NAMÎ
## Bi alîkariya kurê wî Samî Namî

Namî navnîşanê torevaniyê bû ko Mela Ehmedê Namî kurê Seyid Mehmûdê Sîtî diya wî Xedra li xwe kiribû û nivîsandinên xwe bi vî navî dixemilandin.

Mela Ehmedê Namî di sala 1906 an de li gundê Erbetê, qeza Nisêbînê, Kurdistana Bakur hatibû dinyayê.

Heft salî bû dema di hicrika feqehan de dest bi xwendina Nûbihara Biçûkan ya seydayê mezin Ehmedê Xanî û qurana û şerîetê kir û di hicrikên Êstilê, Kercosê, Dara, Amûdê, Girêsiwêr û Tilşeîra Aşîta xwendina xwe berdewam kir û li hicrika seydayê Mela Brahîmê Sofî Ebdo yê Tinatî li Tilşeîrê Îcaza Intîhayê wergirt û bû melayê wî gundî. Mela Ehmedê Namî li gundê Tilşeîrê jiyana xwe ya civakî, torevanî û kurdayetî berdewam dike. Rola rewşenbîrekî kurd bi giranî di dema xwe de dileyize, têkiliyên rewşenbîrî bi kovarên kurdî re wek: Ronahî û Hawarê re girêdide yên ko mîrê alfabeya kurdî Mîr Celade Alî Bedirxan li bajarê Şamê derdixistin û Stêr û Roja Nû yên ko Dr. Kamîran Bedirxan li Bêrûdê derdixistin û helbest û nivîsandinê xwe di nav ropelên zêrîn yên wan kovaran de diweşandin û dibû yek ji dostên nêzîk ji rewşenbîrên dema xwe re û di nav wan de mîrê rewşenbîriya kurdî di çerxa bîstan de Mîr Celadet Bedirxan, Cegerxwîn, Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrîcan,

Institut kurde de Paris

Hesen Hişyar û Reşîdê Kurd....Wilo jî dikeve nava desteka berpirsiyariyê di van partî û civatên kurdî de li Sûrya wek:

- Civata Xoybûnê.
- Civata Azadî Û Yekîtiya Kurdan.
- Civata Arîkariyê Ji Bona Belengazên Kurd Li Cizîrê.
- Nadiya Ciwan Kurd Li Amûdê.

Hêjayî gotinê ye ko malika gundê Tilşeîra Aşîta ya Civata Azadî Û yekîtiya Kurdan ko Namî berpirsiyarê wê bû, bûbû xelka dan û standinê û bihevgirêdanê di navbera civatê û Partiya Kurdistana Îraqê de.

Namî yek ji şagirtên Mîr Celadet Bedirxan bû yên ko fêrkirina zimanê kurdî danîbûn ser milên xwe û dibistaneke şevê li gundê xwe Tilşeîrê di odekê ji odên dibistan gund ya fermî de vekiribû, xort û kalên gund her şev bi terz di hundurê oda dersdanê de rûdiniştin û Namî mamostayê dersdar ew fêrî xwendin û nivîsandina kurdî dikirin.

Mela Ehmedê Namî ne tenê xwe berpirsiyarê hînkirin û fêrkirina zimanê kurdî didît, lê herweha wî bi her awayî şerê kewdeniyê jî dikir û doza rêkirina keç û kuran bo dibistanan ji dê û bavan dikir, nemaza ew ên ko zarokên xwe rênedikin dibistanan.

Namî li gor bîr û baweriyên xwe û piştî dan û standineke giring bi berpirsiyarên Perweredeya dewletê karîbû du dibistanên fermî li gundê xwe Tilşeîrê yek a kuran û ya din

Institut kurde de Paris

ya keçan veke û di sala 1951 an de mamosta dibistana keçan, keçeke Kurd bû şagirtên wê keçên gund her roj di civîna serê sibê de du sirûd digotin:

1- Neşîda netewî ya welatê Sûrî.

2- Helbesta Namî ya bi navê Neşîd û Gaziya Keçan

Birayên delal hûn werin xortino

Buhuşte welat da´m herin merdino

Eger hûn neyên vane keç em meşîn

Besin koletî serfiraz da´m bijîn

Paşî roja xwendinê destpêdikir.

Di sala 1932 an de Namî dest bi nivîsandina kurdî dikir nemaza hûnandina ristan û roj bi roj nivîsandinên wî bi gelek şêweyan derdiketin, helbestên heme reng, çîrok, ferheng, rêziman û hin bîranîn û serpêhatiyên milet û welat û hwd....

Lê mixabin gelek ji wan nivîsên wî ketibûn ber wê talana windabûnê de wek ko Namî di pêşgotina dîwana xwe de ya ya helbestan Daxwazname de dibêjê.

Berhemê Namî yên çapkirî evin:

**1-** Dîwana helbestan bi navê DAXWAZNAME.

A- hejmara rûpelên dîwanê -93- rûp.

B- Hejmara helbestan -2o-

Institut kurde de Paris

C- Hejmara gotaran -2-

D- Jîndariya Namî -1-

E- Hejmara pêşgotinan -2-

Eger em vegerin naveroka dîwana Namî emê bibînin ko helbnestên Namî bi gelek şêweyan hatine.

1-Sirûd û merşên welat û miletperwerî wek:

- Marşa Pêşveçûnê. Rûp -21-
- Neşîd û Gaziya Keçan. Rûp -23-
- Marşa Xortê Kurda. Rûp -25-
- Peyman û Soz. Rûp -26-
- Doz û Daxwaz. Rûp -28-
- Azadî. Rûp -29-
- Pîroznama Newrozê. Rûp -32-
- Kul û Gazin. Rûp -36-
- Dilê Jar û Xemgîn. Rûp -40-

Institut kurde de Paris

2-Pesnê hin hevalên doza welatperweriyê bi rengên nameyên pesindarî û pîrozbayî wek:

- Pîroznama Dîwana Cegerxwîn. Rûp -42-

- Dengê Min û Hekarî. Rûp -48-

- Nalînên Dilê Namî. Rûp -50-

- Pesnê Ahmed Namî Ji Serokê Bijîşk re Ehmed Nafiz Di Reşbeleka Wî De. Rûp – 53-

- Ji Bo Apê Min Nûredîn Zaza. Rûp -56-

- Fîxan Ji Naçarî. Rûp -72-

- Tarîxa Cenga Mîkroba -A- û –NA-. Rûp -74-

- Daxwazname. Rûp -78-

3- Şîna hinek şehîdên Kurd û Kurdistanê:

- Şîna Şêx Ebdurehman ê Garisî. Rûp -61-

- Diljaniya Haco Axa. Rûp -66-

- Van Çend Ristan Li Ser Tirba Min Binosin. Rûp -80-

4- Name û Gotar:

- Li bo Şehîdekî. Rûp -59-

- Mehkema Hewarê Û Deyndarê Şermende. Rûp -81-

5- Têbînî û şirvekirina navan, bûyeran û serpêhatiyan yên di helbestan de. Rûp -86-

Têbînî

---

Namî hin helbestên evîniyê jî hûnandibûn û li gor pêşgotina wî ew bi tevayî ketibon

Ber talana windabûnê de

<u>2- Pirtûk</u>.

- Pirtûka AGIRÊ SÎNEMA AMÛDÊ.

Di sala 1961 an de Mela Ehmedê Namî pirtûkek bi navê Agirê Sînema Amûdê nivîsî û di sala 1987 an de li bajarê

Institut kurde de Paris

Uppsala li Swêdê û bi alîkariya weşanxana Jîna Nû hate çapkirin û belavkirin.

1- Hejmara rûpelên pirtûkê 82 rûpel.
2- Hejmara wêneyan -!2-
3- Pêşgotin pirtûkê bi pênûsa Bavê Nazê ye di bin navê: Seydayê Namî.
4- Pirtûk ji 26 pêşberan pêk hatiye ew jî evin:

**1- Pêşberiya çîrokê bi pênûsa Namî ye.**

Namî ne tenha li ser bûyer û serpêhatiyên winda ji dîroka miletê kurd diaxive,

lê wilo jî li ser mamosta û zanayên kurd li ser hozan û hunermendan, li ser

torevan û ristevanên winda ji vî miletî radiweste wilo jî li ser kesên ko bi

zimanê miletên din nivîsandinên xwe kirine û şûnmayên wan ketine tûrikên

van miletan de lewma Namî dibêje:

Dema min dît ko çîroka agirê sînema Amûdê yek ji serpêhatiyên mezine ko di Welatê me de çêbûye tê hijmartin min nexwest ew jî winda bê ser û şop here...

**2 - Bingehê Serpêhatiyê.**

Institut kurde de Paris

Ev çîrok bi bingehê serpêhatiyê destpêdike, di vir de Namî xweşik ronî dike çawa daneheva alîkariyê ji xelkê bajarê Amûdê bo gelê Cezayir pêk tê......

**3- Bîrhatinên Mudîr:**

...Piştî ko bajar xilas bû ji civandina arîkariyê bi rûsipîtî û camêrî bi têkrayî, ji nûve xeyalên nû hatin bîra hinekan û ew bûne sebebê ziyana mezin, bingehê şewata sînema Amûdê bi bîrhatinên mudîr ve girêdan û di wan re xweş xuya dibin gava Mudîrê Nahiyê mamostayên dibistanan dicivîne û pêşniyarên xwe bi wan dide nasîn: ....Ez dixwazim rojekê sînema Şehrezad kirê bikin û kara wê jî bidin ser perên ko berê hatine civandin ji bo vê arîkariyê.....

**4- Du Birayên Sêwî.**

**5- Avahiya Sînemê.**

**6- Vegera Xwendevanan Ji Mal.**

**7- Zengilê Sînemê.**

**8- Destpêka Filim.**

**9- Gazî Û Hewar.**

**10- Mihemedê Xwa Lê Xweşî.**

**11- Hatina Agirvemrînê.**

**12- Dengê Ellah Û Ekber Û Dengê Naqosa.**

**13- Vedana Sînemê û Deranîna Laşa.**

Institut kurde de Paris

**14- Çûna Ser Goristanê.**

**15- Rewşa Tirba.**

**16- Çi Çû Çi Ma:**

.......Namî dibêje: Ên ko di kûrangiha sînemê de man û hatin biraştin 280

xwendevan bûn.....

.....Ew bûn şehîdên arîkariya azadiyê û serbestiyê.....

**17- Serxweşiya Gel.**

**18- Hatina Berpirsiyaran Ji Bo Serxweşiya Gelê Amûdê.**

**19- Dadestî Û Xwedî Û Hostayê Sînemê.**

**20- Gunehkar Û Tawanbar Kî Ne?.**

**21- Gotina Rast.**

**22- Hatina Şandiyarekî Mezin.**

**23- Parkirina Perê Arîkariyê.**

**24- Gulîstana Mezargehê Û Rewşa Mînak.**

Namî dibêje:.. Me go civîna du mil ku ji berpirsiyaran û rîsipiyên gelê hatibû girêdan, di roja pêşî de têde hatibû gotin: Gereke cihê sînemê bibe bustan û mezargeh, mînak têde bê danîn û hundurê wê bi awakî hendesî bê rast kirin...dema dixwazî herî hundurê bustan hêj

Institut kurde de Paris

li ber devê derî mînak dikeve ber çavê te. Mînak bi vî rengî ye:

.....Sê xortên dibistanê di nav pêl û pêtên agir de pişta wn li hev, ala Cezayir di                Destê yekî ji wan de ye û sekiniye. Mînak ji kanê paxir li Îtalya hatiye çêkirin...

**25- Civîna Roja Pêşî.**

**26- Cîgayî Şadî û Xweşî:**

Namî dibêje:.... Bustanê mezargehê ji îro pêve wê bibe gulîstana şadî û

xweşî ya bi nav û deng û tek û tenha û cîgayê xemrevînê ji bo xembaran....

Berhemên Namî yên neçapkirî:

<u>1-Ferhenga Kurdî û Erbî bi navê Kozar</u>.   Ferheng hîna dest nivîse, hejmara gotinên kurdî 25 hezar ta 30 hazar gotin in.

<u>2- Çiko Li Bîr im</u>.

Çiko Li Bîr im, jînenîgarî û bîranînên Namî ne û hin serpêhatî û bûyerên dîrokî ne. Mixabin nexweşîya dijwar ya dil û bihntegiyê û mirina bêbext pênûsa Namî di nîvê rê de şikand û nehiştin ko wê pirojeya giring bibe srî û ji bilî 33 rûpelên destnivîs pêve nehate nivîsandin.

Institut kurde de Paris

Namî bi van gotinan dest bi nivîsandinê dike û dibêje:

Di sala 1906 an de, heyva gulanê li gundê Erbetê hatim dinyayê, pênc pêhisiyên min –hewasî elxemse- li wî gundî agadar bûne. Ango bi bîna gul û sosinan û bi dengê şalûl û bilbilan û bi dîtina tîrêjên roja jîndar û bi hingiftin û destdana berê dayikek kurdî û li tamkirina şîrê bustanê wê dayikê tamdar û beşdar bûme.

Paşê ez bi dergûşeke darî ji darên çiyayê Kurdistanê, li ser erd û di bin azmanê wê de bi desteki kurdî hatme hejandin, ta ko bûme du salî. Jê û pêve ez di himbêza dê û bavê dilovan de bi delalî hatim xwedî kirin. Bê pesin herwekî xelkê gund dîtibûn û digotin.....

Herweha Namî berdewam dike û bi ferehî rewşa xwendinê di wê demê de li Kurdistanê nemaza xwendina hicrikên feqehan diyar dike. Û çend rîpelan li ser cenga cihanê ya mezin û xela mezin dinivîse....

Namî bi vî awayî berdewam dike ta ko dighîje hatina Frensa û dagîrkirina welatê Sûrî. Haco Axa û şerê leşkerê Frensî li Sûrya, nemaza Şerê Beyandûr û kuştina serok leşkerê Frensî yê Beyandûr Rogan li Diyarê Topê rojavayyî Tirbespiyê.

Du rûpelên dawî 32 û 33, li ser kar û xebata Civata Azadî û Yekîtiya Kurdan li Sûriyê......

<u>3-Rêzimana Kurdî Û Erebî</u>.

Ji 93 rûpelên destnivîs pêk hatiye.

Institut kurde de Paris

# Seydayê Tîrêj

## (1923 - 2002 )

Helbestvanekî ji nifşê kevin bi nifşê nû re di peyiv e

Seydayê Tîrêj helbestvanekî Kurd e ji nifşê Kevin, ew nifşê ku ji destpêkê de pîş bi nivîsandina Kurdî Latînî kiriye. Roja îro piraniya wî nifşî koçkirine wek: Mîr Celadet Bedirxan, Dr Kamîran Bedirxan, Qedrî Can, Reşîdê Kurd, Osman Sebrî, Cegerxwîn, M.Ehmed Botî, Melle Ebdulhadî, Melle Ehmedê Namî...

Seydayê Tîrêj jî, heval û hogirê van kesan bû û bi wan re ketiye kar û bare xebat û berxwedanê de, di meydana ziman, tore û rewşenbîrîya Kurdî de xebitîye; bi teybetî nivîsandina bi zimanê Kurdî, û ji wî heyamê dûr ve berhemên xwe di kovarên Bedirxaniyan de belavkirine, ew kovar û rojnameyên ku di navbera salên(1932-1946) an de li Şamê û Bêrûtê çap û belav dibûn, wek Hawar û Ronahî li Şamê, di bin berpirsyariya Mîr Celadet Bedirxan de, (Roja Nû û Sitêr) li Bêrûtê di bin pirsyariya Dr.Kamîran Bedirxan de.

Ango: ji wê hinge de dan û sitandin û têkiliyên Seydayê Tîrêj bi rewşenbîr, welatparêz û kultura gelê Kurd ve heye û di nav refên rewşenbîrên Kurdan de xebat û bizav



Institut kurde de Paris

kiriye..Hêjayî gotinê ye ku Seydayê Tîrêj di sala 1942 endamek bû ji endamên partiya (Xoybûnê) li bajarê Amûdê.

Wiha ji hinge de ta roja îro pênûsa Tîrêj ne rawestiyaye û her û her wê pênûsê, kul, xem û janên gelê Kurd bi dewêta reş û şîn nivîsandîye.

Hem jî pesnê gelê Kurd, Newroz û sersala Kurdan, çiya û newalên Kurdistanê daye.

Ji roja ku seydayê Tîrêj, bîrewer bûye, di rewşa gelê xwe de ponijîye û xemên gelê Kurd xwarine.

Ji bo xwendevanên kovara (Nûdemê), min ev hevpeyvîn pêre li darxist. De ka werin gelî xwendevanan em mêzekin bê çi di tûrikê Seydayê Tîrêj de maye!?

Konê Reş: Seydayê Tîrêj, ji kerema xwe tu di karî xwe ji xwendevanên kovara(Nûdem) ê re bidî naskirin?

Tîrêj: Nave min Nayif kurê Heso ye, ez bi nave Tîrêj di nav Kurdan de hatim naskirin, sala1923 an de, li gundê (Nicim) ji herêma Qamişlo, li rojavayê Kurdistanê hatime vê dinya, bi êş û jan , kêf û şahî. Niha ez li bajarê Hesekê rûniştime. Ez bavê çar xortan û pênc keçan im.

Di warekî din de, ez di sala 1937 an de yek ji endamên partiya (Xoybûnê)bûm û di wê hinge de Cegerxwîn jî weke min têde endam bû, Qedrî Can mamostayê me herdiwan bû, û ji wê hinge de ta roja îro, min dest bi hûnandina helbestên

Institut kurde de Paris

Kurdî kirîye, di destpêkê de alîkariya Cegerxwîn bi min re hebû, ji ber ku em herdû mela bûn...

Konê Reş: Seydayê Tîrêj, helbestên te, an berhemên te yên pêşîn di kîjan kovar û rojnameyên Kurdî de belavbûne û kîjan salê...?

Tîrêj: Sê-çar helbestên min di kovara Roja Nû de sala1944 an de li Bêrûtê belavbûne, hingê ew cara pêşîn bû û ji wê hingê de bi berdewamî helbestên min di kovar û rojnameyên Kurdistanê de belav dibin, hem jî, hin bûne stiran, Mihemed Şêxo pênc helbestên min bi strainî gotine yek jê ev e:

(Ey bilbilê dilşadî hela wer bike fîxan..).

Konê Reş: Gelo berhemên te di roja îro de, di kîjan kovar û rojnameyên Kurdan de belavdibin û çi pirtûkên te hene?

Tîrêj: Berhemên min çi ji helbestan be, di piraniya kovar û rojnameyên Kurdistanê de belav dibin û bi teybetî yên Kurdistana federe wek: Xebat, Metîn, û yên Sûriyê, wek: Stêr, Gulistan, Roj, Gurzek Gul, Zanîn, Gelawêj û hwd.

Du dîwanê min çap û belavbûne, yek jê bi nave (Xelat) di sala1984 an de û ya din bi nave (Zozan) di sala1992 an de. Di roja îro de dîwaneke min amadeye ji çapê re hem jî pirtûkek zargotinî.

Institut kurde de Paris

Konê Reş: Rewşa weşanên Kurdî li Sûriyê çawaye, û li gor dîtinên te Kurd di kîjan warê edebî de pêş de ne, û di kîjanî de jî paş de mane...?

Tîrêj: Derketina weşanên Kurdî li Sûriyê bi berdewamî ye, bi xêra xortên nûhatî weke te û xeyrî te, em gelekî sipasiya wan di kin û pêşketinê ji wan re dixwazin.

Gotineke Mîr Celadet Bedirxan hebû herdem di got:

(Kurd dibêjin sal bi sal xwezî bi par), Lê di baweriya min de, îro ne wek heyama Mîr Celadet Bedirxan e, ez bawer im ku sala bê wê ji îsal xweştir û geştir be.

Ez nebawer im ku em bi paş de ne û zimanê min nagerê ku ez wilo bêjim...

Di warê helbestan de, em bêtir bi pêş de çûne û sedemên paşketina me di warê edebî yên mayî de, belûye ji ber perçekirina welatê me ye û qedexekirina zimanê me ye, ji wilo pêve ez tiştekî din nabêjim...!

Kone Reş: Seydayê Tîrêj, aloziyên ku tu di zimanê Kurdî de dibînî, çi ne?

Tîrêj: Di baweriya min de, alfabêya me ya bingihîn ya ku Mîr Celadet Bedirxan danîye, em pê serbilind in û xebata xwe pê dikin bê ku em aloziyan bi bînin.

Institut kurde de Paris

Li Kurdistana  federe bi tîpên erebî dinivîsînin. Tevî ku ez mella me jî, lê ez bê dil nivîsandinên wan dixwînim, em bi hêvîne ku  ew jî bi tîpên Latînî binivîsin.

Şêweyên ku di nav koç û hozên Kurdan de hene, di pêşerojan de wê ew şêwe bibin yek, kengî ku Kurdistan azad bibe û Radyo, TV û dibistanên me Kurdan çêbibin, ango aloziyên ziman yên ku di nav me de hene, girêdayî serxwebûn û azadiya Kurdistanê ne.

Konê Reş: Gotin û daxwazên te ji xwendevanên (Nûdem)ê re?

Tîrêj: ez gelekî sipsiya xwediyê kovara(Nûdem)ê dikim ku bi vê xebata çak radibe, di ber zimanê xwe de, û ez bi hêvî me ku berdewam be li ser vî kar û barî, û ji xwendevanên Kurd bi hêvî me ku li zimanê xwe guhdar bin, zarok û cîranên xwe fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî bikin. Pêşî û paşî gotina min ji we re li zimanê xwe miqate bin.

Institut kurde de Paris

# Çend gotin di pênc saliya koçkirina Seydayê Tîrêj de

Wek ku diyare, tev şîn û şadiyên kurdan di meha adarê de ne, ta bi koçkirina seydayê Tîrêj jî, di 23 ê vê mehê de bû. Ango ev pênc sale ku seydayê Tîrêj ji nav me barkiriye.

Bi vê helkeftinê kêfxweş dibim ku guhdaran serwextî bandora seydayê Tîrêj di nav helbestvanên kurdên Binxetê de bikim.

Wek ku hûn tev dizanin, di dawiya salên 1970î de û destpêka salên 1980î de, piştî ku kurdên me ji bakur û başûur sirgûn û mişextî Binxetê bûn, hingê geşbûnek rewşenbîrî û şiyarbûnek zimanhezî, xurtir ji berê, di nav me kurdên Binxetê de peyda bû û serê xwe bi bilindî rakir..Ta wan salan kêm kesan ji me, navê Seydayê Tîrêj sehkiribû, tevî ku seydayê Tîrêj nivîskarek ji nivîskarên kovara Roja Nû bû, ewa ku li Beyrûtê, ji rex Mîr Dr. Kamîran Alî Bedirxan ve dihat weşandin ..Hingê piraniya me, me navê Cegerxwîn, Melayê Cizîrî, Ehmedî Xanî û Feqehê Teyran bihîstibû û naskiribû ..Lê vê paşiyê, bi rêka dengê bihiştî Mihemed Şêxo û stranên wî yên ji gotinên seydayê Tîrêj wek:

Firyad û sed ax û eman

Ez ketim ber êş û bela...

An:

Institut kurde de Paris

Erê şûxê erê canê

Tu wer dam biçne seyranê...

Em serwxtî navê Seydayê Tîrêj û helbestên wî bûn. Û wiha ta ku dîwana wî (Xelat) di sala 1984 an de çap û belav bû û di peyre Zozan û Cûdî..Hem jî em bi dengê Saîd Gabarî û vê helbesta seydayê Tîrêj, eva ku cihê xwe di dilê guhdaran de bi xurtî hiştiye û bandora wê di civata kurdî de heye:

Ey bilbilê dilşadî wer bes bike fîxan

Derdê me girane bira, birîna me kure..

Wiha piştî ku helbestên SeydayêTîrêj bi dengê Mihemed Şêxo, Saîd Gabarî û gelek dengbêjên kurdan yên din hatin gotin, ew kesên kurd yên ku evîndarên peyva kurdî a resen bûn, dane ser şopa seydayê Tîrêj û xwestin ku ew jî mîna wî û seydayê Cegerxwîn, Yûsif Berazî, Umerê Lalê bibin helbesvan..û wiha di vê navê de bandora helbestên Tîrêj bez û eşkere bû..

Di berzbûna navê seydayê Tîrêj de û navên mîna wî yên li jor me gotin, û bi çapkirina dîwanên wan re, evîndarên zimanê kurdî û hezkerên hunandina peyva kurdî peyda bûn û bi belavbûna zimanê kurdî û toreyê re gelekan dane ser şopa seydayê Tîrêj û Cegerxwîn..Ta ku vê paşiyê, nifşekî nû bi rengekî nûjen berhemên xwe yên helbestî hunandin..

Institut kurde de Paris

Bi hatina vî nifşê nû re, nexasim ewên ku serwextî wêje û çanda gelên cîran bûn û bi zimanên wan cîranan tûrikê xwe ji rewşenbîriyê dagirtibûn, wan jî bi rengê nûjen helbestên xwe danîn û yên wek Tîrêj, Cegerxwîn, Yûsif Berazî, Omerê Lalê û Ehmedê Şêx Salih man ji kilasîkên kurdan..Tevî ku hêjî gelek ji xortên me, bi rengê kilasîk di bin bandora Cegerxwîn û Tîrêj û yên mayîn de helbestên xwe dihunin..Hem jî wek ku diyare her u her wê cûdahî di navbera kilasîk û nûjen de hebe..Bele her seydayê Tîrêj dimîne xwediyê bandoreke cîgirtî di nav xort û keçan de..

Bi vê helkeftina pênc salî ji koçkirina Seydayê Tîrêj em bihuşta rengîn wek mal jêre dixwazin û bele serê malbata wî, gelê kurd û evîndarê wî sax be.

Institut kurde de Paris

## Mûsa Anter
## (1918-1992)

Rojnamevan û nivîskarê bê westan barhilgirê derd û kulê gelê Kurd, şoreşgerê ku li dijî dijmin disekinî bi pênûs û xamê, şêxê nivîskarên Kurd, apê me Mûsa Anter: Şêxo, Şeyhmus Almas, hate kuştin bi destê dijminê gelê Kurd, di şeva(20-21/9/1992)an de, di bajarê Diyarbekir de, li taxa (Seyran Tepe ).

Helbet rola pênûsa bihiştî ne kêmî rola tivinga şoreşgerên serê çiya bû, ji ber ku camêr bi pênûsa xwe li rex şoreşgeran di sekinî û şerê dijminê gelê Kurd dikir, lê xuyaye ku ew mêraniya pir bi dijmin re tune bû, ku xwe li ber tîrên pênûsa wî bigrin, vêca bi bêbextî ew dane ber çend gulleyên sor da ku hew bibêje:

(Divê em Kurd li benda xelkê nemînin kes lawê bavê me tune, divê em xwe derxin rûyê dinyayê..)/1/.

Di (22 Sibatê de 1992), dadgeha ewlekariya Tirkî li pey hev sê dadgeh(mehkeme) ji mamoste Mûsa Anter re danîn û bi sê nîqan(gunehan) bar lê kirin:

-Yek jê jêre gotin: Çima di sala çûyî de,1991, dema hilbijartinan tu li çend bajarên rojhilatê(Kurdistanê) geriyaye, û tu li ser daxwazêên gelê Kurd axiviye?!!.

Institut kurde de Paris

-Ya dudiyan, jêre gotin: Çima te gotarek di rojnameya(Yeni Ulke) de nivîsandîye li ser êş, derd û nexweşiyên (Rojhilatê:Kurdistanê)..?!!.

-Ya sisyan, ew dan bersivdan li ser pirtûka ku wî nivîsî bû bi Tirkî, bi nave Bîranînên min, hingê wî ev pirtûk li Stanbolê çap û belav kiribû di sala 1990 î de, li ser vê pirtûkê Apê Mûsa ev bersiv li dadgehvan vegerand û got:

(..Hakimo! salê li Tirkî bi hezaran kitêb derdikevin giş bi Tirkîne, û Kemalîst in, em deynakin, çi qewimîye min jî ji salan û caran ji bo Kurdan kitêbek bi Tirkî nivîsîye..? wê çi bi dewletê bê bi vê kitêbê, heger bi vê kitêba min dewlet bihedime tê xuyakirin ku ev dewlet tewşe..)/2/.

Xuyaye ku dijmin ji berî nihade, li sere wî digeriyan, ji sala 1948 an de, dema ku wî yekemîn rojnameya Kurdî bi nave (Dicle Kaynaği)/(Çavkaniya Dicle) piştî rojnameya Agiri 1929-1930, li Stanbolê çap û belav dikir ji kîsê xwe, ji hingî de mamoste M.Anter li gor zanebûna xwe li ser doza Rojhilatê:Kurdistanê di sekinî û têkoşîneke ramanî dikir.

Di sala 1950 î de jî, kovareke civakî, konevanî, û serbixwe li Stanbolê derdixist ji kîsê xwe tenê, bi nave Şark Macmuasi/ kovara Rojhilatê/ amanca wî ji vê kovarê ku welatê wî Kurdistan yê paşketî pêşde here û ku dewleta Tirkî lê guhdar bibe, di sala 1958 an de, careke din, bihiştî û çend hevalên xwe wek: Avokat Canip Yildirim û Ebdurehman Efhem Dolak rojnameyeke rojane li Diyarbekirê derxistin bi nave Ilerî Yurt/Welatê Pêşketî/, hingê armanca wan ji vê

Institut kurde de Paris

rojnamê ku doza Kurdî di nav xwendekarên Unîversîtî de belavbikin da ku serwxtî rewşa Kurdistanê bibin, lê ji bo gotareke Apê Mûsa bi nave Kimil, Mûsa Anter û herdû hevalên xwe hatin girtin, hingê Apo Mûsa straneke Kurdî kiribû nav gotara xwe de, ew stiran ji devê keçek Siwêreklî girtibû evin çend malik ji wê stiranê:

Bi çiya ketim lo apo, çiya melûl bûn rebeno

Ceh seridîn lo apo, genim hûrbûn rebeno

Kimil hatê lo apo, bi refaye rebeno

Xwar genime lo apo, hişte kaye rebeno

Bi weşandina Kimil re di Ilerî Yurd de, piraniya rojnameyên Tirkan yên wê demê li dijî Apê Mûsa û hevalên wî sekinîn ta ku dewletê rojnameya wan sekinandin û ew û hevalên wî girtin, lê di roja 11/12/1959 an de, ew berdan belê piştî berdana wan bi şeş rojan ango17/12/1959, careke din Apê Mûsa tevî /49/ hevalên xwe hatin girtin bi sûcê Kurdayetiyê û komonistiyê...

Wiha di zindanê de man, ta sala 1963 an, hingê ji nû biryara dadgehê hate dan, bi darvekirina Mûsa Anter û Dr. Şivan(Saît Kirmizi toprak), Saît Alçi, Yaşar Kaya, Canip Yildirim, wiha di gel 20 kesên din.

Li ser girtin û berdanên mamoste Mûsa Anter, Newafê Qaso ji gundê Zorava, ev serpêhatiya Mûsa Anter û dadgehvan ji min re got: Apê Mûsa carekê ji mere got: Carekê hakim ji min pirsî tu çi karî dikî..? Min lê vegerand û

Institut kurde de Paris

got: Ez ji hepsê derdikevim û diçim malê karê xwe û hepsê dikim! Hakim matmayî ji min re got: Çawa ?!!

Min lê vegerand û got: Dema ez ji hepsê diçim malê, di derd û kulê gelê xwe de diponijim û wiha ji neçarî ez li ser êş û birînên wî di nivîsim, dewlet jî wê bê min bigre û bixe hepsê, ma ez ne karê xwe û hepsê dikim??!!

Mûsa Anter bêtirî 10 caran hatiye girtin, û her cara ku diçû hepsê, heps sipî dikir û digot: Mala me ye dive em lê miqate bin.. û bêtirî carekê nave wî hatiye xwendin bi darvekirinê, û di tev girtinên Kurdên Tirkiyê de, Mûsa Anter hatiye girtin, ma di sala 1964 an de, ne hat girtin bi /51/ kesên Kurd re ! an di sala 1966 an de, ne hat girtin bi /244/ kesên Kurd re !! an di sala1977 an de, ne hat girtin bi doza/nîqa/ ku wî û çend hevalên xwe (Komela kulturiya rojhilata şoreşger) sazkirine..wiha ta girtina wî ya dawîn di sala 1990 î de, hingê belavbû ku Mûsa Anter di bin lêdanê de hatiye kuştin.

Mûsa Anter di piraniya rojname û kovarên Kurdî de, dinivîsand û alîkariya xwediyê wan dikir, bigire ji rojnameya (Bariş Dunyasi)/dinya aşitiyê/ ta Dicle- Ferat-Deng û Dengê Serekên û di tevan de jî, bi bi Kurdî yan yan jî li ser gelê Kurd bi Tirkî dinivîsand. Ji bilî ku ew xwediyê sê-çar rojname û kovaran bû, lê di wan herdû salên dawî de, Apê Mûsa rojnameyek an kovarek ne hişt û tê de ne nivîsand, nemaze di rojnameya bi nav û deng de Welat, hingê wî di quncika bi nave " Tîr " de, tîr berdidan dijmin û neyarên Kurdan, û birengekî zanistî ramanên xwe ji xwendevanan re, şirove

Institut kurde de Paris

dikir û qet wî Kurd di ser Tirkan re, ne girtin, lê bi tenê bêtir rewşa wan û zor û stema wan dida xuyakirin, û ji wan re digot: Ku hûn me ne êşînin, mafê me bidin me, emê hiz we bikin, û ku hûn wekheviyê bi xwazin, emê biratiya we bixwazin gava di got:

(Hevalên Tirkan, pirsek we heye hûn dibêjin(Dil miqabilê dile) willeh hûn ji xwedê yeqîn bikin heta ku karê we ev kar be, em hez ji we nakin û hûn jî zanin ku di ilmê sosyalê de, qayideye ku tiştê mirov jê bi tirse, mirov hez jê nake, belkî hûn di dilê xwe de, dibên qey hûnê Kurdan bitirsînin wê bi vî awayî bibin kolê we!! Lê ez nizanim bê îro Îdara Tirkiyê dawa çi li me Kurdan dike, ma lawo li ser bextê we be hûn hez me dikin, ku em jî hez we bi kin? Ne min ji were got: Heywan jî dijminê xwe bi bêhnê û û bi dîtinê fem dikin, ma hûn herroj bên bavê me bi şewitînin, zarokên me bi kujin, namûsa me li ber lingan bidin, xaniyê ku bi hişkeberê, bi ser me de bi hedimînin ma dê çawa emê ji we hez bikin..? Ma em Kurd wek heywanan jî nayên ku em hez kumê we yê şîn bikin..?)/3.

Tevî ku temenê apo Mûsa Anter giha bû di ser /80/ salî re lê Şêxê nivîskarên Kurd ji nû ketibû bihara xwe û nivîsandinê. Divê sala dawîn de, di van rojname û kovaran de di nivîsand: Welat-Tewlo-Deng-Yeni Ulke-özgür Gündem-Rojname-Medya Güneşi/4...lê mixabin pênûsa wî şikandin.

Mûsa Anter di sala 1918 an de ji diya xwe re çêbûye li gundê Zivingê ku di keve navbera wilayeya Mêrdînê û navçeya Nuseybînê de, nêzîkî tixûbê Sûriyê. Ew bi koka xwe

Institut kurde de Paris

ji malbata Miho Taze ye, ji şaxê Anter e niha mirovên vê malbatê li binya xetê pirin, jina wî keça Abdurehman Rohimî ye ji Hekarê (Camêr ji kesên pêşîn bû, ku kurte çîroka Kurdî di gel helbestan de, di kovara Jîn de dinivîsand ) Lê diya jina wî neviya Mîr Bedirxanê mezin bû, sê zarok ji Apê Mûsa mane, hersê tev diya xwe li Ewropa dijîn nave wan: Dicle-Anter û Reşê/Reşa ye.

Ji bilî giranmêriya Mûsa Anter di kovar, rojname, pirtûk û welatparêziyê de, camêr giranmêriya xwe li dijî polîtîka Kemalîstan da xuyakirin, gava tev berhemên xwe binavê Mûsa Anter di weşandin tevî ku nave Mûsa Anter qedexe bû, û qet wî pîş bi wî paşnavê ku Kemalîstan lê kirbûn nekir/ Almas/.

Apê Mûsa xwendina xwe di avokatiyê de kuta kirbû li Stanbolê, lê wî qet pîş pê ne kir bi tenê kar û xebatên ku pê rehet dibû nivîsandin bû, di salên dawî de, dewleta Tirkan ji girtin û berdanên wî betilîn, vêca ew kirin bin rûniştina zorê de, li gundê wî Stilîlê, ku dikeve rojavayî Nusybînê de, bi dor /15/K.M , wiha wî salên dawîn li gundê xwe burandin, û dibin dara xwe a Çinarê de, bîranînên xwe danîn. Û çendî di xwest ku di bin siya wê de bê veşartin, lê mixabin zordarên Tirkan ta di mirinê de jî, nexwestin daxwazên wî bi serî bibin!! Di sala1990 î de, hikûmetê rê danê bi çûna Stanbolê, hingê wî ew pirtûka bi navê Bîranînên min bi zimanê Tirkî çapkir, ji berî vê pirtûkê jî çar pirtûkên din wî çapkiribûn wek: Kimil/Reqik/1962

Yara Salar1964

Birîna reş1965

Ferhenga Kurdî Tirkî-1967.

Dawî hêjaye em çêtirîn gotin sehkin li ser zimanê nivîskar û rojnamevanê Kurd(Huseyn Deniz) yê ku Şehîd ket berî xalê xwe Mûsa Anter, bi kêmî heyvekê. Hingê wî gotarek ser hovîtî û ne demokratiya Tirkan, dijî nivîskar û rojnamevanan yên pêşverû nivîsandibû di rojnameya Welat de: (ji ber ku dewleta Tirk zilm û zorê li miletê xwe, li li miletê Tirk dike, gelek mirovên pêşverû û welatparêz bê sûc û bê heqî di kuje û winda dike, ne demokrate û guhnade heqê mirovan, li cem ti dewletê rûmeta wî tuneye....)/5.

Gava bihiştî Huseyn Deniz wiha li ser nivîskarê Tirk yên pêşverû û hale wan dinivîse, ma gelo wê çi hale nivîskarên Kurd be, ji destê vê dewletê..??!!.

Em rewşa nivîskarên Kurd di dewleta Tirkî de, datînin ber çavên serokên deletên Aştîxwaz û democrat, ewên ku li ser mafên mirovan di sekinin û di xeyidin, ka wê çi ji mere bikin..? û wê çi doze li dewleta Tirkiyê ya demokrat bikin...?

Sed rehmet li giyanê Şêxê nivîkarên Kurd Mûsa Anter bibare, bihişt cîwarê wî be, û sed rehmet li tev Şehîdên Kurdan be.

---

Institut kurde de Paris

1-Mûsa Anter tîr ! Welat j:13 Gulan1992

2- Mûsa Anter mehkema xortê 77 salê, Welat j:3 Adar 1992.

3- Mûsa Anter, tîr, Welat j:14 Gulan1992.

4-temenê Mûsa Anter gihabû 80 ê, salî, belê di pasporta wî de 74 sal hatibû nivîsîn.

5-Huseyn Deniz, welat, j:14 Gulan1992.

Institut kurde de Paris

# Roger Lescot
## (1914-1975)

Dîplomatê Fransî yê ku kar û xebat di ber Kurdan de kiriye

Gelek kesên biyanî hene, xwe di ber Kurdan de westandine, gelek kar û xebat di ber kêşeya gelê Kurd de kirine, çi di ware dîplomasî de û çi di ware ziman û daneheva folklorê Kurdî de. Ji wan kesan mirov dikare navê dîplomat û Kurdnasê Fransî **Roger Lescot** di pêşiya tevan de bibêje.. Ew jî bi saya dostaniya wî bi Mîr **Celadet Bedirxan** û birayê wî Dr. **Kamîran** re û bi saya kovara wan (Hawar)ê xwe berda vê meydanê. Tevî ku **Iskender Japa** jê kevintire.. Lê ji ber bizav û çalakiyên **Lescot** yên giring û bi berdewamî di ber dîrok, civat û zimanê Kurdî de giringiyek wî heye..

Institut kurde de Paris

## Roger lescot kî bû?

Roger Lescot an Lezgîn Axa; nivîskar û dîplomatekî Fransî bû. Tevayî jiyana xwe di ber gelê xwe yê Fransî de xerc kir.

Ew di roja 18-3-1914 an de li Fransa bajarê Liyonê hatiye dinyayê, di sala 1936 an de, dema ku xwendina xwe di toreya Fransî de, zanistiya siyasî û zimanê rojhilatê de, ji zankoya Parîsê wergirt, hikûmeta Fransî ew rêkir Sûriyê, ji bo birêvebirina Enstîtiya Fransî li Şamê bike, da ku lêkolînên zanistî li dor xelkên herêmê birêve bibe. Hingê wî qenc bi zimanê Erebî, Farisî û Tirkî di zanî bû.

Piştî ku hat Şamê û çav bi Mîr Celadet ket, çav bi kovara (Hawar) ket, wî û Mîr Celadet ji hev hezkirin û bûn dost û heval û wiha Lescot fêrî zimanê Kurdî jî bû û bi Kurdî nivîsand û hez Kurdan kir.

Ji ber hezkirina Kurdan, wî piraniya xebatên xwe yên zanistî di ber Kurdan de xerckirin û wiha gelek babet li ser Kurdan nivîsandin, weke jiyana Kurdan ya civakî, danehev û wegerandina çîrok, metelok û efsaneyên Kurdî bo zimanê Fransî, li ser ola Êzîdiyan lêkolîneke rind nivîsandiye, di destpêkê de ev lêkolîn di kovara HEWAR de bi Kurdî û Fransî di bin nave (Twûsparêz) de hatiye weşandin.

Di sala 1938 de pirtûka wî ya pêşîn bi nave (Êzîdiyên Sûriyê û Şengalê) li Parîsê çap bû ye. Di sala1940 de cildê pêşîn ji pirtûka bi nave (Tekstên Kurdî -Textes Kurdes), ku ji çîrok û metelok û efsaneyên Kurdî pêk tê, li Parîsê çap kiriye, bi zimanê Fransî(257 rûpele).

Di sala 1942 de cildê diwem ji vê pirtûkê (Textes Kurdes) li Beyrûtê çap kiriye, naveroka vî cildî, çîroka Memê Alan e .

Institut kurde de Paris

Di sala 1970 de rêzimana Kurdî (Gramaire Kurde) ewa ku wî û Mîr Celadet Bedirxan bi hev re berhev kiribûn, li Parîsê çap kir(372 rûpel e).

Bê guman ev pirtûka rêzimanî ji çêtirîn xebata zanistiye ta niha li ser rêzimana Kurdî, hêjî kesî jê çêtir ne nivîsandiye.

Afirandin û nivîsandinên Roger Lescot yên ku hêj ne hatine çapkirin gelekin, ji wan yên berbiçav ev in:

-Eşîrên Kurdistanê .

-Çend efsaneyên Kurdî, wek (Derwêşê Evdî, Binefşa Narîn, Siyamendê Silîvî û hin din. ) Ji yên ku vê paşiyê hatin wergerandin û çapkirin:

(Şoreşa Çiyayê Kurdan li dijî dagerkerên Fransîzan li Sûriyê, di sala 1989 de).

Piştî şerê cîhanê yê diwem, Roger Lescot vegeriya Parîsê û di dawiya sala1945 de kursiyeke zimanê Kurdî di zanîngeha Sorbonê de li Parîsê vekir û salekê dersên zimanê Kurdî dan, ta ku Dr Kamiran Bedirxan ji Beyrûtê çû Parîsê û cihê wî girt.

Hingê Roger Lescot di wezareta derve ya Fransi de kar kir û weke dîplomatekî Fransî li gelek dewletên cîhanê geriya, wekî Tûnis, Misir, Yemen, Amerîka, U.N , Îran, Urdun, Tayland...

Institut kurde de Paris

Di sala 1972 de, li Parîsê rûnişt, jineke din ji xwere anî, navê wê Marî Liwîz bû.

Ji wê jinê keçek jêre çêbû, navê wê danî Diyan. Piştî mirina wê bi 78 rojan kurek jêre çêbû, navî wî kirin Mîkaîl, niha li Parîsê bi diya xwe re dijî.

Vê paşiyê nexweşiyê zoriya Roger Lescot bir û ew di roja 3-2-1975 de çû ber dilovaniya Xwedê.

Roger Lescot dora 10 salan di nav Kurdên Sûriyê de jiya, ji wan hezkir, wan ji wî hez kirin, ji wan fêrî zimanê Kurdî bû û li ser wan nivîsand, wan jî, jê hezkirin û çi xwest danê ji efsaneyan, çîrokan, strnan, metelokan.. û gelek qedr û qîmet, gelek rêz jêre digirtin, weke axayekî lê dinerîn, kesekî bi nave wî gazî wî ne dikirin, tevan jêre digotin (Lezgîn Axa), bi nave Lezgîn Axa di nav kurdan de dihate naskirin.

Bê guman rola Mîr Celadet û Dr Kamîran Bedirxan gelekî mezin û giring bû di peydabûna dostekî weke Roger Lescot, ji Kurdan re.

Sed rehmet li giyanê hersiyan be.

Institut Kurde de Paris

# Nelson Mandêla

## Di navera xelata Ataturk û gelê Kurd de

Di sala 1992 an de, komîta hilbijartina xelata Ataturk a aşîtiyê, Nelson Mandêla, serokê kongera netewiya Afrîqya başûr (A.N.C), babetî xelatê dîtin, û xelat ji bo wî hate dayîn. Lê Reşikê dil spî, siyasiyê bi nav û deng, kevintirîn girtiyê zindanên cîhanê Nelson Mandêla ew xelat qebûl nekir, û bi mêranî sedemên redkirina xwe ji rojnamevanên cîhanê re şirove kir û bi vî rengî got: ( Ez nikarim xelateke wiha bigirim.. Xwe bixin şûna kurdan, hingê hûnê zanibin bê çima ez vê xelatê red dikim..)

Bê guman, redkirina pêşewayê Afrîqî, ji vê xelatê re hişt ku nav û dengê kurdan, zilm û zora ku li wan tê kirin, li tevî cihanê belav bibe, nemaze ew zilm û setema ku li kurdên bakur dibe, û bi tevayî li kurdên kurdistnê. Hem jî hişt ku gelên cîhanê serwextî mafê mirovan bibin ku di tirkiyê de tune ye, û ew maf di bin lingan de tê perçiqandin.. Vêca ji encamên wê redkirinê, wezîrê dewleta tirkiyê Şerîf Ercan bangek deranî û têde got: (Yên ku li hember yekîtiya tirkiyê şer dikin nehiştin ku Nelson Mandêla xelatê bigire , yana camêr xelat red ne dikir...)

Di sal1993 an de jî, komîta helbijartina vê xelatê, bi serokatiya Sulêman Demirel civînek li darxistin û li gor pîvanên xwe kes berbiçav ne dîtin ku wî, ji xelata Ataturk re

Institut kurde de Paris

hilbijêrin, ji ber ku ji sala çûyî tirsiya bûn...Vêca ev xelat di sala 1993 an de jî, bê xwedî ma.

## Kê Xelata Ataturk wergirtiye ?

Xelata ataturk a aşîtiyê ji sala 1986 an û vire de tê dayîn û heta niha, van kesan wergirtiye:

- Di sala 1986 an de, joseph Luns, sekeretêrê giştî yê NATO yê wergirtiye.
- Di sala 1978 an de Richard Von Waizsacker, serokkomara Elmaniya wergirtiye
- Di sala 1988 an de, nehatiye dayîn..?!
- Di sala 1989 an de, Takahito Mikaso, impratorê Japonyayê wergirtiye.
- Di sala 1990 î de Kenan Evren, Serokê Cûnta 198oê li tirkiyê wergirtiye.
- Di sala 1991 ê de, careke din ev xelat bê xwedî maye.

Lê di sala 1992 an de, dema ku pêşewayê reş Nelson Mandêla babetî vê xelatê hate dîtin, hingê tev rojnameyên tirkiyê pesnê wî bi xurtî dane, lê piştî ku wî ew xelata gemorî û bi xwîn red kir. Hingê ji nû piraniya rojname û nivîskarên tirkan li dijî reşikê dil spî Nelson Mandêla sekinine û şerê wî kirine, û hinan ji wan gotin; Nelson Mandêla dinya ne dîtiye û cir ne xweşe!!

Institut kurde de Paris

Ma gelo raste, pêşewayê Afrîqiya dinya nedîtiye û cir ne xweşe?!! An li gor bîr û baweriyê xwe çûye ? Ew bîr û baweriyê ku di ber wan de 27 salan ketiye zindanên nijadperestên Afrîqiya başûr de. Ji bo xatirê rizgarkirin û serfiraziya gelê xwe yê hejar û bindest ku wan ji bin destê serdarên sipiyên Afrîqiya başûr derîne. Da ku mafê wî yê mirovantiyê bi cih bîne. Û eger dinya ne dîtî ba, û ne serwxtî doza gelê kurd bûya, wî ew xelat red ne dikir, belê di nerîna tirkên faşîst û şofînî de ku Nelson Mandêla dinya ne dîtiye. Hem jî, di nerîna wan de yê cir nexweş ew kesên ku doza mafê mirovantiyê dikin, û di berde di xebitin..

## Nelson Mandêla Kî ye ?

Nelson Mandêla; ew kesê ku di ber mafê gelê xwe yê reş de, bêtirî 27 salan ji xortaniya xwe di zindanên dewleta Afrîqyayê de derbas kiriye, da ku nîjadperestî, di afrîqiya başûr de, ji navbera gelê reş û sipî de nemîne. Bê guman N. Mandêla têkoşerê yekemîne yê ku bi rast û durist li dij nîjadperestiyê sekiniye. Lewma di cîhanê tevî de tê naskirin ku ew kevintirîn girtiyê zindanên cîhanê ye.

Dema ku dadgeha ewlekariyê a dewleta Afrîqya başûr, biryara xwe di roja (12/06/1964) an da, bi girtina ebedî ji Nelson Mandêla û her heft hevalên wî re dan, bi sûcê ku xerabiyê di dewletê de dikin.. Ji wê rojê ve, hezên pêşverû û leberal di tevayî cîhanê de, bê rewestan, doza berdana wî û hevalên wî kirin. Hem jî piraniya dewletên cîhanê danûstandinên xwe bi dewleta Afrîqiya başûr re birîn. Û ji rexekî din ve jî, têkoşîneke berfireh hate kirin ji bo berdana

Institut kurde de Paris

Mandêla. Lê tev boş derbas dibûn, Û wiha Nelson Mandêla bû sembola dijî nijadperestiyê di cîhanê de.

Di vê girtina wî a dirêj de, dost û hevalên wî, û kebaniya wî (Wînî), nesekinîn û xwe ji dûv berdana wî nedan alî. Ta ku navê berdana Nelson Mandêla û dana mafê mirovên reş di Afrîqiya başûr de bi heve hatin girêdan û bûn yek doz. Ango berdana Mandêla daneye ji mafê mirovên reş re di Afriqiya başûr de. Di wê hingê de jî, gelek filmên sînemayê li dor jiyana wî hatin çêkirin û hin roman, di gel bi dehan gotar li ser hatin nivîsandin, hem jî bi hezaran neme ji serokê Afriqiya başûr re hatin şandin, lê tev bê fêde derketin. Û Nelson Manedla di zindanê de ma, porê wî yê reş têde spî bû, hem jî xelkên wî yên reş, di welatê xwe de, di bin siya darên nijadperestên sipî de bêçare man.

Lê di vê dawiyê de, piştî ku guhertinên nû di rewşa dinyê de çêbûn; Yekîtiya Sovyêt ji hev bela wela bû, komarên wê bûn serbixwe û dema dinyê bû dema demokratiyê.

Hingê N. Mandêla bêtirî 27 salan ji jiyana xwe di zindanên(Johansborgê)de bûrandibû. Wiha û ji nişka ve serokê Afrîqya Başûr (Peter Bota) di havîna 1989 an de, bi pêşewayê Afrîqî N.Mandêla re rûnişt û pêre ket dan û standinê.

Hingê dinya li hev ket; ku çawa serokê nijadperestiyê Peter Bota bi serokê kongera Afrîqî Nelson Madêla re rûniştiye û pêre ketiye dan ûstandinê de..?! Piştî wê

rûniştinê bi çend heyvekê N. Mandêla ji zindanê hate der, dewleta Afîqiya başûr jî, hin bi hin dest bi nerimkirin û rakirina nijadperestiyê ji afrîqiya başûr kirin. Lê pêşewayê reş ta roja dawîn têkoşîneke bêrawestandin kir di ber mafê welatiyên xwe de, û tev welatiyên cîhanê de. Yek ji vê têkoşîn û xebata wî, ku wî xelata Ataturk a aşîtiyê red kir û bi mêranî li tirkan vegerand û got: (Ez nikarim xelatek wiha ji bo aşîtiyê bigirim). Gelo ! Ku ev xelat bihata pêşkêşkirin ji hin kesên kurd re wê wan kesan ev xelat red kiriba, wek ku pêşewayê Afrîqiya Nilson Mandêla redkir an na...?!

Di sala 1993 an de, xelata Nobêl a aşîtiyê ji bo Nelson Mandêla hate dan:

Dr. Nelson Mandêla, ew reşikê dil spî , mirovê ku dijî nijadperestiyê sekinî di afrîqiya başûr de ji bo mafê gelê xwe yê ku bi hezarê KM ji Kurdistanê dûr bû, xelata Ataturk red kir û li tirka vegerand. Ji ber ku camêr di nerîn û baweriyên xwe de dûrî navê xwe didît, ango ku xelat dûrî aşîtiyê bû. Vê paşiyê xuya bû ku ew bawerién wî di cihê xwe de bûn û piraniya gelê cîhanê di wan baweriyan de pêre bûn. Dema ku komîta xelata (Nobel Prize), a Nerwêcî ji bo aşîtiyê serokê reş N. Mandêla û serokê spî yê Afrîqiya başûr Frîdrik Dûklîrk, babetî xelata aşîtiyê dîtin, û di roja 14/10 1993 an de, roja hilbijartin û eşkerkirin navê wan de wiha gotin:

(Van herdû mirovan xebat û bizavek mezin kirine ji bo aşîtiyê û hejî dikin , da ku bingehê demokratiyê bi rastî bête danîn. Weke van mirovan simbolin ji aşîtiyê re).

Di roja 10/12/1993 an de, ango di roja ku Nobel têde çûye ber dilovaniya Xwedê (sala 1896 an), van herdû mirovan xelata xwe li Oslo, paytexta Nerwêc standin, di gel 6,700,000 kironên Nerwêcî.

Gelo! Xelata Ataturk ji ber vê xelatê ve çi bihayê xwe heye..? Wek ku kurdan gotiye : Qenckiro bi xwe kiro , xerabkiro bi xwe kiro..

Aşîtiya ku Nelson Madêla divîbû , aşîtiya ku tev gel di bin siya wê de wek bira bi hev re bijîn. Aşîtiya ku mirovên spî ne di ser mirovên reş re bin, û mirovên tirk ne di ser mirovên kurd re bin, ku her kes li gor zanîna xwe cihê xwe di civatê bigire. Kes xwe di ser kesî re nebîne, hingê ji nû mirov dikare li ser şertên aşîtiyê bigere û xelatan jêre bi nav bikin..

Bê guman Nelson Mandêla serwextî dîroka gelê Kurd bû, di zanî bê gelê Kurd çendî asteng û dijwariyan di jiyana xwe de derbas dike, nemaze li Tirkiyê, û xweş dizanî ku Mustefa Kemal-yê ku xelata Aşitiyê bi navê wî ye- çi afatî anîye serê gelê Kurd û ku niha xelat bi navê wî tê dan û yên ku vê xelatê didin jî, weke Mustefa Kemal in, di eynî rêza wî de di livin û bê şerm û fedî xelata bi navê wî, ji bo aşîtîyê di hilbijêrin.

Careke din bê guman, wê xelata wan cihê xwe li bal xelkên weke wan bi gire, lê li bal kesên bi rûmet û şîmet mîna Dr.Nelson Mandêla û kesên weke wî, tu bihayî nayîne û dawî wê xelata wan bê xwedî bimîne.

# Dr. Ehmed Nafiz Zaza
## 1899 - 1968

### Bijîjk û Wekatparêzê ku nayê jibîrkirin

Dr. Ehmed Nafiz Beg, yek bû ji wan têkoşer û welatparêzên kurdan yên ku navê wan tucarî nayê jibîrkirin di nav gelê kurd de û bi taybetî di nav kurdên Cizîrê de. Ji ber ku ew ji yên pêşîn bû di warê dermankirina xelkê Cizîrê de, ku wî ji tevan bêtir tilivên xwe li ser cihê êş û birînên xelkê danîn, di demekê de ku yên weke wî / Pijîjk / pir kêmbûn / mirov dikare bibêje ku nebûn. Belê vê dawîyê, piştî dor 30 salî ji hatina wî, du pijîjkên din ji kurdan di nav kurdên Cizîrê de peydabûn, wan jî xwest li ser rê û şopa wî Dr. Nafiz bilivin, herdu jî ji zarok û nevîyên ew nifşê ku bi Dr. Nafiz re heval û hogirbûn wek:

Dr. Qasim Miqdad Cemîl paşa Diyarbekirî (di 13.10.1992/ an de li bajarê Qamişlo çûye ber dilovanîya zxwedê).

Yê din Dr. Dara Arif beg Ebas e (hêj li ser karê xwe berdewame...) Van hersê doktoran, tev hêza xwe berdan ser saxlemî û rehetkirina can û bedenên xelkê Cizîrê bi tev nijad û netewên ku tê de dijîn, ji Kard, Ereb, Ermen û Siryan ve.

Bi jîr û zîrekîyên xwe derman ji wan re danîn, û bi hezaran ji xizan û belengazan, ji destê nexweşîyên wek: Sorik, Xwirî, Tîfoîd, Melarya û êşa zirav parastin . . .



Institut kurde de Paris

Bê gûman Dr. E.Nafiz pêşewayê pijîjkên kurdên Cizîrê bû, di heyamê wî de qet pijîjk di nav kurdên Cizîrê de peyda nedibûn hem jî, ji yên ku di pey re hatin zîrektir û zanatirbû, û bêtir bi êş û nexweşîyên xelkê Cizîrê dizanîbû. Ew xelkên ku ji ber nexweîşyên kirêt û gemurî bi hezaran dimirin.

Di wî heyamî dûr de ji berî 77 salan, Dr. Nafiz xwe li nav xelkê Cizîrê girt û bi hezaran ji mirinê parastin. Her roj bi dehan zikkelaştin / operêşin / ji nexweşan re çêdikir, tevî ku zikkelaştin ne ji karê wî yê pijîjkî bû, belê ji neçarî bi wî karî jî radibû, ji ber tinebûna doktorên taybetî.

Institut kurde de Paris

## Dr. Ehmed Nafiz Beg Kî bû?

Dr. Ehmed Nafiz beg kurê welatparêzê kurd mele Yusivê Zazî bû. Mele Yusif mirovekî kurdperwer û zîrek bû. Hem jî, halxweş û têr bû. Di warê olî de jî, zana û birewer bû. Li bajarê (Paxir Madenê ) cîwar bû. Ew bajarê ku dikeve nav bera wilayeta Diyarbekirê û Alezîzê de.

Di dawiya çerxê / 19 / an de, sala 1899 xwedê kurek dayê, navê wî kir / Ehmed Nafiz /. û kurê xwe bi dilovaniyeke mezin xwedîkir, ew bi xwendin û zanîn. li bajarê Madenê û Diyarbekrê da, ta ku xwendina xwe ya seretayî û orte kuta kir. Belê ji bo xwendina bilind û bi taybet xwendina pijîjkiyê, ew rêkir Stenbolê. Wiha Ehmed Nafiz xwendina xwe di pijîjkiyê de li Stanbolê kutakir û lê jî, tevlî kerwanê welatparêzên kurdan bû. Bi wan re hevkarî di

komel û bizavên kurdî de kir û têkilî bi piraniya wan re avakirin, nemaze malbata Cemîl Paşa û Dr. Fuad Hacî ibrahîm Efendî û hin ji Bedirxaniyan.

Belê piştî ku Mistefa Kemal di cenga Yûnan de bi serket, û ew mafê ku ji gelê kurd re, di peymana (Sîver) de, hatibû dan, di peymana / Lozan / de, di bin lingan de windakir, di wê hingê de sala (1923), bi navê Komala / Azadî / komaleke li Diyarbekirê hatibû avakirin, Dr. Ehmed Nafiz yek bû ji lebatên wê, hem jî pijîjkê leşkerî bû, di alayîeke Tirkan de.

Dema ku Şêx Seîdê Pîranê, dest bi serhildana xwe kir, Dr Nafiz jî, di gel bav û mirovên xwe peşdarî şoreşê bûn, lê mixabin şoreş beravêtî bû, û bi hovêtî xelekên kurd hatin kuştin û sergûnkirin , û hezaran jî, hatin ajotin zindanan di nav wan de Dr. E .Nafiz û bavê xwe bûn.

Di sala 1928 an de, Dr. Nafiz ji zindanê hate der, wek piraniya welatparêzên kurdan, wê hingê dem hatibû guhertin nema ew dema berê bû. Tev heval û hogirên wî ji bilî yên kuştî, binxetî Sûriyê bibûn, û li wê derê komelek sazkiribûn di bin navê (Xoybpn) de, vêca wî jî dilkir ku xwe bi wan bighîne, nemaze piştî ku şoreşa Agirî jî, bi hovitîdi sala 1930 ê de hatibû perçiqandin, û serokên wê xwe li îranê girtibûn.

Vêca ji neçarî, Dr. Ehmed Nafiz bi destê birayê xwe yê biçûk(Nûreddîn) girt - hingê temenê Nûredîn 11 sal bûn- û di 1ê êlûna 1930 ê de derbasî sûriyê, bajarê Helebê bû.

Institut kurde de Paris

Di hingî de jî, navbera hikumeta Fransî di Sûriyê de, û Tirkan xweş bibû, û li ser daxwaza Tirka hikumeta Fransî piraniya welatparêz û rewşenbîrên kurdan dabûn hev li Şamê, da ku dûrî sînorê Tirkiya bin.

Vêca bi alîkariya wan kurdên sirgûnkirî li Şamê hikumeta Fransî rê dan Dr. E. Nafiz û birayê wî Nûreddîn Dr. Nûredîn Zaza bi çûna Şamê. Wiha ew jî li Şamê bûn mêvanê welatparêzê kurd ( Elî axa Zilfo ) û tevlî kerwanê welatparêzên kurdên sirgûnkirî bûn wek:

Mîr Celadet Bedir Xan, Ekrem Beg û Qedrî beg kurên Cemêl paşa, Haco axa û hersê kurên wî, Hesen, Çeçan û Cemîl, Qedrî Can, Hemza begê Miksî, Memdûh Selîm Wanlî û Mistefa û birayê wî Bozan şahîn htd û di hingê de Dr. Nafiz bû endamek ji endamên (Xoybûnê).

Belê piştî wê rûniştina bi zorê di Şamê de, bi dor salekê, fransizan rê dane wan kurdên sirgunkirî bi vegera cih û warê xwe, bi şertê ku dûrî sinorê tirkiyê bin. Di hingê de Dr. Nafiz kilînîkek(bijîjkxaneyek), li Şamê, taxa Ernûs vekir. Û di rex karê xwe bijîjkîre re serokatiya (Civata Alîkariyê ji bona kurdên belengaz) dikir. Ew civata ku ji rex welatparêz, şex û axayên kurdan ve hatibû damezirandin, li sûriyê, di serê havina 1932 an de. Hingê Dr. E. Nafiz serokê civatê bû li Şamê, lê li Cizîrê serokê wê Hesen Axa Haco bû. Armanca wan ji avakirina wê civatê ku alîkariya wan kurdên birçî û tazî bikin , ewên ku ji ber tirkan revî bûn sûriyê.

Institut kurde de Paris

Di dawiya sala 1932 an de, Dr. Nafiz bû bijîjkê hikumeta fransî û li gundê Eyndîwerê, nêzîkî sînorê tirkiyê û iraqê kilînîkek vekir, da ku xelkên wê herêmê derman bike. Berî wî bi dor salekê, mamoste Hemza begê Miksî jî, li Eyndîwerê dibistaneke kurdî vekiribû ji bo zarokên kurdan fêrî ilm û zanînî û zimanê kurdî latînî bike. Dema ku kovara Hawarê di 15ê gulana 1932 an de çap û belav bû, hingê Dr. Nafiz di (Kuncika bijîjkî) de dinivîsand û bersivên xwendevanên Hawarê yên tenduristî vedigerand..Evin çend gotin ji nivîsandinek wî, ku di Hawarê de, de belav bûye:

( Di bakurî suriyê de ji Cizîra Mîr Şeref heta rojavayî Cerablisê bi sedan gundên Kurdmancan û eşîrên kurdmanc hene ku bê diktorin, hêj tu dikror pê li wan nekirye. Hecî nexweş dikevin bi destên tebîbê kurdmancî têne derman kirin, carna lê kêm diçin bajaran û xwe nîşanê diktoran dikin.

Tebîbên kurdmancî, ev diktorên ha tiştan dizanin ko carinan bi kêrî nexwşan tên. Lê ne her gavê..).

Hawar, jimar:3 / 1932

Di wê hingê de, Dr. Nafiz dihat naskirin wek bijîjkê Hawarê, hem jî bijîjkê Mîran û ji doktorên kurdan yê herî pêşîn ku bi kurdiya latînî nivîsiye. Û Ta roja iro kem bijîjkên kurdan di vî warî de wek wî hene, tevî ku va bêtirî 77salan derbas dibe.

Institut kurde de Paris

Dr. Ehmed Nafiz bi sincên xwe yên xweş û welatparêziya xwe a zêde, hişt ku tev heval û hogir hez wî bikin û dostaniyê pêre bajon. Vê yekê hişt ku cihê wî di dilê piraniya wan de çêbibe. Ta ku seydayê Cegerxwîn di helbesteke xwe de ji mîr Celadet Bedirxan re wiha dibêje:

Begê min serwerê min, ey Celadet

Şahê min, rêberê min pir edaled

..... ..... ..... ......

Ji Nafiz beg bipirse ey begê min

Derman çiye ji bo derdê dilê min?

Birîndare ji ber daxa welate

Gelo derman heye jêre li ba te..

Hawar, jimar: 9/1932

Mela Ehmedê Namî jî, di derheqa pesnê Dr.Nafiz de wiha gotiye:

Bijîşkê xweş fîdakar û hinermend

Birûska hikmeta te çû Semerqend

Tû fexra miletê Kurdî delalo

Were sahtê bi ke derdim hevalo

Me dilsojek nedîbû xayrî Nafiz

Yekî dî jî, Celadet begê Hayiz

Bese Namî çiqas pesnan dibêjî

Institut kurde de Paris

Ji wan bêhtir hevalê te dibêjî

Çiko lawe ciwane pir delale

Dilovane bi can û mal û hevale

( Ji dîwana Namî: Dazwazname, 1986)

Di destpêka salên 1940 î de, Dr. Ehmed Nafiz xwe li bajarê Qamişlo girt û têde kilînîkek vekir, û bi şev û roj êş û nexwşiyên xelkên Cizîrê bi derman dan zanîn û her heftiyê, roja pêncşemê diçû bajarê Amûdê da ku xelkên wê herêmê jî, derman bike û wan ji nexweşiyên ku wê demê pir belav bûn bi parêze. Ew nexwşiyên wek: xurî, Sorik, Êşa zirav, Tîfo û Melariya..

Ta ku helbestvanên kurdan yê gelêrî jî, helbest avêtin ser halê xwe û zîrekiya Dr. Nafiz di dermankirinê de û gotin:

Derdê min pir girane

Çi derdekî yemane

Ez çûm ser textor Nafiz

Çi textorkî xemane

Bi derdê dila zane

Wextê li pîkê min nerî

Go: Wa Hisênkê Omerî

Êşa Tîfo li te dane

Derdê te pir girane...

Institut kurde de Paris

Di destpêka salên 1950 de, Dr. Nafiz jineke filleh ji xwe re anî , jêre digotin Medam Ivon, ji wê jinê sê zarok jêre çêbûn: kur navê wî Cem e, hiha li bajarê Qahîre dimîne, keçek bi navê Hulya ye, niha li Keneda dimîne û jina yekî filleh e û keçek din bi navê Leyla ye, niha li Beyrûtê dimîne.

Di salên 1960 de, Dr. Nafiz nexwş ket, ji ber nexwşiya xwe mala xwe barkir Helebê, li wir kilînîkek vekir, belê vê paşiyê nexweşiyê zordayê , vêca ji ber nexweşiyê di sala 1968 an de û ji bo dermankirina canê xwe çû Beyrûtê, ku di nexweşxaneya Emerîkî de xwe derman bike, lê mixabin, têde Xwedê canê wî yê nazik stand, bê ku kes ji dost û hevalên wî li ber serê wî hebin. Belê kebaniya wî (Medam Îvon), daxweazên wî bi cî anîn. Ew daxwazên ku her gav jêre digot; Divê ez li gundê Dugirê bême veşartin.

Kebaniya wî termê wî ji Beyrûtê anî Helebê, û ji Helebê tev heval û hogirên wî serwextî mirina wî kirin. Xelkên Cizîrê jî, bi tev neteweyên ku têde dijiyan, ji Kurd, ereb, ermen û siryan ve, çûne pêşiya termê wî, û ew birin gundê Dugirê, (Ku dikeve rojhilatî Qamişlo de bi dor 30km), spartin xaka sar û cemidî, di rex heval û dostên wî de wek: Haco axa, Abdulrehman axa Eliyê Ûnis, Hemze Begê Miksê, Haci Mûsa Begê Xuwêtlî, Hesen axa Haco..hwd

Wek ku me got, Dr. Ehmed Nafiz Beg, ji doktorên kurdan yên pêşîn bû di suriyê de, hem ji yê pêşî bû di warê nivîsîna bi zimanê kurdî latînî de.

Di roja iro de, nexweşxaneyek di bajarê Qamişlo de hatiye avakirin, bi navê Dr. Ehmed Nafiz, camêr Dr. Hiznî

Institut kurde de Paris

Haco ev nav lê kiriye, wek wefadarî ji xebat û karên wî re. Hem jî bi dehan ji xelkên Cizîrê navê wî li zarokên xwe kirine û hêj nav û dengê wî di nav xelkên Cizîrê de belave. Sed rehmet li giyanê wî bibare, buhişt cî û warê be.

***Jêder û perawîz:***

1 - Tev hejmarên kovara Hawarê, tevî pêşgotina Dr. Nûreddîn Zaza.

2 - Dr. Nûreddîn Zaza, (Kurdên nejbîrkirinê: Hemze Begê Miksî), kovara Hêvî, hejmar 7/ 1990, Parîs

3 - Dîwana Namî: Daxwazname, Stokholim, 1986, rûpelê35-36

4 - Min ji devê van kesan nûçeyên derbarî Dr. Nafiz sehkirin û sûde ji gotinên wan ditiye ji bo vê nivîvê:

Mecîdê Haco, yek ji hevalên Dr. Nafiz bû, Şekîb yek ji hevalên kurê Dr. Nafiz bû, û mamoste Samî melle Ehmedê Namî, û endezyar Zinar Zaza .

Institut kurde de Paris

# Sebrî Botanî
## 1925 - 1998

Di roja yekşemê 25/10/1998 an de, li Oslo, paytexta memleketa Nerwêcê, helbestvan, nivîskar û pêşmegê Barzanîyê nemir (**Sebrî Botanî: Sebriyê Ehmedê Temir**), çû ber dilovaniya Xwedê û lê hat veşartin.

Bi koçkirina wî re, stêrek geş û çirisî ji asmanê helbesta Kurdî a resen rijiya.. Belê gelek stêrkên bi ronahî li paş xwe vêxistî hiştin.

Bi ragihandina peyama koçkirina wî re, evîndarên gotinên wî, ev peyam bi xem û dilekî şikestî pejirandin, nemaze ewên ku helbestên wî bi dengê rehmetî Mihemed Şêxo an Ciwan Haco an Izeddîn Temo guhdarî dikirin, wek vê strana bi dengê Mihemed Şêxo:

**Ez bûme pîrê xemcivîn**

**Mest û bê hest jêr nivîn**

**Evîna wê ez pîr kirim**

**Yek car bê huş û bîr kirim**

**Li dil vebûne sed birîn**

**Ji derdê wê gula şêrîn..**

Institut kurde de Paris

An ev stran:

**Tuyî bihişta rengîn**

**Gul û rîhan û Nesrîn**

**Tuyî jan û tu î jîn..**

An eva ku Izeddîn Temo dibêje:

**Dildarim dil birînim**

**Ne şaşim ez ne dînim**

**Ez nexweşê evînim..**

Wek ku diyare mamê Sebrî Botanî, dihat hejmartin yek ji helbestvanên jîr û zîrek, hem jî pêşmergeyekî Barzaniyê nemir bû. Ew Barzaniyê ku mafê kurdan jêre wek nan û avê bû. Sebrî Botanî jî, di wê dibistanê de fêr û mezin bû û dara jiyana wî, bi giyanekî kurdperwerî hat avdan.

Vêca her dem û gav, hêvî û armancên wî yekîtî û serxwebûna gelê kurd bû. Ev yek, di helbesta wî a bi navê (Zengilê Min) de, xweş belûye û diyar e.. Ev helbest jî Ciwan Haco kiriye stran:

**Zingezinga zengilê min**

**Vaye dîsa deng veda**

**Dengê doza miletê min**

**Dinya girt û berneda**

Institut kurde de Paris

**Zingezinga zengilê min**

**Xweş hawar û gazî ye**

**Awaza vî zengilê min**

**Ji ferhenga Qazî ye**

**Her weku birq û birûskê**

**Xwe gîhand çerxa felek**

**Sed xweşî bo vî dilê min**

**Ku min dî kurd bûne yek..**

Mirov dikare bibêje ku gelekan ji hunermendên gelê kurd, kodên tenbûra xwe bi helbestên mamê Sebrî Botanî xemilandine.. Bi saye belavbûna stranên wan hunermendan di nav gel de, evîndarên helbestên Sebrî Botanî pir bûne û nav û dengê wî belv bûye. Nemaze di nav evîndar û dildarên peyva kurdî a resen de.

Institut kurde de Paris

## Sebrî Botanî kî bû?

Navê wî **Sebriyê Ehmedê Temir** e, lê bi navê **Sebrî Botanî** xwe daye naskirin û di seranserî Kurdistanê de bi vî navê dawî hatiye naskirin. Ew bixwe Botî ye, ji hoza Jêliya ye. Di sala 1925 an de, li gundê (Lûdê), navçeya (Eroh: Dihê), girêdaya bajarê Sêrtê, li Kurdistana bakur, ji dê û bavê xwe re çêbûye.

Hêj li ser destê diya xwe bû, Tirkan, **Şêx Seîdê Pîran** û hevalên wî li Amedê bi darvekirin. Vêca di sala 1929 an de, ji ber tirs, zulm û zora tirkan, bavê wî **Ehmedê Temir**, mala xwe bi dûv mala **Resûl axa Mihema** û birayê wî **Agit axa** serokên hoza **Jêliyên Botan** barkir binya Xetê (Sûriyê) naveyça Eyndîwerê. Hingê Dîrika Hemko, wek bajar nebû, Eyndîwerê bajar bû, misteşarê Fransî li Eyndîwerê rûdinşt. Di sala 1936 an de, diya wî a oldar û ji Xwedê bi tirs, kurê xwe Sebrî dişîne bal melayê gundê Sêgirka mala Mîro (Niha ev gund nema ye). Sebrîyê zîrek di demek kurt de Qurana pîroz nîcî dike, lê ji ber tirs û xwestekên Mele zû devij xwendina olîtiye berdide û berê xwe dide xwendina fermî li Eyndîwerê. Li ser vê yekê di Pêşgotina dîwana xwe **(DILISTAN)** ê de wiha dibêje:

(...Li hezar û nehsed û sîh û şeş bibûm mîna gulek geş, dayka mina misilman aşiqa dîn û iman, ez birim ber xwendinê ji bo karê dîn û dinê.. Ez rêkirim Sêgirka paytextê mar û mişka, mala Mîro ava bû , Mîro rewşa mêrabû, nimûneyê camêra bû. Seydayê Xwedê kuştî, kar bazbend û niviştî, aşiq mirîşk û qirûş, dem û gavê şer firoş. Hema bi nav mela bû, rastî, derd û bela bû, çav li hêk û sabûnê, heta roja rabûnê. Ewê Xwedê nehiştî, darfeleqe li destî, her hejand û rahejand, heta jê hat veweşand, patk li min herişand, dilê min pê lerizand, wî dil bi kesî nedisot, dar rakir û hat got: Hey kurê wî sehê pîs, kê dît mizgeft û nivîs ? Nivîs ne karê meye, diyanet yarê me ye, tu hatî nîvê Quranê, pa xelatê min kanî?).

Institut kurde de Paris

Wiha Sebrî Botanî xwendina olîtiyê li paş xwe dihêle û li Eyndîwerê, di gel kurên mala Mîro, ku yek ji wan **Hecî Dehamê Mîro** bû, berê xwe dide xwendina fermî, ta ku digihêje rêza çaran. Ji ber gelek sedemên çetîn dev ji wê jî berdide.. Di vî warî de wiha dibêje:

(..Ez giham rêza çarê, nexwezî min bi wê biharê, min xwendina xwe hêla, ji nû ketim ber pêla. Bêçare û derbider, derdê welat hate ser. Ji eşqa welatvanê min xwe beda meydanê..)

Sebrî Botanî, biçûkanî û xortaniya xwe li Suriyê, navçeya Eyndîwer û Dêrikê di nav **zarokên mala Mîro** de derbas kir û di wan salan de çav bi gelek welatparêzên kurdan ket. Nemaze ewên ku di civata **Xoybûnê** de bûn, hem jî xwendevanên kovara **Hawarê** bûn wek: Resûl axa, Egît axa, Abdulkerîme Melle Sadiq, Haco axa û kurên wî, **Hemze begê Miksî**: Yê ku wê demê mamosta bû li Eyndîwerê, **Dr. Ehmed Nafiz Zaza**: Yê ku wê hingê kilînîkek li Eyndîwerê vekiribû.. Dibe jî, ku çav bi mîr Celadet Bedirxan jî kiribe, dema ku mîr bi serdanî diçû Cizîrê. Hem jî dibe ku **Cegerxwîn** jî di demê de dîtibe.. Jixwe di bin hezkirina helbestên Cegerxwîn de, wî helbest hunandine.. Di destpêkê de, wî piraniya helbestên Cegerxwîn jiber kiribûn. Ew helbestên ku di kovara Hawarê de dihatin weşandin. Mirov dikare bibêje ku Sebrî Botanî yek bû ji şagirtên Cegerxwîn yên pêşîn. Hem jî mirov dikare bibêje ku bi saya kovara **Hawarê** giyanê niştimanperwerî, di huş û mejiyê wî de hat çandin..

Institut kurde de Paris

Di pêşgotina dîwana xwe **(ŞÎN Û ŞADÎ)** de, wiha dibêje:

(..Kuro Sebro! Hê hê êdî piştî îro ez te nebînim ha.. Heke, ezê lingê te bişkînim. Wey babooo, tu dibêjî qey wî kafirê Cegerxwîn tifkiriye devê wî de, wê roja hanê li ser berbanga Mele Xelîlê Xello zire zira wî dihat û qîrkirbû Pîra Torê û Ey Felek..).

Li Suriyê, Sebrî Botanî hez helbestan kiriye û dibe ku nivîsandibin jî. Bi texmîn ew di sala 1946 an de, çûye kurdistana başûr û di eynî salê de, ew li wir hatiye girtin.. Hingî di zindana Mûsilê de helbest gotine û nivîsandine. Ew bi xwe vê yekê şirovedike û dibêje:

(Ji sala 1944 ê ve, ez û şiir bi hevre dijîn, lê ji sala 1946 ê, di zindana Mûsilê de, jîna min di gel vehandinê dest pê dike; dost û hevalên min dixwendina şiiran de kêf xweş dibûn; lê ji nivîsîn û hilgirtina wan dilgiran dibûn..).

Temenê wî dor 20 saliye dema ku diçe Kurdistana başûr. Xuyaye li Zaxo akincî dibe û di sala 1957 an de dikanek lê vedike:

(..Li sala 1957 ê ku dikandar bûm li Zaxo, ji nûyî; lezke bi lezîne ey qelem.. Gelek bûrîne sal û dem.. Ev jîna tehil û derd û xem.. Li dil dijenin sed kelem.. Derke ji dil jana sitem.. Da vejînim gurzê Rustem..).

Li başûre Kurdistanê dibe endamê partiya (P.D.K-Îraq). Û wek kadirekî çeleng û jêhatî kar ji gelê xwe re dike di gel hevalên xwe wek (Elî Esker û hin din).

Di sala 1961 ê de, beşdariyê di şoreşa Îlûnê de dike, ta ku 1967 an de li Kerkûkê tê girtin û pêlekê di zindana Mûsilê de dimîne.. Vê paşiyê bi alîkariya hin hevalan ji zindanê direve û xwe bi serê çiyayên bilind û azad ve digehîne..

Rojekê ji rojan Sebrî Botanî xwe ji ber şerê azadiya welatê xwe ne da alî. Bê tirs dinav bazên serê çiyayên Kurdistanê de dijiya. Ta ku 11 ê Adara 1970 ê pêkhat.. Wiha jî beşdarî di şoreşa Gulanê (1976) de kir û qet xwe ji rêçika Barzaniyê mezin neda alî..

Di sala 1991 ê de, ji neçarî di gel kerwanê penaberan çû Kurdistana bakur-Silopî- û di sala 1992 an de wek penaberekî siyasî çû Ewropa. Li bajarê Oslo, paytexta memeketa Nerwêcê bi cî û war bû.

Ne tenê helbestvanekî zarxweş bû an helbestên wî nêzîkî dilê xelkên kurd bû, lê belê hem jî ew rojnamevanekî jêhatî dihat dîtin û gelek rojname bi nivîsên wî dihatin xemilandin wek: Birayetî, Teaxî, Eliraq, Rewşenbîrî..hwd

Her wiha jî, bi saya navtêdanên wî, gelekan ji dostên wî yên nêzîk, dest bi hunandina helbestê kirin. Wek ku çawa ew bi xwe bi navtêdana seydayê **Enwerê Mayî** li ser hunandina helbestê gur bûye.. Ji wan dostan, mirov dikare van navan bi nav bike: **Abdulrehman Mizûrî. Xelefê**

Institut kurde de Paris

**Zîbarî, Dr. Bedirxan Sindî**.. Gelekî hez hunermendên kurd dikir û bi merdî helbestên xwe dida wan, ji ber vê yekê jî, gelek helbestên wî bûne stran.

Dema ku gotin bê ser Sebrî Botanî, nexasim jînenîgariya wî, mirov nikare di ser hezkirina wî ji dengbêja kurd (Gulbihar) re biqevêze. Çiko wî gelekî hez Gulbiharê dikir û gelek caran navê wê di helbestên xwe de gotiye. Werim em bi hev re gotinên wî seh bikin, bê wî di vî warî de, çi li dor Gulbiharê gotiye:

**(..Min Gulbiharê bi çav nedîtiye, lê ji mêje ku min ji dûr ve naskirî. Naskirinek baş. Nivîsarên min ku hemû ji pesnê wê dagirtîne û bes. Belko hozan jî, ji zarê wê min vehînane û hem li ser wê jî nivîsîne.**

Her perça tu dixwînî, bêhna gulê jê tê. Gula hunermend, pencera min e. Ez geşatî û spiyatî ya hemû dol û nizar û çiyayên Kurdistana rengîn têra dibînim..)

Institut kurde de Paris

Sebrî Botanî; piraniya rojên jiyana xwe bi tirş û talî derbas kirin, gelek qiriktalî û dijwarî di rojên xwe de dîtin, ji roja çêbûna wî li herêma Botan ta roja mirina wî li Ewrûpa, tevi ku ew çend salên li Ewropa jêre xweş bûn û bêhna wî hinekî hatibû ber, lê di baweriya min de ji kalemêrekî weke wî re, dûrî welat, heval, dost, xizm û karan ne tû xweşbûn bû. Wek ku kurd dibêjin: (**Xanîkê pîrê xweştire ji birca mîrê Cizîrê**).

Sebrî Botanî li ser dijwariyên rojên xwe wiha dibêje:

**(..Eger xweşiya jînê diravê pir û xanim û meyxaneye, min dedît, eger geşt û seyran û tenahiye, dîsan li min heram bit, her weku goştê berazê boz li sofî Simo heram. Lê eger xweşiya jînê hezkirina xebat û kêferata rast û paqije, eger xemdariya ji bona welate, ez kesî ji xwe kêfxweştir û bextiyartir nabînim..)**

Û eve şîreta wî ji keç û lawan re:

(..Qîzino, Lawino! Herdem haş û şad bin, da hûn tam bêhna xweşiya jînê bizabibin. Çiko kesê ne haş û şad bit, bi kêrî xebatê jî nayê. Her gav xeman ji xwe re çênekin, ji bil xema milet û welat û mirovantiya dinyayê..)

## ***<u>Berhemên Sebrî Botanî:</u>***

Li gor ku li paş dîwana wî Dilistan: 1984, rûpelê 73 an hatiye nivîsandin, berhemên wî yên çapkirî û ne çapkirî evin:

**A** – *<u>Çapkirî:</u>*

1 – **Şîn û Şadî**, 1979 Bexdad

2 – **Dilistan**, 1984 Bexdad

**B** – *<u>Jêrçap:</u>*

1 – **Dibêjin (1)**

2 – **Şîn û Şadî**, çapa duwem

**C** – *<u>Neçapkirî:</u>*

Institut kurde de Paris

1 – **Bilûra Çiyan**, dîwana sisyan

2 – **Pîra Gerok**

3 – **Dibêjin (2)**

4 – **Kulîlkên Mam Behdîn**: (Çîrok û şiîr ji zarokan re)

5 – **Pak û Pîs** (çîrok)

Lê ji berhemên wî, li gor ku kurê wî Beşîr Botanî, di hevpeyvîna roja 28/10/1998 de, di dengê Emerîka, beşê kurd de, ji seydayê Xelefê Zîbarî re got ku, pirtûkên bavê wî yên çapkirî evin: **Şîn û Şadî, Dilistan û Dengê Metîn û Cûdî** ye, lê yên neçapkirî evin: komek çîrokên gelêrî û romanek li ser gelê Kurd.

Di bîranîna Sebrî Botanî a 10 an de/2008, sê dîwanên wî (**Şîn û Şadî, Dilistan û Bilûra Çiyan**), ji rex Yekîtiya Nivîskarên Kurd/tayê Duhokê ve, di pirtûkekê de hatin çapkirin. Wek ku diyar e, herdû dîwanên pêşî berê jî hatine çapkirin, lê dîwana wî (**Bilûra Çiyan**), cara yekemîne ye ku çap dibe û dikeve ber destên xwendevanan.

Institut kurde de Paris

<u>*Jêder û çavkanî:*</u>

1 - Dengê emerîka beşê kurdî, hevpeyvînek telefonî bi kurê wî (Kawa Botanî) re, di roja 26/10/1998

2 - Dengê emerîka beşê kurdî, hevpeyvînek telefonî bi kurê wî (Beşîr Botanî) re, di roja 28/10/1998

3 - Pêşgotina dîwana Şîn û Şadî / 1979

4 – Pêşgotina dîwana Dilistan / 1984

Gelek pêzanîn jî, ji min re hatin gotin ji gelek kesan, – nemaze ji Mîcerê Egit axa, serokê eşîra êliyan li Binxetê û ji kurê Hecî Dehamê Mîro, yê ku xwediyê gundê Sêgirka Mîro bû.

Institut kurde de Paris

# Mihemedê Cemîlê Seyda

## 1918 - 2005

Ji Licê ta bi Qamişlo

**Mihemedê Cemîlê Seyda** kurê Cemîlê Seyda bû, yê bi nav û deng, ewê ku di sala 1925 an de beşdarî di şoreşa **Şêx Saîd** kiribû. Piştî beravêtina şoreşê, ew jî wek tevayî hevalên xwe binxetî xeta fransî bibû ango hatibû Sûriyê.

Li sûriyê Fransîzan ew jî dûrî sînorê tikiyê kiribûn, û mîna şoreşgerên Serhildana Şêx Saîd, ew jî kirbûn bin rûniştina zorê de li Şamê.

Di sala 1937 an de dema ku serhildana Dêrsimê destpêkir, Cemîlê Seyda di gel Evdilrehîm, birayê Şêx Seîd û çarde peyayên din derbasî tikiyê bûn, pêleke baş di xaka Kurdistana bakur re meşiyan ku xwe bi **Seyd Riza** ve bigihînin, lê mixabin bi rêde yek ji hevalên wan bi navê Huseynê Sawirlî, ku ajanê mîtê Tirkan bû, li wan mikur hat..û wiha di nav wan û leşkerên tirko de bû şer û ceng ..Ta ku Cemîlê Seyda û hevalên wî tev hatin kuştin.

Berî mirina Cemîlê Seyda wî heyfa xwe ji Huseynê Sawirlî stand û ew kuşt...

Ji wê hingê ve Mihemedê Cemîlê Seyda jî bi bavê xwe re binxet dibe.

Institut kurde de Paris

li Şamê dixwîne û li ber destê Mîr Celadet Bedirxan fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî dibe, û li sûriyê dimîne.

Ew di sala 1918 an de li Licê, girêdaya Amedê çêbibû.

Di çend salên dawîn de, wî çend pirtûk bi zimanê kurdî berhev kiribûn wek:

-Ferhenga Jîn, Kurdî- Erebî, sala çapkirinê ne diyare.

-Elfabêya Nûjena Kurdî, 1995

-Jînenîgariya bavê min Cemîlê Seyda, 2000

Ew di roja 09/08/2005an de, li bajarê Qamişlo çûye berdilovaniya Xwedê û di eynî rojê de, ew di goristana taxa Qudûr Beg, de di rex melle Ehmed Namî û şêx Maşoq û Kemal û Şêxmûs de hatiye veşartin.

Institut kurde de Paris

# Seyid Remezanê Berzencî
## 1930- 2004

Seydayê melle Remezanê Berzencî yek ji navdarên mellayên kurd yên welatparêz û bi rûmet bû di nav kurdên Suriyê de( Herêma Cizîrê). .Ew ji mele Ebduqudusê Cemîlê Seyda û Cegerxwînê Hesarî fêrî kurdewariyê bibû û di bin bandora helbestên Cizîrî, Feqeyê Teyran, Elê Herîrî û Cegerxwîn de xwe berdabû nav cîhana tore û wêjeya kurdî û dabû pey navdarên kurdan û wiha pirtûkek ji 5 cildan amadekiriye bi navê (jînenîgariya zanyar û oldarên kurdan di kurdistanê û sirgûnê de). û yek bi navê (Jînenîgariya helbestvanên kurd )j' amade kiriye..

Di gel ku wî car caran helbest ji xwe re di hûnandin..

Navê wî **Remezanê Silêmanê Îbrahîm** bû, bi navê **Seyd Remezanê Berzencî** di nav kurdan de hatibû nas kirin. Ew ji malbata **Berzenciyan e** ya ku bi nav û denge di kurdistanê de.

Di sala 1930 î de li gundê Miherkan, nêzîkî Tirbespiyê çêbib, xwendina xwe li gundê Xizna, ber destê Mele Reşîd bi dawî anîbû.

Di sala 1949 an de li gundê Cimayê, bareşî Qamişlo cîwar bibû, di sala 1965 an de mala xwe barkiribû herêma Kîkan, gundê **Şora Şerqî**, û lê bibû mela ta ku di roja 11/12/2004 çû ber dilovaniya Xwedê, û di goristana eynê gund de hatiye veşartin...

Rehmetî zanyarekî olî bû, hem jî kurdperwerekî dilsoz, wefadar û wêrek bû.

Institut kurde de Paris

Di destpêka damezirandina **Partî** de li sûriyê ji kesên pêşîn bû ku bibû endam û xebat ji dil û can di ber de kir, di nav re jî gelek caran toşî rêtengî û bersivdanan ji rêjîmê ve dibû...

Ji sala 1992 an de xwe dûrî karê rêxistinî kiribû, dest bi danheva jînenîgarî û serboriya zanyar, oldar û helbestvanên kudan kiribû..

Ji şîretên wî ji xortên kurdan re:

((Divê mirov nebe hevalê pîsan, heta ji mirov bê, qenciyê bike û ya herî baş ewe ku, mirov netwa xwe bi parêze û xizmeta gelê xwe bike, razîbûna Xwedê jî têde heye, ji ber ku her kes berpirsyarê dema xwe ye, berpirsyarê mal û malbata xwe ye..))

Min Seyid Remezan wek (**Xocakî Xizir**) nas kir, dema ku ji nişka ve, tevî wê kalitiya xwe, li dergehê nivîskar û helbestvanan dida, da ku jînenîgarî û berhemên wan tomar bike... sed rehmet li giyanê wî bibare, buhişt mala wî be.

Institut kurde de Paris

# Seydayê Keleş
## 1930 - 2007

Stêreke din
ji asmanê helbesta kilasîk a kurdî rijiya

Di roja 18 meha cehzeran de 2007, Seydayê Keleş (Mele Hisênê Bizgûrî) xatirê dawî ji me xwest û çû ber dilovaniya Xwedê, di mala xwe de li bajarê Qamişlo.

Di eynî rojê de, di gel cemawerekî zexim ji evindarên peyva kurdî a resen û rêxistinên kurdî, termê wî hat spartin xaka sar û cemidî, di rex gora Kemal Ehmed, Şêxmûs û şêx Maşûq de, di goristana Qudûr Beg de li Qamişlo.

Seydayê Keleş di sala 1930 î de li gundê Bizgûrê ji wîlayeta Mêrdîne li kurdistana Serxetê(Tirkiyê), hatibû jiyanê. Di 6 saliya temenê xwe de bav û diya wî diçin ber dilovaniya Xwedê, ji feqîrtî Binxet dibe.

Li Binxetê, di temenê 10 salî de, dest bi xwendina olperestiyê kiriye, di sala 1945 an de, dest bi karê welatparêzî û xwendina kurdî kiriye û dan û standinên wî bi rewşenbîrên wê hingê re çêdibin wek Cegerxwîn, Qedrî Can, Mele Ehmed Namî, Seydayê Tîrêj.. û bi wan re dest bi hunandina helbestê dike.. Ji ber ku wî ji biçûkaniyê ve, gelek zilm û zor dîtibû û di gelek cûreyên kar û xebatê kiribû, ji bo pêkanîna gepa nanê xwe û zarokên xwe; ji

Institut kurde de Paris

cotkariyê, şivantiyê, palayiyê û avakirina xaniyan, ji ber van yekan, piraniya ristên wî bi dijwarî û xurtî êrîşî zordestiyê, sitemkariyê û bindestiyê dike, û li dor rewşa gel û welatê xwe bi xurtî sekiniye; ji serketinên welatiyên xwe re lîlandiye û ji têkçûnan re hawar kiriye..

Seydayê Keleş Xwedî 8 dîwanên Helbesta ye:

Ji Dîwanên wî yên çapkirî:

1 – Em û Dijmin, ( Helbest, Beyrût 1981)

2 – Rêka Gel, (Helbest, Cihê çapê û sal nediyarin), belê li gor ku ez serwextim ev diwan di sala 1991 ê de, li Şamê hatiye çapkirin, û pêşgotina wê di 1981 hatiye danîn.

3 – Derdê Millet, ( Helbest, Beyrût 1993)

4 – Ronahî, ( Helbest, Beyrût 2005)

5 – Xebat, ( Helbest, Beyrût 2006)

6 – Gotinên Bav û Kalan, ( Zargotin, Beyrût 2006)

7 – Alfabaya Kurdî,( Ziman, 2006, cihê çapê nediyare )

Yên destnivîs sê dîwan û bîranin e:

1 – Helebçe, Helbest

2 – Berbang, Helbest

3 – Baxistan, Helbest

4 – Bîranînên Min

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque

Di guhestina termê wî de, çend gotin hatin xwendin, ji wan gotinan a rewşenbîrên kurd li Binxetê, ya ku min bi devikî, li ser daxaza heval û hogiran got:

Çax û demê we xweş be, hun bi xêr hatin û bi xêr vegerin

Spas ji we re, ji hatina we re, ji beşdariya we re..

Bêguman iro stêrek ji asmanê helbesta kurdî a kilasîk rijiya. Ew stêr Seydayê Keleş e. Seydê Keleş rewşenbîrekî ji nifşê pişt Hawarê bû, yek ji wan kesan bû, ewên ku xeleka rewşenbîriya kurdî di nav kurdên sûriyê de, bi zimanê kurdî bi berdewamî gerandine, mîna Cegerxwîn, tirêj, mele Namî, Qedrî Can.. Ango ew jî li ser rêbaza kovara Hawar ê û Mîr Celadet Bedirxan meşiya ye. Wî jî dengê xwe tevî dengê Mîr Celadet Bedirxan kiriye û gotiye:( Kuro ! Eybe, şerme, fihête an hînî xwendin û nivîsanina zimanê xwe bibin an mebêjin em kurdin...)

Erê seydayê Keleş xelekek qewîn bû di navbera rewşenbîrên kevin û nû de..

Em wek rewşenbîrên kurd li Binxetê, bi coşeke gur û gerim Seydayê Keleş bi oxir dikin û spasiyên xwe ji hemî kesên ku beşdarî xatixwestina wî bûne pêşkêş dikin.

Seydayê Keleş, yê me tevaye, yê civata xwe ye, yê Kurdewariyê ye...Em bi we re, jêre dilovanî û bihiştê ji Xwedanê gewre hêvî dikin.

Qamişlo 22/06/2007

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# Dr. Vet. M. Nûrî Dersimî
## (1892 - 1973)

### Lehengek Ji Lehengên Welatê Min

Pêwiste ku mirov di govenda mêran de dîlanê bigerine, li gor bejin û bala wan, bejin û bala xwe bihejîne, û pîş û sazên wan ji gelê xwe re derîne.. Erê, êş û azarên wan şanî gelê xwe bide, berxwedan û pêdariya wan, mêranî, dilsozî û wefadariya wan ji xwendevanên zimanê xwe re raxîne..

Di rojên 10-11-12/02/2009an de, bi serdaneke taybet çûme bajarê Helebê, Efrînê û Çiyayê Kurmênc bi tevayî(Deşta Cûmê, Şikakan, Ciyayê Lêlûnê û Navçeya Şêrewiyê), da ku pêzanînan li dor kurdên resen Êzidîyan, kom bikim. Di vê geşt û gerê de, çav bi gelek kesan ketim, bi gelek kesan re axifîm û min pirsa gelek kesan û tiştan ji wan kir. Di nav re jî, min pirsa hin navdarên kurdan mina Dr. Nûrî Dersmî kir.. Ewên ku xebat û bizav di ber kêşeya gelê me de kirine û malê xwe û canê xwe di rêka welatê birîndar de winda kirine..

Wiha ez li Dr. Vet. M. Nûrî Dersimî sekinîm û serboriya wî gelekî bala min kişand.

Dr. Nûrî Dersimî; Yê ku yekî bingehîn bû ji lehengên serhildana Dersimê a 1937 an. Piştî têkçûna serhildanê di dawiya sala1937 an de û bidarvekirina bihiştî Seid Riza

Institut kurde de Paris

serokê serhildanê û her deh hevalên wî, Dr. Nûrî Dersimî ji neçarî û bi halekî xerab xwe gihand Sûriyê, bajarê Helebê. Û wiha her 35 salên xwe yên dawî li Helebê, di nav kurdên çiyayê Kurmênc de derbas kirin.

Belê tevî xwînherikandina wek cobaran di serhildana Dersim de, ew ji desthilanîn neket û xwe ji ber neyartiya Tirko neda alî.. Tirko yê ku heval, dost û xizmên wî kuştin, sirgûn kirin û di zîvariyan de belavkirin.. Û her wiha li Sûriyê jî wek lebatekî aktiv ket nav refên welatparêzên Kurdan de, li kêleka Bedirxaniyan û hevalên wan sekinî û bi wan re kar û xebat di ber kurdewariyê de kir.. Û di sala 1952 an de pirtûka xwe a navdar bi navê: (KURDISTAN TARIHINDE DERSIM), li Helebê çap kir, lê mixabin ku ji rex rijîme ve hat qedexekirin.. Belê, ta di mirinê de jî, Dr. Nûrî Dersimî nexwest neyar zanibe ku têkçûye.. Û razî nebû, ku serê wî li ser ti axê bê danîn ji bil axa çiyayê Dersimê pêve.. Û her dem û gav bi axîn û hesreta axa çiyayê Dersimê bû..

Ji min re gotin; Berî ku Dr. Nûrî Dersemî here ber dilovaniya Xwedê, wî di sala 1964 an de, ew mizgeftika biçûk ku wek xanîkî bû di goristana şêx Henan de, li Kefercenê, ser riya Efrînê, ji nû ve nûjen kir(restore kir), hem jî hewşek ji wê mizgeftê re ava kir û di hundirê hewşê de, gora xwe û a kebaniya xwe Ferîde xanim kola û amade kir û ev nivîs li ser kêla gora xwe nivîsand:

*Dilbirînê Bi Nalîna Welat*

*Mihemed Nûrî Kurê Mella Îbrahîm Colik Oglo*

Institut kurde de Paris

*Li ser vê riya dijwar*

*Min jî kire pir hawar*

*Da ji bo we rojekê*

*Dinya bibe gulbihar*

û her wiha qewîtiyên xwe (wesyet), li dost û hevalên xwe yên nêzik wek: Dr. Mihemed Cafer, Şêx Mihemed Şêx Îsmail Zade û hin din kirin, ku roja bemire qewîtiyên wî bi cî bînin; yek ji wan qewîtiyan, ku wî li çiyayê Kurdaxê, di goristana şêx Henan de veşêrin, da ku her sibeh bayê çiyayê Dersimê bi ser de bibare.. A din ku darbesta wî di ber qunsilxaneya tirkan re derbas kin.. û ya din ku, ew kîsê AXA çiyayê Dersimê, yê ku her dem di bin palgeha wî de bû, di gorê de jî, têxin bin serê wî de.. Belê, û ji min re gotin; dema ku Rehmetî Dr. Nûrî Dersimî di sala 1973 an de koça dawî kir, me ew qewîtiyên wî, wek ku wî dixwest, bi cî anîn.. Lê mixabin gelek kes bi me re beşdar nebûn, newêrîbûn, ditirsiyan..

Di vê gera xwe a çiyayê kurmênc de, min du rojan ser hev gora wî û kebaniya wî ziyaret kir û her car min çend kulîlkên Nêrgizan datanîn ser gora wan. Li ser gora wî wiha hatiye nivîsandin:

*Dilbirînê Bi Nalîna Welat*

*Mihemed Nûrî Kurê Mella Îbrahîm Colik Oglo*

*Li ser vê riya dijwar*

*Min jî kire pir hawar*

Institut kurde de Paris

*Da ji bo we rojekê*

*Dinya bibe gulbihar*

*Li Kurdistana tirkiyê meha azara 1892 an çêbûye*

*Li Helebê di roja 22ê meha abê 1973 an de miriye.*

Li ser gora kebaniya wî Ferîde xanim, a ku di rex gora wî de ye, bi tenê ev nivîs hatiye nivîsandin:

*Dilgirtî*

*Ferîde Dersimî Elî(Xiz)Oglî*

Sê zarok ji wan mane, du keç û kurek, keçek li Elmaniya ye, yek li Dûbey ye û kur li Bolgarisanê dimîne. Yezdanê gewre Dr. Nûrî Dersimî û tev têkoşerên Kurdan bi dilovaniya xwe şad bike.

Bi helkeftina ku di roja 02/08/2009 an de, 36 sal di ser koçkirina Dr. Nûrî Dêrsimî re derbas bû, min ev helbest wek bersiv lê vegerandiye:

Lehengo Nûrî Dêrsim

Bijî Çiyayê Dêrsim
Jiyana te î dijwar
Va em bi zêr dirêsim

Bi saya kesên wek te

Institut kurde de Paris

Bihişt bibe mala te

Xweş silava bigihîn

Wan şehîdên riya te

Seyd Riza û Şêx Seîd

Wan sofiyên wek Egîd

Xwîn rijandin bi merdî

Bo azadî bûn mirîd

Bo riya teyî dijwar

Va em jî dikin hawar

Navê te diparêzin

Ji bihar ta bi bihar

Ji Qamişlo û Efrîn

Gul, kulîlka datînin

Ser gora te ezbenî

Dêrsimê bi bîr tînin

Konê Reş / Qamişlo

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# Mihemed Şêxo
## 1948 - 1989

Hunermendê kurd ê navdar Mihemed Şêxo di sala 1948'an de li başûrê rojavayê welêt, li gundê Gîrbanîn ya Qamişloyê tê dinê. Navê wî yê rastî Mihemed Salih Şêxmûs e. Di zarokatîya wî da malbata wî koçber dibe û li gundê Xecokê bi cîh dibe.

Ew, di sala 1959'aan da dest bi xwendinê dike, lê sê sal şûnda dest ji mektebê ber didê. Di salên xwe yê mektebê da Mihemed Şêxo gelek hunermendên kurd nas dike. Ji tesîra wan nêzikî muzîkê dibe û di sala 1969'an da dest bi dengbêjîtîyê dike. Ew salên xwe yên di navbera 1969 û 1972'yan li Libnanê ji bo xizmeta hunerê xerc dike û li Bêrûdê du sal dersên muzîkê distînê.

Di sala 1972'yan de bi hinek hevalên xwe re bi navê Koma Serkeftin komek mûzîkê saz dike. Mihemed Şêxo 1973'yan de derbasî başûrê Kurdistanê dibe û li wir mîna hozan û şervanan kar dike, têkiliyê xwe bi hunermendên kurdên ên din re saz dike. Paşê diçe Şamê, li wir kaseta xwe ya bi navê "Ay Gewrê" derdixe. Lê li wir dewleta Sûriyê Mihemed Şêxo rihêt nehêlê û gelek caran tê binçavkirin. Ser wê yekê carek din berê xwe da Iraqê û di nav refên pêşmergeyan da cîhê xwe digre.

Institut kurde de Paris

Bi têkçûna serhildana Başûr re ew derbasî Rojhilat dibe û li wir kasetekê tomar dike. Li rojhilatê Kurdistanê ji bilî karê xwe yê muzîkê çend salan mamostetiyê jî dike. Demek şûnda rejîma Îranê jî Şêxo wekî dijberê rejimê dihesibîne û der heqê wî de biryara binçavkirinê digre. Ji ber vê yekê Mihemed Şêxo piştî 11 salan carek din berê xwe didê Sûriyê û li wir bi hezkirinek mezîn tê pêşwazîkirin. Dewleta Sûriyê ji têkilîya Mihemed Şêxo û gelê kurd aciz dibe û wî digrê, davêjê zindanê. Lê ev biryar jî dengê Şêxo nade birîn. Ew kilamên xwê yên herî baş li haps û zindanan da dibêje û di kilam û stranên xwe da derd û kulên gelê xwe û daxwaz û bawerîyên wan bi hunermendîyek bilind tîne ziman. Hunermend di sala 1983'yan de vedigere Qamişloyê û heta sala 1988'an de gelek berheman diafirîne. Ji albumên Mihemed Şêxo 14 jê li Stenbolê ji Kom Muzîkê di beşa ARŞÎV'ê de careke din hatin weşandin û gihîştin ber destê hezkiriyên wî. Mihemed Şêxo di 9'ê adara 1989'an da çû ser heqîya xwe. Li Qamişlo 70'ê hezar kes beşdarî merasima cenazeya wî dibe ku hezkirine wisa berê di dîroka kurdan de nehatibû dîtin.

**Hin albumên wî:** - Ay Gewrê, Ay Lê Gulê, Cana min/Sînem, Dil Perîşanım, Gulîzar, Ey Felek/Kewê, Ême, Nesrîn, Nalinêk, Koçê Me Barkir..

Institut kurde de Paris

# Mihemed Şêxo Û Hilbijartina Gotinan

Kêfxweş dibim, ku ez jî dewla xwe di bîra hunermendiya Mihemed Şêxo de dakim û dilê evîndarên deng, awaz û gotinên wî, bi çend gotinan şad û xweş bikim.

Mihemed Şêxo; ew jî miroveki wek me tevan bû. Lê di warê deng û mûzîkê de, mirovekî ji me cuda bû; Mirovekî bi bûyerên gelê xwe ve girêdayî bû, qet hayê wî ji malê dinyê tune bû. Wî tev temenê xwe di ber bîr û baweriyên xwe de xerckirin, bê ku hayê wî ji dîrokê jî hebe, an li cihekî ji navê xwe re di nav rûpelên dîrokê de bigere..

Wek guhdarekî stranên wî, ez jî, yek ji dost û evîndarên guhdariya stranên wî me. Ew stranên ku li ser zilana sê bingehan dizîvire; Deng, awaz û gotin. Mihemed Şêxo bi zanebûn, ev hersê bingeh bi mûzîkê, li gor gewriya xwe û bi gotinan, li gor eş û janên gelê kurd ji xwe dibijartin, bi hevre dihûnan û di nav gel de belav dikir. Guhdarên wî jî, bi sehkirina stranên wî re, di nav pêlên jiyaneke tijî kul, xem, kef û şahî de dûr - dûr diçin û rehet dibin.. Ji ber ku stranên wî akam û bandoreka mezin di his, hest û derûna mirovê kurd de dihêle, wî ji qurm ve dihejîne û bi rex du tiştan ve dehif dide; Welat û evîn..

Mezinbûna navê Mihemed Şêxo ji vê yekê tê; ku dikare du celebên guhdaran peyda bike, yek jê; Ewên bi kul û jan in, a din ewên bi kêf û şahî ne. Ango Mihemed Şêxo di

Institut kurde de Paris

stranên xwe de, şîn û şadiyê bi hev re kom dike.. Dikare bihêle ku mirovên şîn-şad li yek stranê guhdarî bikin. Di baweriya min de ev yek jî vedigere ser bijartina wî ji gotinên stranên wî re. Wî, bi zanebûn gotinên stranên xwe dibijartin û razî nedibû ku her helbestê bistirîne. Li gor ku ez yek ji kesên nêzîkî wî bûm, gelek helbest jêre dihatin ku bike stran, lê ew razî nedibû... Helbestên ku dibijartin, bi piranî li dor zilana welat, bûyerên welat û evînê digeriyan. Ta ku wî evîn jî, bi welat ve girêdida, ango li tembûra kul û êşên welatiya dida, xwe ji welatiyên xwe dûr nedikir, bi reşahiya welatiyan re bû û bi wan re dijiya.. Weha wî helbestên stranên xwe bi zanebûn bijartin û helbestên van helbestvanan gotin, ewên ku welat ji wan re, evin bû, hebûn bû û bi bûyerên welatê xwe girêdayîbûn û bi wan bûyeran re dihejiyan û dixiliyan.

De ka werin emê mêzebikin bê Mihemed Şêxo helbestên kê kiriye stran:

**<u>Cegerxwîn: (1903-1984)</u>**

1- Bilinde bejin û bala te
2- Di baxan de
3- Pêjna te nayê
4- Nalînek tê guhê min
5- Agirê derdê te îro
6- Bexçê gula
7- Ey felek ka ew sera, birc û qunaxed dimin
8- Dil kujtiyê awirên çavê te me
9- Şêrînê nû gihayê.



Institut kurde de Paris

**Tîrêj: (1923 – 2002)**

1- Feryad û sed ax û eman
2- Erê şoxê
3- Dîsa li min awir kişand
4- Em hemî pêşmergan e
5- Wa keça Tora banî

**Yûsif Berazî (Bêbihar), li Serê Kaniyê a suriyê dimine**

1- Hebis û zindan
2- Di xwed e
3- Rabe ji xewê
4- Çibikim bi can
5- Koçê me barkir
6- Di zindanê dinalim ez
7- Ez bûm ferar
8- Welat
9- Derdan çi ez dil jarkirim
10- Şêrîn tu cirana minî
11- Rabe pismam
12- Eman ez bûm warê xeman
13- Şeva tarî
14- Ez jî bi cî bim
15- Yarê şehkir porê siyah
16- Perwîn keça nû gihiştî
17- Eman Dilo

Institut kurde de Paris

**Mele Ehmed Namî (1906 – 1975)**

1- Pêşkevin em serfiraz in miletê kurdî

**Omerê lelê: niha li Zaxo jiyana xwe derbas dike**

1- Xem û xeyalê te ez revandim
2- Ay lê gulê gula min ê
3- Qedera min çendî ciwan e
4- Yarek min heye bi navê jin
5- Peymana min şêrîn yare
6- Perwîn

**Sebrî Botanî (1925 – 1998)**

1- Tu wî bihuşta rengîn
2- Pîrê xemcivîn
3- Mixabin bi navê jîn
4- Vê yarkujê tîrek weşand

**Xelefê Zîbarî: Niha di dengê Emerîka de li washington kar dike**

1- Dema min tu dîtî Nesrîn
2- Kewê xortê serê çiya me

**Dr. Bedirxan Sindî: li kurdistana başûr dimîne**

1- Ey felek bo te dinalim
2- Şermîne dil

Institut kurde de Paris

**Ehmedê Şêx Salih: li Eyndîwerê ye, rex Cizîra Botan**

1- Çûm nav baxê evînê
2- Azad e, ciwan e
3- Cana min !
4- Xortên me lêne bê jimar

**Kemal Şanbaz: Di sala 1975 an de li Beyrûtê hat kujtin**

1- Min bihîstî tu nexweşe
2- Yadê rebenê

**Mustefa Atrûşî: Ji kurdên Başûr e**

1- Min canê dît
2- Sê zerî hatin ber derî
3- Gava ez mirim gelî zindiya

**Dr. Feydellah Xiznewî: Niha li Parîsê diji**

1- Bilbilo
2- Xalxaloka çema

**Ferhad îçmo: niha li Qamişlo dijî**

1 - Destê min bigire

Institut kurde de Paris

**Taha Xelîl: Niha li Qamişlo dimîne**

1 - Meke girî me lorîne

**Mihemed Elî Şakir: Niha li Serê Kaniyê dijî**

1 – Gewrê

2 – Ber dilê min pirr şêrîne

3 – Ez Keçeke Kurdî me

4 – Eyd û Erfat

5 – Zeynebê

6 - Şivan

**Adil Seyfeddîn:**

1- Azade şêrîn

**Beşîr Çaçan (Şêrên): Niha li emarata erebî dijî**

1- tu ji min dûr ket şêrîn yare

**Mihemed Şêxo: Helbestên du stranên xwe danîne:**

1 – Em belav bûn li cîhanî, di sala 1975 an de

Institut kurde de Paris

2 – Rabe Gulîstan ez û tu tenê man, di sala 1984 an de.

Her weha Mihemed Şêxo di dor 20 salan de, dor 114 stranan gotiye, ew stran di gelek kasêtên têvel de belav bûne..

Hem jî, wî stranek bi erebî gotiye bi navê (Zûro libnan), ango herin libnanê...

Belê gelek stranên wî yên din jî hene, ez tênegihiştim bê ji gotinên kêne..Lê ji stranên wî yên navdar wek ku li jor min nişan kiriye ji gotinên wan camêran e.

Institut kurde de Paris

# Rola Mihemed Şêxo

# Di Stran Û Muzîk Kurdî De

Berî pêlek nêzîk, li ser daxwaza Ajansa ANF'ê (**Ajansa Firatê**), Birêz **Cemil Oguz**, edîtorê **Diyarname**yê, dosyayek taybet li ser gorbihuşt **Mihemed Şêxo** û rola wî di muzîka Kurdî de amade kir. Ez jî yek ji wan kesên ku kak Cemil Oguz ew bijartin û pirsên xwe ji wan re şandin, ez vê derfetê zêrîn dibînim, ku van pirs û bersivan di 21 saliya koçkirina Mihemed Şêxo de, ku di roja 09/03/2010 an de ye, diyarî evîndarên deng, awaz û gotinên stranên wî bikim. Fermo evin pirsên wî û bersivên min:

1 - Rola Mihemed Şêxo di nav muzîka kurdî de çi ye?

* Rola wî guhertin û pêşxistin bû. Wî jî wek yên pêşiya xwe; Aramê Dîkran, Seîd Yûsif û Mehmûd Ezîz stran û muzîka kurdî ji kilasîkiyê rizgarkir, pêşde bir, bi awazên nû xemiland û bi guhdaran şêrîn kir.. Erê bi rêka wî jî stran û muzîka kurdî, derbasî qunaxeke nû bû. Tevî temenê wî yê kurt(41sal), wî karîbû bi rêka muzîka kurdî, peyva kurdî a resen bi guhdaran bide hezkirin, şêraniya zimanê kurdî bi rêka awazên xwe yên nû belav bike û xwe di her çar perçeyên Kurdistanê de bide naskirin.. Di wî heyamê ku stran û peyva kurdî ji niha qedexetir bû..

Institut kurde de Paris

2 - Giraniya stranên wî (ji aliyê naverok/gotin û muzîkê ve) çi ye?

* Di baweriya min de giringiya stranên wî, ku wî karîbû bi rêka stranên xwe, di wî heyamê xerab de, di navbera salên1970-1989 an de, hestê netewî kurdî di nav kurmacîaxêfan de belav bike. Ew salên çetîn û dijwar di jiyana kurdan de. Salên ku gelek bobelatên seyr hatin serê Kurdan, wek anîna ereban nav kurdên Binxetê di sala 1974 an de, Derba Everîn di 12 êlûna 1980 î de, qirkirina Barzaniyan di sala 1983 an de, Enfal û Helebçe di sala1988 an de û wiha ta bi mirna wî di sala 1989 an de.. Ji ber ku ew ji xwe piştrast bû û xwedî nameyeke netewî bû, xwedî helwesteke Kurdistanî bû.. Wî bi mêranî û cegerdarî stranên xwe digotin.. Û bi bawerî û dûrdîtinî gotinên stranên xwe dibijartin û wiha helbestên gelek helbestvanên netewî, ku bi kêf û şahiyên gelê xwe re dikeniyan û bi êş, birîn û derdên gelê xwe re digiryan, kirin stran.. Di baweriya min de ji ber vê yekê û ji ber dengê wî yê henûn û awazên tembûra wî a dilovan, cemawerê kurd jî hezê kir û stranên wî bûn wek dermanê birînê ji birîndarên welat re û her wiha ji evîndaran re jî..

3 - Stranên wî bersiva îro jî didin yan na?

* Belê didin çawa na! Dema ku hêj ew kêşeya Mihemed Şêxo bo wê dikir hawar û gazî çareser nebûye.. Hej Beko keleme di bavbera Mem û Zînê de.. Hêj miradê Siyaben û Xecê bi hev nebûye.. Hêj Cegerxwîn xwe nas nekiriye bê kî ye.. Hêj Ehmedê Xanî li yekîtiya Kurdan digere.. Hêj Feqayê

Teyran dûrî ava Dicle dikale.. Hêj Mîr Bedirxan di surgûnê de bi nalenale.. Hêj pêdiviya me bi (Ay felek bo te dinalim bo çi Nergiz çilmisî..), heye..

4 - Mihemed Şêxo li rojavayê Kurdistanê li gundekî Qamişloyê hatiye dinê. parçeyeke din a kurdan bihata dinê dê çi biguheriya? Tesîra wê parçeyê çiqas li ser hebû? Yan jî em di vî warî de dikarin çi bibêjin?

* Bêguman Mihemed Şêxo xwedî name bû û wek ku diyar e her perçeyekî kurdan taybetmendiyek wê heye.. Binxetê û Qamişlo ji bo wî taybet bûn. Taybetiya wan ku Cegerxwîn û pêşengê strana kurdî a nûjen Aramê Dîkran li Qamişlo bûn û ji Qamişlo destpêkirin. Wek ku diyare Aram bi gotinên Cegerxwîn kirasê strana kurdî a kevin çirand û kirasekî nû lê kir.. û wiha bi strana Şev çû ma tu êdî hew tê lo.. destpêkir.. Seîd Yusif, Mehmûd Ezîz û Mihemed Şêxo dan ser şopa wî.. Anku, ez karim bibêjim ku Mihemed Şêxo ji kaniya Cegerxwîn û Aram av vexwar.. Di wî heyamî de, ew kanî li perçeyên din nebû.. Di gel ku Mihemed Şêxo mêr bû, erê mêr bû ku xwe bi şoreşa Barzaniyê nemir ve gihand û di şoreşê de, helbestên hevalên xwe yên helbestvan û pêşmerge wek Sebrî Botanî, Mustefa Etrûşî û Xelefê Zîbarî kirin stran û gotin.. Berî çend rojan Xelefê Zîbarî bi min re axifî, me baş behsa Mihemd Şêxo kir.. Kak Cemîl! Xwezî te baweriyên Xelefê Zîbarî jî naskiribana. Ew dostekî Mihemed Şêxo yê kevn e û baş serwextî rojên wî yên şoreşê û penaberiya Îranê ye..

Institut kurde de Paris

Niha, ew bêjere di Dengê Emerîka, beşê Kurdî de li Waşington.

5 - Ji bo xwedîlêderketina navê wî divê çi bê kirin? (Mînak wekî abîde, peyker yan tiştên din) Kurd bi têra xwe wî bibîr tînin yan na?

* Ta ku em li navdarên xwe nepirsin, li wan bixwedî dernekevin, em pêş nakevin, Mihemed Şêxo navdarekî me ye, pêdiviye em li vî navdarê xwe xwedî derkevin, her sal wî bibîr bînin. Maşellah TVyên me pirr bûne, ku her sal, her TV yek nîv saetê li dor jiyana wî raweste dinya xera nabe.. Ez ji dil spasiya wan TV yan dikim, ewên ku wî û kesên wek wî bibîr tînin..

Di vê biwarê de gazinek mezin ji şaredariya bajarê Nisêbînê dikim, ku ta roja îro hêj Mihemed Şêxo bibîr neanîne.. Çima Nisêbînê? Ji ber ku Qamişlo û Nisêbînê du bajarên cêwî ne, xelkên herdu bajaran ji hemû bajarên kurdan bêtir ji kaniya hunermendiya Mihemed Şêxo vexwarine.. Û wek ku hûn tev dizanin rewşa Qamişlo awarte ye.. Di van salên dawî de çûna ser gora wî, di roja mirina wî de bûye qedexe.. Belê derfetên bîranîna wî li Nisêbînê pir hêsane û ferz dibînim..

Bi vê helketê, ez doza danîna peykerekî Mihemed Şêxo di navtarek Nisêbînê de dikim, bihêvîme ku şaredariya Nisêbînê vê daxwaza min bi cî bîne. Ev daxwaz ne a min tenê ye, a pirraniya cemawerê kurd e.. Hem jî ku navê wî li ser dibistanekê bê danîn.. Her wiha bihêvîme ji şaredarên

bajarên Bakur û hikumeta herêma Kurdistanê ku navê Mihemed Şêxo û kesên wek wî, di ser dibistan, peymangeh, navtar û kolanan re bilind bibe û her wiha hol bi navê wan di zankoyan de bêne bi nav kirin.

Qamişlo, 14.02.2010

Institut kurde de Paris

# Hizniyê Selîm Bavê Adil
## 1932 - 2008

Mîrê Govend û Dîlana Kurmancî

Hizniyê Selîm Bavê Adil an (Şêx), wek ku jêre dihat gotin; bibû perçak ji kultura me, ji mafê wî ye ku di dergehekî ber fireh re derbasî ferhenga kurdî bibe û çima na?! Ew bû yê ku di rojên çetîn û dijwar de, strana me, folklorê me û zimanê me parast û xebat di ber de kir... Erê ew di navbera 50 salî de, mîrê govend û dîlana Kurmancî bû.

Di navbera 50 salî de wî peyva kurdî a resen hembêz kir.. 50 salî dara strana kurdî av da.. 50 salî dibistana Eliyê Mihemed û Ûsivkê Çelebî şopand û ew bi xwe bû dibistan ji şagirtên nû re... 50 salî hişt ku Serxet û Binxet li hev bicivin... 50 salî hewlda ku zinarê Mêrdînê li beriya Mêrdînê bibane.. çiyayê Omeriyan û Bagokê li deşta Xelef axa û Hesinan xwedî derkeve.. Qamişlo ji Nisêbînê dûr nekeve...

Bavê Adil di sala 1932 an de li gundê Herem Şero çêbûye, wek ku diyare ji malbata şêxê Cibir e. Wî hez stran û tembûrê kir, tevî ku lêdana tembûrê di malbata wî de qedexe bû, lê wî xwe fêr kir û bi hezaran bejin li ber tembûra wî hatin hejandin û bi hezaran şahî û govend gerandin...

Institut kurde de Paris

Piştî koçkirina Ûsivkê Çelebî wî barê wî li erdê nehişt, rahiştê û xwe di berde westand.. Ango ew yekî tekane bû di wî heyamî de ku dibistana Ûsivkê Çelebî parast û bi saya wî şagirt çêbûn, ku roja îro ew dibistan hêj li dare. Ji wan şagirtan mirov dikare navê kurê wî Adil Hiznî di sere wan de bibêje, hem jî Seîd Gabarî şagirtekî wî bû, û wiha Îmad Kakilo, Şefîq Bavê Raed û gelekên din.

**Hizniyê Selîm** jêderek bingehîn bû ji Dr. Celîlê Celîl û rehmetî Ordîxanê Celîl re, dema ku di salên heyştêyan de dihatin Qamişlo û zargotina kurdên Binxetê kom dikirin..

Di êlûna 1982 an de, dema ku Prof Dr. Celîlê Celîl ji Yerîvanê hat nav kurdên Sûriyê, hingî wî beşekî xweşik ji stran, çîrok û folklorê Kurdên Sûriyê komkir û di sala sala 1989 an de li Swêdê, di bin navê (**Zargotina Kurdên Sûriyê**) de çapkir. Di wê pirtûkê de, di bin benda176 an de, di derheqî Hizniyê Selîm de, wiha dibêje:

*(176. Werin Dîlanê Esmer: Hatiye nivîsarê 31 gulanê sala 1982 a li Qamişliyê ji zarê tembûrvan û stranvanê eyan Husniyê Selîm. Dengnivîsara stranên wî cem me hene. Xeberê strana me ji zarê dengbêj nivêsiye pey dengnivîsarê. Himberî hevkirina têksta û xeberê dengnivîsarê ferqiya mezin nedan. Husnî ê Selîm: Sala 1931a ji diya xwe bûye li gundê Herem Şero(12 kîlometra ji Qamişlî dûr e). Tembûrvan stranê xwe ji stranbêj Elî Mihemed hîn bûye. Husnî bi xwe ji eşîra Temika ye, Pînar Alî. Bi eslê xwe Şêxî ye. Me ji dengbêj devdevî* hevtê stranê govendê *bi deng û bi qedandina tembûrê dengnivîsiye).*



Institut kurde de Paris

Li vir pênasîna Dr. Celîlê Celîl ji Hizniyê Selîm re xelas dibe, û van stranên wî yên govendê cihê xwe di 25 rûpelên pirtûka wî de girtiye, ji rûpelê 309 ta rûpelê 333 an. Di gotina xwe de dibêje ku wî 70 stran ji zardevê bihiştî daye hev.. lê gotinên stranên ku wî kirine pirtûka xwe de evin: *Ziravê, Dolabê, Gulê, Mencê, Xanimê, Kejê, Siltanê, Êmo, Leylko Leylanê, Keynê giran, Yar De Yar, Besnayê, Xurfanî, Bejna Keçikê, Kinê, Edlayê, Canê, Eyşanê, Xensê, Sînemê.*

Rehmetî dor sed û pêncî stranên govendan, di dor 4/5 kasêtan de tomar kirine.

Di roja 11/12/2008 an de, koça dawî kir û bi beşdarbûna cemawerekî zexim ew li gundê wî Til Şiîrêa Şêxan hat veşartin. Û wiha stêreke geş di esmanê govenda kurdî a resen de rijiya. Evîndarên wî li dor darbesta wî kom bûn û her yekî, bi rengekî ew bibîr anî û xatir jê xwestin.. Nexasim ewên ku gelek caran li ber dengê wî û awazên tembûra wî bejin û bala xwe hejandibûn..

Em ji sed gurzên gulan, hezar gurzên gulan diyarî canê wî dikin û em bi hêvîne ku kurê wî Adil şopa bavê xwe bernede û berdewam bike.. ***Bejna Keçikê*** ji we re dikim diyarî:

Bejna Keçikê, kelha hesinî,

Bejna delalê, kelha hesinî,

Hoste mi berdanê, gîhandim binî,

Ser sînga gewrê, kêfa mezinî..

Institut kurde de Paris

Bejna keçikê, minara Helebê,

Govendek gerya, li deryê neqebê,

Qîz û xort ketnê, celeb celebê,

Dilketim Esmerê, ji dil û kezebê...

Bejna keçikê taka hermelê,

Şîn hat li beriyê, li binê Kerbelê,

Keçik zaro bû, ez pêr ketim belê..

Bejna keçikê minara Fafê,

Sînga te gewrê, berfa Eynkafê,

Tekya mala şêx, naşîno!

Em herne tewafê..

Mala me bar kir, li gelîkî kûr e,

Ser sînga gewrê, hevrêşmê hûr e,

Ez te ramîsim, bajarî dûr e..

Mala me bar kir li gelîkî teng e,

Ser sînga gewrê, hevrîşim reng e,

Ez te ramîsim, lê zû me dereng e..

Welle, tu canî, bille tu canî,

Tu bi sola sorî, bi gorê Mûşanî,

Mal mi xera kir, agir lê danî,

Ji derdê Esmerê, ez ketim vî halî..

Qamişlo, 12/12/2008

Institut kurde de Paris

# Elîkê Betê
## (? - 1919)

Çiyayê Bagokê, çiyak ji çiya-rêzên Toros e. Ev çiya li herî başûrî zincîra çiyayê Toros dikeve; ji rojava ber bi rojhilat ve dirêj dibe. Mirov dikare bibêje ji çiyayê Omeriyan û bajarê Nisêbînê ta bi tixûbên bajarê Cizîra mîr Şeref (Cizîra Botan) û çiyayê Spî dirêj dibe û bi gelek navan hatiye naskirin; çiyayê Torê, Torabdîn, Çiyayê Çêlka, Qelaçê Dasika, lê bêtir bi vî navê dawî (Çiyayê Bagokê), di nav kurdan de hatiye nas kirin. Ji vî çiyayî û ber bi başûr ve deştek dûz û firehe bi navê Deşta Xelef Axa (Sinceqa Xelef Axa) an Deşta Dasika dirêj dibe ta ku digihêje girê Qeresiyê û çiyayê Şingalê.

Herêma Hevêrka jî, cihekî mezin ji vî çiyayî digire. Dibêjin; navê Hevêrka ji navê eşîra Hewêra ya Êzidî hatiye girtin û bi demê re bûye Hevêrka. Di baweriya min de jî, Hevêrkan herêmeke, gelek eşîr têde dijîn û her eşîrek bi serok û gundên xwe naskirî ye. Her ku eşîrek ji eşîrên Hevêrkan xurt û bi hêz bûye, wê eşîrê, eşîrên din kiriye bin destê xwe de û desthilatiya xwe li ser wan meşandiye.. Vêca ev herêm (Hevêrkan), pêlekê ketiye bin destê eşîra Baraviya de, pêlekî eşîra Dilmemikan de, pêlekê eşîra Erebiyan de û vê paşiyê ketiye bin destê mala Osmên (Serhan û Haco) de.. Mirov nikare bibêje ku Hevêrkan fedrasyoneke ji eşîran.. Eger wiha be jî, ew fedrasyoneke bi zor û kotekî ye..

Institut kurde de Paris

Ji sedê salan ve gelek êl, hoz, bavik û ber ji Êzîdiyan, Misilmanan û Xiristyanan di vê çiyayî de bi hev re jiyane û hêjî dijîn û tev di bin desthilatiya mîr Botan de bûn. Lê piştî jihevketina mîrnîşiya Botan di sala 1847 an de bi serokatiya Mîr Bedirxan û têkçûna şoreşa Ezdînşêr di sala 1855 an de û di pey wan re fermana Xelef Axa û malbata wî, hin bi nin rewşa civakî di çiyayê Bagokê de bi tevayî û herêma Hevêrkan bi taybetî lihevketiye; hin ketine û hin nû rabûne..

Her ku eşîrek bi mêraniya xwe xurt û bi hêz bûye Hevêrkan ketiye bin desthilatdariya wê de û wiha di bin desthilatdariya gelek eşîran re derbas bûye.. Dibêjin ji mêj ve desthilatdariya herêma Hevêrkan di destê êşîra Baraviya de bû, bi seroketiya mala Osmanê Xelîl ku paytexta wan gundê Dêrhavê bû.. Di pey wan re ketiye destê eşîra Dilmemikan de, bi serokatiya mala Ismaîlê Werdê ku paytexta wan gundê Keferzê bû.. Vê paşiyê, mala Eliyê Remo ku ji eşîra Erebiyan e, li ber wan rabûne û serkêşiya herêma Hevêrka ji wan standine. Paytexta wan jî gundê Çêlik bû. Li Çêlik ji mala Eliyê Remo re dihat gotin mala Axê.. Di pey wan re serkêşiya Hevêrka ketiye destê mala Osmên; Serhan û Haco de, ku ew bi koka xwe ji koçerên Alika ne û paytexta wan gundê Mizîzexê bû. Dibêjin li Mizîzexê ji mala Osmên re dihat gotin mala Qesrî an mala Osmên. Mala Haco û Betê dibêjin; Mîrê Botan ji pêşiyê me re gotiye; here tu xulamokê minî, min mezinatiya Hevêrkan da te..

Di nav salan re, ji ber mêranîya mala Osmên, nav û deng bi gelek neferên wan ketiye.. Wan jî, berê xwe di

Institut kurde de Paris

herêma Hevêrkan de fireh kirine û wiha bi demê re rola mala Eliyê Remo qelis û lawaz bûye û di encam de mala Osmên şûna mala Eliyê Remo girtine.. Ji kurên Osmên yên ku navdane evbûn: Çelebî, Serhan, Ferho û Hesen. Ji Hesen; Haco, Hemed û Betê çêbûne, ji Betê Elîk çêbûye û nav û deng di herema Hevêrkan de daye.. Û ewe yê ku navê mala Osmên bilind kiriye û navê wî di Kurdistane de belav bûye..

Di wî heyamî de dema ku gundê Mizîzexê paytexta zarokên Osmên bû, Çelebiyê Osmên û zarokên xwe bêtir ji biraziyên xwe Haco, Hemed û Betê xwedî desthilatbûn û nakokî û dilmaniyek di navbera wî û biraziyên wî de hebû, anko zarokên birayê wî Hesen.

Dibêjin rojekê Çelebî çend zilamên gund bi xwe re birine ser bêrmên avê (Çalên Avê an sarincên avê), da ku wan bêrman ji pirik, çirav û beran paqij bikin, Elîk jî bi wan re ye (Elîk yekî bi gewdê xwe kinûgulover bû), Çelebî ji Elîk re jî gotiye; tu jî bi zilaman re dakeve bêrmê û paqij bike.. Lê ev gotina mamê wî Çelebî pê nexweş hatiye. Yek ji Çelebî, yek ji Elîk.. Elîk xwe çem Çelebî kiriye, bi herdû guhên wî girtiye û bernedaye ta ku xwînê di wan re avêtiye.. Piştî xelkê ew ji hev cihê kirine, Çelebî ji Elîk re gotiye; Sêwlekê pîs tu jî zilamî, here heyfa mamê xwe hilîne.. Elîk, ev gotin bi xwe re hilaniye û di nav xwe û nefsa xwe de soz daye ku, heyfa apê xwe Haco hilîne..

Bi vê desthilanîna ku Elîk li ber mamê xwe Çelebî rabûye, nav bi Elîk ketiye û navê wî bi mêranî di nav eşîrên

Institut kurde de Paris

Hevêrkan de belav bûye û wiha dijberî ji berê bêtir di nav mala Osmên de gur bûye; Elîk û kuramê xwe Haco2 ji rexekî ve û Çelebî, Serhan û zarokên xwe ji rexekî din ve..

* * *

Berî vê bûyera Çelebî û Elîk bi dor 20 salan, anko berî ku Elîk çêbibe eşîrên Hevêrkan bibûn du bend. (Di xeleka li dor Haco de ezê vê dubendiya Hevêrkan û bi taybet a mala Osmên bê çawa bûne Hevêrkî û Dekşûrî zelal bikim). Bendek jê bi navê Dekşûrî dihatin naskirin, serkêşiya wê mala Çelebî, Serhan û Ûsivê Axê ji mala Hesen Şemdîn axayên Kercosê dikirin, yên ku wê hingê ji wan re dihat gotin axayên di ser axa re.. Yek jî bi navê Hevêrka bû, serkêşiya wê Hacoyê yekem û herdû birayên xwe Betê û Hemed dikirin, di gel wan gelek ji eşîrên Hevêrkan bi Êzidî, Xiristyan û Misilmanan ve hebûn..

Di baweriya min de ev jî siyasetek tirkan bû ku di nav hoz û êlên Kurdan de dimeşandin, da ku yekîtî di nav wan de çênebe û her dem û gav qelis û lawaz bimînin..

Osmanî ji (Peymana Pîroz) a ku mîr Bedirxan berî hingî di nav êl û hozên Kurdan de çêkiribû bi tirs bûn, vêca nedivîbûn ev yek careke din dubare bibe. Daxwaza wan ku Kurdan xwe bi xwe berdin hev û wan bikin dijminên hev.. Wek ku êl û eşîrên çiyayê Bagokê kirin Hevêrkan û Dekşûrî, li çiyayê Omeriyan jî, Omerî kirin Mehmûdkî û Etmankî û li Tora Mihelmiyan jî, Mihelmî kirin Xelîlbegî û Îssabegî û wiha..

Di şerekî de ji şerên navbera Hevêrkiyan û Dekşûriyan de, Cimoyê Hêştrekî yê ku bi koka xwe, ew jî ji eşîra Alika bû û hevalbendê Dekşûriyan; mala Çelebî û Ûsivê Axê bû, keysê li Hacoyê yekemîn tîne; wî dikuje û serê wî jêdike. (Dibêjin dema ku Cimo xincer biriye ser gerdena Haco ku serê wî jêbike, Haco jêre gotiye: Kurê Hacîra kor! Mirov zilama di stikura wan re jêdike ne di zengelorkê re..!). Piştî ku Hacoyê yekemîn hatiye kuştin, Hacoyê duwemîn û navdar hêj çênebibû, di zikê diya xwe de bû.. Dema ku Haco hatiye kuştin, di nav Dekşûriyan bûye kêf, şahî û dîlan.. Lê diya Cimoyê Hêştrekî girya ye, li xwe xistiye û herdû keziyên xwe kurkirine.. Dibêjin dema Cimo bihîstiye ku diya wî digirî û herdû keziyên xwe kurkirine, bi diya xwe de xeyidiye.. Diya wî lê vegerandiye û jêre gotiye: Kurê min! Li ser te digirîm û min keziyên li ser te kurkirine.. Ne wê sibe dora te jî bê, wê mala Osmên te bikujin..

Piştî kuştina Hacoyê yekemîn bi çend heyvan Hacoyê duwemîn çêbûye. Elîk jî piştî kuştina Hacoyê yekemîn çêbûye. Anko herdû bi temen, nêzîkî hev in.. Wiha herdû pismam; Elîk û Haco bi hev re mezin bûne, bûne xort û heyfa Haco di dilê wan de maye.. Ta ku di şerekî de ji şerên di navbera Hevêrkan û Dekşûriyan de Elîk dikeve pêşiya Cimoyê Hêştrekî û kurê wî Mecîd û herdiwan dikuje. Di wî şerî de Elîk, Mecîdê Cimo dikuje û dide pey bavê wî Cimo, wî jî bi birînên xedar birîndar dike û di ser re disekine, xincera xwe datîne ser stikura wî ku serê wî jêke.. Cimo jê dipirse tu kî yî?

Elîk lê vedigerîne û dibêje: Ez birazyê beranê sor im.

Cimo dibêje: Law heqê te heye, lê ez pîrbûme di heyfa amê te de dernayêm..!

Elîk jêre dibêje: Mane berî kêlîkekê, min kurê te Mecîd jî kuşt..

Hingê Cimo dibêje: Te Mecîd jî kuşt?! Vêca em dibin heyfa mamê te..

Lê seyidekî Bêcirmanî keska xwe davêje ser Cimo da ku Elîk serê wî jêneke- Ji ber ku rêzgirtina Seyidan gelekî mezin bû- Piştî ku Elîk Cimo temam dike, guhê wî jêdike, ji diya Haco re dibe, ew diya ku ji ber kerba Haco re kor bibû.. Dibêjin xelekek ji guharê darînî di guhê Cimo de bû.

Piştî ku Elîk heyfa apê xwe Haco hiltîne, bêtir ji berê, nav û dengê mêraniya wî di nav êzidî, misilman û xiristyanên çiyayê Bagokê û herêma Omeryan de belav dibe..

Di sala 1913 an de, dema ku Elîkê Betê tê Nisêbînê, jinbiyek xwe dexîlî wî dike ku kurê wê ji zindanê reha bike.. Elîk digire ser zindanê û di encam de tev girtiyan berdide û Nisêbînê dixe bin destê xwe de.. Piştî ku artêşa Osmaniyan di hewara Nisêbînê de tê û dora Nisêbînê digirin rê li ber Elîk teng dibe, bi devê tivingê ew û hevalên xwe, xwe ji nav wan xelas dikin û berê xwe didin binya xeta Elmanî, gundê Xerabkortê, bal dostê xwe Tahirê Mehmûd. Hingê xelkên gundên derdorî Xerabkortê dibihîzin ku Elîkê Betê hatiye Xerabkortê, deh-pazde peye xwe didin hev û berê xwe didin

Institut kurde de Paris

Xerabkortê ku Elîkê Betê bibînin. Bi rêde, ev bira zilaman li leşkerên tirkan yên ku bi dûv şopa Elîk de digeriyan, rast tên, hingê serleşkerê cendirman ji wan dipirse; bi kûve hûnê herin? Yek ji wî birê zilaman lê vedigerîne û ji dêlva ku bibêje; Em diçin bal Elîk- ji ber ku bi tirkî nizane- dibêje; (Ben Elîkdir), anko ez Elîk im.. Bi vê gotinê re, cendirme li wan direşînin, ji tirsa canê xwe ku rast ew Elîk û zilamê wî bin wê wan bikujin.. Çimkî gelekî ji Elîk bi tirs bûn. Di wê bûyerê de 13 kes ji wan zilaman hatine kuştin..

Piştî ku Elîk vê bûyerê dibihîze, êdî nema riya xwe bi gundê Xerabkortê dixîne, berê xwe dide çiyayê Omeriyan, gundê Tinatê, bal hevalbendê xwe Mehmûdê Esed axayê Tinatê. Û her wiha artêşa Osmaniyan bi dûv de ye.. Di wê navê re gelek şerên dijwar di navbera wî û artêşa Osmaniyan de diqewime.. Elîk û hevalên xwe 60 rojî di nav Omeriyan de dimînin.. Daxwaza Elîk ji vê çûna Omeriyan ev bû ku, dostê xwe Mehmûdê Esed û pismamê wî Ehmedê Silêman li hev bûne.. Paşê, ji Omeriyan dizîvire gundê xwe Mizîzexê. Belê her û her cendirmên tirkan bi dûv wî û hevalên wî de bûn.. Ta ku di şevekê de ji sala 1914 an dora Mizîzexê dikin wek xelek û Elîk, Haco, Şemûnê Heydo, Hisênê Ferho û gelekên din ji azadîxwazan digrin, wan dibin Xarpêtê dixin zindanê de.

Di sala 1917 an de, bi bertîlan, ji zindana Xarpêtê direvin.. Elîk û çend hevalên xwe vedigerin gundê xwe Mizîzexê, lê Haco xwe li zarokên Îbrahîm Paşayê Milî digire.. Li Mizîzexê, ji kêfa vegera Elîk û hevalên wî re, xelkên gund kêf, şahî, govend û dîlanê digerînin û tivingan berdidin..

Institut kurde de Paris

Lê sed mixabin, ew kêf û şahiya xelkên Bagokê zêde dirêj nekir.. Salek, dû sal di wê navê re derbas bûn, nebûn.. Di havîna 1919 de Elîkê Betê, sehdike ku li gundê Midihê di navbera destbirakê wî Omerê Şêro û êşîrên derdorê de şere.. Elîk bi hewarî xwe bi destpirakê ve digihîne û di şer de, nav di xwe de dide û dibêje; Ez bavê Ûsiv û Nezîr im.. Pêşî kesî bawer nedikir ku Elîk di şer de ye, ji ber ku teva zanîbû Elîk di zindana Xarpêtê de ye.. Bawer nedikirin ku Elîk ji zindanê hatiye der..

Dibêjin di wî şerî de Elîk bi guleyekê ji tivinga Emoyê Şemokî hatiye kuştin.. Bi kuştina Elîk re heval û mirovên wî ji hev bela bûne, artêşa tirkan jî destê xwe danîne ser termê Elîk û termê wî birine qeza Midyadê, sê rojan li rastê hiştine, di roja çaran de, mirovên wê bi qeweta zêran termê wî ji wan standine û birine gundê wê Mizîzexê û ew di goristana (Ziyareta Rastê) de veşartine.

Ji berî çend salan ve neviyê wî (Elîkê Ûsivê Elîkê Betê), ji nû ve gora bapîrê xwe ava kiriye. Ev Elîk hêj sax e û li bajarê Nisêbînê dimîne.

Du kur ji Elîk dimînin; Ûsiv û Nezîr. Ev hedû kur jî di sala 1926 an de bi pismamê xwe Haco re binxet bûne û li gundê Dirêjîkê, nêzîkî Tirbespiyê cîwar bûne. Lê di sala 1950 î de ji ber sedemna.. wan û zarokên pismamên xwe Haco li hev nekirine.. Ûsiv vegeryaye Serxetê/ Tirkiyê û li gundê Kertwênê, bareşî Nisêbînê bi dor 7 km an cîwar bûye.

Institut kurde de Paris

Nezir li Binxetê/ Sûriyê maye, xwe li Evdoyê Ehmed axayê gundê Xalid Gilo girtiye û lê cîwar bûye. Ev gund bi dor 7 km an li bareşî Qamişlo dikeve û himberî gundê Kertwênê ye.

Nezîr, di sala 1973 an de, li gundê Xalid Gilo çûye ber dilovaniya Xwedê û ew di goristana welatparêzên Kurdan de li Gundê Dugirê hatiye veşartin. Temenê wî dor 70 salî bû. Ev zarokên wî hene: Nûrî, Ferzende, Îsmet, Dirêhî, Wecdî, Hiznî, Zehreddîn, Xelîl, Kamîran, Zalê, Tengezar û Restem.

Ûsiv di sala 1992 an de li gundê Kertwênê çûye ber dilovaniya Xwedê û lê hatiye veşartin. Temenê wî dor 85 salan bû. Ev zarokên wî hene: Elîk, Selîm, Behzad, Betê û Medenî.

Ji şerên ku li ser Elîkê Betê hatine gotin: Şerê Nisêbînê, şerê Tinatê (Strana: Hey lê dayê hey lê dayê) û şerê Elîk û Sofî Îbrahîmê Gijalî (Strana: Dêrano).

Ev şerê dawî, di navbera Elîkê Batê û eşîra Elîka de bû. Sofî Îbrahîmê Gijalî jî yekî Elîkî bû, sedema şer ku Evdê Simko, ji gundê Mijmîjokê ji ber pirsgirêka wî bi xizmê wî Gijalîyan re, gilîyê Gijalîyan li cem Elîkê Batê dike.. Ew gilî dibe sedema şer di navbera Elîk û Sofî Îbrahîmê Gijalî de.. Dibêjin ku Elîkê Batê di wê demê de dixwest bide xuyakirin ku, ew di herêmê de qebûl nake kes neheqîyê li kesekî din bike.. Hem jî divîbû bide xuyakirin ku ew hikm li herêmê dike. Û dibêjin ku Elîkê Batê di nav gel de belavkiribû: Ez

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque

qebûl nakim ku kesek werê şelandin, zor û tade li kesekî bê kirin.. Yên ku zêde gaviyan bikin, ezê wan talan bikim..

Dibêjin, vê paşiyê Hisoyê Şemokî û pismamê xwe Mehmûdê Cimikî li ser daxwaza mala Betê û Haco xwarziyê xwe Emoyê Şemokî kuştine û wiha heyfa Elîkê Betê hatiye hilanîn..

Hêjaye gotinê, çend dostên Elîkê Betê ji misilman, êzidî û xirîstyanan hebûn, di tev şeran de wek şêran li kêleka wî bûn.. Pêwîste em navê wan jî bînin ziman; Şemûnê Hina Heydo ji Xiristyanan, Cirdoyê Êzidî ji Êzidiyan, Hemayê Êlo û Omerê Şêro ji Misilmanan. Ev her çar leheng di gel çend lehengên din yên êzidî di tev şer, rûdaw û bûyeran de li kêleka Elîk disekinîn û navê wan bi navê wî re tê gotin û hêjaye em bêjin ku Cirdoyê Êzidî pêre hatiye kuştin.

* - Ev lêkolîn ji zardevê gelek kesan hatiye girtin; hin ji mala Osmên (Betê û Haco) ne, hin ji wan kalemêrên ku ji bav û kalên xwe bihîstine û hin ji êzidî û filehên Tirbespiyê ne û di encam de a ku min durist dîtiye, gotiye.. Ez nabêjim ku her tiştê di vê xepartinê de hatiye rast e.. Wek ku Kurd dibêjin; goşt bê hestî nîne.. Bi hêvî me ji wan kesên ku a rast bêtir zanin, me serwext bikin.

Institut kurde de Paris

## Dara malbata Elîkê Betê

Osmên

↓

Ferho — Miqdad — Hesen — Serhan — Çelebî

Hesen ↓

Hemed — Betê — Haco 1

Betê ↓ — Haco 1 ↓

Xelîl — Elîk — Haco 2

Elîk ↓ — Haco 2 ↓

Usiv — Nezîr — Ûsiv

Usiv ↓ — Nezîr ↓ — Ûsiv ↓

| Usiv ↓ | Nezîr ↓ | Ûsiv ↓ |
|---|---|---|
| Elîk | Nûrî | Dr. Hiznî |
| Selîm | Ferzende | |
| Behzad | Ismet | |
| Betê | Dirêhî | |
| Medenî | Wecdî | |
| | Hiznî | |
| | Zehreddîn | |
| | Xelîl | |
| | Kamîran | |
| | Zalê | |
| | Tengezar | |
| | Restem | |

Qamişlo, 01.11.2010

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# Mele Nûriyê Hesarî
## (Pirêşan)
## 1934 - 2011

Melayê zimanzan û helbestvan.. Melayê ku di bin bandora helbestên Cegerxwîn de şiyar û serwextî derd, jan û nexweşiyên civata xwe bû û li ber şêx Elaeddînê Xiznewî rabû.. Mele, Sofî û mirîdên şêx Elaeddîn jî, şerê wî kirin, ew bi dînbûn û kufrê tewanbar kirin û di encam de pir êşiya.. Jiyanek bi kul, êş û keder derbas kir.. Wî jî, ji kerba navê xwe kir Pirêşan.. Werin, em wî bibîr bînin û silavekê li giyanê wî bikin.

*　　　*　　　*

Di roja (25.01.2011) an de, Mele Nûriyê Hesarî (Pirêşan), ku navdarekî ziman û helbesta kurdî a kilasîk bû di nav Kurdên Sûriyê de, ji nav me barkir.. Bi koçkirina wî re stêrek geş û bêdeng ji asmanê wêjeya Kurdî rijiya.. Lê navê wî, bi bilndî di rêza helbestvanên Kurd de tê rojevê.. Wî jî mîna Cegerxwîn, Palo, Tîrêj, Berazî, Keleş, Rewî.. navê xwe bi berzbûn di qada rewşenbîriya Kurdî de tomar kir.. Û bi xortî rêzgirtina xwe di nav gel de çesipand..

Erê, ew mîna mirîdekî Barzanî bû.. Xemxurekî ziman û rewşenbîriya Kurdî bû.. Bi ked û westandinê; hezkirina xwe di dilê welatiyên xwe de çand û navê xwe zindî kir.. Erê, ez

Institut kurde de Paris

jî ji Yezdanê mezin bi hêvî me ku cihê melayê Pirêşan buhişt be. Wî navê xwe kir PIRÊŞAN, ji ber ku ew di jiyana xwe de pirr êşiya.. Erê pir êş, jan, kul û derd dîtin.. Werin em bi hev re kurtiyekê ji jînenîgariya wî bixwînin:

Mele Nûriyê Hesarî, di 1934 an de li Hesara Kercewsê çêbûye. Di nav Kurdan de bi naznavê Seydayê Pirêşan dihat naskirin. Navê diya wî Xanim e, navê bavê wî Mele Yûsivê kurê Emer e. Emer ji gundê Hêştirekê ji malbata Etmanka, ji şaxê Elikan, ji herêma Hevêrkan bû.

Mele Nûrî ji malbateke xweneda, zana û bîrewer bû. Bavê wî mele bû, diya wî jî keça melan û jineke xweneda bû.

Mele Nûrî di 1939 an de pêşî li cem diya xwe dest bi xwendina Quranê kiriye û li cem wê Mewlûd, Nehculenam, Nûbihar û Rewdneîm xwendine. Di 1940 î de, çaxê ku diya wî li Hesarê giyana xwe spariye Xwedê, wî li bal kekê xwe Mele Huseyin xwendiye. Lê çaxê ku kekê wî çûye leşkeriyê, vêca bavê wî ew xistiye dibistana bi zimanê tirkî ya ku li Hesarê bû.

Mele Nûrî di 1945 an de, dema ku di rêza çaran de dibistana tirkî dixwend, bavê wî jiyana xwe spartiye Xwedê. Îcar kekê wî Mele Hemîd ew ji dibistanê derxistiye û daniye ber xwendina medresê. Piştî demekê ew û kekê xwe Mele Nezir çûne gundê Bilêderê û li cem birayê xwe yê ji dê mane. Pişt re çûye mala xalê xwe Mele Mihemed li gundê Êlihê (niha jê re dibêjin Batman), maye. Ji wir jî çûye gundê

Institut kurde de Paris

Kurrika li Bişêriyê, di medreseya Mele Hesenê Tilmizî xwendiye û ders ji kurê Mele Hesen Mele Faîq girtiye. Piştî demekê ji wir şûnde vegeriyaye çûye Hesarê, ew û kekê xwe Mele Hemîd ji bo xwendinê daketin Binxetê û çûne cem mala Şêx Ehmedê Xiznewî. Li wir, dîsa li cem kekê xwe Mele Hemîd xwendiye heta ku "Sadulaha Gewra" xilas kiriye.

Di sala 1949 an de, dema ku birayê wî Mele Hemîd xwendina xwe ya medresê kuta kiriye, di Kanûna Paşî de vegeriyaye Hesarê, lê Mele Nûrî li gundê Xizna maye.. Li cem Mele Beşîrê Batêrgizî xwendiye. Di sala 1950î de, meha adarê, dema ku Şêx Ehmedê Xiznewî çûye ber dilovaniya Xwedê, ji wir çûye gundê Til Marûf û li bal şêx Elaeddîn kurê Şêx Ehmedê Xiznewî xwendiye. Lê xuya ye ku wî û şêx Elaeddîn li hev nekiriye.. Paşê bûye ji pêbawerên Şêx Masûm kurê Şêx Ehmedê Xiznewî.

Sedema ne lihevkirina wî û şêx Elaeddîn kurê Şêx Ehmedê Xiznewî ev bû; di wî heyamê ku olperistiyê konê xwe bi firehî di ser Kurdên Cizîrê re vegirtibû, gundê Til Marûf, paytexta mala Şêx Ehmedê Xiznewî û kurên wî bû, qublegeha misilmanan bû.. Ji çar hawêr ve sofî û mirîdên mala Şêx lê diqurîyan, wî li wî yê ku karibe bi çarlepkî xwe bi Şêx ve bigihîne û destê wî maç bike.. Di wî heyamî de Cegerxwîn ev helbesta xwe ya navdar di nav cemawer de belav kir:

Şêxê min! Destên te êdî maçî nakim, ez bese

Kavil û wêran te hiştin, ev sera û medrese..



Institut kurde de Paris

Qet bi sîwaka te dijimin, paşve naçin gavekê

Bo çi tev mane perîşan, dîl û bendê davekê..

Bes di pişt perdê de rûne, ey ciwamêr xwe binas

Dijminê jîna welatî, tim bi dest te, tevr û das..

Hêj bibêjim, tê bibêjî; ev Cegerxwîn gawire

Na, di bextê tew Xwedê de, dil bi pêt û agire..

**Cegerxwîn, dîwana Kîme Ez, Beyrût 1973, rûpelê128**

Dengvedana vê helbestê wek peqîna qunbelakê bû.. Mele Nûrî jî di di bin bandora vê helbestê de şiyar dibe, pê tê hejandin û di encam de pîş û kiryarên mala şêxê Xiznewî bi tevayî û yê şêx Elaeddîn bi taybetî protesto dike û li pêşberî wan disekine.. Hingê mala şêx belav dikin ku mele Nûrî jî wek Cegerxwîn dîn bûye û bûye gawir..

Mele Nûrî di jiyê xwe yê bîst salî de (1954), dest bi nivîsandina bi zimanê kurdî kiriye û berhemên xwe hemû bi alfabeya latînî nivîsandine. Di gel wê perîşaniyê, dilêşanî û xizantiya xwe de, wî heta niha bêtir ji deh pirtûkan li pirtûkxaneya Kurdistanê zêde kirine.

Pênasîna wî li ser qaba dawî a pirtûka wî ya bi navê (Axlîma: Pêlên Helbesta Kurdî), ku di sala 1997 an de çap bûye wiha hatiye nivîsand:

Institut kurde de Paris

(Di sala 1934 an de li gundê Hesarê ji diya xwe bûye.. Sala 1939 an dest bi xwendina Quranê kir.. Sala 1949 an di gundê Qere Hesenê re derketî Sûrî, û berê xwe da gundê Xezna û dûv re çû gundê Til Marûf, li bal Şêx Ehmedê Xeznewî xwendina olîtî xwend.. Di bîranînên xwe de dibêje: Li Tirkiyê me (Kurdan) bi zimanê tirkî dixwend û piştî ez hatim Sûrî, me bi zimanê erebî xwend. Di virde min ji xwe re got: Gereke zimanekî me jî hebe, pê bê xwendin. Weke van zimanên din..

Û piştî li helbestên Cegerxwîn û paş re yên Melayê Cizîrî ko di civata melan de dihatin xwendin, guhdarî kir, pir pê kefxweş dibû.. û Piştî hevdîtina wî û mele Ehmedê Palo dest bi nivîsandina helbestên Kurdî kir.. Ne bes wiha; nameyên xwe jî bi kurdî dinivîsandin.. Piştî van karên wî, mala Şêx Xeznewî jê dilgiran dibûn û gotin: Dîn berdaye û çûye gihaye gunehkaran. Xwedîxêran saloxê karê wî gihandin desthilatên rêjîmê û ew, bi çend melayên din re, hatin girtin. Lê bi rêya dostaniya mala şêx hatin berdan..

Ji sala 1966 an ve li Qenat Elsiwês, li bajarê Qamişlo rûniştiye.. Ji sala 1988 an ve, kêferatê bi nexweşiyê re dike û devê wî nagere.)

Erê, Mele Nûriyê Hesarî, di ser deh pirtûkên bi zimanê Kurdî û alfabeya latini re nivîsîne. Hin ji wan bi dektîlo nivîsîne, hinek jî bi pênûsê hatine nivîsandin. Tev di defteran de li ser kaxezê A4 hatine nivîsandin. Piraniya pirtûkên wî helbest in û çend lib jî li ser babetên cuda bi pexşanî hatine nivîsandin.

Institut kurde de Paris

Lê belê heta niha çar pirtûkên wî hatine çap kirin, ew jî evin:

Şoreşa Barzanî: Dîwanek helbest e, di sala 1995 an de çap bûye.

Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî: Ev pirtûka wî di sala 1996 an de mamoste Zeynelabddîn Zinar li Swêdê ji aliyê weşanxaneya PENCINARê ve çap kiriye. Ev pirtûk jî li dor zimanzaniyê ye.

Axlîma: Pêlên Helbetsa Kurdî: Zimanzaniye, di sala 1997 an de çap bûye,

Zevîyek Gazîndan: Dîwanek helbest e, di sala 2000 î de çap bûye û Seydayê Mele Nûrî diyarî ji canê serokê nemir Mele Mistefa Barzanî kiriye. Yên din tev li ser kaxeta ne..

Di dawiya eynî pirtûka xwe (Axlîma) de, navê pirtûkên xwe yên çapkirî û neçapkirî, di bin navê Berhemên Daner de wiha anîne ziman:

Şoreşa Barzanî: Helbest, 1995

Axlîma: Pêlên Helbesta Kurdî, 1996

Rêziman: Destnivîs

Ferhenga Kurdî - Kurdî, Destnivîs

Ferhenga Kurdî - Tirkî, Destnivîs

Ferhenga Kurmancî- Zazî, Destnivîs

Institut kurde de Paris

Mewlida Pêxember, Destnivîs

Vegerandina Zimanê Erebî Şarvîn, Destnivîs

Koledar: Çîrokek Helbestî ye, Destnivîs

Dû Mar: Çîrokek Helbestî ye, Destnivîs, Bi zimanê Erebî ye.

11 Dîwanên Helbestan, Destnivîs

Bîranîn, ji jiyana wî, Destnivîs

Institut kurde de Paris

Mele Nûriyê Hesarî di sibeha roja 25.01.2011an de, di mala xwe de li bajarê Qamişlo koça dawî kir û çû berdilovaniya Xwedê. Di eynî rojê de wefadar û evîndarên wî, ew di goristana taxa Qidûr Beg de li Qamişlo, spartin axa sar û cemidî.. Xwedê wî bi dilovaniya xwe şad bike û buhişta rengîn mala wî be.

Hêjaye gotinê ku rehmetiyê Mele Nûrî hin xelat jî standibûn wek Xelata Festîvala Helbesta Kurdî li Sûriyê û Xelata Koma Narîn a folklorî.. Fermo vê helbesta rehmetî li dor serboriya wî, evîna welat û hejariya wî, bixwînin:

Evîna welat! Gelekî tu zorî

Ez nadim welat, bi çerxê jorî

Bavê min jêre dibêjin Yûsiv

Navek şêrîne, wek dims û hingiv

Diya min bi min, gelkî biha ye

Navê wê Xanim, kîza Mela ye

Ez li Hesarê, çêbûm ji dê re

Diya min zû çû, (Fermo) ji Xwedê re

Şehra me Mêrdîn, li Kurdistanê

Tirk li wan dikin îro fermanê

Jîna min çardeh, gîhame Sûrî

Çi hat serê min, ji destê dûrî

Li min bû peyda, evîna welat

Zimanê min bû, Xabûr û Ferat

Min melatî kir, peyda li gunda

Bûme biyanî, ji rengê Kunda

Geriyam li gunda, nebûme dilxweş

Qirdê min kor bû, bextê min bû reş

Institut kurde de Paris

Hatim Qamişlo destê min vala

Guhneda ser min, keskî ji hevala

Ji ber neçarî, ez ketim xana

Hişê min tev çû, ji derd û jana..

Ev helbest jî, rehmetî li dor mirinê huna ye:

Hey wax ji derdê mirinê, ez pê nizanim wê çikî

Ev bê dila pir ijdehar, bo çî me dê winda bikî

Qîza ji ber xortan dibî, axîn ji dil der nakevin

Îdî nema peyvê dikin, mîna kesê ku bê devin

Geh bav diçî, geh dê diçî, zaro dimînin bê xwedî

Îdî nema ew têr dixwin, lewra dikin tirs û fedî

Hey mirinê ka min çi dî, ku ez ji cîhanê herim

Qey tê bihêlî careké, pey mirinê ez vegerim?!

Bi hatina bihar û Newrozê re bang li keça Kurd kiriye û jê re gotiye:

Qîza ciwan û gulperî

Şewq û şemala xweserî

Institut kurde de Paris

Ger tû dixwazî koçerî

Mizgîn didim va bû bihar

Dakev ji wê asêgehê

Adar giha roja nehê

Serbest were vê bergehê

Bê tirs li ber çavê neyar

Şalûl û bilbil bûne ref

Hespa cîhan tev kirine kef

Saz û bilûr û ney û def

Cerga dikin serxweş û har

Qamişlo, 27.01.2011

Institut kurde de Paris

# Hecî Mûsa Begê Xwêtî
## 1855 – 1928

*Jiyanek bê rawestandin di navbera Deşta Mûşê û revandina Guloya Ermenî de.. Dadgeha Osmaniya li Stenbolê û sirgûna Erebistanê, bajarê Medîna Munewer.. Serleşkeriya hêzên kurdan di şerê Rûssan û Osmaniyan de û dostaniya wî bi Mistefa Kemal Paşa re.. Endametiya wî di Komela Azadî de û bidarvekirina Xalid Begê Cibrî û Yûsif Ziya Begê.. Sirgûniya Anadola Rojava û çavpêketina wî bi Kor Husên Paşa re.. Reva ji sirgûna Anadolê bi Kor Husên Paşa re û derbasbûna Sûriyê, gundê Dugirê.. Çûna Iraqê bi Kor Husên Paşa re û mirina li Sûriyê, gundê Dugirê.. Erê jiyan û dîroka Hecî Mûsa Begê bi bûyerên tevlîhev xemilandî bû..*

* * *

Piştî ku min ji aliyê kovara BÎR hejmara 7 an gotarê mamoste Şakir Epozdemir yê bi navê (Hecî Musa Begê Xwêytî û Seîdê Nuh Begî) xwend, pêre pêre çîroka hatina Hecî Musa Begê û Kor Husên Paşa, nav Kurdên Sûriyê hat bîra min. Ji dema ku ez bîr dibim, di civatên Kurdên Binxetê de qal û behsa hatin û kuştina Kor Husên paşa yê Heyderî û mirina Hecî Mûsa Begê Motkî li gundê Dugirê dihat kirin..

Digotin; Hecî Musa Begê û Kor Husên Paşa, di gundê Xerabkortê re derbasî Sûriyê bûn.. Li ser daxwaza wan,



Institut kurde de Paris

Tahirê Mehmûd axayê eşîra Temikan, ew birin gundê Dugirê, nêzîkî Qamişlo. Hingî Haco axa û Emînê Ehmed (Emînê Perîxanê, serokê eşîra Rema) jî di gel gelek ji giregirên Kurdan yên ku ji ber tirkan revyayî bûn li gundê Dugirê di mêvandariya Silêmanê Ebês axayê eşîra Dorikan debûn û kar û barê xwe ji tevgereke Kurdî re dikirin.. Dibêjin piştî ku Kor Husên Paşa û Hecî Mûsa Begê jî tevî wan bûne, li ser destê mîr Celadet Bedirxan bûne endam di komela Xoybûn de.. Ji ber ku sûnda Xoybûnê xwarin, divîbû di ber de têkoşînê bikin, ew têkoşîn jî ku, xwe bi serhildana Agirî ve bigihînin û li kêleka serokê wê, Ihsan Nûrî Paşa ala azadiya welatê xwe bilind bikin..

Wiha di serê bihara 1928 an de Hacî Mûsa Begê û Kor Husên Paşa ji Dugirê, berê xwe dane Iraqê, da ku ji gundê Barzan xwe bi çiyayê Agirî ve bigihînin.. Lê mixabin li bajarê Mûsilê ji rex Ingilîzan ve hatine girtin û careke din ew li sûriyê, gundê Dugirê vegerandine.. Li Dugirê Hecî Mûsa Begê bi nexweşiya Melariya ketiye û di nav çend rojan de canê xwe ji dest daye û miriye. Hingî ew li serê kûpê girê Dugirê veşartine û ta niha gora wî li wire. Ji wê hingê ve girê Dugirê bûye guristana welatparêzên Kurdan. Gelek ji mezinên Kurdan têde hatine veşartin wek: Haco axa, Silêmanê Abbas axa, Ebdulrehman Axayê Eliyê Ûnis, Dr. Ehmed Nafiz (Birayê Dr. Nûreddîn Zaza), Hemze Begê Miksî, Arif Beg Abbas, Dr. Qasim Miqdad Cemîl Paşa, Hesen Hişyar (Mele Hesenê Kurd), Hesen axa Haco û gelek kesên din.. Gundê Dugirê dor 22 k m rojhilatî bajarê Qamişlo ye.

Lê Kor Husên Paşa tevî xulamê xwe careke din, di rêka Mûsilê re derbasî Barzan bûye, da ku ji wir xwe bi Ihsan Nûrî Paşa serokê serhildana Agirî ve bigihîne. Dibêjin ku pêleke baş di mêvandariya şêx Ehmedê Barzanî de maye û li wir çav bi Nûh Beg birayê Hacî Mûsa Begê û Medenî kurê Hacî Mûsa Begê ketiye.. Li Barzan, kar û barê xwe û çûna Agirî kirine. Di wan çend rojên mêvandariya Şêx Ehmedê Barzanî de, Mustefa Bazrzanî (Mele Mustefa Barzaniyê Nemir), xortekî nûhatî û jîr bû, temenê wî dor 25 salan bû, di nav mêvanên malê de diçû û dihat.. Serwextî gotinên ku di civatê de dihatin gotin, nedûrî veşartokên civatê bû û dihisiya ku ava Nûh beg û biraziyê wî Medenî ne zelal e.. Nêtên xerab di dilê wan de hene, planên reş di mejiyê xwe de çandine.. Wan jî dixwest ku bi Kor Husên Paşa re derbasî Tirkiyê bibin û beşdariyê di serhildana Agirî de bikin. Lê berî ku Kor Husên Paşa bi rê keve, Mustefa Bazrzanî birayê xwe Şêx Ehmed agahdar dike ku nêtên xerab di dilê Nûh begê û biraziyê wî Medenî de hene û bi tirse ku di rê de Kor Husên Paşa bikujin.. Li ser vê yekî Şêx Ehmedê Barzanî Nûh Beg li cem xwe wek giraw dihêle û rê dide ku biraziyê wî Medenî bi Kor Husên Paşa re derbasî Araratê bibe.. Bi rêde Medenî kor Husên Paşa û xulamê wî dikuje, serê Kor Husên Paşa jêdike û ji waliyê Wanê re dibe.. Bi vê yekê efûya xwe ji Kemalîstan distîne..

Dibêjin; li Barzan jî, piştî ku şêx Ehmedê Barzanî bi kiryara kirêt a ku Medenî kiriye agahdar dibe, Nûh beg di ber kuştina Kor Husên Paşa de, tê kuştin..

Institut kurde de Paris

Hem jî dibêjin ku di salên 1960 î de, piştî ku Medenî bûye Hecî, di mizgeftek Bedlîsê de destlimêj digire, xortek di ser re disekine û jêre dibêje ka bapîrê min Kor Husên Paşa..?!! Medenî lê dizîvire û mêze dike ku demaçe di dest de ye, nas dike ku hatiye kûştina wî.. Lê vedigerîne; bavê min kuştibû.. Xort jêre dibêje: Bavê te li Sûriyê, gundê Dugirê bi nexwşiya melariya miriye.. Û bi van gotinên dawî re çend fîşekan li ser datîne û wî dikuje.

**Hecî Mûsa Begê Kî Ye?**

Hecî Mûsa Beg kurê Mîrza Begê ye. Malbata wan ji kevin de, di deşta Mûşê, navçeya Xwêtê, gundê Xifyanê de ji begên eşîra Motkan tên naskirin.. Mîrza Beg, di heyamê xwe de, qaymeqamîya Motkan û Xelatê bû û pêlekê jî li Bedlîsê defterdarî kiriye. Mîrza Begê di sala 1885an de ji terefê neyarên xwînî ve hatiye kuştin û wiha kurê wî Mûsa Begê şûna bavê xwe girtiye.

Mûsa Beg di sala 1855 de li navçeya Xwêtê hatîye dinyê.

Di sala 1887 an de Mûsa Begê Guloya Ermenî direvîne. (Gulo: Gulnaz; keça birayê papazekî ermeniyên deşta Mûşê bû, navê wî Garsa Mîro bû). Ji ber vê revandinê û hin kiryarên wî yên din, di sala 1889 an de, dadgeha dewleta Osmanî li Stenbolê Mûsa Beg bi 14 gunehan sûcdar dike. Gunehê herî mezin ku, wî Guloya Ermenî an Gulîzara 14 salî bi kotekî revandiye, ji keçkanî xistiye û paşê xwestiye wê bike misilman û bi birayê xwe ra bizewicîne.. Lê Gulê bi xebera Mûsa Begê nekiriye, bi alîkariya Ermenan ji Mûşê

Institut kurde de Paris

revîyaye, çûye Stenbolê.. Ji encamên vê dadgehê Siltan Abdul Hemîd, Hecî Mûsa Begê sirgûnî Erebistanê, bajarê Medîna Munewer kiriye. Hingê Mûsa Begê kufletê xwe jî bi xwe re biriye û kurê wî Medenî li Medîna Munewer çêbûye û navê wî kiriye Medenî.. Gulo jî teslîmî dê û bavê wê kirine. Vê paşiyê Gulo bi yekî Ermenî ji Mûşê, bi navê Kexam Gerebêtyan re zewicîye..

Di sala 1895 an de, anku piştî 6 salan ji mana Mûsa Begê li bajarê Medîna Munewer, zîvirîye welat. Hecîtiya wî ji wê çûna Medîna Munewer destpê kiriye.

Di salên 1915 û 1916 an de bûye serfermandarê hêzên Kurdistanê di artêşa Osmanî de û bi Mustefa Kemal Paşa re dijî artêşa Rûssan, li deşta Mûş û Bedlîsê, şerekî dijwar kiriye.

Di sala 1919 an de Hecî Mûsa Begê bûye endamê kongreya Erzerûmê û kongreya Sêwasê. Lê di her dû kongeyan de jî beşdarî nekiriye.. Di sala /1922 an de Hecî Mûsa Begê bûye endam di Komela Azadî de, ewa ku li Erzerûmê, di bin serokatiya Xalid Begê Cibrî û Yûsif Ziya Beg de, hatibû damezirandin.

Berî serhildana şêx Seîd bi çend heyvan Serokê Komela Azadî Xalid Begê Cibrî û Yûsif Ziya Beg di gel çend hevalên xwe ku Hecî Mûsa Begê jî di nav wan de bû, li Bedlîsê têne girtin.. Di dadgehê de Hecî Mûsa Begê inkar dike ku ew endame di komela Azadî de.. Di encam de Xalid Begê Cibrî û Yûsif Ziya Begê, di bihara 1925 an de bidarvedikin û Hecî

Institut kurde de Paris

Mûsa bi 15 salan ceze, wî sirgûnî Anadola Rojava, bajarê Aydinê dikin.

**Kor Husên Paşa Kî Ye?**

Kor Husên Paşa, serokê eşîra Heyderan bû, paytexta wî gundê Batnosê bû.. Di serhildana Agirî de çar kurên wî û gelek ji mirovên wî şehîd ketine.. Yek ji endamên Komela Azadî bû. Beşdarî di serhildana Şêx Seîdê Pîran de nekir û piştî herifandina serhildanê bûye asteng di pêşiya hevalên şêx Seîd û kurê wî Elî Riza de, nehiştiye ku xwe bi Simko Axayê Şikakî ve bigihînin.. Piştî têkçûna serhildana 1925 an, Kemalistan piraniya axa, beg, şêx û hempayên Kurdan sirgûnî Anadola Rojava kirin, hingî Kor Husên Paşa jî sirgûn kirin..Tevî ku xizmeta wan kiribû..

Di wê sirgûniyê de, berî efûya sala 1928 an, herdû mezinên Kurdan Kor Husên Paşa û Hecî Mûsa Begê hev dibînin, bi ser halê hev de gilî û gazinên xwe dikin û ji hev re dibêjin; Cihê me li Tirkiyê nema ye.. li Sûriyê di nav Kurdan de partiyek çêbûye, pêwîste em xwe pêve bigihînin û ji xwe re cihekî di nav de bibînin.. Û wiha herdû ji sirgûna li Anadola Rojava direvin, xwe li dewleta Sûriyê ya ku wê hingê di bin destê Fransîzan de bû digirin û derbasî gundê Dugirê dibin...

Dawî, em bêjin nebêjin Hecî Mûsa Begê navdarekî kurd e. guneh û kêmasiyên wî jê re ne.. Bi taybetî gunehê ku wî bi Guloya Ermenî re kiriye.. Erê gunehên wî li kesayetiya wî vedigerin, ne li gelê kurd. Ji ber ku gelê Kurd, ev karê wî

Institut kurde de Paris

protesto kiriye û nerazîbûna xwe jê diyar kiriye.. Ew nerazîbûn jî di strana Guloya Ermenî de xweş belû û diyar e, ku heta niha dengbêjên Kurdan wê neheqiya ku Hecî Mûsa Begê bi Gulo, Gulnaza bavfile re kiriye, di nav xwe de, bi zimanê Kurdî dibêjin;

**Gulo rê girt çû bêriya yekdana..**

**Mûsa Begê ket pêşiyê û şûr kişand ji kalana..**

**Go ezê te bînim ser dînê Misilmana..**

**Gulo go, ez Gulo me Guloka bavfile me,**

**Tu min hûrkî, neyêm ser dînê te me..**

**Ez ne layiqî Mûsa Begê mîrê xwe me..**

Belê ji rexekî din ve, tevî vê protestoya gelêrî ji rex gelê Kurd ve; di baweriya min de rola partiyên Ermeniyan yên wê hingê wek Taşnak û Hançak di mezinkirina vê bûyerê de pir mezin bû.. Wan dixwest misilmanan û bi taybet Kurdan bi vê bûyerê, gunehkar bikin. Û dewletên wek Ingilîzan, Frensîzana û Rûssan agahdarî kêşeya xwe bikin ku zilm û zor ji rex Kurd û Tikan li wan dibe, da ku qezecên siyasî pêk bînin.. Erê, di baweriya min de rola mîsyoner û konsolosên van dewletan li Stenbolê, di mezinkirina gunehê Hecî Mûsa Begê de pir mezin bû..

<u>**Jêder:**</u>

- Şakir Epozdemir: Hecî Musa Begê Xwêytî û Seîdê Nuh Begî, malper kovara Bîrê (www.kovarabir.com)

Institut kurde de Paris

- Konê Reş: Komela Xoybûn1927 û Bûyerên Rojane Yên Şoreşa Araratê1930, bi zimanê erebî, Erbîl, 2000.

- Nacî Kutlay: Hecî Mûsa Beg û Guloya Ermenî. WAN: Kovara Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Swêd, hejmara 4, sala 1992

- Nivîskar Kazim Ozdemîr jînenîgariya xwe wiha rêz kiriye.

Qamişlo, 29.01.2011

Institut kurde de Paris

# Memdûh Selîm Begê Wanî
## 1897 - 1976

Dîplomatê Kurd, Endazyarê Pêwendiyan Di Navbera Kurd Û Ermeniyan De Û Hîmdarê Komela Xoybûnê

Dibe ku di nav gelek miletan de jî wiha be; mirov xwe bi bajarê xwe, gundê xwe an eşîra xwe bide naskirin.. Belê hin caran jî ji ber hunera mirovekî, pîş û sazê mirovekî an mêraniya mirovekî, gundê wî, bajarê wî an navçeya wî bi navê wî tê naskirin. Mebesta min ji vê yekê ku Memdûh Selîm Begê jî xwe bi bajarê xwe Wanê daye naskirin. Di roja îro de eger Cizîra Botan bi Birca Belek û Bedirxaniyan hatibe naskirin.. Bedlîs bi Şerefxanê Bedlîsî û Mele Selîm bilind bûbe.. Diyarbekir bi bedena xwe û navê Şêx Seîdê Pîran hatibe neqişandin.. Mêrdîn bi keleha xwe û navê Mûsa Anter berz bûbe.. Mikis bi Feqiyê Teyran û Hemze beg navdar bûbe.. Bêguman Wan jî bi gola xwe û navê Memdûh Selîm Begê deng daye.. Werim em bi hev re Memdûh Selîm Begê Wanî bibîr bînin, silavekê li giyanê wî bikin û pêlekê di serboriya wî de biponijin.

* * *

Ji mêj ve min divîbû tiştekî li dor jiyan û xebata vî lehengê Kurd Memdûh Selîm Begê binivîsim, vî dîplomatê Kurd û endazyarê ku pêwendiyên Kurdan û Ermeniyan xurt

Institut kurde de Paris

kirin û Hîmê Komela Xoybûnê danî bi nifşê nû re bidim nas kirin.. Lê ew pêzanînên ber fireh li ber destê min nebûn.

Memdûh Selîm Beg; ev lehengê nepen yê ku ji destpêka çerxê bîstan ve gelek kar û xebat ji gelê xwe re pêşkêş kiriye û tev jiyana xwe di ber kêşeya gelê xwe de mizaxtiye.. Mixabin ku ta roja îro hêj nivîskarekî Kurd wek ku pêdivîye li dor jînenîgariya wî ne nesekiniye.. Di baweriya min de ev yek jî, ji ber kêmbûn û nebûna pêzanînan bû û hin sedemên din.. Ji kesên ku li dor nivîsandine; mamoste Rohat Alakom e. Camêr di pirtûka xwe a bi navê (**Xoybûn û Şoreşa Agirî**) de, tiştê jê hatiye li dor Memdûh Selîm Begê Wanî nivîsandiye. Rehmetiyê Mihemed Uzun jî di romana xwe (**Siya Evînê**), a sisyan de, beşek ji jiyan û xebata Memdûh Selîm Begê Wanî aniye ziman. Her wiha di nav re jî rewşa siyasî, civakî û kulturî ya Kurdistanê, piştî Şerê Cîhanê yê duemîn di nav re derbas kiriye. Belê nizanim, bê Mihemed Uzun ew qunax û hurikên veşartî di jiyana Memdûh Selîm de ji kû anîne..?! Min jî di pirtûka xwe a di bin navê (**Komela Xoybûn 1927 û Bûyerên Rojane Yên Şoreşa Araratê 1930**) de, ku bi zimanê erebî li Erbîlê hatiye çap kirin, hin pêzanîn li dor kar û xebata wî anîye ziman.

Belê a ji tevan giringtir ku vê paşiyê mamoste Xalid Îssa ji Parîsê çend belge li dor navdarên Kurdan ji **arşîvên dewleta Fransî** (Fermandariya tabûra ewlkariya hikumeta Fransî li Sûriyê), deranîne û bi zimanê Erebî di NETê de belav kirine, yek ji wan li dor Memdûh Selîm Begê Wanî ye.

Ev belge di roja 29/09/1927 an li Şamê hatiye nivîsandin. Belê di encam de wiha dikarim wî bidim naskirin.

## Memdûh Selîm Begê Wanî kî ye?

Memdûh Selîm Begê Wanî; Ji pêşengên dîplomatên Kurda ye, endazyarê avakirina pêwendiya ye di navbera Kurdan û Ermeniyan de û Hîmdarê damezirandina Komela Xoybûnê ye.. Ew ji xelkên Wanê ye, kurê Cemîl Tewfîq Begê ye. Di hin cihan de jî navê wî Memdûh Cemîl Begê Selîm hatiye nivîsandin, hem jî bi navê Eskender Begê hatiye naskirin, ev navê wî yê veşartî bû.

Memdûh Selîm Beg, di sala 1897 an de li bajarê Wanê çêbûye, xwendina destpêkê li Wanê û ya bilind li Stenbolê di felsefeye û siyasetê de bi dawî aniye û di gel re jî fêrî zimanê Fransî bûye.

Ji encamên dostaniya wî bi ermeniyan re fêrî zimanê Ermenî jî bûye, jixwe zimanê kurdî zimanê axaftina mala wî bû. Li Stenbolê bûye mamostayê edebiyatê û pêwendiyên wî bi rewşenbîrên kurdan, Ermenan û Tirkan re çêbûye, nexasim bi Kurdên Stenbolê re wek Bedirxaniyan, Nehriyan, Babaniyan, malbata Cemîl Paşa û kesayetiyên wek Abdellah Cewdet, Kemal Fewzî, Hemzeyê Miksî, Xelîl Xeyalî, Mustefa Beg û Bozan Begê Berazî, Dr. Mihemed Şikrî Segvan û wiha di nav tevgerqa netewî Kurdî de jî xwedî cihekî berz bû.. Wiha jî pêwendiyên wî bi Ermeniyan re jî hebûn û cihê baweriya rewşenbîrên Ermeniyan bû wiha jî endamên partiya Taşnaq .

Institut kurde de Paris

Di salên xwendina li Stenbolê de beşdarî di damezirandina gelek komeleyên Kurdî de kiriye. Di sala 1913 an de wek kadirekî di kovara (Rojî Kurd) de cih girtiye. Di dawiya şerê cihanê de ku wî jî beşdarî têde kiribû, bi welatparêzên Kurdan re li Stenbolê (Komela Tealî a Kurdistanê: Kurdistan Tealî Cimiyetî) damezirandiye û di sala 1918/1919 an de kovarek bi navê JIN weşandine. 25 hejmar ji vê kovarê hatine weşandin, ji hejmara yekê ta bîstan berprsyarê wê Hemze Begê Miksî bû, ji hejmara 21 an heta hejmara dawî (25) Memdûh Selîm Beg bi berprsyariya wê rabûye.. Ev Kovar (Jîn), weşana fermî ya rêxistina Komela Tealî Kurdistanê bû.

Di Komela Tealî Kurdistanê de, ew li rexê Emîn Alî Bedirxan û kurên wî sekiniye û doza serxwebûna Kurdistanê kiriye, vajî Şêx Abdulqadirê Nehrî serokê komelê û Zeynelabidîn berbirsyarê komelê li Adana.. Û her wisa di sala 1918/1919 an de Memdûh Selîm di gel Sureya Bedirxan, Arif Mardînî, Nicmedîn Kerkûkî, Abdullah Cewdet.. sekiniye û komela (Lique Kurde) damezirandine.. Di 20 çêriya paşî sala 1919 an de Memdûh Selîm karîbû bi hunera dîplomasiya xwe, raya komeleyên Kurdî (Komela Tealî Kurdistanê, Komela Teşkîlatê Îctîmaiye, Komela Serxwebûna Kurdistanê û yên din), di bin serokatiya Şerîf Paşa de bike yek û Şerîf Paşa wek nûnerê Kurdan bi Nûbar Paşa nûnerê Ermeniyan re beşdar bibe û herdû bi hev re doza mafê netewên xwe bikin.. Anku Memdûh Selîm karîbû Kurd û Ermenan li hev bîne, berî ku peymana Sîverê di roja 10.8.1920 an de bê mor kirin.. Tevî qirkirina Ermeniyan û gunehê ku bi rex Kurdan de dihat avêtin û hê jî tê avêtin..

Institut kurde de Paris

Di sala 1922/1923 an de Memdûh Selîm neçar dibe ku Stenbolê li paş xwe bihêle.. Hingî diçe Misrê, bajarê Qahîre bal Sureya Bedirxan û pêlekî li wîr kar dike.. Piştî têkçûna şoreşa Şêx Seîd di 1925 an de, careke din welatparêzên Kurd, ronakbîr û hîmdarên komeleyên Kurdî yên Stenbolê di Rojhilata Navîn û Ewrûpa de belav dibin û Kemalîst piraniya serok eşîr, Şêx û axayên Kurdan Sirgûnî Anadola Rojava dikin.. Di sala 1926 an de mîr Celadet Bedirxan bo mirina bavê xwe Emîn Alî, ji Almaniya tê Qahîre. Li Qahîre çav bi birayê xwe Sureya û dostê xwe Memdûh Selîm, hevalê rojên Stenbolê dikeve.. Piştî veşartina mîr Emîn Alî Bedirxan di goristana Qahîre de, her sê ronakbîrên Kurd di rewşa welat û welatiyên xwe de diponijin û di encam de ramana damezirandina komeleyeke Kurdî ya nû bi alîkariya Ermeniyan dikeve serê wan de. Ji bo vê armancê Mir Celadet Bedirxan û Memdûh Selîm Beg têne Beyrûtê mala Mîr Xelîl Ramî Bedirxan, waliyê Maletyayê yê berê.. Li Beyrûtê, Memdûh Selîm û mîr Celadet Bedirxan, pêwendiyan bi Ermeniyên Beyrûtê re girêdidin, di serê wan de, Vahan Papazyan, berpirsê partiya Taşnaq li Libnanê..

Û di encam de Memdûh Selîm bi dîplomasiya xwe û dostaniya xwe a kevin bi Ermeniyan re, wan razî dike ku alîkarbin bi Kurdan re ji şoreşeke nû re.. Ji rexekî din ve Mîr Celadet Bedirxan jî têkiliyê bi welatparêzên Kurdan yên revyayî û sirgûnkirî re girêdide wek Dr. Mihemed Şikrî Segvan li Bexdayê, Şerîf Paşa li Parîsê, Mistefa û Bozan Şahîn li Cerablis û Kobanî, Elî Riza kurê Şêx Seîd, Haco axa û Emîn Axa Perîxanê li Sûriyê, gundê Dugirê..û ji wan dixwaze ku li Beyrûtê kom bibin.. Û wiha di roja 5ê çêriya

Institut kurde de Paris

pêşî sala 1927 an de bi navê (Xoybûn), rêxistineke nû di mala Vahan Papazyan de tê damezirandin. Memdûh Selîm Beg û Mîr Celadet Bedirxan ji hîmdarên damezirandina Xoybûnê yên sereke bûn. Tevî qirkirina Ermeniyan û dilmaniya wan ji Kurdan.. Memdûh Selîm beg du carî karîbû Kurdan û Ermenan lihev bûne û wan bigihîne hev; carekê di peymana Sîverê de û carekê bi avakirina Xoybûnê.. Gelo roja îro rêxistinên me karin peymaneke wiha hevbeş bi Ermeniyan re ava bikin..?!

Komela Xoybûnê Şoreşa Agirî birêve dibir.. Piştî her çar/pênc eniyên şer ku ji Binxetê ve di hawara Îhsan Nûrî Paşa û şervanên Agirî de bi paş de zîvirîn û hewildana wan beravêtî bû, Memdûh Selîm Beg û Mîr Celadet Bedirxan di dawiya havîna 1930 ê de, xwe bi şervanên Agirî ve gîhandin.. Lê Sed mixabin çûna wan jî bê sûde bû.. Paş vegera Memdûh Selîm Beg ji Araratê dît ku ew keça Çerkez ya ku li Beyrûtê hezê dikir mêr kiriye.. Jana vê hezkirinê pêre direj dike.. Memdûh Selîm Beg li Sûriyê a ku hingê di bin desthilata Fransîzan de bû, di wezareta perwerdeyê de mamosteyî kiriye û bi taybet li Bajarê Antakiyayê. Di sala 1936 an de piştî ku Antakiya ketiye bin destê Tirkan de li bajarê Derea û Laziqiyê mamosteyî kiriye, paşê li Şamê niştecî bûye û di eynî wezaretê de bûye mufetişê perwerdeyê.. Di wan salan de jî jinek ji malbata Cezairî ku bi temenê xwe mezin bû ji xwe re aniye û jiyana xwe li Şamê burandiye ta ku malnîşî bûye.

Wek ku me got, Memdûh Selîm Beg, rojên dawî ji jiyana xwe li bajarê Şamê derbas kiriye. Di sala 1976an de,



Institut kurde de Paris

li Şamê koça dawî kiriye û li taxa Kurdan, di goristana şêx Xalidê Neqişbendî de, li kêleka rêhevalên xebata kurdewariyê mîr Celadet Bedirxan û Qadrî Can hatiye veşartin.

Ji bo bêtir pêzanînan li dor jiyana Memdûh Selîm Beg nas bikim, di rojên 10-11-12- 02.2011 an de, bi telefonê, ez çend carekî bi mamoste Gorgînê Mele Hesenê Kurd (Hesen Hişyar) re axifîm, yê ku mala wî li Şamê ye û temenê wî 73 sal e û ji kesên nêzîkî Memdûh Selîm Beg bûn. Wî bersiva pirsên min wiha vegerand:

(Berî ku Memdûh Selîm beg here ber dilovaniya Xwedê, min ser jê qut nedikirin.. Mala wî li Şamê, taxa Muhacirîn bû.. Ew û neviyên sultan Abdulhemîd cîranên hev bûn.. Ji wezareta perwerdeyê teqawît bibû, ew Mufetişê Mearifa bû.. Vê paşiyê jin anîbû, jina wî jl malbatek mezin bû, emîrak Cezairî bû, navê wê nayê bîra min.. Zarok ji wan re çênebûn.. Ji min re digot; di jiyana min de sê dînbûn bi min re derbas bûne: Yek jê ku min bi ya bavê xwe nekir û min Tib nexwend, a din ku min ew keça Çerkezî ya ku min hezê dikir nezewicand a sisiyan ku ez ketim nav siyasetê de.. Û got, (hêjî gotin ji Gorgînê Mele Hesenê Kurd re ye): Memdûh Selim li Şamê rojnameyek bi navê Antakiya bi zimanê Tirkî dijî Kemalîstan diweşand.. Lê hejmarên wê li ber destan nînin..?! Li dor pirtûkxaneya wî wiha got: Pirtûkxaneyek mezin li cem hebû, li ber dilê wî pir şêrîn bû, pirtûkek jê nedida kesekî.. Piştî mirina wî jina wî ew pirtûkxane da Komela Selahedînê a Xeyirî li Ammanê.. Carekê ez bi Martin re çûm cem, herdu bi Fransî bi hev re

Institut kurde de Paris

peyivîn.. Çendî Martin xwest ku tiştekî ji ser zimanê wî tomar bike, hin ji bîranînên wê binivîse, lê Memdûh Selîm Beg qebûl nekir û tiştekî hêja negot..

Ew di sala 1976 an de mir, meh û roj nayên bîra min.. Dema ku mir, min Kurdên taxê û dostên wî agahdarî mirina wî kirin û min pere ji bo xerciya gorê û guhestina termê wî ji xelkên tarê dahev û min, Mihemed Berzencî, Ebû Memdûh (Navê wî Mistefa Ebdo, ji Kurdên Efrînê bû) û Hesen Dêrkî.. me ew di goristana şêx Xalidê Neqişbendî, rex gora Qedrî Can de veşart.. Lê sed mixabin kêm kes amade bûn.. Dikarim bibêjim em sed kes nebûn..! Cardî mixabin ku niha cihê gora wî nediyar e, tenê bi texmîn zanim li kuye.. Di rex gora mîr Celadet Bedirxan deye, nêzîkî gora Qedrî Can e.. Memdûh Selîm Beg rewşenbîrekî pir mezin bû, mirovekî hezxwekirî bû, donciwan bû. Pêwendiyên wî bi eremeniyan re xurt bûn..)

Gazindek: Di dawiya vê xepartinê de gazindekê ji serokên rêxistinên Kurdên Sûriyê yên wê hingê dikim ku, bi erkê xwe yê netewî derbarî Memdûh Selîm Beg ranebûne.. Her wiha gazina min ji Kurdên Şamê û tev welatparêzên Kurdên Sûriyê jî heye; çawa guhnedane gora Memdûh Selîm Beg ku niha kes cihê wê nas nake..! Wax li vê sosretmayê..

Qamişlo, 15.02.2011

Institut kurde de Paris

# Rezoyê Osê

(Ebdulrezaqê Osê: 1950 - 2010)

Nivîskar û rewşenbîrekî Kurd î resen bû. Navê wî **Ebdulrezaqê Eliyê Îsayê Osê** ye. Roja 10.10.1950 li gundê Dekşûrî, herêma Qamişlo, hatiye jiyanê. Xwendina xwe, ya seretayî li gundê Tenûrî/ gundê sînordaşê Dekşûrî/ kuta kiriye. Ya navendî û lîse jî li bajarê Qamişlo bi dest xistiye. Bi navên: Aro; Rezo; Stêr; Azad; Pirs; **Ebdulrezaq Osê** û **Rezoyê Osê** di gelek kovar û rojnaman de nivîsiye, wilo jî di malperan de, ji wan: Stêr; Armanc; Dugir; Pirs; Metîn; Dengê Azadî; Zanîn.. Ji havîna sala 1970 de dest bi nivîsandinê kiriye. Gelek gotar û lêkolîn belav kirine. Wilo jî, helbest, keveşop û nûjen, nivîsiye, şano di kovaran de belav kirine, folklor daye hev û belav kiriye, kurteçîrok nivîsîne, çîrokên zarokan dane hev û pênc pirtûk bi navê Dîk-Dîko; Libhinarê; Bavê Hepûn; Şengê û Pengê; Finda Şemal çap kirine. Wî bi Kurdî nivîsîne û Dr. M. Nejarî guhertine zimanê Erebî û bi hev re di bin navê danehev û pêşkêşkirina herdu navan hatine çapkirin.

**Ji keda Mamoste Rezoyê Osê:**

**1** - 1972 - 1974 Endamê komîta berpirsiyariya kovara "**Şoreşgêr**", ku li bajarê Berlîna Rojava derdiçû, maye.

**2** - Di van salan de jî bûye endamê komîta çapderîn, ku sê pirtûk li Berlîna Rojava çap kirin: Dîwana S. Hêzanî, bi Kurdî. Helperkên Kurdî, yên folklorî, bi zimanê Elemanî. Miletek berxwedanê di ber hebûna xwe de dike, bi zimanê Elemanî.

**3** - 1977, kursê **fêrbûna zimanê Kurdî li bajarê Mosko**, ji grûpek xortên Kurd, yên zanîngehê re vekiriye.

**4** - 1977, Bûye endamê komcivîna damezrandina "**Hevbenda Kawa bo wêjeya Kurdî**" damezrerên vê hevbendê: Bavê Nazê; Dr. M. E. Najarî; Dr. S. Mulla û Rezo bûn, ku li Mosko pêk hat. Vê hevbendê gelek pirtûk, bi zimanê Erebî, çi wergerandin, çi jî afirandin/ dane weşandin.

**5** - 1978, 1980 Bûye endamê "**komîta amadekar**" bo pêkanîna yekbûna komeleyên xwendevanên Kurd li Ewropa, ku di bin çavnihêriya mamoste Ezîz Mihemed de kar dikir.

**6** - 1980, 1981 Berpirsiyariya belavoka "**Ronakbîr**",li Sûriya, kiriye.

**7** - 1982, 1984 Bi Bilûrvan re serkêşiya fêrbûna "**Kursênzimanê Kurdî**" li binekova Cizîrê kiriye.

**8** - 1983, 1993 Berpirsiyariya kovara "**Stêr**", bi Bilûrvan re, weku damezrêner, paşê bi Dilovan û hin rewşenbîrên din re kiriye.

Institut kurde de Paris

**9** - 1993 Endamê komîta berpirsiyar e di kovara **"Pirs"** de.

**10** - 2002, Endam û yek ji damezrênerên **Komîta xelata Cegerxwîn** e.

**11** - 2003, Bûye endamê komîta şêwirdarên kovara**"Pêl"** ko li Elmaniya der tê. Vê salê jî bûye endamê **PEN a Kurd.**

**12** - 2003, Vexwendî çalakiyên sedsalaliya Cegerxwîn, li Amedê û Izmîrê, bûye. Li wir "Xwendinek di berhemên Cegerxwîn de" pêşkêş kiriye.

**13** - 2004, Endam û çalakdarê komcivîna duwemîn ya "**rojên wêjeyê li Amedê**" bûye û beşdarî kiriye.

**14** - 2005, Endamê konferansa **PENa Kurd û PENa Tirk** bû, ku di bin çavdêriya **PENa Navnetewî** û **UNESCO** de li Amedê pêk hat.
**15** - 2005, Vexwendiyê **festîvala rewşenbîrî ya yekemîn li Duhokê** bû, da lîkolînekê li ser "**hevoksaziya Kurdî**". pêşkêş bike. Lê ji ber sedemên rewşa navwelatî, di navbera Sûriya û Îraqê de, nikarîbû amade bibe, tenha lêkolîna xwe rê kir.

**16** - 2006, Endam û çalakdarê **festîvala rewşenbîrî ya duhemîn li Duhokê** bû.

**17** - 2008, Endam û çalakdarê **festîvala Cegerxwîn li Hewlêrê** bû.

Institut kurde de Paris

**18** - 2008, wergêrê **xelata yekemîn ya fablê li Wanê** bû.

Ji bil ku gelek distnivîsên wî yên cur bi cur hene, amade ne ji çapê re.

Not: Di êvara înê roja 04/03/2010, saet 9ê şevê de, Yezdanê mezin, piştî nexweşiyek dirêj emanetê xwe ji nivîskar, rojnamevan û welatparêzê kurd Rezoyê Osê stand. Roja Înê, 05/03/2010, piştî limêja nîvro, bi beşdarbûna cemawerekî mezin darbesta wî, ji Qamişlo, ber bi gundê wî Dekşûrîyê ve û ew lê hat veşartin.

Institut kurde de Paris

## Silavek Wefadarî Ji Giyanê Rezoyê Osê Re

*Li azmanê bilind îro, şevên tarî hejar im ez*
*Stêra min xuya nake, nema ron û zelal im ez*

***Rezoyê Osê***

Wek ku diyar e berî salekê, di rojek mîna îro de(04.03.2011), mamostayê ziman û peyva Kurdî a resen Rezoyê Osê ji nav me barkir. Bi koçkirina wî re valahiyek berz di qada rewşenbîriya Kurdî de hat dîtin.. Rehmetî ji kesên pêşî bû di gel Zagrosê Haco ku korsên zimanê Kurdî di destpêka salên 1980 î de ji xortên Cizîrê re vekirin û bi dehan xort û keç fêrî zimanê dê kirin.. Hem jî bi nivîsandinên xwe yên bi zimanê Kurdî, bi karê xwe yê rojnamevanî û her wiha bi çalakiyên xwe yên rewşenbîrî û têvel xwedî cih û naskirî bû.. Ji bil pirtûkên wî yên bi zimanê Kurdî çapkirî û yên ku amade ne ji çapê re..

Di vê bîranîna diltezîn de mirov nikare wî bibîr neyne, serdana gora wî neke û gurzek kulîlk li ber serê wî daneyne.. Sebaretî min, wek dostekî wî yê nêzîk nizanim bi çi gotinan wî bibîr bînim; hema ez ê berê xwe bidim gundê wî Dekşûrî.. Ser gora wî a ku niha çûk û çivîk li ser kêla ber serê wî datînin û ew jî wek min sirûdên şîniyê dibêjin; ji xakê vegeriya xakê.. Ji Dekşûrî vegeriya Dekşûrî.. Ji jiyanê bi tenê bîranîn dimînin.. Erê bi tenê bîranîn dimînin.. Belê xweş e ku kar û barê mirov di vê jiyana kurt de çandina bîranînên çak û rind be.. Pîş û sazê mirov di xizmeta welat û welatiyên wî de be.. Mane Kurdan ji mêj ve gotiye: Tu çi

Institut kurde de Paris

tovê di xakê de bireşînî tê berê wî tovî hilînî.. Hem jî gotine: Ga dimre çerim dimîne, mêr dimre nav dimîne.. Erê em ê tev li axê vegerin..

Belê, gelkî rind e ku mirov bîranînên çak û bedew li pey xwe bihêle.. Bêguman mamoste Rezoyê Osê jî yek ji wan kesan bû yên ku bîranînên rind li cem me hiştine.. Çiko wî beşekî mezin ji jiyana xwe diyarî welat û welatiyên xwe kiribû.. Bi gotineke din xwe kiribû weqif ji ziman û rewşenbîriya Kurdî re..

Erê di serê vê biharê de ez gurzek Nêrgiz diyarî canê wî dikim û jêre dibêjim: Na mamoste! Stêra te di asmanê welat de hêjî berz, geş û bilind xuya dike û gelek li ber ronahiya wê ber xwe dibînin..

Ji Yezdanê mezin bihêvî me ku cihê wî bihişta rengîn be.

Qamişlo, 04.03.2011

Institut kurde de Paris

# Hunermend Seîd Yûsiv

Hunermend Seîd Yûsiv di roja 10.04.1947 an de li Qamişlo taxa Qidûr Beg çêbûye, Bavê wî Yûsivê Seîdê Osman e ji çiyayê Bagokê gundê Zaxuranê ye. Ji ber dubendiya malbatê bapîrê wî Seidê Osman xwe li Bişêriyê, mala Perîxanê girtiye û bi salan di nav wan de maye, ta ku bi şaşitî hatiye kuştin. Piştî kuştina bapîrê wî, bavê û apê wî Osman binxetî sûriyê bajarê Qamişlo dibin. Li Qamişlo bavê wî Yûsiv çav bi diya wî Emina Ehmedê Îssa dikeve û bi hev re dizewicin.

Li Qamişlo Bavê Seîd di avakirina xaniyan de kar dike û jêre dihat gotin Hoste Yûsiv.

Seîd Yûsiv dor sal û nîvekê li ber destê mele Mihemedê Xiznewî Quranê dixwîne û xitim dike. Di sala 1956 an de qunaxa seretayî di dibistana gundê Enteriyê de bi dawî tîne, çend salan di pey re qunaxa amadeyî û piştî zewacê Bekelorya jî bi rengekî azad û serbest distîne.

Ji biçûkaniya xwe ve li tembûrê dixine ta ku di serê sala 1966 an de dibe xwedî tembûr û tê naskirin.

Seîd Yûsiv di bin bandora Mihemed Arif Cizrawî û Muradê Kinê de mezin dibe.. Di wan salan de jî, di ahengên taybet

Institut kurde de Paris

de, dilê cemawer xweş û geş dike û nav û dengê wî belav dibe.. Hin caran di navenda çanda Erebî de li Qamişlo distirê. Û piraniya gotinên stranên wî ji danîna wî ne wek strana: Rewşê rewşê Rewşenê û Eman Cîhan..

Di sala 1967 ande diçe Beyrûtê, wek dengbêj di Radyo û aşxaneyên wê de kar dike, rojnamegeriya Libnanî jî baş li dor hunermendiya wî dinivîsînin. Û 4 sêlikan ji stranên xwe li Beyrûtê tomar dike, wek Rewşenê û Gulperî..

Di sala 1968 an de Êzgeya Kurdî li Bexdê wî vexwendî Bexdayê dikin, li wir çend stranên xwe tomar dike û ji wir diçe êzgeya Kerkûkê, ji wan re jî çend stranan tomar dike..

Li Îraqê çav bi Mihemed Arif, Hesen Cizrawî, Îssa Berwarî, Gulbihar, Nesrîn Şêrwan, Tehsîn Taha, Fexrî Bamirnî û gelek hunermendên din dikeve û bi hev re dibin dot û heval.. Û wiha her 6 heyvan ji bo tomarkirina stranan diçe Êzgeya Kurdî li Bexdayê.

Piştî çûna Aramê Dîkran a Ermenistanê, ew dibe dengbêjê yekem li Qamişlo. Mamoste Seîd Yûsiv di roja 01.08.1969 an de bi Emîra Melûl re dizewice û di roja 01.05.1970 î de kura wan Hunermed Zoro çêdibe û di eynî salê de 1969 an dibe Beyrûtê.

Li Beyrûtê, Komek Hunerî bi navê (**Koma Newroz a Kurdî- Libnanî Bo Hunera Gelêrî**) ava dike ku ji 45 emdaman pêk dihat, rehmetiyê Mihemed şêxo, Rifetê Darî, Elî Ehmed û Şêrîn di nav de bûn, Vê paşiyê hunermendên

Institut kurde de Paris

wek Mehmûd Ezîz û rehmetiyê Mihemed Emîn Kîkî jî tevlî wan dibin û yekemîn ahenga xwe di nîsana 1971 ê de li ser textê şanoya sînema **Rîvolî**, bi amadebûna Saib Selam, serokê Encûmena wezîrên Libnanî û gelek kesayetiyên Libnanî yên navdar wek rehmetiyê Kemal Cinbilat pêk tînin..

Di salên Libnanê de gelek caran hevdîtinên Tvyên Libnanî pêre têne lidarxistin û wiha jî dostaniya wî bi hunermendên Ereb yên Libnanî re xweş dibin wek Riad Şerare. Her wiha di wan salan de sêlikek bi zimanê erebî, bi navê **Zûro Libnan** tomar dike.

Di sala 1972 an de di gel hunermend Mehmûd Ezîz Şakir û hunermenda deng xweş Şêrîn Mele diçin Urdinê û ahengekê li Emmanê di bin serokatiya Seed Cima, serokê wezîrên Urdinî de pêk tînin.

Di sala 1972 an de, li ser daxwaza koma Newroz û Komela Kurdî li Libnanê, hunermendê mezin Mihemed Arif Cizrawî û Gulbihar û Îssa Berwarî vexwendî Beyrûtê dikin û du ahengên mezin li Beyrûtê, yek di stadyoma bajarê Sporê de û yek di sînema Rîvolî de pêk tînin.

Di sala 1972 an de, li Beyrûtê çav bi Mîr Dr. Kamîran Bedirxan dikeve û dostaniya wî pêre çêdibe.. û mîr Kamîran ji Kurdên Libnanê dibêje: **Kurên Min! Strana girê sîra bi sîr e ew jî Kurdistan e..**

Di sala 1973 an de li ser daxwaza Unesco, ew û hunermendê Efrînê Mihemed Elî Tico û hunermendê Îraqî

Institut kurde de Paris

Mûnîr Beşîr çend ahengan li Fransa û Almaniya divejînin. Hingê Unesco sêlikek wî a tembûrjeniyê tomar dike. Di sala 1974 an de, di gel 12 mûzîkjen û hunermendên Kurd li ser hesabê wezareta Libnanî a Siyahe, li Afrîqyayê digerin..

Piştî şerê libnanê, di 1975 an de, di sala 1977 an de mala xwe tîne Şamê, salekê di îzgeya wê de kar dike û dibe yek ji endamên sendîqeya hunermendên Sûriyê û her wiha gelek awazan dide hunermenda mezin Semîra Tewfîq..

Di sala 1978 an de mala xwe diguhêze bajarê Helebê û firoşgehek bo tomarkirin û firotina kasêtan vedike. Di dawiya 1979 an de careke din dizîvire bajarê xwe yê evînê Qamişlo û firoşgehek bo tomarkirina taseta û firotina amûrên mûzîkê vedike.

Di sala 1988 an de diçe Ewropa, Nemsa û gelek ahengan li tevayî Ewropa pêk tîne.. Di sala 1996 an de li ser daxwaza Buroya siyasî a PDKÎ diçe Kurdistana azad û çend ahengan li Selaheddîn û Duhokê pêk tîne û paşê jî li Stenbolê. Di van salên dawî de jî, gelek caran hatiye vexwendkirin ji rex wezareta kulturê a sûriyê û aheng di bajarên Sûriyê de pêk anîne.. Hem jî serkêşiya pêşbaziya Stranên Kurdî di TV / TRT6 de li Stenbolê kiriye.

Di gel ku mamoste Seîd Yûsiv Dengbêj, awazvan û mûzîkjene ew helbestvan e jî, ez dikarim bibêjim ku tev stranên wî, ji bil yên folklorî ji hunandina wî ne. Ji dîwanên wî yên Çapkirî: **Govenda Dilan, Rewşen û Sozdil**. Û yên neçapkirî, 5 dîwan hene. Pirtûkek wî bi erebî, bi navê (Bedai

Institut kurde de Paris

Teelîm Alet Elbiziq) amade ye ji çapê re. Ta niha dor 25 kasêtên wî hatine tomar kirin û gelek xelat wergertine.

Jiyana Seîd Yûsiv jiyanek mişt xebat e, wî 45 sal ji temenê xwe di warê huner û peyva Kurdî de xerckiriye û hê jî berdewam e. Em jî temenekî dirêj di xweşiyê de bo Seîd Yûsiv, Mîrê Tembûrê hevî dikin.

Wek wefadarî û rêzgirtin ji ked, xebat û berdewamiya Seîd Yusiv re, di ber gotin, awaz û mûzîka Kurdî de, ku 45 salan pêre dirêj kiriye, di roja 22.09.2011 an, li bajarê Qamişlo di hola Dr. Nûreddîn Zaza de, bi beşdarbûna beşekî ji rewşenbîr, nivîskar û helbestvanên Kurd, mamoste **Hemîdê Derwêş** sekretêrê Partiya Dîmoqratî Pêşverû Kurdî li Sûriyê hunermend Seîd Yusiv bi dîplomek rêzgirtinê xelat kir.

Hêjaye gotinê ku ev diwemîn care ku hunermend Seîd Yusiv ji rex rêxistinek kurdî ve tête xelat kirin, cara pêşîn ji rex mamoste Ismaîl Omer serokê Partiya Yekîtî ya Demokratîk ya kurdî li Sûriyê (YEKÎTÎ), hatiye xelat kirin.

Qamişlo, 23.09.2011

Institut kurde de Paris

**Konê Reş Kî Ye**; nivîskar û helbestvanekî Kurd e.. Navê wî Selmanê Osmanê Evdo ye. Sala 1953 an li gundê Doda, nêzîkî Qamişlo çêbûye..

Di malbateke Kurdperwer, zimanhez û rewşenbîr de mezin bûye.. Ji mêj ve hez ziman, folklor û toreya gelê xwe kiriye.. Û wiha gelek berhem û gotarên wî di kovar û rojnameyên Kurdî yên mehane û rojane de hatine weşandin û gelek pirtûkên wî hatine çap kirin.. û bi serketin di her çar perçeyên Kurdistanê de hatiye naskirin.. Konê Reş, yek ji wan kesên pêşî ye ku di van sîh salên dawî de li Binxetê bi zimanê Kurdî nivîsandiye. Hêjî bi kar û barên xwe yê nivîsandina bi zimanê Kurdî berdewame. Ew hebûna gelê Kurd di hebûna zimanê Kurdî de dibîne û her dem dibêje: Zimanê me dîroka me ye.. Hêvî û daxwazên wî jî evin; ku wê rojê bibîne; ew roja ku her sibeh rojnameyeke Kurdî bi tîpên Latînî li ber deriyê mala wî be û bi rêka wê rojnameyê nûçe û bûyerên Kurdistanî û cîhanî bixwîne.

Institut kurde de Paris

وەشانێن وەزارەتا رەوشەنبیری و لاوان

ڕێڤەبەریا گشتی یا راگەهاندن و چاپ و بەلاڤکرنێ

ڕێڤەبەریا چاپ و بەلاڤکرنێ -- دهۆک

| ژ | ناڤێ پەرتووکێ | نڤیسەر |
|---|---|---|
| | ٢٠١١ | |
| -١ | بایولۆژیا گەردی و خانەی | و. دیان جمیل |
| -٢ | مایکرۆبایولۆژی | و. دیان جمیل |
| -٣ | رۆمان خودیکا ژیانێیە — ج١ | د.عارف حیتو |
| -٤ | شۆرشێن جەماوەرێ ئەرەب | د. فاضل عمر |
| -٥ | رۆلێ دەقی دئاڤاکرنا دراماێا کوردیدا | شڤان قاسم |
| -٦ | تطور الاعلام الكردي | حسين صديق |
| -٧ | الرواية التأريخية | د. جمال خضير |
| -٨ | تاڤگە لێگەریان ل رۆناهییا پرا جینۆتێ | تەحسین ناڤشکی |
| -٩ | هن ئالیێن جڤاکێ کوردی دکولتورێ گەلیری دا | نزار محمد سعيد |
| -١٠ | هێنری ماتیس | فەهمی بالایی |
| -١١ | شوونوارێن دەڤەرا دهۆکێ | عزەت فندی |
| -١٢ | سترانێن عەمەرێ عەڤدێ ژ کانیا جراڤێ | هزرڤان عبد الله |
| -١٣ | فن وعمارة الكورد | رنا فتحي الأومري |
| -١٤ | فەرهەنگا زمانێ یەرنبیا / کوردی - یەرنی | د. فاضل عمر |
| -١٥ | بزاڤا شانۆیێ (ل ئاکرێ، ئامێدیێ، زاخۆ) | رفعەت رجب جەمال |
| | ٢٠١٢ | |
| -١٦ | Gotinên li ber mirinê | دیا جوان |
| -١٧ | سالێن پەنابەریێ ژ ژیانا ئیحسان نوری پاشا | موسەدەق تۆڤی |
| -١٨ | ئالایێ کوردستانێ- ڤەکۆلینەک دیرۆکی | یوسف صبری |
| -١٩ | جارەک ژ جارا (کورتە چیرۆکێن فلکلوری) | دیا جوان |
| -٢٠ | زمانڤانیا دێکستی | شورشڤان عادل احمد |
| -٢١ | جوداکرنا کارێ لێکدای ژ کارێ خودان تەواوکەر و بەرکار | دلبرین عبدالله علی |
| -٢٢ | دادابیزم دهۆزانا نویخوازا کوردیدا | ارشد حیتو |
| -٢٣ | نێچیرا کولان (شانۆیا ب هەفت وێنەیان) | و. شالیکۆیێ بێکەس |
| -٢٤ | ژ بۆ تە (هەلبەست) | دیا جوان |
| -٢٥ | اللغة الكردية في منطقة بهدينان | ت. كريم فندي |
| -٢٦ | تێگەهەکێ یاسایی بۆ رۆژنامەڤانیێ | هەکار عبد الكريم فندي |
| -٢٧ | دهوك في اواسط القرن الماضي | جميل محمد مصطفى |
| -٢٨ | بەهائی ( شێخ تاها عبدالرحمن مایی) | د. عبدالرحمن مزوري |
| -٢٩ | بنەمایێن درامایێ د حیکایەتێن بازیدیدا | ئارام یوسف ابراهیم |
| -٣٠ | مێژوویا ئێکەتیا قوتابیێن کوردستانێ | فرست طيب عبدالله |
| -٣١ | دێ چەوا ژ بۆ زارۆکان نڤیسی | و. هزرڤان |
| -٣٢ | جەگەر، چەند شیرەتێن دەروونی | حاجی رەمەزان بێسکی |
| -٣٣ | بابەتێن سینەمایی و فوتوگراف | رمزی ئاکریی |
| -٣٤ | خێزانا بەختەوەر | صبرية صالح حسن |
| -٣٥ | ژیان ل ناڤ کوردان دا (مێژوویا ئێزدیان) | و. داود خديده |

Institut kurde de Paris

| | | |
|---|---|---|
| ٣٦- | سەرهاتیێن فەشارتی و ئاشوویی | و. کاڤین نەجیب |
| ٣٧- | جونیکرنا گیرەکێن زمانێ کوردی | صدیق حجی ولی |
| ٣٨- | پەیوەندی و گەهاندن دراگەهاندنێ دا | حەسەن سەدیق |
| ٣٩- | ستەکهۆلمێ تە چ دیتیە بێژە ؟ | باڤێ نازێ |
| ٤٠- | ئامیدی (العمادیة) دراسة في التاریخ السیاسی | رجب جمیل حبیب |
| ٤١- | القصة الکردیة القصیرة (قراءة مقارنة) | عبد الکریم یحیی |
| ٤٢- | زەنگینیێ هێژا | و. ماجد محمد ویسی |
| ٤٣- | زانستێ جوانکارییێ دهۆزانا کوردیدا | مسعود یاسین چەلکی |
| ٤٤- | سمکۆیێ شکاك | فاخر حەسەن گولی |
| ٤٥- | هیومانیزم د هۆزانا نو یا کوردی دا | ریزان شڤان ئیسف |
| ٤٦- | علماء قدموا الی الموصل من الکرد ومن کوردستان | جاسم عبد شلال |
| ٤٧- | مێژوویا کوردستانێ یا کەڤن | محمد صالح طیب – رێبەر جعفر |
| ٤٨- | گەنجینە | مسعود خالد گولی |
| ٤٩- | فرهەنگا تیرمێن ویژەیی | باڤێ نازێ |
| ٥٠- | نهێنییێن داردە و رەفتارێن جڤاکی | عبدالجبار عبدالرحمن |
| ٥١- | رێزمانا زمانێ کوردی | باڤێ نازێ |
| ٥٢- | نەمانا هندەك پەیڤێن زمانێ کوردی | محمد ابراهیم ئامێدی |
| ٥٣- | دور المهارات الریادیة للمدیرین | دلشاد طه میرو علی |
| ٥٤- | رێبەرێ رۆژنامەڤانییا سەربخوە | برهان یحیی حمو حاجی |
| ٥٥- | المعوقات الاجتماعیة والسیاسیة للتسامح في المجتمع الکردي | د. محمد سعید حسین |
| ٥٦- | سەرهلدان و وەرارا جۆرێن نوو یێن ئەدەبی | دریاس مصطفی سلیمان |
| ٥٧- | علماء الکورد وکوردستان | صالح شیخو الهسنیانی |

٢٠١٣

| | | |
|---|---|---|
| ٥٨- | دیرۆکا دنڤەکرییێ | یورگن ئۆستەر هامەل – نیلس .پێ پێتەرسون – و.ئەبدولحەمید بامەرنی |
| ٥٩- | نووچە ژ کاغەزێ بۆ ئەنتەرنێتێ | ئازاد نسری |
| ٦٠- | التدخل الانساني من قبل الامم المتحدة | خدر شنگالی |
| ٦١- | اخلاقیات الاعلام الجدید | د. رحیم مزید علی |
| ٦٢- | فصول من تاریخ یهود کوردستان | د. فرست مرعی اسماعیل |
| ٦٣- | مدرسة قبهان | د. محمد سعید أحمد |
| ٦٤- | رێبەرێ نڤیسینا ڤەکولینێن زانکۆیێ | أمین عبدالقادر |
| ٦٥- | شاکارێن هەلبەستا جیهانی | أسماعیل ئاهر جانگیر |
| ٦٦- | رۆندکێن ژ خوینێ بۆ واری و ئەڤینێ | ئوسامە محمود حەسەنی |
| ٦٧- | مێژوویا یاسایێ | م. محمد حسن الخیاط |
| ٦٨- | Ji Stêrên Welatê Qedexe | Konê Reş |

Institut kurde de Paris

### وەشانێن پروژێن هەڤپشك و هاریکاری یێن
### رێڤەبەریا گشتی یا راگەهاندن و چاپ و بەلاڤکرنێ
### رێڤەبەریا چاپ و بەلاڤکرنێ - دهۆك

| ژ | لایەن | نڤیسەر | ناڤێ پەرتوکێ |
|---|---|---|---|
| | | ٢٠١٢ | |
| ١ - | کوریەندا سەرەرم یا قوتابییان | بەلاڤوکا سالانە | زمانێ دایکێ |
| ٢ - | ئێکەتیا نڤیسەرێن کورد/دهوك | ئەمین عەبدولقادر | تیۆر و تەکنیکێن شرۆڤەکرنا رۆمانێ |
| ٣ - | ئێکەتیا نڤیسەرێن کورد/دهوك | یونس احمد | رائحة الورد (قصص قصيرة) |
| ٤ - | ئێکەتیا نڤیسەرێن کورد/دهوك | حسب الله يحيى | الكتابة بالحبر الأبيض |
| ٥ - | ئێکەتیا نڤیسەرێن کورد/دهوك | ئدریس عەلی دێرگزنیکی | ئەو ستێرا تەڤیای (هەلبەست) |
| ٦ - | ئێکەتیا نڤیسەرێن کورد/دهوك | محەمەد عەلی یاسین | هەڤوەغەرێ بای |
| ٧ - | ئێکەتیا نڤیسەرێن کورد/دهوك | دەمهات دێرکی | Hest diaxivin(هەلبەست) |
| ٨ - | ئێکەتیا نڤیسەرێن کورد/دهوك | سەلمان شێخ مەمی | د عەشقا تە دا (هۆزان) |
| ٩ - | ئێکەتیا نڤیسەرێن کورد/دهوك | فەهێل محسن | دێ رووبارەکی کەمە کلیل... |
| ١٠ - | ئێکەتیا نڤیسەرێن کورد/دهوك | خالد حسین | رۆژەکێ هو گوت |
| ١١ - | کومەلا هەلبەستڤانێن گەنج | کومەلا هەلبەستڤانێن گەنج | داستانەکا هەلپەسارتی |
| ١٢ - | رێکخراوا سیما | پروفیسور د.سابر عەبدوللا | سیما ٢ |

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# KONÊ REŞ




Ji ber tarîbûn û bê ronahiyê, stêr di asmanan de diçirisîn in, ji hêza baran û şilahîyê, xak di buharî de dikene, mirovên çak, rind û leheng jî, ev kesin, ku ji nebûnê, hebûna xwe di nav gelê xwe de diyar dikin, di şert û mercên dijwar û teng de li ber xwe didin, di nebûna mêran de, mêranîya xwe berz û eşkere dikin, ji ber ku di firehîyan de her yek dibêje: ez lawê bavê xwe me.. Lê ez heyranê wî mirovê bim, ewê ku di asteng û dijwarîyan de, li ber xwe bide û ji mêranî nekeve, û dawî welatîyên wî pesnê wî bidin û li ber ronahîya kiryarên wî, pîş û hunera wî pêşkevin û reş û sipî ji hev derxînin.

Institut kurde de Paris

چاپخانا پاریزگەها دهوکێ
CAPXANA PARÊZGEHA DUHOKÊ

Rêveberiya Çap û Belavkirnê - DUHOK
Hijmara Sipardinê 2104 68 2013